ана́лиз *м. в разн. знач.* analîz *ж.*; nihêrandin *ж.* (*рассмотрение*); zelalkirin *ж.*, safîkirin *ж.* (*выяснение*); **хими́ческий ~** analîza kîmîyaê; **коли́чественный ~** analîza çiqasîyê (piranîyê); **ка́чественный ~** analîza cûretîyê; **~ кро́ви** nihêrandina xûnê; **~ по́чвы** nihêrandina xwelîyê; **производи́ть ~** analîz kirin.

анализи́ровать, проанализи́ровать analîz kirin; nihêrandin (*рассматривать*); zelal (eyan) kirin (*выяснять*).

аналити́ческ||ий *прил.* yê analîtîk, yê analîtîkîyê; ~ **ме́тод** mêtodê analîtîk, qaîdê analîtîkîyê; ~**ая хи́мия** kîmîya analîtîk.

аналоги́чн||ый *прил.* yê analoj, yê mîna hev, yê nimanî hev, yê teherekî; ~ **слу́чай** qezîya wî cûreî (teherî); ~**ые явле́ния** qewmandinê wî cûreî (wî teherî).

аналóг||ия *ж.* analojî *ж.*, şivet *ж.*; **по́лная** ~ şiveta temamîyê; **по** ~**ии** bi notilahevkirinê, mîna hev kirin; **провести́** ~**ию** bişivet derbaz kirin, angorî hev kirin.

ананáс *м.* 1. (*плод*) ananas *ж.*; 2. (*растение*) dara ananasa.

анархи́зм *м.* anarşîzm *ж.*, anarxîzm *ж.*

анархи́ст *м.* anarşîst *м.*, anarxîst *м.*; terefdarê anarşîzmê (*сторонник анархизма*); uzvê teşkîleta anarşîsta (*член анархистской организации*).

анархи́стский yê anarşîst.

анархи́ческий *прил.* yê anarşî, yê anarşîyê; ~ **спóсоб произво́дства** qaîdê deranîna anarşîyê.

ана́рхия *ж.* 1. *полит.* anarşî *ж.*; 2. (*безвластие*) bêhukumatî *ж.*, bêserkarî *ж.*; 3. *перен.* bêtertîbî *ж.* (*беспорядок*); bêqaîde *ж.*, bêqanûnî *ж.* (*беззаконие*); xweserîtî *ж.* (*своеволие*); bêserwerî *ж.* (*самотёк*); ~ **капиталисти́ческого произво́дства** bêtertîbîya deranîna hasiletê ya kapîtalîstîyê.

ана́рхо-синдикали́зм *м.* anarşo-sîndîkalîzm *ж.*

ана́том *м.* anatom *м.*, ulmdarê anatomîyê.

анатоми́ровать *несов. и сов.* meît qelaştin.

анатоми́ческий *прил.* yê anatomîyê; ~ **а́тлас** **deftera** anatomîyê; ◇ ~ **теа́тр** **oda** anatomîyê.

анато́мия *ж.* anatomî *ж.*, ulmê anatomîyê; ~ **челове́ка** anatomîya merîya; ~ **расте́ний** anatomîya heşnaîya.

анахрони́зм *м.* 1. anakronîzm *ж.*; 2. (*пережиток*) edetê buhurî.

ангáр *м. ав.* angar *ж.*, cîwara teyara, teyarxana sergirtî.

áнгел *м. рел., поэт.* melek *м.*

ангидри́д *м. хим.* angîdrîd *ж.*

ангúна *ж. мед.* gewrîêş, angîn *ж.*

англи́йск||ий *прил.* yê înglîsî; ~ **язы́к** zimanê înglîsî; ◇ ~**ая була́вка** derzîya pêsîra (înglîsî); ~**ая соль** xwêa înglîsî.

англича́нин *м.* merîyê înglîsî.

а́нгло-америка́нский *прил.* yê înglîs û emirkan (emrikan).

англо́рск||ий *прил.* yê angorê; ~**ая коза́** bizina tiftîkdirêj (angorê, mûdirêj).

анекдóт *м.* anêkdot *ж.*, metelok *м.*, henek *ж.*, çîrok *м.*, qelebotk *ж.*; hîkyata kenanînê (*смешной рассказ*); qewimandina eceb (nedîtî) (*удивительный, забавный случай*).

анекдоти́ческий *прил.*, **анекдоти́чный** *прил.* yê anêkdotî, yê meteloka kenanînê, yê qelebotka; yê ecêb (*удивительный, забавный*); ~ **слу́чай** qezîya ecêb (qelebotkêîyê, ecêbî).

анеми́ческий *прил.*, **анеми́чный** *прил.* 1. (*малокровный*) yê kêmxûn, yê xûnkêmasîyê, yê xûna wî hindike (kême); 2. *перен.* yê sist (*слабый*); yê bêqewet (*слабосильный*); yê neqewet, yê zeîf (*немощный*).

анеми́я *ж.* kêmxûnî *ж.*, xûnkêmasî *ж.*, anêmî *ж.*

анемóметр *м.* anêmomêtr *ж.*, destgê bapîv.

анерóид *м.* anêroîd *м.*

анестези́ровать *несов. и сов. мед.* eş hêsa kirin (rehet kirin).

анестези́я *ж.* hêsakirina (rehetkirina) êşê.

анили́н *м. хим.* anîlîn *ж.*

анили́нов||ый *прил.* yê anîlînê; ~**ые кра́ски** dermanrengê anîlînê.

ани́с *м. бот.* 1. (*растение*) dara anîsûnê, anîs *м.*; 2. (*семена*) toximê anîsûnê.

ани́сов||ый *прил.* yê anîsûnê, yê anîs; **~ое ма́сло** bizirê anîsûnê.

анке́||та *ж.* ankêt *ж.*, serhatîname *ж.*; **запо́лнить ~ту** ankêt tijî kirin; **провести́ ~ту** pirs kirin, derbazî ankêtê kirin.

анке́тн||ый *прил.* yê ankêtê; **~ые да́нные** elametîyê (nîşandaîna) ankêtê.

анна́лы *мн.* salnivîsî *ж.*, tarîxnivîsî *ж.*; tarîxnivîsandina sal bi sal (*хроника*).

аннекси́ровать *несов. и сов.* anêksîya kirin; bi zorê zevt kirin (*овладевать силой*).

анне́кс||ия *ж.* anêksîya *ж.*; zevtkirin *ж.* (*завоевание*); **мир без ~ий и контрибу́ций** pêîmana bê deyn û bê zevtkirinê.

аннота́ция *ж.* anotasîya *ж.*, nêtgotin *ж.*

анноти́ровать *несов. и сов.* anotasîya kirin, nêt gotin; şiro vekirin (*объяснять*).

аннули́рование *с.* retkirin *ж.*, undakirin *ж.*, pozemîşkirin *ж.*

аннули́ровать *несов. и сов.* ret (unda, pozemîş) kirin; **~ долги́** deyn daîn (kuta kirin).

ано́д *м. физ.* anod *м.*

анома́лия *ж.* anomalî *ж.*, nerastî *ж.*; ◇ **магни́тная ~** *физ.* anomalîya meqletûzê.

анома́льный *прил.* (*неправильный*) yê nerast.

анони́м *м.* nivîskarê navveşartî, nivîskarê bênav û bêdeng, anonîm *м.*

анони́мн||ый *прил.* yê bêqol, yê bênav, yê neeşkerê; **~ое письмо́** nema neeşkere.

анса́мбль *м.* deste *ж.*, ansambl *м.*, kom *ж.*, tofek *ж.*; **~ пе́сни и та́нца** desteka stiranê û reqasê.

антагони́зм *м.* antagonîzm *ж.*, muxalêfî *ж.*, antahonîzm *ж.*; pêşbersekinî *ж.* (*оппозиция*).

антагони́ст *м.* merîyê muxalêf, antagonîst *м.*

антагонисти́ческ||ий *прил.* yê antagonîstîyê; yê neyarîyê (*враждебный*); yê pêşbersekinî (*оппозиционный*); **~ие противоре́чия** muxalêfîyê antagonîstîyê.

Анта́нта *ж. ист.* Antant *ж.*

антаркти́ческий *прил.* yê antarktîk, yê antarktîkîyê.

анте́н||на *ж. радио* antên *ж.*; **вертика́льная ~** antêna tîk; **горизонта́льная ~** antêna raxistî; **натяну́ть ~ну** antên kişandin.

анти... miqabilî..., pêşberî...

антивое́нный *прил.* yê miqabilî eskerîyê, yê miqabilî cengîyê.

антигосуда́рственный *прил.* yê miqabilî dewletê.

антиимпериалисти́ческий *прил.* yê miqabilî împêrîalîstîyê (împêrîalîsta).

антиква́р *м.* antîkvar *м.* (*торговец древностями*); ĥewaskarê tiştê qedîm (kevin) (*любитель древностей*).

антиква́рн||ый *прил.* 1. yê kevin, yê qedîm (*старинный*); yê pirqîmet (*ценный*); **~ая вещь** tiştê qedîm û pirqîmet; 2. (*торгующий антикварными вещами*) yê firoşçîyê tiştê kevin û pirqîmet; **~ магази́н** mîxaza firotana tiştê kevin û pirqîmet.

антимаркси́стский *прил.* yê miqabilî marksîstîyê.

антиматериалисти́ческий *прил.* yê miqabilî matêrîalîstîyê.

антимилитари́зм *м.* miqabilî mîlîtarîzmê (cengîyê).

антимилитари́ст *м.* miqabilçîyê mîlîtarîzmê.

антимилитаристи́ческий *прил.* yê miqabilî mîlîtarîstîyê.

антинаро́дный *прил.* yê miqabilî cimaetê (milet), yê pêşberî muxulqetîyê.

антинау́чный *прил.* yê miqabilî ulmîyê.

антиобледени́тель *м. ав.* destgê miqabilî qerimandinê (bûzgirtinê).

антиобще́ственный *прил.* yê miqabilî cimaetîyê, yê miqabilî tevavetîyê; ~ **посту́пок** kirina miqabilî cimaetîyê.

антипарти́йный *прил.* yê miqabilî hîzbê (partîyê).

антипати́чный *прил.* yê kirêt, yê nefretanînê.

антипа́тия *ж.* kirêtî *ж.*, nefretanîn *ж.*

антирабо́ч||ий *прил.* yê miqabilî pala; ~**ее законода́тельство** qanûndanîna miqabilî pala.

антирелигио́зный *прил.* yê miqabilî dîn.

антисанита́рный *прил.* yê miqabilî sanîtarîyê (temîzaîyê, sehîyê); yê netemîzatîyê, yê qilêr (*нечистый, грязный*).

антисеми́т *м.* antîsêmît *м.* (*neyarê yahûdîya*).

антисемити́зм *м.* antîsêmîtîzm *ж.* (*yahûdneyarî*).

антисе́птика *ж.* antîsêptîk *ж.* (*melhemkirina birîna, bona qirkirina mîkroba*).

антисове́тский *прил.* yê miqabilî sovêtîyê; yê pêşberî dewleta sovêtîyê (*направленный против советского государства*).

антите́за *ж.* antîtêz *ж.*, miqabilî *ж.*

антите́зис *м. филос.* antîtêzîs *ж.*, eksîtêzîs *ж.*, têzîsmiqabilî *ж.*

антифаши́ст *м.* antîfaşîst *м.*, miqabilçîyê faşîzmê.

антифаши́стский *прил.* yê miqabilî faşîstîyê, yê faşîstmiqabilî, yê pêşberî faşîzmê.

анти́чный *прил.* yê antîk; yê dewrana kevin, yê qedîm, yê berê (*древний*); ~ **мир** dewrana qedîm (berê).

антра́кт *м. театр.* antrakt *ж.*; molet *ж.* (*перерыв*).

антраци́т *м.* antrasît *ж.*, komira kevirê xas.

антраци́тн||ый *прил.*, **антраци́тов||ый** *прил.* yê antrasîtê; ~**ые пласты́** leşê antrasîtê, taqê antrasîtê.

антропо́лог *м.* antropolog *м.*, ulmdarê tebîetîya îsan.

антропологи́ческий *прил.* yê antropolojîyê, yê merivzanbûnê, yê îsanzanbûnê; ~ **музе́й** mûzêa antropolojîyê.

антрополо́гия *ж.* antropolojî *ж.*, merivzanbûn *ж.*, îsanzanbûn *ж.*

ао́рта *ж. анат.* aort *ж.*

апати́т *м. мин.* apatît *м.*

апати́товый *прил.* yê apatît.

апати́чный *прил.* yê sist (*ленивый, вялый*); yê bêdil, yê leq, yê bêkêf (*безразли́чный*); yê bêkêf (*без настроения*).

апа́тия *ж.* sistî *ж.* (*лень, вялость*); bêdilî *ж.* (*безразличие*); bêemrî *ж.* (*безжизненность*).

апелли́ровать *несов. и сов.* 1. *юр.* (*подавать апелляцию*) erzê şikîyatkirinê dan, erza nerazîyê dan; 2. *перен.* gazî kirin (*взывать*); komek (komekdarî) xwestin (*требовать помощи*); ~ **к кому́-л., чему́-л.** ber bi kesekî ya ber bi tiştekî çûîn; ~ **к общественному мне́нию** ber bi nêta cimaetîyê çûîn.

апелляцио́нн||ый *прил. юр.* yê şikîyatkirinê, yê dewkirinê; ~**ая жа́лоба** erzê şikîyatkirinê.

апелля́ция *ж. юр.* dewkirin *ж.*; şikîyat *ж.* (*жалоба*).

апельси́н *м.* apêlsîn *м.*, nerenc *м.*

апельси́нн||ый *прил.*, **апельси́нов||ый** *прил.* yê apêlsîn, yê nerenc; ~**ое де́рево** dara apêlsîna (nerenca).

аплоди́ровать *несов.* dest lihevxistin.

аплодисме́нт||ы *мн.* destlihevxistin *ж.*; **бу́рные** ~ destlihevxistina gumreh; **взрыв** ~**ов** şeqeşeqa destlihevxistina.

апло́мб *м.* xwebawerî *ж.*, xweîtbarî *ж.* (*самоуверенность*);

quretî *ж.*, kubarî *ж.* (*надменность, гордость*).

апоге́й *м.* niqitka tewrebilind (*высшая точка*); dereca tewrebilind (lapebilind) (*высшая степень*).

аполити́чный *прил.* yê apolîtîk, yê bêseyasetî.

апологе́т *м.* apologêt *м.*, piştovan *м.*; terefdar *м.* (*сторонник, приверженец*).

апоплекси́ческий *прил.* yê apoplêksî, yê paralîçê, yê kişîyaî; ~ **уда́р** *мед.* derba reqbûnê, şilbûna nişkêva.

апоплексия *ж. мед.* apoplêksî *ж.*, reqbûn *ж.*

апостерио́ри *нареч.* apostêrîorî, ji rîya cêribandin, ji cêribandinê; **говори́ть о чём-л.** ~ derheqa tiştekîda apostêrîorî gotin.

апо́стол *м.* 1. *рел.* hewarî *м.*; 2. *перен.* terefdarê fikirekê.

апостро́ф *м.* apostrof *м.* (*vêrgûla ser xeta nivîsarê*).

аппара́||т *м.* 1. (*прибор*) aparat *ж.*, destge *м.*, hacet *ж.*; **телефо́нный** ~ haceta (aparata, destgê) têlêfonê; **фотографи́ческий** ~ aparata şikilkişandinê, destgê ekskêşîyê; 2. aparat *ж.*, îdara serkarîyê (*органы управления*); xebatkare îdarekê, qulixçîyê teşkîletekê, qulixdarê dîwanê (*штат, сотрудники*); **госуда́рственный** ~ destgê dewletê; **рабо́тать в ~те** li aparatêda xebitîn, li îdara dewletêda xebitîn; 3. *физиол.*: **пищевари́тельный** ~ para xwerek muhandinê, para muhandina xwerekê.

аппарату́ра *ж.* aparatûr *ж.*, destgê aparata, destge *м.*, hacet *ж.*, mekene *ж.*

аппе́ндикс *м. анат.* apêndîks *м.*, kerê (kerîyê) rûvîya kor.

аппендици́т *м. мед.* apêndîsît *м.* (*hewahildana, sermakirina qismeta rûvîya kor*).

аппети́||т *м.* îşte *ж.*, mede *м.*; **прия́тного ~та!** loşî can be!

аппети́тный *прил.* yê îştcanînê, yê medevekirî, yê bimede, yê îştevekirî.

апре́ль *м.* nîsan *ж.*, aprêl *ж.*

апре́льский *прил.* yê meha nîsanê, yê meha aprêlê; **Апре́льские те́зисы** *ист.* têzîsê meha Aprêlê.

априо́ри *нареч.* aprîorî, bêcêribandin; **говори́ть о чём-л.** ~ derheqa tiştekî bêcêribandin gotin.

апроба́ция *ж.* qebûlkirin *ж.* (*принятие*); tesdiqkirin *ж.*, hildan *ж.* (*подтверждение*); cêribandin *ж.* (*испытание, проба*); heqkirin *ж.*, îzbatkirin *ж.* (*утверждение*); ~ **семя́н** cêribandina toxim.

апроби́ровать *несов. и сов.* qebûl kirin (*принимать*); tesdîq kirin, hildan (*подтверждать*); cêribandin (*испытывать, пробовать*); heq kirin, îzbat kirin (*утверждать*).

апте́ка *ж.* aptêk *ж.*, dermanxane *ж.*

апте́карск||ий *прил.* yê dermanxanê; **~ие това́ры** heşîyaê dermanxanê.

апте́карь *м.* aptêkvan *м.*, dermanxaneçî *м.*, qulixçîyê dermanxanê.

апте́чка *ж.* (*домашняя, дорожная*) qutîya dermana.

апте́чный *прил.* yê dermanxanê.

ар *м.* ar *ж.* (*100 m²*).

ара́б *м.* ereb *м.*

араби́ст *м.* zandarê zimanê ereba.

ара́бск||ий *прил.* yê erebî; ~ **язы́к** zimanê erebî; ✧ **~ие ци́фры** reqemê erebî.

арба́ *ж.* erebe *ж.*

арби́тр *м. юр.* hakêm *м.*, şede *м.*, arbîtr *м.*

арбитра́ж *м.* arbîtraj *ж.*, navcîtkar *м.*; **госуда́рственный** ~ navcîtkarê (navcîtvanê) dewletê; **междунаро́дный** ~ navcîtkarê ortamiletîyê.

арбитра́жн||ый *прил.* yê arbîtrajê, yê navcîtîyê, yê navcîtkarîyê; **~ое реше́ние** qirarê navcîtkarîyê; **~ая коми́ссия** komîsîya navcîtkarîyê.

арбу́з *м.* zebeş *м.*, kal *м.*, hendivane *ж.*, gundor *м.*

арбу́зн||ый *прил.* yê zebeş, ye kal, yê hendivanê, yê gundor; **~ые се́мечки** dendikê zebeşa.

аргó́н *м. хим.* argon *ж.*

аргуме́нт *м.* delîl *м.* (*довод*); îzbatî *ж.*, îzbatkirin *ж.* (*доказательство*); heqkirin *ж.*, esas *м.*, hîm *м.* (*основание*); **убеди́тельный ~** esasê bawerîyê, îzbatîya esebûnîyê; **приводи́ть ~** îzbat (heq) kirin; daîn bawerandinê (*убеждать*).

аргументи́ровать *несов. и сов.* delîl kirin (*приводить доводы*); îzbat kirin (*обосновывать*).

аре́||на *ж. прям., перен.* meîdan *ж.*; **~ полити́ческой борьбы́** meîdana şerkirina seyasetîyê; **на междунаро́дной ~не** li ser meîdana ortamiletîyê; **выходи́ть на ~ну** derketin meîdanê; **сходи́ть с ~ны** ji meîdanê çûîn (derketin), unda bûîn.

аре́н||да *ж.* 1. (*наём*) arênd *ж.*, kirê *ж.*; **~ земли́** kirîya xwelîyê; **долгосро́чная ~** kirîya pirwext; **взять в ~ду** bi kirê hildan; **сдать в ~ду** bi kirê dan; 2. (*плата*) perê (heqê) kirê; **плати́ть ~ду** heqê kirê dan.

аренда́тор *м.* arêndvan *м.*, kirêçî *м.*, kirêvan *м.*, kirêgir *м.*

аре́ндн||ый *прил.* yê arêndê, yê kirê; **~ догово́р** qirarê kirê daînîyê; **~ая пла́та** heqê kirê.

арендо́ванный *прич., прил.* yê arêndkirî, yê kirêkirî; **~ уча́сток земли́** cîyê xwelîya kirêkirî.

арендова́ть *несов. и сов.* arênd (kirê) kirin, kirê hildan (girtin).

арео́метр *м. физ.* arêometr *ж.*

аре́ст *м.* 1. (*человека*) girtin *ж.*, hebskirin *ж.*; **взять под ~** hebs kirin; **находи́ться под ~ом** hebs bûîn; **освобожда́ть из-под ~а** ji girtinîyê aza kirin; 2. (*имущества*) girtin *ж.*; **наложи́ть ~ на иму́щество** heşîya girtin.

аресто́ванный *прич.* 1. yê hebskirî, yê zîndankirî, yê girtî; 2. *в знач. сущ. м.* (*арестант*) merîyê girtî.

аресто́вать *сов. см.* аресто́вывать.

аресто́вывать, арестова́ть hebs kirin, girtin; avêtin (kirin) kelê (*сажать в тюрьму*).

аристокра́т *м.* maqûl *м.*, şerîf *м.*, esilzade *м.*, arîstokrat *м.*, torin *м.*

аристократи́ческ||ий *прил.* yê maqûlîyê, yê torin, yê şerîf, yê esilzade; **~ое о́бщество** cimaeta maqûla.

аристокра́тия *ж.* cimaeta maqûla (şerîfa), koma torina, arîstokratî *ж.*; ◇ **фина́нсовая ~** arîstokratîya peredarî.

арифме́тика *ж.* arîfmêtîk *ж.*, hesab *м.*, ulmê hesabdarîyê, hesabdarî *ж.*

арифмети́ческий *прил.* yê arîfmêtîkê, yê hesabdarîyê.

арифмо́граф *м.* maşîna hesabdarîya avtomatîk, arîfmograf *м.*, destgê hesabnivîs.

арифмо́метр *м.* maşîna hesabkirinê, arîfmomêtr *ж.*

а́рия *ж.* arîa *ж.*, kilama yekdengî.

а́рка *ж.* taq *м.*, qube *ж.*; **~ моста́** taqê pirê; **триумфа́льная ~** quba pîrozîyê.

аркан *м.* tasme *ж.*, xerboqe *ж.*

аркти́ческ||ий *прил.* yê arktîkê, yê arktîkîyê; **~ие льды** bûza arktîkê; **~ перелёт** serrafirîna arktîkîyê; **~ая экспеди́ция** êkspêdîsîona arktîkîyê.

арма́да *ж.* armad *ж.* (*yekbûna mezin ya gemîya û teyara*); **возду́шная ~** armada teyara.

армату́ра *ж.* armatûr *ж.*, hacet *ж.*; **электри́ческая ~** hacetê êlêktrîkçêkirinê.

арматýрный *прил.* yê armatûrê.

арматýрщик *м.* armatûrçî *м.*, sazkar *м.*

армéйский *прил.* yê eskerîyê, yê ordîyê, yê qoşûnê.

áрмия *ж. в разн. знач.* ordî *ж.*; qoşûn *ж.*, esker *м.* (*войско*); **Совéтская Áрмия** Ordîya (Eskerê) Sovêtê; **Крáсная Áрмия** Ordîya Sor; **дéйствующая ~** ordîya cengîyê; **регуля́рная ~** ordîya monezem; **~ специали́стов** ordîya zandara; **~ безрабóтных** ordîya bêxebatçîya; **резéрвная ~ трудá** zexîra ordîya bêxebatçîya.

армяни́н *м.* merîyê file (êrmenî).

армя́нск||ий *прил.* yê fileî, yê êrmenî; **~ая литерату́ра** lîtêratûra fileî (êrmenîya).

аромáт *м.* xweşbînî *ж.*, bîna xweş; **тóнкий ~** bîna letîf.

ароматúчный *прил.*, **аромáтный** *прил.* yê xweşbîn, yê bînxweş.

арсенáл *м.* 1. *воен.* arsênal *ж.*, cîyê sîlîha, sîlîhxane *ж.*, [top]cebirxane *ж.* (*завод*); embara çeka (*склад*); 2. *перен.* (*большой запас чего-л.*) bêhesabî *ж.*, pirî *ж.*, zefbûn *ж.*, gumretî *ж.*

артáчиться *несов. разг.* înk kirin, ser ya xwe sekinîn.

артезиáнский *прил.*: **~ колóдец** bîra artêzîan.

артéль *ж.* artêl *ж.*; **сельскохозя́йственная ~** artêla malhebûntîya gundîtîyê.

артéльн||ый *прил.* yê artêlê; **на ~ых нача́лах** ser hîmê tevavîyê, ser qirarê (ser hîmê) artêlê.

артериáльн||ый *прил.* yê artêrîyê, yê artêrîalî; **~ая кровь** xûna artêrîalî.

артериосклерóз *м. мед.* artêrîosklêroz *ж.*, nexweşîya temarê xûnê.

артéрия *ж.* 1. *анат.* temara xûnê; **сóнная ~** temara xewê; 2. *перен.*: **вóдная ~** rê-dirba avê, reça avê.

артикуля́ция *ж. лингв.* artîkûlasîyon *ж.*

артиллери́йск||ий *прил.* yê topê; **~ое орýдие** top *ж.*; **~ая подгото́вка** agirkirina topa; **~ое наступле́ние** hucûmkirina topa; **~ обстре́л** teqandina (agirkirina) topa; **~ огóнь** agirkirina topa; **~ снаря́д** gula topa; **~ полк** hengê topa; **~ парк** cîwara (ewira) topa.

артиллери́ст *м.* topçî *м.*, topvan *м.*

артилле́рия *ж.* 1. (*род войск*) eskerê topa; 2. (*орудия*) top *ж.*, topxane *ж.*; **морска́я ~** topên berê; **береговáя ~** topên devê berê; **крепостна́я ~** topên kelahilşandinê (kela); **полевáя ~** topên deştê; **дальнобóйная ~** topên dûragir; **зени́тная ~** topên teyaravê; **противотáнковая ~** topên miqabilî hejdahana (tanka); **лёгкая ~** topên sivik; **тяжёлая ~** topên giran; **самохóдная ~** topên xwehej (xweşûnê).

артúст *м.* artîst *м.*; senetkar *м.* (*деятель искусства*); aktêr *м.* (*актёр*); zandar *м.*, senetkar *м.* (*виртуоз, мастер*); **нарóдный ~** artîstê cimaetê (muxulqetîyê); **заслýженный ~** artîstê qedirvan, artîstê hêja (laîq); **óперный ~** artîstê opêrê.

артисти́ческ||ий *прил.* yê artîstîyê; yê senetkarîyê, yê senetkar (*виртуозный, мастерской*); **~ое исполне́ние** qedandina artîstîyê; **~ая рабóта** îşê senetkarîyê.

áрфа *ж. муз.* sazê arfa.

архаи́зм *м.* 1. *лингв.* arxaîzm *ж.*, xeberkevinî *ж.*; 2. *перен.* qewimandina kevinbûî.

архаи́ческий *прил.*, **архаи́чный** *прил.* yê arxaî, yê zef kevin; yê qedîm (*древний*).

археóлог *м.* ulmdarê (zandarê) arxêolojîyê.

археологи́ческ||ий *прил.* yê arxêolojîyê; ~**ие раско́пки** kolana arxêolojîyê.

археоло́гия *ж.* arxêolojî *ж.*

архи́в *м.* 1. (*учреждение*) arxîv *ж.*, îdara xweîkirina kaxezê kevin; **госуда́рственный** ~ arxîva dewletê; 2. (*документы*) arxîv *ж.*, name û destnivîsê îdarekî ya merivekî; ◇ **сдать в** ~ *разг.* kevin ĥesab kirin (*что-либо*); merivekî ji îş aza kirin (*кого-л.*).

архива́риус *м.* arxîvvan *м.*, arxîvarîûs *м.*, serkarê îdara arxîvê, qulixçîyê arxîvê.

архи́вный *прил.* yê arxîvê; ~ **фонд** fonda (zexîra) arxîvê.

архипела́г *м. геогр.* koma cezîra, gelecezîre *м.*

архите́ктор *м.* mêmar *м.*, binakar *м.*; zandarê binakarîyê.

архитекту́ра *ж.* 1. (*зодчество*) mêmarî *ж.*, binakarî *ж.*; 2. (*стиль*) qaîdê binakarîyê (avaîçêkirinê).

архитекту́рный *прил.* yê mêmar, yê binakar; ~ **стиль** qaîdê binakarîyê.

ары́к *м.* ariq *м.*, rîya avê.

арьерга́р||д *м. воен.* eskerê dûmdar (paşhatî); ◇ **находи́ться в** ~**де** cîda (eqeb) maîn, paşda ketîn.

арьерга́рдный *прил.* yê eskerê dûmdar; ~ **бой** şerê eskerê dûmdar.

асбе́ст *м.* asbêst *ж.*

асбе́стовый *прил.* yê asbêstê; yê ji asbêstê çêkirî (*сделанный из асбеста*); ~ **завод** karxana asbêsthazirkirinê.

аскети́зм *м.* askêtîzm *ж.*

аспе́кт *м.* aspêkt *ж.*, nêt *ж.*, fikir *ж.*, nezer *ж.*

а́спид *м. мин.* kevirê reş (aspîd).

а́спидн||ый *прил.* yê aspidê; yê ji kevirê reş çêkirî (*сделанный из аспида*); ~**ая доска́** textê ji kevirê reş çêkirî.

аспира́нт *м.* aspîrant *м.*

аспирантýра *ж.* aspîrantûr *ж.*

аспири́н *м.* aspîrîn *м.*

ассамбле́я *ж.* asamblê *ж.*, civata tevavîyê, qurulte *ж.*; **Генера́льная Ассамбле́я Организа́ции Объединённых На́ций** Civata Tevavîyê ya Teşkîleta Miletê Yekbûî.

ассениза́ция *ж.* gemarkêşî *ж.*, qilêrkêşî *ж.*, temîzkirin *ж.*

ассигнова́||ние *с.* 1. (*выделение средств*) peredaîn *ж.*, perecudakirin *ж.*, perebaşqekirin *ж.*; ~**ния на капита́льное строи́тельство** berdana pere bona avaîçêkirina rikinî; 2. (*выделенная сумма*) cem *ж.*, perê berdaî.

ассигнова́ть *несов. и сов.* pere daîn (berdan), pere cuda (pere başqe) kirin.

ассимили́ровать *несов. и сов.* yek kirin, notila hev kirin.

ассимили́роваться *несов. и сов.* tev bûîn, notila hev buîn.

ассимиля́ция *ж.* tevbûîn *ж.*, notilahevbûîn *ж.*

ассисте́нт *м.* asîstênt *м.*, komekdarê ulmdara.

ассисти́ровать *несов.* asîstêntî kirin, komekdarîya ulmdara kirin.

ассортиме́нт *м.* (*товаров*) asortîmênt *м.*, cema ĥeşîyaê cûre-cûre; ~ **това́ров** ĥeşîyaê cûre-cûre.

ассоциа́ция *ж.* 1. kom *ж.*, teşkîlet *ж.*, yekbûn *ж.* (*общество, объединение*); tifaq *ж.* (*союз, согласие*); 2. (*связь представлений*) pevgirêdana fikira (nêta, nezera).

ассоции́ровать *несов. и сов.* pevgirêdana tişta eyan kirin.

ассоции́роваться *несов. и сов.* anîn bîra xwe.

а́стма *ж. мед.* astma *ж.*, nefesgiranî *ж.*, nefesgirtin *ж.*; **серде́чная** ~ astma dilik; **бронхиа́льная** ~ astma bronxa (pişikê).

а́стра *ж. бот.* astra *ж.*, gula qeşqar.

астро́лог *м.* pisporê steîrka.

астроло́гия *ж.* felikvekirina bi arîkarîya steîrka.

астроно́м *м.* astronom *м.*, zandarê ezmîan.

астроно́мический *прил.* yê astronomîyê, yê ezmanzanbûnê; **~ие наблюде́ния** nihêrandina astronomîyê; **~ие прибо́ры** hacetê astronomîyê; ◇ **~ие ци́фры (чи́сла)** reqemê astronomîyê (*zef mezin*).

астроно́мия *ж.* astronomî *ж.*, ulmê ezmanzanbûnê (steîrkzanbûnê).

астрофи́зика *ж.* astrofîsîk *ж.*

асфа́льт *м.* qîr *ж.*, asfalt *ж.*

асфальти́ровать *несов. и сов.* qîr (asfalt) kirin; **~ у́лицу** soqaq (kûçe) asfalt (qîr) kirin.

атави́зм *м. биол.* atavîzm *ж.*

ата́ка *ж.* ĥucûm *ж.*; **о́бщая ~** ĥucûma tevaî; **фланго́вая ~** ĥucûma teniştêva; **фронта́льная ~** ĥucûma pêşber (miqabil); **штыкова́я ~** ĥucûma songîya; **возду́шная ~** ĥucûma teyara; **хими́ческая ~** ĥucûma gazê (kîmîyê); **ло́жная ~** ĥucûma qelp (derew); **идти́ в ~ку, бро́ситься в ~ку** ĥucûm kirin; **отби́ть ~ку** ĥucûm alt kirin.

атакова́ть *несов. и сов.* ĥucûm kirin.

атама́н *м.* (*главарь*) serkar *м.*, mezin *м.*, serwer *м.*, pêşîkar *м.*

атеи́зм *м.* atêîzm *ж.*, bêxudaî *ж.*, xudênenasî *ж.*

атеи́ст *м.* atêîst *м.*, bêxudê *м.*, xudênenas *м.*

ателье́ *с.* atêlyê *ж.*, salon *ж.*, ode *ж.*; **~ фотогра́фа** oda ekskêşîyê; **~ мод** salona (dukana) moda; **~ худо́жника** oda neqaşçî.

а́тлас *м. геогр.* deftera kartê (xarîta); **~ ми́ра** deftera kartê (deftera xarîta) dunîyaê; **анатоми́ческий ~** deftera anatomîyê.

атла́с *м.* (*ткань*) etlez *м.*

атла́сный *прил.* 1. (*сделанный из атласа*) yê etlez, yê ji etlez dirûtî; **~ое пла́тье** dêrê etlez; 2. *перен.* yê nerm (*мягкий*); yê hîlû (*гладкий*); yê mîna etlez (*подобный атласу*); **~ая ко́жа** çermê nerm; ◇ **~ая бума́га** kaxeza zef baş, kaxeza xas.

атле́т *м.* 1. (*спортсмен*) atlêt *м.*, meşqvan *м.*; guleşgir *м.* (*борец*); 2. *перен. разг.* pelevan *м.*, merîyê qewet (*силач*); bedenşer *м.* (*богатырь*).

атле́тика *ж.* atlêtîk *ж.*, meşq *ж.*; **тяжёлая ~** atlêtîka giran; **лёгкая ~** atlêtîka sivik.

атлети́ческий *прил.* yê atlêtîk; **~ие упражне́ния** meşqê atlêtîkê; **~ое телосложе́ние** bejin-bala atlêtîk.

атмосфе́ра *ж.* 1. atmosfêr *ж.*; 2. *разг.* (*воздух*) hewa *ж.*; **спёртая ~** hewa dûgirtî; 3. *перен.* ĥewal, dorber *м.* (*среда*); qirar *ж.*, ĥalwext *м.*, çar-mikan *м.* (*обстановка, условия*); **това́рищеская ~** ĥalwextê hevaltîyê; **трудова́я ~** qirarê xebatê; 4. *физ., тех.* atmosfêr *ж.*

атмосфе́рный *прил.* yê atmosfêrê; **~ые оса́дки** barînê atmosfêrê; **~ое давле́ние** tepisandina atmosfêrê, guvaştina atmosfêrê.

а́то||м *м. физ.* atom *ж.*; **расщепле́ние ~ма** cudakirina (başqekirina, parevekirina) atomê.

атоми́стика *ж. физ.* ulmê atomzanbûnê.

атомисти́ческий *прил. физ.* yê atomîstîyê; **~ая тео́рия** têorîya atomîstîyê, têorîya atomzanbûnê.

а́томный *прил.* yê atomê; **~ое ядро́** kakila atomê; **~ая эне́ргия** qeweta atomê; **~ая бо́мба** bomba atomê; **~ое ору́жие** sîlîha atomê.

атрибу́т *м.* ĥeşîya *м.*, atrîbût *м.*, hacet *ж.*

атрофи́рованный *прил.* yê nesax; yê mirî (*отмерший*); yê

bêjîîn, yê bêemirî (*безжизненный*); yê hişkbûî (*высохший*).

атрофи́роваться *несов. и сов.* nexaş bûîn; mirin (*отмирать*); bêjîîn bûn, bêemir bûîn (*становиться безжизненным*); hişk bûn (*высыхать*).

атрофи́я *ж.* mirin *ж.* (*отмирание*); bêjîînî *ж.*, bêemirî *ж.* (*безжизненность*); hişkbûn *ж.* (*высыхание*).

АТС (автомати́ческая телефо́нная ста́нция) cîwara têlêfona avtomatîk.

атташе́ *м.* ataşê *м.*, wekîl *м.*: **вое́нный ~** ataşê eskerîyê; **торго́вый ~** ataşê bazirganîyê (arişvêrşîyê).

аттеста́||т *м.* 1. atêstat *ж.*, şedenama xilaskirina mektebê; **~ зре́лости** şedenama mekteb kutakirinê; 2. *воен.* atêstata eskerîyê; **получа́ть по ~ту** pê (bi) atêstata eskerîyê pere standin.

аттестацио́нн||ый *прил.* yê atêstatkirinê; **~ая коми́ссия** komîsîya atêstatkirinê.

аттеста́ция *ж.* 1. (*действие*) atêstatkirin *ж.*; 2. (*отзыв, заключение о ком-л.*) nêtgotin *ж.*, nêta kutasî (*derheqa kesekîda*).

аттестова́ть *несов. и сов.* 1. atêstat kirin; şedenama dereca ulmê daîn, derece daîn (*присваивать звание*); 2. (*давать отзыв*) nêta xwe daîn, fikir gotin.

аудие́нц||ия *ж.* (*официальный приём*) qebûlkirina (hildana, teklîfkirina) resmî; **дать ~ию** qebûl kirin; **получи́ть ~ию** qebûl bûîn, hatin qebûlkirinê.

аудито́рия *ж.* 1. (*помещение*) otaxa dersa, oda dersxwendinê; 2. guhdarvan (*слушатели*); hazir (*присутствующие*).

аукцио́||н *м.* aûksîon *ж.*; **продава́ть с ~на** li aûksîonêda firotin.

ау́л *м.* aûl *м.*; gund *м.*, qişle *ж.* (*селение*).

афга́нец *м.* merivê Efxanistanê, merîyê efxanî.

афга́нский *прил.* yê efxanî; **~ язык** zimanê efxanî.

афе́ра *ж.* qelpî *ж.*, xapandin *ж.*; delkbazî *ж.* (*жульничество*).

афери́ст *м.* afêrîst *м.*, merîyê qelp (xapxapok).

афи́ша *ж.* afîş *ж.*; elamnama temaşaxanê (*театральная*).

афиши́ровать *несов.* nîşan kirin (*показывать*); eyan kirin, pêhesandin (*обнаруживать*).

афори́зм *м.* gotina kurtê pirnêt, aforîzm *ж.*

африка́нск||ий *прил.* yê Afrîkaîyê; **~ие языки́** zimanê Afrîkaîyê.

аффе́кт *м.* afêkt *ж.*; xweundakirin *ж.*, xwevaçûîn *ж.* (*потеря самообладания*); kerbûîbûîn *ж.*, hêrsbûîn *ж.* (*припадок злости*).

ах *межд.* (*выражает удивление, восхищение, испуг*) ah!, ax!, weî!, pe!; **ах, я забы́л!** pe, min bîrkir!

а́хать *несов.* ax kirin (kişandin, gotin), axwax gotin, axîn kirin; nalîn, nale-nal kirin (*ныть*).

ахине́я *ж.* bêhîşî *ж.* (*бессмыслица*); bêaqilî *ж.*, bêfemî *ж.* (*глупость*).

а́хнуть *сов. см.* а́хать.

ацетиле́н *м. хим.* gaza asêtîlên.

ацетиле́нов||ый *прил.* yê asêtîlênê; **~ая горе́лка** çira asêtîlênê.

ацето́н *м. хим.* asêton *ж.*

аш|у́г *м.* aşiq *м.*

аэродина́мика *ж.* aêrodînamîk *ж.*

аэродро́м *м.* aêrodrom *ж.*, meîdana (ewira) teyara, cîyê teyardanînê.

аэроклу́б *м.* aêroklûb *ж.*, klûba teyarvana, mekteba teyarçîya.

аэроли́т *м. астр.* kevirê aêrolît.

аэромая́к *м. ав.* bircê şewqdaînê bona teyarê ku şevê difirin.

аэронавига́ция *ж. ав.* birîn-anîna (çûîn-hatina) teyara.

аэропла́н *м.* teyare *ж.*, xwefir *ж.*, firinde *ж.*, balafir *м.*, aêroplan *ж.*

аэропо́рт *м.* aêroport *ж.*, meîdana teyardanîn ê ya mezin, ewira teyara.

аэростáт *м.* aêrostat *ж.*; **привязно́й ~** aêrostata girêdaî; **~ наблюде́ния** aêrostata nihêrandinê; **~ заграждéния** aêrostata rêgirtinê (rêbirînê).

аэросъёмка *ж.*, **аэрофотосъёмка** *ж.* ekskêşîya ji teyara (ji hewaê).

Б

ба́ба I *ж. разг.* jin *ж.*, kulfet *ж.* (*женщина*); jinikok *ж.* (*презрительно о женщине*); serjinik *м.* (*презрительно о мужчине*); ◇ **ка́менная ~** *археол.* bûka kevir; **сне́жная ~** bûka berfê.

ба́ба II *ж.* (*подвесной молот*) çakûçê dardakirî.

ба́бка I *ж. разг.* pîrik *ж.* (*бабушка*); pîrejin *ж.* (*старуха*); ◇ **повива́льная ~** pîrika zarê (zarobûnê).

ба́б||ка II *ж.* **1.** (*надкопытный сустав*) gûzek *ж.*; **2.** (*игральная кость*) kap *ж.*; **игра́ть в ~ки** kap lîstin, bi kapa lîstin.

ба́бочка *ж.* minminîk *ж.*, balatîf *ж.*, pirpirk *ж.*; **капу́стная ~** minminîka kelemê; **ночна́я ~** pirpirka şevê.

ба́бушка *ж.* pîrik *ж.*; dapîr *ж.* (*со стороны отца*).

бага́||ж *м.* baxaj *ж.*; bar *м.* (*вьюк*); hûrmûrê rê (*дорожные вещи*); **ручно́й ~** barê (kelmelê) desta; **сда́ча ~жа́** baxajkirin *ж.*, dana baxajê; **отпра́вить ~жо́м** bi baxajê şandin.

бага́жник *м.* qutîya (sendûqa) baxajê.

бага́жн||ый *прил.* yê baxajê; **~ая квита́нция** berata (kaxeza) baxajê; **~ вагóн** vagona baxajbarkirinê (hûrmûr); **~ые ремни́** tasmên baxajgirêdanê; **~ая ка́сса** kuleka baxajê; **~ое отделе́ние** barxane *ж.*, baxajxane *ж.*, cîyê baxajê.

багóр *м.* çengela destûdirêj, bist *ж.*

багрове́ть, побагрове́ть sor bûîn, sicirîn.

багро́вый *прил.* yê sorbûî, yê sicirî.

багря́нец *м.* rengê sor; sûretê sor (*на лице*).

бадья́ *ж.* koda (legana, sîtila, firaqa) dar, badî *ж.*

ба́за *ж.* **1.** (*основа*) binyat *ж.*, hîm *м.*, esas *м.*; **экономи́ческая ~** esasê malhebûntîyê, cîyê malhebûnîyê; **социа́льная ~** esasê cimaetîyê (halwextîyê); **материа́льная ~** binyata malhebûntîyê (haltîyê); **техни́ческая ~** esasê têxnîkîyê; **энергети́ческая ~** esasê ênêrjîyê; **2.** (*склад*) embar *ж.*; **3.** (*опорное предприятие*): **кормова́я ~ для животново́дства** cîyê debirê bona heîwanet; **4.** *воен.* ewir *ж.*, cîwar *ж.*; **авиацио́нная ~** ewira teyara; **вое́нно-морска́я ~** ewira eskerîyê û berîyê, ewira esker û berîvana; **5.** *архит.* hîm *м.*; **~ колóнны** hîmê sitûnê.

база́льт *м.* bazalt *м.*

база́льтовый *прил.* yê bazalt.

база́р *м.* bazar *ж.*, meîdan *ж.*; **колхо́зный ~** bazara kolxozê; **кни́жный ~** bazara kitêba, cîyê kitêba difiroşin.

база́рн||ый *прил.* yê bazarê; **~ день** roja bazarê (ledê); **~ая пло́щадь** meîdana bazarê.

базе́дова боле́знь *ж.* nexweşîya Bazêdovê.

базили́к *м. бот.* reĥan *ж.*, belalîzk *м.*

рази́ровать *несов.* ewir (ĥîm, cîwar, esas, cî) kirin; ~ **авиа́цию на острова́х** teyar li ser cezîra ewir kirin, teyar ser qunîya cîwar kirin.

рази́роваться *несов.* 1. (*иметь территориальную базу*) ewir (cîwar) bûîn; 2. (*находить обоснование*) ĥîm (îzbat) bûîn.

ба́зис *м.* 1. *филос., эк.* bazîs *ж.*, ĥîm *м.*, esas *м.*; **экономи́ческий** ~ esasê malhebûntîyê, ĥîmê ekonomîyê; 2. (*основа*) binyat *м.*, esas *м.*, ĥîm *м.*

бай *м.* dewletî *м.*, aĥa *м.*, beg *м.*

байда́рка *ж.* qeîqa îecê.

ба́йка *ж.* bambazî *м.*

ба́йковый *прил.* yê bambazî, yê perçê bambazî.

бак *м.* kûp *м.*; ~ **для воды́** kûpê (devoê) avê.

бакале́йн||ый *прил.* yê biqalê; ~**ые това́ры** ĥeşîyaê biqalê; ~ **магази́н** miĥaza biqalê.

бакале́я *ж.* biqalî *ж.*, ĥeşîyaê biqalê (*товары*); miĥaza biqalê (*магазин*).

бакенба́рды *мн.* porê cênîkê, palik *м.*, simbêlê palik.

баклажа́н *м.* badrican *ж.*

баклу́ши: бить ~ *разг.* bêkarî kirin, boş-betal rûnîştin.

бактериа́льный *прил.* yê baktêrî, yê mîkrobî.

бактерио́лог *м.* zandarê mîkroba, ulmdarê baktêrîolojîyê.

бактериологи́ческ||ий *прил.* yê baktêrîolojîyê; ~**ая война́** şerê baktêrîolojîyê; ~**ое ору́жие** sîlîha baktêrîolojîyê.

бактериоло́гия *ж.* baktêrîolojî *ж.*

бактериофа́г *м.* baktêrîkuj *м.*, baktêrîofag *ж.*

бакте́рия *ж.* baktêrî *ж.*, baktêr *м.*, mîkrob *ж.*

бал *м.* bal *ж.*; ~**-маскара́д** bala bi maskê.

балагу́р *м. разг.* ĥenekçî *м.*, laqirdîçî *м.*, tiraneçî *м.*

балагу́рить *несов. разг.* ĥenek (laqirdî, tirane) kirin.

балала́йка *ж.* balalaîke *ж.*, saz *м.*

баламу́тить, взбаламу́тить *разг.* 1. (*мутить*) şêlû (qîlêr) kirin; 2. *перен.* şerpeze (hêrs) kirin (*волновать*); lihevxistin, bêtertîb kirin (*вызывать беспорядок*).

балáнс *м.* 1. *бухг.* ĥesabdarîya kar û mesrefa, bîlan *м.*; 2. (*соотношение*): **торго́вый** ~ ĥesabdarîya tucaretîyê, arişvêrîştîyê kar û mesrefa firotanê; **акти́вный** ~ ĥesabdarîya bikar, ĥesabdartîya feresatîyê; **пасси́вный** ~ ĥesabdarîya bimesrefî; **тепловóй** ~ mesrefa germê.

балдахи́н *м.* perda neqşkirî, baldaxîn *м.*

балери́на *ж.* reqasçî *ж.*, reqasvan *ж.*, reqase *ж.*

балéт *м.* temaşa reqasê, balêt *ж.*

балетме́йстер *м.* hostaê reqasa, balêtmêîstêr *м.*

ба́лка I *ж.* keran *м.*, kenar *м.*; **металли́ческая** ~ kenarê (keranê) hesîn; **деревя́нная** ~ kenarê (keranê) dar.

ба́лка II *ж.* (*овраг*) kendal *м.*, bel *м.*, newal *ж.*, çel *ж.*

балка́нский *прил.* yê Balkanê.

балко́н *м.* eîvan *м.*, balkon *ж.*

балл *м.* 1. (*оценка степени чего-л.*) derece *ж.*; 2. (*отметка*) nîşan *ж.*; **получи́ть хоро́ший** ~ nîşana rind standin.

балла́да *ж.* serhatî *ж.*, ballad *ж.*, kilam *ж.*

балла́ст *м.* 1. bargiranî *ж.*, giranî *ж.*; barê aêrostatê (*на аэростате*); 2. *ж.-д.* qûma rêtinê; 3. *перен.* (*обуза*) palas *м.*, serbarê ser.

балло́н *м.* devo *м.*, balon *ж.*, balûn *ж.*

баллоти́ровать *несов.* deng daîn (*отдавать голос*); bijartin (*избирать*).

баллоти́роваться *несов.* hatin bijartinê; xwe daîn bijartinê, kandîdatîya xwe dan (*выставлять свою кандидатуру*).

баллоти́ровка *ж.* pêşdaanîna (pêşdaxistina) kandîdata bona bijartinê, dengdaîn *ж.*

балова́ть *несов.* xirab hîn kirin; ~ **ребёнка** zar xirab hîn kirin (naz hîn kirin).

балова́ться *несов. разг.* nes bûîn, nesî kirin.

ба́ловень *м.* 1. (*шалун*) zara nes; 2. (*любимец*) delal *м.*, zara delal (hizkirî); ~ **семьи́** delalê malê.

баловство́ *с.* 1. (*по гл.* балова́ть) xirabhînkirin *ж.*, nestî *ж.*; 2. (*по гл.* балова́ться) nesî *ж.* (*шалость*).

балти́йский *прил.* yê Baltikê.

бальза́м *м.* melhem *ж.*, belsan *м.*

бальзами́ровать, набальзами́ровать melhem kirin, belsan kirin.

бамбу́к *м.* qamîş *м.*, qamûş *м.*

бамбу́ковый *прил.* yê qamîş, yê qamûş; ~**ая трость** şivika qamîş (qamûş).

бана́льность *ж.* fikira sivik; çêr *м.* (*пошлость*).

бана́льный *прил.* yê fikira sivik; yê çêrkirinê (*пошлый*).

бана́н *м.* 1. (*плод*) banan *ж.*; 2. (*дерево*) dara banana.

ба́нда *ж.* koma qaçaxa (cerdbaşîya, talançîya), cerd *ж.*, band *ж.*

банда́ж *м.* 1. *тех.* bandajê (kembera) hesin; 2. *мед.* qaîşa (kembera) pişta, bandaj *ж.*

бандеро́ль *ж.* bandêrol *ж.*

банди́т *м.* qaçax *м.*, talançî *м.*, cerdbaşî *м.*, qelaş *м.*

бандити́зм *м.* bandîtîzm *ж.*, cerdîtî *ж.*, talanî *ж.*, qelaşî *ж.*, qaçaxî *ж.*

банди́тский *прил.* yê talanîyê, yê qaçaxîyê, yê cerdîtîyê, yê bandîtîyê; ~**ая ша́йка** koma qaçaxa (talançîya).

банк *м.* bank *ж.*; **госуда́рственный** ~ banka (xezna) dewletê; **земе́льный** ~ banka xwelîyê; **учётно-ссу́дный** ~ banka deyndaînê; **национа́льный** ~ banka miletîyê; **промы́шленный** ~ banka senetîyê.

ба́нка *ж.* derdan *ж.*, qutî *ж.*; **стекля́нная** ~ derdana şûşê; **консе́рвная** ~ qutîya konsêrva.

банке́т *м.* bankêt *ж.*, kêfkirin *ж.*, kêfkirina resmî, ziafet *ж.*

банки́р *м.* bankdar *м.*, xweîyê bankê, bankîr *м.*

банки́рск||ий *прил.* yê bankdartîyê, yê bankdar; ~**ая конто́ра** îdara bankdartîyê.

банкно́т *м.*, **банкно́та** *ж.* kaxeza bankê, banknot *ж.*, êskênas *м.*

ба́нковск||ий *прил.* yê banktîyê; ~ **капита́л** sermeîya banktîyê; ~**ая при́быль** kara banktîyê; ~**ие опера́ции** daîn-standina banka; ~ **креди́т** deyndaîna bankê.

ба́нковый *прил.* yê bankê, yê banktîyê; ~ **биле́т** bilêta bankê.

банкро́т *м.* 1. (*несостоятельный должник*) deyndarê bêqewet; 2. *перен.* merîyê malxirab (binketî, malmîrat).

банкро́тство *с.* 1. (*долговая несостоятельность*) deyndartîya bêqewet, malxirabî *ж.*; 2. *перен.* (*крах, провал*) binketin *ж.*, xirabî *ж.*, pozemîşbûn *ж.*

ба́нный *прил.* yê hemamê; ~ **день** roja hemamê.

бант *м.* girê *м.*, govek *ж.*, qotik *ж.*

ба́нщик *м.* kîseçî *м.*, hemamçî *м.*

ба́н||я *ж.* hemam *ж.*; **идти́ в** ~**ю** çûîn li hemamê; ✧ **зада́ть** ~**ю** *разг.* bela (*kesekî*) daîn, zor daîn.

бараба́н *м.* def *ж.*; **бить в** ~ defê xistin.

бараба́н||ить, забараба́нить defê xistin, ringe-ring kirin, det

lêxistin; **дождь ~ит по кры́ше** baran tape-tepê banê xanî dixe.

бараба́нн||ый *прил.* yê defê; **~ бой** dengê defê; **~ая па́лочка** çomaqê defê; ✧ **~ая перепо́нка** *анат.* perda guh.

бараба́нщик *м.* defçî *м.*

бара́к *м.* 1. xanîyê texte, xanîyê bi texta hatîye çêkirinê; 2. *воен.* xanîyê esker.

бара́н *м.* beran *м.*, pez *м.*, qoç *м.*; **годова́лый ~** kavir *м.*; **холощёный ~** beranê xesandî; **двухгодова́лый ~** berdîr *ж.*, kavirê dumeyel.

бара́н||ий *прил.* yê beran, yê pêz; **~ье мя́со** goştê pêz; **~ьи рога́** stirê berana; ✧ **согну́ть в ~ ро́г** *разг.* zor daîn ser, siyemîş kirin.

бара́нина *ж.* goştê pêz.

баранта́ *ж.* kerîyê pêz.

бара́хтаться *несов. разг.* xwe vegevastin.

бара́ш||ек *м.* 1. berx *ж.*; 2. (*мех*) postê berxê; 3. *мн.* **~ки** 1) (*облака*) ewir; 2) (*волны*) pêl.

барбари́с *м.* zerêşk *ж.*

ба́ре *см.* ба́рин.

барелье́ф *м. иск.* barêlêf *ж.* (*neqşa* (*sifetê*) *ser kevirê pen*).

ба́ржа *ж.* qeîqa barbir; **деса́нтная ~** qeîqa eskerbirinê (dêsantavêtinê).

ба́рий *м. хим.* barîûm *м.*

ба́рин *м. уст.* 1. (*помещик*) milkdar *м.*; 2. (*обращение*) axa *м.*

баритон́ *м.* barîton *м.*

ба́рка *ж.* qeîq *ж.*, qeîyeq *ж.*

барка́с *м.* qeîqa barkişandinê (barkêş).

баро́граф *м. физ.* barograf *м.*

баро́метр *м.* baromêtr *ж.*

баррика́да *ж.* senger *м.*, tawî *ж.*, tabî *ж.*, qelaçe *ж.*; **у́личная ~** sengerê soqaqê, qelaçê soqaqa.

баррикади́ровать, забаррикади́ровать senger (qelaçe, tabî) çêkirin, tawî (bend) kirin.

барс *м.* peleng *м.*

ба́рский *прил.* yê axatî, yê begî, yê maqûltî, yê maqûlî.

ба́рство *с.* (*изнеженность*) nazî *ж.*, nazikî *ж.*, delalî *ж.*, axatî *ж.*, begitî *ж.*, torintî *ж.*

барсу́к *м.* parsûk *м.*, kurebeşk *ж.*

бархан́ *м.* qûça (tepa) qûmê.

ба́рхат *м.* qedîfe *м.*

бархати́стый *прил.* yê mîna qedîfe (*похожий на бархат*); yê nerm, yê nazik (*мягкий, нежный*).

ба́рхатн||ый *прил.* yê ji qedîfe; **~ое пла́тье** dêrê qedîfe; ✧ **~ го́лос** dengê nerm (nazik).

ба́рщина *ж. ист.* pîgarî *ж.*

ба́ры *см.* ба́рин.

ба́рыня *ж. уст.* (*помещица*) jina axa, xanim *ж.*, xatûn *ж.*

барыш́ *м. разг.* kar *ж.*, feîde *ж.*

барыш́ник *м.* 1. (*перекупщик*) arişvêrişçî *м.*; 2. (*торговец лошадьми*) hespfiroş *м.*, merîyê ku hespa dikire û difiroşe.

барыш́ничать *несов.* arişvêrişçî kirin.

ба́рышня *ж. уст.* 1. (*девушка*) qîz *ж.*, bakire *ж.*, keç *ж.*; 2. (*обращение*) qîza delal, keçê *ж.*

барье́р *м.* sûr *ж.*, çeper *ж.*, perçîn *ж.* (*ограда*); dîwar *м.* (*стена*); **взять ~** ser sûrêra banzdan.

бас *м.* bas *м.*, dengê nimz.

баскетбо́л *м. спорт.* baskêtbol *ж.* (*top avêtin sebetê*).

баскетболи́ст *м. спорт.* baskêtbolçî *м.*, baskêtbolîst *м.*

баскетбо́льн||ый *прил. спорт.* yê baskêtbolê; **~ая кома́нда** desta baskêtbolê.

ба́сма *ж.* basme *ж.*

басма́ч *м.* basmaç *м.*, qaçax *м.*

басма́чество *с.* basmaçtî *ж.*, qaçaxtî *ж.*

баснопи́сец *м.* nivîsarkarê metela (meteloka, çîroka).

басносло́вный *прил.* 1. (*легендарный*) yê hekyatê, yê efsene, yê bawernekirinê; 2. *разг.*

yê bêhesab (*бессчётный*); yê bêhed, yê bêhedûd (*безграничный*).

ба́сня *ж.* 1. *лит.* metele *ж.*, mesele *ж.*, çîrok *ж.*; 2. *разг.* vir *м.* (*вымысел*); derew *ж.* (*ложь*).

бассе́йн *м.* 1. (*водоём*) ẖewz *м.*; ∽ **для пла́вания** ẖewze bona sobekarîyê; 2. (*рекú*) ẖewz *м.*; ∽ **Во́лги** ẖewze çemê Volgaê; 3. *геол.* meden *ж.*, ẖewz *м.*; **каменноуго́льный** ∽ medena komira kevir.

бастова́ть, забастова́ть gêrêv kirin, şuxul hiştin.

бастую́щий *в знач. сущ. м.* gêrêvçî *м.*, merîyê şuxulhiştî.

бата́льо́н *м. воен.* tabûr *ж.*, batalîon *ж.*, gordan *м.*; **стрелко́вый** ∽ tabûra agirkirinê; **та́нковый** ∽ tabûra tanka; **сапёрный** ∽ tabûra mehkemkirina erdê, tabûra tabîçêkirinê; **отде́льный** ∽ tabûra başqe.

бата́льо́нный *прил.* yê tabûrê, yê batalîonê, yê gordan; ∽ **кома́ндир** qumandarê tabûrê.

батаре́йный *прил. воен.* yê batarêê; ∽ **ого́нь** agirkirina batarêê.

батаре́я *ж. в разн. знач.* batarê *ж.*; **электри́ческая** ∽ batarêîya êlêktrîkîyê; ∽ **парово́го отопле́ния** batarêîya hêlm-gulmê.

бати́ст *м.* çîtê tenik, batîst *м.*

бати́стовый *прил.* yê çîtê tenik, yê batîst; ∽ **плато́к** destmala ji çîtê tenik.

бато́н *м.* nanê sipî û dirêj, baton *ж.*

батра́к *м.* palê gund.

батра́цкий *прил.* yê paletîyê.

батра́чество *с. в разн. знач.* paletî *ж.*

батра́чить *несов.* paletî kirin.

бахва́литься *несов. разг.* paî dan xwe, pesnê xwe daîn, met dan xwe.

бахва́льство *с. разг.* paîyêxwedaîn *ж.*, pesnêxwedaîn *ж.*

бахрома́ *ж.* qotik *ж.*, rîşî *м.*

бахча́ *ж.* baxçe *м.*, bostan *м.*

бахчево́д *м.* baxçêvan *м.*, baxvançî *м.*, bostançî *м.*

бахчево́дство *с.* baxçebêcarkirin *ж.*, hildan û danîna baxçe, pêkanîna baxçe, baxçêvanî *ж.*

бахчев||о́й *прил.* yê baxçe, yê bostan; ∽**ы́е культу́ры** êmîşê (çerezê) baxça.

баци́лла *ж.* basîl *ж.*, mîkrob *ж.*

башка́ *ж. разг.* (*голова*) ser *м.*, kele *м.*, qaf *м.*, serî *м.*

башки́р *м.* başkîr *м.*

башки́рский *прил.* yê başkîrî, yê başkîr; ∽ **язы́к** zimanê başkîrî (başkîra).

башлы́к *м.* başliq *ж.*

башмаки́ *мн. м.* sol *ж.*; kondere *ж.* (*женские праздничные*).

башма́чник *м.* soldirû *м.*

ба́шня *ж.* birc *ж.*, kela *ж.*; **высо́кая** ∽ birca bilind; **водонапо́рная** ∽ birca avê; **оруди́йная** ∽ *воен.* birca topxanê.

баю́кать, убаю́кать bêşîk ẖejandin, lûrî-lûrî kirin (gotin).

баян *м.* (*музыкальный инструмент*) sazê bayan.

баяни́ст *м.* bayançî *м.*, sazbend *м.*, bayanîst *м.*

бди́тельность *ж.* huşyarî *ж.*, serxwebûn *ж.*, bîdarî *ж.*, guhdarî *ж.*; **проявля́ть** ∽ serxwe (serwext) bûn, bîdarî kirin.

бди́тельный *прил.* yê huşyar, yê bîdar, yê serxwe, yê guhdar; ∽ **надзо́р** qerewilê guhdar (serwext, bîdar, serxwe).

бег *м.* rev *ж.*, bez *ж.*; **эстафе́тный** ∽ reva êstafêtê; **марафо́нский** ∽ reva marafonê; ∽ **на 1000 ме́тров** reva bi 1000 mêtrê; **на бегу́** rev-rev.

бега́ *мн.* 1. (*гонки*) leca (cirîda) hespa; 2. *разг.* (*ипподром*) meîdana cirîda hespa (beza hespa).

бе́г||ать, бежа́ть, побежа́ть revîn, bezîn; **бе́гать взад и вперёд** virda-wêda bezîn, paşda û pêşda revîn; ◇ **глаза́ его́ так и ∽ают** *разг.* çevê wî diçin û tên.

бегемо́т *м.* hespa avî.

бегле́ц *м.* qaçax *м.*, revî *м.*

бе́гло *нареч.* 1. (*легко, без затруднений*) zû-zû, hêsa, bêçetinî, sivik; ~ **чита́ть** zû-zû xwendin; ~ **говори́ть** zû-zû xeberdan; 2. (*поверхностно*) serra; ~ **взгляну́ть** nihêrîn, serra dîna xwe daîn.

бе́глый *прил.* 1. *тж. в знач. сущ. м.* (*убежавший*) revî *м.*, merîyê qaçax; 2. (*быстрый*) yê zû, yê lez, yê gur; ~ **ого́нь** agirkirina lez, agirê gur; ~ **по́черк** destnivîsara lez, destnivîsara zû; 3. (*поверхностный*) yê serra; ~ **просмо́тр** nihêrîna serra.

бегово́й *прил.* yê revê, yê bezê.

бегом *нареч.* 1. reve-rev, beze-bez; 2. (*команда*) reve-rev!

беготня́ *ж.* [virda-wêda] çûîn-hatin *ж.*, dorhevbezîn *ж.*, dorhevrevîn *ж.*

бе́гств||о *с.* 1. rev *ж.*, bez *ж.*; ~ **из пле́на** ji hêsîrîyê bezîn (revîn); **спастись ~ом** bi revê xilas bûn, bi revê (bi bezê) xwe xilas kirin, bi revê aza bûn; 2. (*беспорядочное отступление*) paşdavekişandina bêtewaş.

бегу́ *см.* бежа́ть.

бегу́н *м. спорт.* revçî *м.*

бе||да́ *ж.* bela *ж.*, bedbextî *ж.*, teşqele *ж.*; **со мной случи́лась ~** bela serê min qewimî, bela hate serê min; ~ **в том, что...** bela wê yekêdana ku...; ✧ **не ~!** tişt nake!; **на мою ~ду́** bela serê min.

бедне́йш||ий *прил.* yê feqîr, yê belengaz, yê bêmilk; **~ее крестья́нство** gundîyê kesîb (belengaz, bêmilk).

бедне́ть, обедне́ть belengaz bûn; feqîr (kesîb) bûn (*нищать*); destteng bûn (*скудеть*).

бе́дность *ж.* belengazî *ж.*, hewce *м.* (*нужда*); feqîrî *ж.*, bêçaretî *ж.* (*нищета*); desttengî *ж.* (*скудость*).

бедноте́ *ж.* (*бедняки*) feqîr *м.*, kesîb *м.*, belengaz *м.*

бе́дный *прил.* 1. yê belengaz (*нуждающийся*); yê feqîr (*нищий*); yê destteng (*скудный*); 2. yê perîşan (*несчастный*); yê bextreş, yê bêbext, yê telereş (*злосчастный*); 3. *в знач. сущ. м.* merîyê kesîb.

бедня́к *м.* 1. (*неимущий*) merîyê belengaz (kesîb, feqîr); 2. (*бедный крестьянин*) gundîyê feqîr (destteng).

бедня́цк||ий *прил.* yê gundîyê belengaz (feqîr); **~ое хозя́йство** malhebûna gundîyê feqîr.

бедо́вый *прил. разг.* (*озорной*) yê zor, yê bela; ~ **ребёнок** zarane (nesitirî, netebîtî).

бе́дренн||ый *прил. анат.* yê renê, yê hêtê; **~ая кость** hestûyê renê (qalçê), parasû *м.*

бедро́ *с.* 1. *анат.* ren *ж.*, hêt *ж.*, parasû *м.*; 2. (*часть туши*) hêt *ж.*, ren *ж.*

бе́дственн||ый *прил.* yê belengaz; **~ое положе́ние** halê belengazîyê.

бе́дств||ие *с.* bela *ж.*, bedbextî *ж.*, teşqele *ж.*; **стихи́йное ~** teşqele *ж.*; **сигна́л ~ия** elametkirina (hewar-gazîya) komekê; **терпе́ть ~** (*о судне*) ketin teşqelê, ketin belaê (*derheqa gemiya*).

бе́дствовать *несов.* (*нуждаться*) hewce (belengazîyêda) bûîn.

беж *прил.* rengê qîçik (bêj).

беж||а́ть, побежа́ть 1. *см.* бе́гать; ~ **со всех ног** çirip (çapik) banzdan; ~ **йноходью** yorxe çûîn; 2. *перен.* (*о времени*) derbaz bûîn; 3. (*течь, литься*) hatin, çikîn; **кровь ~и́т из ра́ны** xûn jî birînê tê; 4. *разг.* (*литься через край*) kel çûîn, rijîn; **молоко́ ~и́т** şîr kel diçe; 5. *несов. и сов.* (*спасаться бегством*) bi bezê xwe xilas kirin, bezîn, revîn; ~ **из пле́на** ji hêsîrîyê bezîn.

бе́женец *м.* revoke *м.*, moĥacir *м.*

без *предлог* 1. (*указывает на отсутствие чего-л.*) bê, bêî; **без хлопо́т** bê şerpeze, bê menî, bê qalmeqalm; **без сомне́ния** bê-şik; **без промедле́ния** zef zû, bêsekinandin, bêderengî: **не без основа́ния** ne bêsebeb; **без моего́ ве́дома** bêî min; 2. (*в отсутствие кого-л.*) bê, bêî; **без нас не начина́йте** bêî me destpênekin; 3. (*исключая*) xênî ji...; **без вас** bêî we; **без десяти́ мину́т семь** deh deqe maîye bive heft, hefta kême deh deqîqe; ◇ **не без того́** *разг.* ne ku bêî wêyekê; **не без по́льзы** ne bê feîde, bêfeîde nînbû.

безаварийный *прил.* yê xirabnebûî.

безала́берный *прил. разг.* yê bêteher, yê bêtertîb, yê bêqaîde, yê bêînîzam (*беспорядочный*); yê bêaqil, yê bêferesat (*бестолковый*).

безалкого́льный *прил.* yê bêalkol, yê bêîçke, yê bê şerav û araq.

безапелляцио́нный *прил.* (*категорический*) yê bêxeberdan, yê bicarekêva, yê bê lam û çim.

безбе́дный *прил.* yê nefeqîr, yê nebelengaz, yê bêhewce; yê halxweş (*зажиточный*); yê bêkêmasî (*с достатком*).

безбиле́тный *прил.* yê bêbilêt.

безбо́жие *с.* bêxodanî *ж.*, bêxudêtî *ж.*, bêdînî *ж.*

безбо́жник *м.* merîyê bêxuda (bêîman, bêdîn).

безболе́зненный *прил.* 1. yê bêêşandin, yê bêtelkirin, yê bêêş, yê bêazarî; **~ая опера́ция** qelaştina bêêşandin (bêêş); 2. *перен.* (*безвредный*) yê bêzerar, yê bêzîyan, yê hêsa.

безборо́дый *прил.* yê bêrû; yê kose.

безбоя́зненно *нареч.* bêtirs, bêxof.

безбоя́зненный *прил.* yê netirsonek, yê bêxof, yê bêtirs, yê bêsaw; yê cesûr, yê bicuret (*смелый*).

безбре́жный *прил.* (*безграничный*) yê bêhed, yê bêser û binî, yê bêqerax; **~ое мо́ре** bera bêqerax.

безве́стность *ж.* navundaî *ж.*, bênavî *ж.*, undabûîn *ж.*, neeyanî *ж.*, nekivşî *ж.* (*незаметность*); nenasî *ж.*, nebeledî *ж.* (*неизвестность*).

безве́стный *прил.* yê navunda, yê bênav, yê undabûî; yê neeyan, yê nekivş (*незаметный*); yê nenas (*неизвестный*).

безве́тренный *прил.* yê bêba; **~ая пого́да, ~ день** roja bêba.

безве́трие *с.* bêbaî *ж.*

безви́нный *прил.* yê bêguneh, yê bêeîb, yê bêsûc.

безвку́сие *с.*, **безвку́сица** *ж.* bêtemî *ж.*

безвку́сный *прил.* yê bêtem; yê bêmiz (*только о еде*); yê nexweş (*невкусный*); yê temsar (*пресный*); **~ая еда́** xwerina bêtem.

безвла́стие *с.* bêhukumatî *ж.*, bêdîwantî *ж.*, bêserkarî *ж.*, bêserwerî *ж.*

безво́дный *прил.* yê bêav; **~ая пусты́ня** deşta bêav.

безво́дье *с.* bêavî *ж.*, demî *ж.*

безвозвра́тно *нареч.* 1. (*полностью невозвратимо*) lapte; 2. (*навсегда*) bêvegerandin, bona hertîm, hergavtî; **~ исчезнуть** bêser-bêberate unda bûîn.

безвозвра́тный *прил.* 1. (*невозвратимый*) yê bêvegerandin; 2. (*не подлежащий возврату*) yê bêvegerandinê, yê paşda naê vegerandinê; **~ая ссу́да** deynê bêvegerandinê, deynê ku îdî paşda nadin.

безвозду́шный *прил.* yê bêhewa; **~ое простра́нство** cîyê bêhewa.

безвозме́здно *нареч.* bêheq, badîhewa, belaş; mufte, bêmizd (*даром*); **получи́ть что-л. ~** tiştek bêheq (belaş) standin.

безвозме́здный *прил.* yê bêheq, yê badîhewa, yê belaş; yê muíte, yê bêmizd (*даровой*).

безво́лие *с.* bêîrade *ж.*; bêkamî *ж.*, sistî *ж.* (*слабость*).

безволо́сый *прил.* yê bêpor, yê bêmû; yê keçel (*лысый*); yê kose (*со слабой растительностью — о мужчине*).

безво́льный *прил.* yê bêîrade; yê sist, yê bêkam (*слабый*).

безвре́дный *прил.* yê bêzerar, yê bêzîyan.

безвре́менн||ый *прил.* yê bêwext, yê li newextêda; **~ая кончи́на** wîfata (mirina) bêwext.

безвы́ездно *нареч.* bêhereketî, bêderketin, bêçûîn-hatin.

безвы́ходность *ж.* neçarî *ж.*, bêîlacî *ж.*, bêçaretî *ж.*; **~ положе́ния** bêîlacîya hal, bêgavî *ж.*

безвы́ходн||ый *прил.* yê neçar, yê bêîlac, yê bêrê; **попа́сть в ~ое положе́ние** bêîlac maîn, ketin li nava halê bêîlacîyê.

безгла́сный *прил.* 1. (*молчаливый*) yê bêseîd, yê ker-lal, yê bêdev; 2. *перен.* (*не имеющий собственного мнения*) yê bêfikir, yê bênêt.

безголо́вый *прил.* 1. yê bêserî; yê serbirî (*обезглавленный*); 2. *перен. разг.* (*глупый*) yê bêaqil, yê axmax; 3. *перен. разг.* (*забывчивый, рассеянный*) yê bêbîr, yê bîrreş, yê fikirbela.

безгра́мотно *нареч.* 1. (*неграмотно*) nezantî, bêsewdetî; 2. (*невежественно*) nezantî; 3. nerast (*неправильно*); şaştî (*ошибочно*); **чертёж сде́лан ~** neqş (xaz) xirab hatîye çêkirinê.

воскли́кнуть *сов. см.* восклица́ть.

восклица́ние *с.* deng *м.*, dengbilindî *ж.*

восклица́тельн||ый *прил.* yê gazîyê; ~ **знак** *грам.* nîşana gazîyê; ~**ое предложе́ние** *грам.* cumla gazîyê.

восклица́ть, воскли́кнуть nişkêva gotin, kirin qîrîn.

восков||о́й *прил.* 1. yê mûmê, yê şîmaê; ~**а́я свеча́** mûma şimaê; 2. *перен.* (*мертвенно бледный*) yê sipîçolkî, yê rengketî.

воскреса́ть, воскре́снуть 1. saxbûîn, ji nav mirîya rabûn; 2. *перен.* (*возрождаться, возобнов-*

ляться) teze bûîn (rabûn), teze hîm bûn, dasekinin.

воскресе́нье *с.* (*день недели*) roja bazarê.

воскреси́ть *сов. см.* воскреша́ть.

воскре́сиуть *сов. см.* воскреса́ть.

воскреша́ть, воскреси́ть 1. saẍ kirin, emir daîn; 2. *перен.* efrandin, dasekinandin (*возрождать*); teze kirin (*возобновлять*).

воспале́ние *с. мед.* werim *ж.*, hewahildan *ж.*; sorbûn *ж.* (*покраснение*); ~ **лёгких** hewahildana (surebirina, kepeneka) pişika.

воспалённый *прил.* yê werimî, yê hewahildaî.

воспали́ться *сов. см.* воспаля́ться.

воспаля́ться, воспали́ться werimîn, hewa hildan; sor bûn (*краснеть*).

воспева́ть, воспе́ть (*кого-л.*) kilam avêtin (*ser kesekî*).

воспе́ть *сов. см.* воспева́ть.

воспита́ние *с.* terb[îy]et *ж.*, telîm *ж.*; **коммунисти́ческое** ~ terb[îy]etkirina komûnîstîyê.

воспи́танник *м.* merîyê terb[îy]etkirî (telîmkirî).

воспи́танный 1. *прич.* yê terb[îy]etkirî, yê telîmkirî; 2. *прил.* (*вежливый*) yê bimerîfet, yê biedeb, yê giran.

воспита́тель *м.* terb[îy]etçî *м.*, telîmçî *м.*, şîretkar *м.*; dersdar *м.* (*учитель*).

воспита́ть *сов. см.* воспи́тывать.

воспи́тывать, воспита́ть 1. terb[îy]et kirin; mezin kirin (*растить*); telîm kirin (*обучать*); 2. *с.-х.* kozî kirin, xweî kirin.

воспламени́ть(ся) *сов. см.* воспламеня́ть(ся).

воспламеня́ть, воспламени́ть alav daîn, agir pêxistin, vêxistin, şuxulandin; 2. *перен.* (*возбуждать*) hilan (dil) daîn, mabilind kirin.

воспламеня́ться, воспламени́ться 1. alav (agir) pêketin, alav daîn, şuxulîn; 2. *перен.* (*горячиться*) hêrs (sergerm) bûîn.

воспо́лнить *сов. см.* воспо́лнять.

восполня́ть, воспо́лнить tijî (zêde) kirin, deha zef kirin.

воспо́льзоваться *сов.* îstîfade kirin; kar (fêîde, semt) dîtin (*извлекать выгоду*).

воспомина́||ие *с.* 1. bîranîn *ж.*, xatir *м.*; 2. *мн.* ~**ия** (*мемуары*) kitebê bîranînê.

воспрепя́тствовать *сов.* nehiştin, rê nedaîn, mene girtin, îznnedan.

воспрети́ть *сов. см.* воспреща́ть.

воспреща́ть, воспрети́ть qedexe kirin, nehiştin, rênedaîn.

воспреща́||ться *несов.* qedexe bûîn; **кури́ть** ~**а́ется** ciẍarekişandin qedexeîye (îzn nînê).

восприи́мчивость *ж.* îstîdad *ж.*, hiş *м.*; femkarî *ж.*, feresatî *ж.*, bihîstin *ж.*, zên *ж.* (*сообразительность*).

восприи́мчивый *прил.* yê bîstîdad; yê femkar, yê şereza, yê zên (*сообразительный*).

воспринима́ть, воспри́нять fem kirin.

воспри́нять *сов. см.* воспринима́ть.

воспри́ятие *с.* femkarî *ж.*, bihîstin *ж.*

воспроизведе́ние *с.* 1. (*в памяти*) anîn bîra xwe, bîranîn *ж.*; 2. (*копирование*) bergirtin *ж.*; neşirkirin *ж.* (*письменное*).

воспроизвести́ *сов. см.* воспроизводи́ть.

воспроизводи́ть, воспроизвести́ 1. *эк.* teze kirin; 2. (*в памяти*) anîn bîra xwe; 3. (*копировать*) ber girtin; neşir kirin, ber nivîsîn (*списывать*).

воспроизво́дство *с. эк.* tezehasilkirin *ж.*, daxuliqandin *ж.*, tezederanîn *ж.*, tezeberdan *ж.*; **простóе** ~ tezehasilkirina adî;

расши́ренное ~ tezeĥasilkirina fire.

воспроти́виться *сов. см.* проти́виться.

воспря́нуть *сов.* ser xweda hatin, ruhbilind bûîn; ✧ ~ **ду́хом** serê xwe bilind kirin, ser xweda hatin.

воссоедине́ние *с.* **1.** (*по гл.* воссоединя́ться) yekbûn *ж.*, tevbûn *ж.*; **2.** (*по гл.* воссоединя́ть) tevkirin *ж.*, yekkirin *ж.*

воссоедини́ть(ся) *сов. см.* воссоединя́ть(ся).

воссоединя́ть, воссоедини́ть tev (yek, dexil) kirin.

воссоединя́ться *несов.* tev bûîn, yek bûn.

воссоздава́ть, воссозда́ть teze efrandin (kirin), teze saz kirin (*создавать вновь*); careke maîn çêkirin (*создавать ещё раз*).

воссозда́ние *с.* tezeefrandin *ж.*, tezekirin *ж.*, tezesazkirin *ж.*; dasekinandin *ж.* (*повторение*).

воссозда́ть *сов. см.* воссоздава́ть.

восстава́ть, восста́ть miqabil rabûn, pêşber çûîn, rabûn ser.

восстана́вливать, восстанови́ть **1.** teze kirin (*возобновлять*); teze çêkirin, teze avakirin (*отстраивать — здание и т. п.*); ~ **разру́шенный го́род** şiherê hilşîyaî teze avakirin; ~ **здоро́вье** selamet bûîn; **2.** *перен.* (*враждебно настраивать*) navtêdan, pînc kirin; **3.** (*возвращать в прежнее состояние*) danîn dewsê, dagerandin (*ĥalê berê*); ~ **в права́х** heq daîn, îzna berê daîn; ~ **на рабо́те** vegerandin ser xebatê.

восстана́вливаться, восстанови́ться teze hatin çêkirinê (*отстраиваться*); teze bûîn (*возобновляться*).

восста́ние *с.* qîyam *ж.*, îsyan *ж.*, ĥej *ж.*; **вооружённое** ~ qîyama sîlĥkirî (sîlĥîyê).

восстанови́тельный *прил.*: ~ **пери́од** dewra tezeçêkirinê (avakirinê); weda dasekinandinê, dewra dasazkirinê.

восстанови́ть(ся) *сов. см.* восстана́вливать(ся).

восстановле́ние *с.* tezekirin *ж.* (*возобновление*); tezeçêkirin *ж.*, tezeavakirin *ж.* (*отстраивание вновь*).

восста́ть *сов. см.* восстава́ть.

восто́||к *м.* şerq *ж.*, mişriq *ж.*, rohilat *ж.*; **к ~ку** li alîyê mişriqê; **на ~ке** li mişriqê.

востоковéд *м.* zandarê (ulmdarê) mişriqê, mişriqçî *м.*

востоковéден||ие *с.* şerqzanbûn *ж.*; **институ́т ~ия** înstîtûta şerqzanbûnê.

восто́рг *м.* ĥeîran *ж.*, şabûn *ж.*, dileşiqî *ж.*, şaî *ж.*

восторга́ться *несов.* şa (ĥeîran) bûîn.

восто́рженный *прил.* yê bi-ĥeîran, yê bidil-û can, yê şaîyê.

восторжествова́ть *сов.* alt kirin; pîrozmend bûîn, altdar bûn (*оказаться победителем*).

восто́чн||ый *прил.* yê şerqê, yê mişriqê, yê rohilatê; ~**ая грани́ца** sînorê rohilatê; ~ **ве́тер** baê mişriqê.

востре́бован||ие *с.* xwestin *ж.*, dewkirin *ж.*; **письмо́ до ~ия** nema ĥeta dewkirinê.

востре́бовать *сов.* xwestin, dew kirin.

восхвале́ние *с.* paîdaîn *ж.*, pesndan *ж.*

восхвали́ть *сов. см.* восхваля́ть.

восхваля́ть, восхвали́ть paî daîn, nav bilind kirin, pesn dan.

восхити́тельный *прил.* yê zef ĥaw, yê zef bedew; yê qeşeng, yê ĥijmekar (*красивый*).

восхити́ть(ся) *сов. см.* восхища́ть(ся).

восхища́ть, восхити́ть ĥeîran (tesîr, metel) kirin.

восхища́ться, восхити́ться ĥeîran (tesîr) bûîn, ĥijmekarî kirin.

восхище́ние *с.* şabûn *ж.*, ĥeîranbûîn *ж.*, ĥijmekarîkirin *ж.*

восхищу́ *см.* восхити́ть.

восхо́д *м.* bilindbûîn *ж.*; rohilat *ж.* (*солнца*); ~ **со́лнца** bilindbûîna tevê, rohilat *ж.*

восходи́ть *см.* всходи́ть.

восхожде́ние *с.* çûîn jorê, hilatin *ж.*, hilkişîn *ж.*, bilindbûn *ж.*

восхожу́ *см.* восходи́ть.

восьмёрка *ж.* ĥeîşt *ж.*; reqema ĥeîşta (*цифра*).

восьмигра́нник *м. мат.* ĥeîştalî *м.*

восьмидеся́тый *числ.* yê ĥeîştê.

восьмиле́тний *прил.* yê ĥeîştsalê (*о сроке*); yê ĥeîştsalî (*о возрасте*).

восьмисо́тый *числ.* yê ĥeîsidî.

восьмиуго́льник *м.* ĥeîştgoşe *м.*

восьмиуго́льный *прил.* yê ĥeîştgoşe.

восьмичасово́й *прил.* yê ĥeîştsehet, yê ĥeîştsehetê; ~ **рабо́чий день** roja xebatê ya ĥeîştsehetê.

восьм||о́й *числ.* yê ĥeîşta; ~**о́е** [**число́**] ĥeîşt; **одна́** ~**а́я** yek ji ĥeîşta.

вот *частица указ.* aha, binêre, binihere, wa, wanê, a wa; **вот так** usa; **вот и всё** temam bû çû, aha, temam bû; **вот почему́** aî çira, aha bona çi, bi wê menîyê; **вот как!** usa, erê!

вотри́ровать *несов. и сов.* deng daîn.

воткну́ть *сов. см.* втыка́ть.

во́тум *м.* dengdaîn *ж.*; ~ **дове́рия** dengdaînîya îtbaranînê; ~ **недове́рия** dengdaînîya bêîtbarîyê.

воцаря́ться *сов. см.* воцаря́ться.

воцаря́ться, воцари́ться 1. padşahtî kirin, ser text rûniştin, rabûn ser text; 2. *перен.* (*наступать*) qirar bûîn.

вошёл *см.* войти́.

вошь *ж.* sipî *ж.*

вошью́ *см.* вшить.

во́ю *см.* выть.

вою́ю *см.* воева́ть.

воя́ка *м. ирон.* şeroke *м.*, şerûde *м.*, şerûn *м.*

впада́ть, впасть 1. (*вваливаться*) kûrda çûîn; 2. (*втекать, вливаться*) tev bûîn, ketin nav; 3. *перен.* (*приходить в какое-л. состояние*) ketin, ketin ĥalekî; ~ **в я́рость** ĥêrs bûîn; ✧ ~ **в противоре́чие** ketin li miqabilîyê, ketin nava dudilîyê.

впаде́ние *с.* dexilbûn *ж.*, tevbûn *ж.*

впа́дина *ж.* koraî *ж.*, qaş *ж.*; **глазна́я** ~ *анат.* koraîya (qaşa) çeva.

впа́л||ый *прил.* yê kordaçûî; ~**ые глаза́** çevê kordaçûî.

впа́рхивать, впорхну́ть firîn.

впасть *сов. см.* впада́ть.

впе́йся *см.* впи́ться.

впервы́е *нареч.* cara ewil, teze.

вперего́нки *нареч.*: **бежа́ть** ~ ketin leca (ketin ĥuceta) revê.

вперёд *нареч.* 1. pêşda, bipêşda; **идти́** ~ bipêşda çûîn; ~, **к побе́де коммуни́зма!** pêşda, bi pîrozîya komûnîzmê!; 2. *разг.* (*впредь*) ji îro şûnda, ji roja îro; 3. (*авансом*) berîhinga, pêşda; **заплати́ть** ~ pere pêşda daîn; ✧ **взад и** ~ virda-wêda; **ни взад ни** ~ ne virda, ne wêda.

впереди́ 1. *нареч.* li pêşîyê; ~ **показа́лся лес** pêşîyê mêşe hate kivşê; **е́хать** ~ pêşda (pêşîyê) çûîn; 2. *нареч.* (*в будущем*) paşê, pêşda, pêşîyê, paşwextîyê; ~ **мно́го вре́мени** li pêşîyê wext hê zefe; 3. *предлог* (*перед кем-л., чем-л.*) pêşîya, ber, berîhinga (*kesekî, tiştekî*).

вперемёжку *нареч.* dûhev, peîhev, tevhev.

вперемёшку *нареч.* tevhev, dûhev, peîhev.

впечатле́ние *с.* tesîr *ж.*, neqş *ж.*, ĥukum *м.*; **произвести́** ~ tesîr kirin, ĥukum kirin ser.

впечатли́тельность *ж.* tesîr *м.*, eser *м.*, ĥukum *ж.*

впечатли́тельный *прил.* yê bitesîr, yê bizên.

впива́ться, впи́ться gezîn; ◇ ~ **глаза́ми [в кого́-л., во что́-л.]** çevê xwe kutan [li kesekî ya tiştekî].

вписа́ть *сов. см.* впи́сывать.

впи́сывать, вписа́ть [têda] nivîsandin, serda zêde kirin.

впита́ть(ся) *сов. см.* впи́тывать(ся).

впи́тывать, впита́ть 1. hilçînîn (hildan) xwe; 2. *перен.* (*воспринимать*) bihîstin, fem kirin.

впи́тываться, впита́ться hilçînîn (kişandin) xwe.

впи́ться *сов. см.* впива́ться.

впи́хивать, впихну́ть bi zorê têra kirin.

впихну́ть *сов. см.* впи́хивать.

вплавь *нареч.* bisovekarî, ser avêra.

вплёл *см.* вплета́ть.

вплести́ *сов. см.* вплета́ть.

вплета́ть, вплести́ badan, navda girêdan.

вплотну́ю *нареч.* zef nêzîk (*очень близко*); kîp (*очень плотно*); meḥkem (*крепко*).

вплоть *частица*: ~ **до** ḥeta-ḥetanî; ~ **до ве́чера** ḥeta êvarê.

вповали́ку *нареч.* serhev, serhevda, tevhev.

вполго́лоса *нареч.* binîvdengî; **говори́ть** ~ binîvdengî (hedî) xeberdan.

вползти́ *сов. см.* вполза́ть.

вполза́ть, вползти́ kişîyan (ketin) hundur.

вполне́ *нареч.* bicarekêva, pêda, lapte (*в полной мере*); zef gelekî (*очень*); **я** ~ **дово́лен** ez zef razîme.

вполови́ну *нареч.* nîvî, nîvîda.

впопа́д *нареч.* li wextêda (*своевременно*); bicî (*уместно*); gendî (*точно*).

впопыха́х *нареч.* zef lez (*в спешке*); zef zû (*торопливо*).

впо́ру *нареч. разг.* 1. (*вовремя*) li wextêda, serê wextê; **он пришёл** ~ ew wextêda hat; 2. (*как раз*): **сапоги́ мне** ~ sapok çapa lingê minin, çêkme minra pakin.

впорхну́ть *сов. см.* впа́рхивать.

впосле́дствии *нареч.* paşê, paşwextîyê, biaxirîyê.

впотьма́х *нареч.* li terîêda, li şevereşêda.

впра́ву *нареч. разг.* rastî.

впра́ве: он ~ **э́того тре́бовать** heqê wî heîye dewa wê yekê bike; **быть** ~ heqî bûîn, heq hebûn.

впра́вить *сов. см.* вправля́ть.

вправля́ть, впра́вить rast (cî) kirin; ~ **ру́ку** dest rast kirin, dest kirin cî.

впра́во *нареч.* bi destê (bi alîyê) rastê (rast); **поверну́ть** ~ bi destê rastê zivirîn.

впредь *нареч.* ji îro şûnda (*с сегодняшнего дня*); ji vir şûnda, ji virhada, careke dinê (*в следующий раз*); ◇ ~ **до...** ji îro şûnda heta...

в придачу *нареч.* serra (*сверх того*); serva (*в виде прибавки*).

вприку́ску *нареч.*: **пить чай** ~ çaî dîşleme vexwerin.

вприпры́жку *нареч. разг.* banzdan-banzdan.

впро́голодь *нареч.* birçî, netêr, nîvtêr.

впрок *нареч.* 1. (*про запас*) bona zexîrê; 2. *в знач. сказ.* (*на пользу*) bibergeh, bifeîde, bibereket; **идти́** ~ bergeh girtin.

впроса́к *нареч.*: **попа́сть** ~ *разг.* hatin xapandinê.

впро́чем *союз* lê, wekî maîn.

впры́гивать, впры́гнуть banzdan hundur.

впры́гнуть *сов. см.* впры́гивать.

впры́скивание *с.* têdaberdan *ж.*

впры́скивать, впры́снуть têda berdan.

впры́снуть *сов. см.* впры́скивать.

впряг *см.* впрячь.

впряга́ть, впрячь girêdan; nîr girêdan (*напр. быков*).

впрячь *сов. см.* впряга́ть.

впуска́ть, впусти́ть berdan hundur.

впусти́ть *сов. см.* впуска́ть.

впусти́ю *нареч.* bêfeîde, badîhewa, cîyê belasebeb.

впу́тать(ся) *сов. см.* впу́тывать(ся).

впу́тывать, впу́тать tev (dexil) kirin, anîn ortê.

впу́тываться, впу́таться xwe têra (xwe tev) kirin, xwe anîn ortê.

впущу́ *см.* впусти́ть.

впя́теро *нареч.* pênc cara, beranberî (weke) pênca; **сократи́ть ~** pênc cara kêm kirin.

впятеро́м *нареч.* bi pênc neferî, pêncmerîtî.

враг *м.* dujmin *м.* (*противник*); neyar *м.* (*неприятель*); peîketî *м.* (*преследователь*); **кла́ссовый ~** dujminê sinifê.

вражда́ *ж.* dujminî *ж.*, dujminaî *ж*; neyarî *ж.* (*неприязнь*); peîketinî *ж.* (*преследование*).

вражде́бность *ж.* dujminaî *ж.*; miqabilîhevbûîn *ж.* (*антагонизм*); neyarî *ж.* (*неприязнь*).

вражде́бн||ый *прил.* yê dujminaîyê; yê neyarîyê (*неприязненный*); **~ые отноше́ния** helaqetîyê neyarîyê (dujminaîyê).

враждова́ть *несов.* dujminaî kirin; neyarî kirin; dujminaî hevra kişandin (*между собой*).

вра́жеск||ий *прил.* yê dujminaîyê; yê neyarîyê (*неприятельский*); **~ая а́рмия** ordîya dujmina.

вразби́ву *нареч. разг.* başqe-başqe.

вразбро́д *нареч. разг.* başqe-başqe, bela-bela.

вразва́лку *нареч. разг.* bilikum; **ходи́ть ~** likumîn, tîştîşî rêva çûîn.

вразре́з *нареч.*: **идти́ ~** 1) (*поступать вопреки чему-л.*) miqabil çûîn, pevneketin; 2) (*противоречить*) miqabil bûîn.

вразуми́тельный *прил.* yê femkarîyê, yê biaqil, yê aqilanê, yê şerezatîyê, yê biferesat.

вразуми́ть *сов. см.* вразумля́ть.

вразумля́ть, вразуми́ть daîn femkirinê, hîn kirin.

враль *м. разг.* virek *м.*, derewîn *м.*

враньё *с.* derewkirin *ж.*; virkirin *ж.*, vir *м.* (*вздор*); nerastî *ж.* (*неправда*).

врасплох *нареч.* nişkêva; **заста́ть ~** nişkêva serda girtin (çûîn).

врассыпну́ю *нареч.* bi her alîya (*во все стороны*); cude-cude (*врозь*); **бро́ситься ~** bela-bela bûîn.

враста́ть, врасти́ 1. binî girtin, kok berdan (*пускать корни*); têda (kûrda) çûîn, çûîn hundur, kûr bûîn (*проникать вглубь*); 2. *перен.* (*перерождаться, приспособляться*) hatin guhastinê, hîn bûn, edet kirin.

врасти́ *сов. см.* врата́ть.

врата́рь *м. спорт.* dergeçî *м.*, dervan *м.*

врать, совра́ть *разг.* derew kirin; rast negotin (*говорить неправду*); vir kirin (*болтать вздор*).

врач *м.* ĥekîm *м.*, tebîb *м.*; **зубно́й ~** ĥekîmê dirana; **райо́нный ~** ĥekîmê neĥîyê; **гла́вный ~** ĥekîmê sereke; **позва́ть ~á** gazî ĥekîm kirin.

врачебн||ый *прил.* yê ĥekîm, yê ĥekîmîyê; yê dermankirinê (*лечебный*); **~ая по́мощь** arîkarîya ĥekîmîyê.

вращательный *прил.* yê zivirok, yê zivirînê.

враща́ть *несов.* badan, çerx daîn, zivirandin, dor birin-anîn.

враща́ться *несов.* 1. çerx daîn, dorê çûîn-hatin, gerîn; 2. *перен.* (*постоянно бывать*) hertim bûîn.

враще́ние *с.* zivirîn *ж.*, zivir *ж.*

вред *м.* zîyan *ж.*, zerar *ж.*; **причини́ть ~** zerar daîn, zîyan daîn.

вреди́тель *м.* 1. zîyankar *м.*, zerarçî *м.*, xirabkar *м.*; 2. *с.-х.* zerarkar *м.*

вреди́тельство *с.* zîyankarî *ж.*, zerarî *ж.*, xirabkarî *ж.*

вреди́ть, повреди́ть zerar (zîyan) daîn, zîyan gîhandin, zîyankarî (xirabkarî) kirin.

вре́дный *прил.* yê bizerar, yê xirab, yê bizîyan.

вре́жу *см.* вре́зать.

врежу́ *см.* вреди́ть.

вре́зать *сов. см.* врезáть.

врезáть, вре́зать birîn, qelaştin, têra kirin.

вре́заться *сов. см.* врезáться.

врезáться, вре́заться 1. têra çûîn, xwe ortêra (xwe têra) kirin; 2. *перен.* (*запечатлеваться*) tesîr kirin.

временáми *нареч.* cara-cara, wext-wextî, carawexta.

вре́менно *нареч.* wedetî.

вре́менн||ый *прил.* yê wedetî; **~ая рабóта** xebata wedetî; ◇ **~ое правúтельство** *ист.* hukumata wedetî.

врéм||я *с. в разн. знач.* wext *м.*; dewran *ж.* (*период*); zeman *ж.* (*эпоха*); wede *м.* (*срок*); molet *ж.*, çax *ж.* (*досуг, свободное время*); **во вся́кое ~** her wexta; **в нáше ~** li zemanê me; **в то ~, когдá**... hingê, çaxê ku...; **тем ~ем** wî wextê; **со ~ени**... ji ... wextêda; **~ от ~ени, по ~енáм** cara-cara, jî wextê heta wextê; **с течéнием ~ени** hetanî wextekî; **до сего́ ~ени** heta naha, heta îro; **всё ~** timê, hertim, herwext; dehîm (*постоянно*); **в своё ~** li wextê xweda, wedêda, wextêda; **одно́ ~** wextekî, zemanekî; **на ~** wedetî; **ско́лько ~ени?** sehet çende?; **~ена́ го́да** feslê salê; **настоя́щее ~** *грам.* wextê naha; **бу́дущее ~** *грам.* wextê wê bê; **проше́дшее ~** *грам.* wextê buhurî; **вечéрнее ~** wedê êvarê; **у́треннее ~** wedê sibê; **~ не ждёт** wede kine, wext nasekine; **~ тéрпит** wext heîye, wext tab dike.

времяисчисле́ние *с.* hesabkirina wext.

времяпрепровожде́ние *с.* wextderbazkirin *ж.*, derbazkirina wext.

врёт *см.* врать.

вро́вень *нареч.* beranber, weke hev, angorî hev.

вро́де *предлог* mîna, notîla, bi tewşê.

врождённый *прил.* yê ji dê, yê ji zarotîyê.

врозь *нареч.* başqe-başqe, ji hev cihê, cuda-cuda.

врос *см.* врасти́.

вро́ю *см.* врыть.

вру *см.* врать.

вру́бов||ый *прил.*: **~ая машúна** destgê (maşîna) qulkirinê.

врукопáшную *нареч.* bi desta, bi songîya; **дра́ться ~** bi desta (bi songîya) şer kirin.

врун *м. разг.* virek *м.*, derewîn *м.*

вруча́ть, вручи́ть teslîm kirin, sipartin; daîn (*давать*); **~ о́рден** nîşan daîn.

вруче́ние *с.* teslîmkirin *ж.*, sipartin *ж.*; daîn *ж.*; **~ верúтельных гра́мот** sipartina îtbarnama.

вручи́ть *сов. см.* вруча́ть.

вручну́ю *нареч.* bi desta.

врыва́ться, ворва́ться nişkêva xwe avêtin hundur, derda hatin.

вря́д ли *нареч.* çetin; bişik (*сомнительно*).

всади́ть *сов. см.* вса́живать.

вса́дник *м.* sîyar *м.*, sîyarî *м.*, fariz *м.*

вса́живать, всади́ть têra kirin, têda kutan, daçikandin.

вса́сывать, всоса́ть hilçinandin (kişandin) xwe, fir kirin.

все *см.* весь 1.

всё I *нареч.* 1. (*постоянно*) hergav, hertim, timê, herwext; **он ~ за́нят** ew hertim mijûle (gîroîye); 2. (*до сих пор*) heta naha; 3. *в знач. союза* (*однако*) lê, hema; 4. *при сравнении* deha:

~ **бóлее и бóлее** deha zêde û zêde; ◇ ~ **же** dîsa.

всё II *мест. см.* весь 2.

всевозмóжный *прил.* yê hercûre, yê herreng, yê cûre-cûre.

всегдá *нареч.* timê, hertim, hergav, herwext.

всегó I *нареч.* 1. (*в общем, итого*) bitemamî, xulase; 2. (*только, лишь*) feqet, tenê; ◇ ~-**нáвсего** *разг.* feqet; **тóлько и** ~ ew tenê.

всегó II *см.* весь; ~ **хорóшего!** dema xatirê te! (*при обращении к одному лицу*); dema xatirê we! (*при обращении к нескольким лицам и вежливая форма*).

всей *см.* весь.

вселéние *с.* ewirbûîn *ж.*, cîgirtin *ж.*, cîbûn *ж.*

вселéнная *ж.* dunîya *ж.*, alem *ж.*, dinê *ж.*

вселúть(ся) *сов. см.* вселять(-ся).

вселя́ть, вселúть 1. ewir (cî, misken) kirin; xanî daîn (*предоставлять квартиру*); 2. *перен.*: ~ **надéжду** guman (omîd) kirin.

вселя́ться, вселúться cî girtin, ewir bûîn.

всемéрно *нареч.* bi her alîya, bi temamîya qewetê.

всемéрн||ый *прил.* yê hercûre, yê herqaîde (*всевозможный*); yê heralî (*всесторонний*); ~**ое содéйствие** arîkarîya heralî.

всéмеро *нареч.* bi hêt cara.

всемерóм *нареч.* bi hêt neferî, hêtmerîtî.

всемúрно-исторический *прил.* yê hemdunîyaê û tarîxîyê.

всемúрный *прил.* yê hemdunîyaê, yê temamîya alem; **Всемúрный Совéт Мúра** Şêwra Edilaîyê ya Hemdunîyaê, Şêwra Edilaîya Hemdunîyaê; **Всемúрная Федерáция Профсоюзов** Fêdêrasîûna Sîndîkaîyê ya Hemdunîyaê, Fêdêrasîya Sîndîkaîya Hemdunîyaê.

всемогýщество *с.* hemqudretî *ж.*, hemzorî *ж.*, hemqewetî *ж.*, pirqudretî *ж.*

всемогýщий *прил.* yê hemqudret, yê hemzor, yê hemqewet.

всенарóдный *прил.* yê temamîya milet, yê tevmuxulqetîyê, yê hemûmiletîyê.

всеóбуч *м.* (всеóбщее обязáтельное обучéние) hînbûna tevavîyê (ya eseî).

всеóбщ||ий *прил.* yê tevavîyê, yê temamîyê; ~**ее избирáтельное прáво** heqdarîya bijartina tevavîyê; ~**ее обучéние** hînbûna tevavîyê; ~**ая мобилизáция** eskertopkirina tevavîyê; **Всеóбщая конфедерáция трудá** Konfêdêrasîona şuxulê ya tevavîyê; ~**ая забастóвка** xebathiştina tevavîyê.

всеобъéмлющий *прил.* yê ji her alîyava, yê dorgirtî.

всеорýж||ие *с.*: **во** ~**ии** bisîlih, hazirbûî, bisîlihî.

всеохвáтывающий *прил.* yê ji her alîyava, yê pêda, yê dorgirtî, yê pêda hildaî.

всепобеждáющ||ий *прил.* yê hempîrozîyê, yê altkirina temamîyê; ~**ая сúла идéй ленинúзма** hempîrozîya qeweta fikirê lênînîzmê.

в сердцáх *нареч. разг.* bikerba, bihêrs.

всероссúйский *прил.* yê hemûrisêtî, yê hemûrisêtîyê; ~ **съезд** qurulta hemûrisêtîyê.

всерьёз *нареч.* bêlaqirdî, rastî.

всесúльный *прил.* yê qadir, yê pirqewet.

всесоюзный *прил.* yê hemtifaqîyê; **Всесоюзная Коммунистúческая пáртия (большевикóв)** Hîzba (Partîya) Komûnîsta Hemtifaqîyê (ya balşevîka); **Всесоюзный Лéнинский Коммунистúческий Союз Молодёжи** Tifaqa Komcahilê Lênînîyê Komûnîstîyê ya Hemtifaqîyê, Tifaqa Cahilên Lênînîyê Komûnîstîyê ya Hemtifaqîyê.

всесторóнний *прил.* yê ji her alîyava, yê herteref.

всё-таки *союз* yeke, bive-nebe; ~ **он придёт** yeke ew wê bê.

всеуслы́шание *с.*: **во** ~ bi dengê bilind.

всецéло *нареч.* bicarekêva; temamtî, pêda (*полностью*).

вскáкивать, вскочи́ть 1. (*на что-л.*) banzdan ser; ~ **на ло́шадь** banzdan ser hespê; 2. (*с места*) zû rabûn ser, banzdan, xwe avêtin ser; ~ **с ме́ста** ji cî banzdan.

вскáпывать, вскопáть kolan, vekolan.

вскарáбкаться *сов. см.* вскарáбкиваться.

вскарáбкиваться, вскарáбкаться hilpas bûn, rabûn ser, hilkişîyan.

вскáрмливать, вскорми́ть daîn xwerînê, xweî kirin, kozî kirin (*кормить*); mezin kirin (*выращивать*); terb[îy]et kirin (*воспитывать*).

вскачь *нареч.* bezîn bi bezê, reve-rev; bibanzdan (*скачками*); zef zû (*очень быстро*).

вскúдывать, вскúнуть ber xwe kişandin; avêtin (*подбрасывать*); bilind kirin (*поднимать*); ~ **мешóк на плéчи** çewal avêtin ser milê xwe; ~ **гóлову** serê xwe bilind kirin; ~ **винтóвку** tiving ber xwe avêtin, tiving anîn xwarê.

вскúнуть *сов. см.* вскúдывать.

вскипáть, вскипéть 1. kelîn, ser hevra çûîn; 2. *перен.* (*вспылить*) hêrs bûn.

вскипéть *сов. см.* вскипáть.

вскипятúть *сов. см.* кипятúть.

всклокóченный *прил.* yê gijik (*о шерсти, волосах*); yê poperîşk (*о волосах*).

всколыхнýть *сов.* 1. hereket kirin, kirin ĥalê ĥejandinê (*привести в движение*); ĥejandin (*потрясти*); 2. *перен.* rakirin (*поднять*); ser û binî kirin (*взбудоражить*).

всколыхнýться *сов.* 1. ĥejîn; hereket bûîn (*прийти в движение*); 2. *перен.* (*подняться*) rabûn.

вскользь *нареч.* serava, hindik, serra.

вскопáть *сов. см.* вскáпывать.

вскóре *нареч.* zef zû.

вскормúть *сов. см.* вскáрмливать.

вскочúть *сов. см.* вскáкивать.

вскрúкивать, вскрúкнуть niş-kêva kirin qarîn, qîjîn qarîn.

вскрúкнуть *сов. см.* вскрúкивать.

вскружúть *сов.*: ~ **гóлову** serî gêj kirin, serî êşandin.

вскрывáть, вскрыть 1. (*открывать*) vekirin; 2. *перен.* eyan (eşkere) kirin, dîtin (*обнаруживать*); belû (berder) kirin (*выявлять*); ~ **недостáтки** kêmasî eyan kirin; 3. *анат.* ji hev vekirin, qelaştin.

вскрывáться, вскры́ться 1. eyan bûn, hatin dîtinê (*обнаруживаться*); belû (berder) bûn (*выявляться*); 2. (*о нарыве*) derbûn; 3. (*о реке*) vebûn.

вскры́тие *с.* 1. (*по гл.* вскрывáть) eyankirin *ж.*, eşkerekirin *ж.* (*обнаружение*); belûkirin *ж.*, berderkirin *ж.* (*выявление*); 2. (*по гл.* вскрывáться) eyanbûn *ж.* (*обнаружение*); 3. (*рекú*) vebûn *ж.*; 4. *анат.* qelaştin *ж.*, jihevvekirin *ж.*, vekirin *ж.*

вскры́ть(ся) *сов. см.* вскрывáть(ся).

всласть *нареч. разг.* bi lezet.

вслед *нареч.. и предлог* peî, dû, paşî; ~ **за э́тим** paşî wêyekê; **идтú** ~ **за...** dû... çûîn.

вслéдствие *предлог* bona, boî bi; ~ **э́того** bona wêyekê.

вслепýю *нареч.* kortî.

вслух *нареч.* bi deng, dengî.

вслýшаться *сов. см.* вслýшиваться.

вслýшиваться, вслýшаться guh daîn, guhdarî kirin, guhê xwe dan ser.

всмáтриваться, всмотрéться dîna xwe daîn, pak nihêrîn.

всмотре́ться *сов. см.* всма́триваться.

всмя́тку *нареч.*: **яйцо́** ~ hêka dîlme.

всо́вывать, всу́нуть têra kirin, dahiştin, kutan hundur.

всоса́ть *сов. см.* всáсывать.

вспа́рхивать, вспорхну́ть firîn, nişkêva bilind bûîn.

вспа́рывать, вспоро́ть qelaştin, birîn, vebirîn.

вспаха́ть *сов. см.* вспáхивать.

вспáхивать, вспаха́ть erd rakirin; kotan kirin (*плугом*); şov kirin (*бороздить*).

вспáшка *ж.* erdrakirin *ж.*

вспе́ниваться, вспе́ниться kef dan.

вспе́ниться *сов. см.* вспе́ниваться.

всплеск *м.* şelpîn *ж.*, şelpe-şelp *ж.*, bilqe-bilq *ж.*

всплёскивать, всплесну́ть: ~ **рука́ми** heîr (şaş) maîn.

всплесну́ть *сов. см.* всплёскивать.

всплыва́ть, всплыть 1. (*на поверхность*) ser avê ketin; 2. *перен.* eyan (eşkere) bûîn (*обнаруживаться*); eyan (belû) bûn (*выявляться*).

всплыть *сов. см.* всплыва́ть.

всполоши́ть *сов. разг.* şer-dew kirin (*затеять ссору*); tev-tev kirin, şer daxistîn (*смешать*); qalmeqal kirin (*поднять шум*); hewar-gazî daxistin (*поднять крик*); şerpeze (bêaram) kirin (*встревожить*).

всполоши́ться *сов. разг.* xwe virda-wêda avêtin; şerpeze (bêaram) bûn (*встревожиться*).

вспомина́ть, вспо́мнить anîn bîra xwe.

вспо́мнить *сов. см.* вспомина́ть.

вспомога́тельный *прил.* yê arîkarîyê, yê komekdarîyê; ~ **гла́гол** *грам.* fêla arîkarîyê.

вспоро́ть *сов. см.* вспáрывать.

вспорхну́ть *сов. см.* вспáрхивать.

вспоте́ть *сов. см.* поте́ть 1.

вспры́гивать, вспры́гнуть xwe avêtin ser, banzdan ser.

вспры́гнуть *сов. см.* вспры́гивать.

вспры́скивать, вспры́снуть şil kirin; ~ **водо́й** av kirin (reşandin, pejiqandin).

вспры́снуть *сов. см.* вспры́скивать.

вспу́гивать, вспугну́ть veciniqandin, bizdandin; tirsandin (*пугать*); ziravê dil qetandin, zef tirsandin (*сильно пугать*).

вспухáть, вспу́хнуть werimîn.

вспу́хнуть *сов. см.* вспухáть.

вспыли́ть *сов.* hêrs (sergerm, kerbûî) bûîn.

вспы́льчивость *ж.* hêrsî *ж.*, sergermî *ж.*

вспы́льчивый *прил.* yê hêrs, yê sergerm; yê netebitî (*невыдержанный*).

вспы́хивать, вспы́хнуть 1. agir pêketin (*загораться*); alav pêgirtin (*воспламеняться*); vêketin, qemilîn (*зажигаться*); 2. *перен.* (*начинаться*) nişkêva destpêbûîn; 3. *перен.* (*краснеть*) sor (sopilkî) bûîn; 4. *перен.* (*приходить в возбуждение*) hêrs bûîn.

вспы́хнуть *сов. см.* вспы́хивать.

вспы́шка *ж.* alav *ж.* (*воспламенение*); agirpêketin *ж.* (*загорание*); birq *ж.* (*молнии и т. п.*); ~ **гне́ва** alava hêrsê.

вспять *нареч.* paşda, şûnda, bieqeb.

встава́ние *с.*: **почти́ть па́мять** ~**ем** bi rabûnê mirî anîn bîra xwe, bi rabûnê remet kirin, bona texdîrbûnê rabûn pîya.

встава́ть, встать 1. (*подниматься на ноги*) rabûn, bilind bûîn; ~ **из-за стола́** ji ser texte rabûn; 2. (*наступать на что-л.*) lingê xwe danîn (*ser tiştekî*); 3. *перен.* (*сплачиваться*) tifaq bûn, yek bûn; ~ **на борьбу́** rabûn bona şerkirinê; 4. *перен.* (*возникать*) pêşda hatin; **встаёт**

вопро́с о... pirs derheqa... pêşda te; 5. (*останавливаться*) sekinîn; 6. (*умещаться*) cî bûîn (girtin); 7. *перен.* (*выздоравливать*) qenc (selamet, pak) bûîn.

вста́вить *сов. см.* вставля́ть.

вста́вка *ж.* 1. (*действие*) kirîn hundur; 2. tiştê zêde (*вставленный предмет*); zêdeî *ж.* (*добавление, текст*).

вставля́ть, вста́вить kirin hundur, têra kirin; ⌣ **стекло́** şûşe kirin; ✧ ⌣ **сло́во** xeber avêtin li nav, xwe tev gilîya kirin.

встать *сов. см.* встава́ть.

встрево́жить(ся) *сов. см.* трево́жить(ся) 1.

встрепену́ться *сов.* veciniqîn, nişkêva rabûn.

встре́тить(ся) *сов. см.* встреча́ть(ся).

встре́ча *ж.* 1. hevdîtin *ж.*, rasthatin *ж.*, rastîhevhatin *ж.*; **неожи́данная** ⌣ hevdîtina (rastîhevhatina) nişkêva; 2. (*праздника и т. п.*) derbazkirin *ж.* (*eîd*); 3. *спорт.* lîstin *ж.*, rastîhevhatin *ж.*, rasthatin *ж.*, hevralîstin *ж.*

встреча́ть, встре́тить 1. (*застава́ть, обнаружи́вать, сталкиваться с...*) dîtin; ⌣ **тру́дности** çetinî dîtin; ⌣ **знако́мых** nas dîtin; 2. (*принимать*) qebûl kirin; ⌣ **с ра́достью** bi dil û can qebûl kirin; 3. (*получать*) qebûl kirin, standin; ⌣ **всео́бщее одобре́ние** bi tevavîyê hatin qebûlkirinê.

встреча́ться, встре́титься 1. (*обнаруживаться*) eyan bûîn, belû bûn; dîtin; ⌣ **с затрудне́ниями** çetinî dîtin; 2. (*видаться*) hev dîtin, rastî hev hatin, rast hatin; **и́зредка** ⌣ car-cara hev dîtin; 3. (*попадаться*) rastî hev hatin.

встре́чн||ый *прил.* 1. (*идущий навстречу*) yê miqabil, yê pêşberî, yê rasthatinê; ⌣ **ве́тер** baê miqabil; 2. (*ответный*) yê cihabê, yê miqabil, yê pêşber; ⌣ **план** bernama cihabdarîyê, plana cihabê (pêşberî); ⌣**ое предложе́ние** pirsa cihabê (pêşberî); ✧ **пе́рвый** ⌣ yê ewil; **ка́ждый** ⌣ **и попере́чный** *разг.* herkes, yê nenas.

встре́чу *см.* встре́тить.

встря́ска *ж. разг.* 1. (*действие*) dawşandin *ж.*; 2. *перен.* (*оживление*) qalmeqalm *ж.*, qerebalix *ж.*, hewarze *ж.*

встря́хивать, встряхну́ть 1. dawşandin; 2. *перен. разг.* (*оживлять*) saẍ kirin.

встряхну́ться, встря́хиваться 1. xwe dawşandin; 2. *перен. разг.* (*оживляться*) ser xweda hatin, jîr bûîn; 3. *перен. разг.* (*развлекаться*) kêf kirin, lîstin, mijûl bûn.

встряхну́ть(ся) *сов. см.* встря́хивать(ся).

вступа́ть, вступи́ть 1. (*входить*) dexil bûîn, çûîn li hundur, ketin hundur; ⌣ **в го́род** hatin li şiher, ketin nava şiher; 2. (*вступать в члены, зачисляться*) uzv bûn, xwe nivîsîn, ketin nav; ⌣ **в па́ртию** bûîn uzvê hîzbê; 3. (*начинать*) dest pêkirin; 4. (*переходить в какое-л. состояние*) derbazî nava halekî bûîn; ✧ ⌣ **в брак** zewicîn; ⌣ **в си́лу** qanûn bûîn, qewet girtin.

вступа́ться, вступи́ться tereîdar bûîn; alî kirin, pişt girtin (*помогать*).

вступи́тельн||ый *прил.* 1. (*предварительный*) yê dexilbûînê, yê pêşda; ⌣**ое сло́во** xebera pêş, pêşxeber *ж.*; 2. (*напр. о взносе*) yê tevbûînê, yê uzvbûnê; ⌣ **взнос** heqê dexilbûînê (qebûlkirinê, hildanê); ⌣ **экза́мен** îmtyanê (îmtihanê) dexilbûînê (qebûlkirinê).

вступи́ть(ся) *сов. см.* вступа́ть(ся).

вступле́ние *с.* 1. (*действие*) dexilbûîn *ж.*, tevbûîn *ж.*; 2. (*введение*) pêşxeber *ж.*

всу́нуть *сов. см.* всо́вывать.

всухомя́тку *нареч.* tisî.

всхли́пнуть *сов. см.* всхли́пывать.

всхли́пывать, всхли́пнуть fişe-fiş kirin.

всходи́ть, взойти́ 1. (*подниматься*) hilkişîn, derketin, bilind bûîn; 2. (*о светилах*) bilind bûîn; 3. (*о растениях*) gihîştin; 4. (*о тесте*) rabûn, hilatin.

всхо́ды *мн.* (*ростки злаков*) simbil *ж.*, zilaîn *м.*

всхо́жесть *ж.* qeweta gihîştinê (zîldaînê), qudreta şînbûnê.

всы́пать *сов. см.* всыпа́ть.

всыпа́ть, всы́пать rokirin, kirin têda, rêtin, berîdan.

всю́ду *нареч.* li her cîya, li hemû cîya, li her dera, li hemû dera.

вся *см.* весь 1.

вся́к||ий *местоим.* 1. (*каждый*) her, herkes, hemû; ∽ **раз** hergav, hemû carа; 2. *в знач. сущ. м.* herkes *м.*, hemûkes *м.*; ∽ **мо́жет э́то сде́лать** herkes dikare wêyekê bike; 3. (*разный*) cûre-cûre, her cûre; ✧ **безо ∽ого** bêgilî, bêxeberdan, bê lam û cîm.

вся́чески *нареч. разг.* bi her qaîde, bi her teherî, bi her cûreî.

вся́ческий *прил. разг.* yê hercûre, yê cûre-cûre.

вся́чина *ж.*: **вся́кая ∽** *разг.* her tişt.

вта́йне *нареч.* binalî (*секретно*); xepe-xep (*незаметно*); xewle (*скрытно*); tele-tel (*украдкой*).

вта́лкивать, втолкну́ть devdan.

вта́птывать, втопта́ть pêpes kirin, daîn bin lingê xwe; ✧ ∽ **кого́-л. в грязь** kesek rûreş (kesek çirax) kirin, xeîba kesekî kirin.

вта́скивать, втащи́ть kişandin (anîn) hundur, kaş kirin hundur.

втащи́ть *сов. см.* вта́скивать.

втека́ть, втечь çikîn (ketin) hundur.

втёр *см.* втере́ть.

втере́ть(ся) *сов. см.* втира́ть (-ся).

втечь *сов. см.* втека́ть.

втира́ть, втере́ть hesikandin, mizdan; ✧ ∽ **очки́ кому́-л.** *разг.* kesek xapandin.

втира́ться, втере́ться: ∽ **в дове́рие** xwe bi îtbar kirin, îtbar li xwe anîn.

вти́скивать, вти́снуть bi zorê ci kirin (têra kirin, orfêra kirin, berra kirin).

вти́снуть *сов. см.* вти́скивать.

втихомо́лку *нареч. разг.* hêdîka (*тихо*); binalî (*тайно*); xepe-xep (*украдкой*); kere-ker (*молча*); xewle (*скрытно*).

втолкну́ть *сов. см.* вта́лкивать.

втолкова́ть *сов. см.* втолко́вывать.

втолко́вывать, втолкова́ть daîn femkirinê.

втопта́ть *сов. см.* вта́птывать.

вторга́ться, вто́ргнуться hucûm kirin; dexil bûîn (*входить, вступать*); xwe tev kirin, xwe navra kirin (*вмешиваться*).

вто́ргнуться *сов. см.* вторга́ться.

вторже́ние *с.* hucûm *ж.*; dexilbûîn *ж.* (*вход, вступление*); tevbûîn *ж.* (*вмешательство*).

вто́рить *несов.* erê gotin, peîhatin; wekilandin (*повторять*).

второ́чно *нареч.* cara duda.

второ́чный *прил.* yê duda, yê cara duda.

вто́рник *м.* sêşem *ж.*

втор||о́й 1. *числ.* yê duda; ∽**а́я дека́да** dehrojîya duda; ∽ **час** sehet duda dixebite; 2. *прил.* yê nemohim, yê neferz (*не срочный*); yê neeslî, yê nehîmlî (*не основной*); **на ∽о́м пла́не** li cîyê başqe, li cîyê axirîyê; 3. *прил.* (*подобный первому*) yê duda, yê mîna ewil; ∽**о́е оте́чество** wetenê teze; ✧ **из ∽ы́х рук** ji destê [firoşçîyê] duda.

второпя́х *нареч.* zef zû, lez.

второразря́дный *прил.* yê dereca duda.

второстепе́нный *прил.* yê dereca duda; yê neferz (*не срочный*); yê neeslî, yê nêhîmlî (*не основной*).

в-тре́тьих *вводн. сл.* yê sisya.

втри́дорога *нареч. разг.* zef biha, bi sê biha; **уплати́ть ~** zef biha daîn, qîmetê sê biha daîn.

втро́е *нареч.* bi sê cara; **увели́чить ~** bi sê cara zêde kirin; **уме́ньшить ~** bi sê cara kêm kirin; **согну́ть ~** sê cara qet kirin.

втроём bi sê neferî, sêmerîtî

втуз *м.* (вы́сшее техни́ческое уче́бное заведе́ние) dersxana bilindê têxnîkiyê, delirfûnûna texnîkiyê bilind.

втулка *ж.* 1. (*колеса*) surnî *м.*; 2. (*пробка, затычка*) topî *м.*

втыка́ть, воткну́ть têra kirin, daçikandin.

втя́гивать, втяну́ть 1. kişandin hundur (*внутрь*); hilbirîn, hilkişandin (*поднимать*); 2. (*вбирать*) hilçinîn xwe; 3. *перен.* (*вовлекать*) anîn ortê, tev kirin.

втя́гиваться, втяну́ться 1. (*вбираться внутрь*) kûrda çûîn, çûîn hundur; 2. edet kirin (*привыкать*); hîn bûîn (*приучаться*).

втяну́ть(ся) *сов. см.* втя́гивать(ся).

вуали́ровать *несов. перен.* veşartin, perde kirin, girtin.

вуз *м.* (вы́сшее уче́бное заведе́ние) delirfûnûna xwendiniyê bilind, dersxana xwendiniyê bilind.

вулка́н *м.* volkan *м.*, çîyaê agirdiz; **поту́хший ~** çîyaê agirdiz vêzîyaî, çîyaê agirvêsîyaî.

вулканиза́ция *ж.* volkanîzêkirin *ж.*

вулканизи́ровать *несов. тех.* volkanîzê kirin.

вулкани́ческий *прил.* yê volkanê, yê çîyaê agirdiz.

вулканизи́ция *ж.* vûlgarîzê *ж.*, beyankirin *ж.*, vûlgarîzêkirin *ж.*

вульгаризи́ровать *несов. и сов.* vûlgarîzê kirin; ji nêt. derxi tin (*лишать смысла, выхолащивать*).

вульга́рный *прил.* 1. (*грубый, непристойный*) yê bêmerîfet; 2. (*лишённый смысла, выхолащенный*) yê ji nête derxistî, yê beyan, yê bêfem, yê nepak.

ВФДМ (Всемирная Федера́ция Демократической Молодёжи) Fêdêrasîûna Cahilên Dêmokratîyê yê Hemduniyaê.

ВФП (Всемирная Федера́ция Профсою́зов) Fêdêrasîûna Sîndîkatîyê ya Hemduniyaê, Fêdêrasîûna Promtîfaqîya Hemduniyaê.

вход *м.* 1. (*место*) derî *м.* (*дверь*); derge *м.* (*ворота*); 2. (*действие*) çûîn hundur, dexilbûîn *ж.*, derdaçûn *ж.*

входи́ть, войти́ 1. dexil bûîn, hatin hundur, derda hatin; **~ в дом** hatin hundurî xanî, çûn malê; 2. (*вмещаться*) ci bûîn (girtin), têda çûîn; 3. (*содержаться в чём-л.*) têda hebûn, cî bûn; ◇ **~ в азарт** sergerm bûîn, ketin hecê (hucelê); **~ в си́лу** qanûn bûîn; **~ в согла́шение** qirar girêdan, bariş bûn; **~ в обы́чай** edet bûn; **~ в мо́ду** mod bûîn; **~ в чьё-л. положе́ние** (*сочувствовать*) şirîkê derdê kesekî bûîn, hemderdî kirin, ketin derdê (ketin halê) kesekî.

входно́й *прил.* yê dexilbûînê, yê derdaçûînê, yê derbazbûînê.

входя́щий *прил.* yê tê hundur, yê dexiliyê; **~ие бума́ги** kaxezê dexilîyê.

вхолосту́ю *нареч.* bêfeîde (*бесполезно*); badihewa (*напрасно*); pûç, xalî, vala (*впустую*); bêkar, bêhasil, bênetîce (*безрезультатно*).

вцепи́ться *сов. см.* вцепля́ться.

вцепля́ться, вцепи́ться yaxe girtin, dest avêtin bedenê.

ВЦСПС (Всесою́зный Центра́льный Сове́т Профессиона́ль-

ных Сою́зов) Şêwra Merkeza Sîndîkaîyê ya Hemtifaqîyê, Şêwra Sîndîkaîyê Merkezîyê Hemtifaqîyê.

вчера́ *нареч.* duh; ~ **днём** duh roj, roja du; ~ **ве́чером** duh êvarê.

вчера́шний *прил.* yê duhî, yê duh; ~ **день** roja duh.

вчерне́ *нареч.* bi nivîsara reş, berê ewil, reşbelek.

вчетверо *нареч.* bi çar cara; **сложи́ть** ~ çar cara qet kirin; **увели́чить** ~ bi çar cara zêde kirin; **уме́ньшить** ~ bi çar cara kêm kirin; ~ **бо́льше** bi çar cara zêde.

вчетверо́м *нареч.* bi çar neferî, çarmerîtî.

в-четвёртых *вводн. сл.* yê çara.

вчита́ться *сов. см.* вчи́тываться.

вчи́тываться, вчита́ться rind xwendin.

вшей I *см.* вошь.

вшей II *см.* вошь.

вши *см.* вошь.

вшива́ть, вшить li hundurva (têda) dirûtin.

вши́вый *прил.* yê sipîxwer.

вшить *сов. см.* вшива́ть.

въеда́ться, въе́сться hilçinîn (hildan, kişandin) xwe.

въезд *м.* 1. (*место*) rîya derbazbûnê; derge *м.* (*ворота*); dervaze *ж.* (*проезд*); 2. (*действие*) hatin hundur.

въезжа́ть, въе́хать siyarî çûîn hundur, ajotin hundur; ~ **во двор** çûîn hundurê hewşe.

въе́сться *сов. см.* въеда́ться.

въе́хать *сов. см.* въезжа́ть.

вы *мест.* we (*ед. ч.*); ûn, hûn (*мн. ч.*); **вам** wera, we (*вежл. форма ед. ч.*); ûn, hûn (*форма мн. ч.*); **я вам скажу́** ezê wera bêjim; **вам на́до торопи́ться** ûn gereke lezkevin, hûn gereke bilezînin; **ва́ми** ji alîyê we, ji we; **что с ва́ми?** çi we qewimîye?, wera çi qewimîye?; **я ва́ми дово́лен** ez ji we razîme; **вас** we; **мы ждём вас** em hîvîya wene; **мы скуча́ем по вас** em bîra we dikin; **э́то возлага́ется на вас** eweyek tê sipartinê ser we, ewê yekê tesmîl we dikin; **ваш** yê we; **ваш друг** hogirê we.

выба́лтывать, вы́болтать *прост.* zêdeî xwe xeberdan, egan kirin, gotin.

выбега́ть, вы́бежать reve-rev derketin; ~ **на у́лицу** bezin [li] soqaqê.

вы́бежать *сов. см.* выбега́ть.

выбива́ть, вы́бить 1. (*выламывать*) şikênandin, derxistin, deranîn; 2. (*выколачивать*) dawişandin, lêxistin; 3. (*клеймо и т. п.*) kutan; ~ **клеймо́** daş (nîşan) kirin; 4. (*выгонять*) derxistin; ~ **неприя́теля** neyar derxistin; ◇ ~ **из колей** ji rê derxistin; **град вы́бил посе́вы** teîrokê zevî kuta.

выбива́ться, вы́биться: ~ **из сил** sist (bêtaqet) bûîn, qudûm (ĥal) ketin; ~ **в лю́ди** *разг.* bûîn meri.

выбира́ть, вы́брать 1. (*отбирать*) bijartin, başqe (cuda) kirin; 2. (*избирать голосованием*) bi dengdaînê dan bijartinê.

выбира́ться, вы́браться *разг.* 1. (*выходить с трудом*) (*bi zorê*) derketin; 2. *перен.* jêderketin (*из затруднений и т. п.*); xilas (aza) bûîn (*освобождаться*).

вы́бить(ся) *сов. см.* выбива́ть (-ся).

вы́боина *ж.* kendal *м.*, kor *ж.*, çel *ж.*, newal *ж.*

вы́болтать *сов. см.* выба́лтывать.

вы́бо||р *м.* bijartin *ж.*; ~ **пал на него́** ew hate bijartinê; **у меня́ нет ~ра** ez bêîlacim; ◇ **на ~** bi bijartinê.

вы́борка *ж.* 1. (*действие*) bijartin *ж.*; 2. (*выбранное*) tiştê bijartî.

вы́борность *ж.* bijartin *ж.*; ~ **наро́дных суде́й** bijartina sûcdê muxulqetîyê (cimaetê).

вы́борный *прил.* 1. yê bijartinê; 2. *в знач. сущ. м.* bijartî *м.*

вы́борочно *нареч.* bi bijartin, bijar-bijar.

вы́борочн|ый *прил.* yê bijartinê; **~ая убо́рка хлебо́в** ekinberevkirina bijartiniyê, bêcarkirina ekinê ji hevdu başqe.

вы́борщик *м.* bijartvan *м.*, bijartçî *м.*

вы́боры *мн.* bijartin *ж.*; **~ в Сове́ты** bijartin li nava Şêwra; **всео́бщие ~** bijartinê tevaviyê; **ра́вные ~** bijartinê weke hev (beranberî hev); **прямы́е ~** bijartine raste-rast.

вы́бранить *сов.* çêr (kifir) kirin, dain xebera.

выбра́сывать, вы́бросить 1. avêtin; 2. *перен.* (*отпускать — напр. цитату*) berdan; ◇ **~ кого́-л. на у́лицу** kesek avêtin kûçê; **вы́бросить из головы́** ji serê xwe derxistin, ji fikira xwe avêtin.

выбра́сываться, вы́броситься xwe avêtin.

вы́брать(ся) *сов. см.* выбира́ть (-ся).

выбрива́ть, вы́брить kur kirin; sûret hildan (*лицо*).

вы́брить *сов. см.* выбрива́ть.

вы́бриться *сов.* sûretê xwe kur kirin, rûyê xwe hildan.

вы́бросить(ся) *сов. см.* выбра́сывать(ся).

выбыва́ть, вы́быть derketin, çûin.

вы́быть *сов. см.* выбыва́ть.

выва́ливать, вы́валить rokirin, rêtin; vala kirin (*опорожнять*); avêtin (*сбрасывать*); nuqul erdê kirin (*опрокидывать*); welgerandin (*перевёртывать*); rijandin (*рассыпать*).

выва́ливаться, вы́валиться ketin; nuqul erdê bûin (*опрокидываться*); welgerîn (*перевёртываться*); rijîn (*рассыпаться*).

вы́валить(ся) *сов. см.* выва́ливать(ся).

вы́валять *сов. см.* валя́ть 2.

вы́валяться *сов. см.* валя́ться 3.

выва́ривать, вы́варить [zêf] kelandin.

вы́варить *сов. см.* выва́ривать

вы́ведать *сов. см.* выведывать

вы́веде́ние *с* 1. (*выращивание*) mezinkirin *ж.*, xweşkirin *ж.*; 2. (*искоренение*) derxistin *ж.*, kokbirandin *ж.*, qirkirin *ж.*, kokanîn *ж.*

вы́вед|ывать, вы́ведать xebera jê derxistin, binalî eyan kirin.

вы́везти *сов. см.* вывози́ть.

вы́верить *сов. см.* выверя́ть.

вы́верка *ж.* rastkirin *ж.*

вы́вернуть *сов. см.* выве́ртывать.

выве́ртывать, вы́вернуть 1. (*вывинчивать*) derxistin, paşda badan; 2. (*выворачивать*) vajkirin, welgerandin, vejandin.

выверя́ть, вы́верить rast kirin; **~ часы́** sehet rast kirin.

вы́весить *сов. см.* вывеши́вать

вы́веска *ж.* navnîş *ж.*, tablo *ж.*

вы́вести *сов. см.* выводи́ть.

выве́тривание *с.* dan bê, dan ber baê.

выве́шивать, вы́весить (*флаг и т. п.*) darda kirin, daliqandin; **~ фла́ги** al darda kirin.

вы́винтить *сов. см.* вывинчивать.

вывинчивать, вы́винтить derxistin, paşda badan.

вы́вих *м.* 1. ciderketin *ж.*; **~ руки́** cîderketina dest; 2. *перен. разг.* şaşî *ж.* (*ошибка*); kêmasî *ж.* (*упущение*).

вы́вихнуть *сов.* ji cî derxistin; **~ но́гу** ling ji cî derxistin.

вывоз *м.* 1. (*действие*) derxistin *ж.*, birîn *ж.*; **~ войск** derxistina eskerî; 2. (*итог*) xulase *ж.*, serecem *ж.*; **прийти́ к ~ду, что...** hatin ser wê nêtê ku...

вывози́ть, вы́вести 1. dain derxistinê (*заставлять выходить*); derxistin, derbaz kirin (*уводить*); **~ из бо́я** ji nava şer derxistin; 2. kok anîn, qir kirin, derxistin (*уничтожать*); le-

mîz kirin (*отчищать*); ~ **пя́тна** leke temîz kirin; 3. çêkirin (*строить*); bilind kirin (*воздвигать*); 4. (*изображать*) nîşan kirin; 5. (*избавлять*) xilas (aza) kirin; ~ **из затрудне́ний** ji çetinîyê xilas kirin; ◇ ~ **из себя́** kerbûî (hêrs) kirin; ~ **в лю́ди** *разг.* kirin merî; ~ **на чи́стую во́ду** *разг.* eşkere (eyan) kirin.

вы́водок *м.* 1. (*у животных*) çêjik *м.*; 2. (*у птиц*) cûcik *ж.*

вывожу́ I *см.* выводи́ть.

вывожу́ II *см.* вывози́ть.

вы́воз *м.* 1. (*действие*) birin *ж.*, derxistin *ж.*; 2. (*вывозимое*) heşîyaê birinê (*li dereka*).

вывози́ть, вы́везти 1. (*удалять*) derxistin, dûr xistin, birin; 2. (*привозить с собой*) xwera anîn; 3. şandin welatê dereke, birin (*экспортировать*); firotin (*продавать*).

вывозно́й *прил.* yê birinê; yê firotanê.

выора́чивать(ся) *несов. см.* вы́вернуть(ся).

вы́гадать *сов. см.* выга́дывать.

выга́дывать, вы́гадать feîde (kar) dîtin (standin).

вы́гибать, вы́гнуть tewandin, badan.

вы́гладить *сов. см.* гла́дить 1.

вы́глядеть *несов.*: **он хорошо́ ~ит** rengê wî pake, beşera wî xweşe, ew bi kêfe.

выгля́дывать, вы́глянуть 1. ji (*cîkî*) nihêrîn (*смотреть откуда-л.*); serê xwe (*ji cîkîra*) derxistin (*высовывать голову*); 2. (*показываться откуда-л.*) xweya (xanê) kirin, kivş bûîn.

вы́глянуть *сов. см.* выгля́дывать.

вы́гнать *сов. см.* выгоня́ть.

вы́гнуть *сов. см.* вы́гибать.

выгова́ривать, вы́говорить 1. (*произносить*) gotin; 2. (*обусловливать*) dest xistin, xastin, kivş kirin.

вы́говор *м.* 1. (*произношение*) zarav *м.*, lewz *м.*; 2. (*порицание*) temî *ж.*, şîret *ж.*, serzenêş *м.*

вы́говорить *сов. см.* выгова́ривать.

вы́года *ж.* feîde *ж.*, kar *ж.*

вы́годный *прил.* yê bifeîde, yê karê.

вы́гон *м.* (*пастбище*) ariş *м.*, cîyê (çaîrê) çêrê.

выгоня́ть, вы́гнать derxistin, berîdan; ~ **из ко́мнаты** ji otaxê derxistin.

выгора́живать, вы́городить 1. dîwar danîn, perçîn kirin, sûre kişandin (*отгораживать — стеной и т. п.*); başqe (cuda) kirin, navbirî kirin, hevqetandin (*изолировать*); 2. *перен. разг.* (*оправдывать*) îzbat kirin.

выгора́ть, вы́гореть 1. (*сгорать*) şewitîn; 2. (*выцветать*) rengê xwe unda kirin, çilmisîn, qîçik bûn.

вы́гореть *сов. см.* выгора́ть.

вы́городить *сов. см.* выгора́живать.

вы́греб *см.* вы́грести.

выгреба́ть, вы́грести temîz (paqij) kirin (*вычищать*); verotin, derxistin (*удалять*).

вы́грести *сов. см.* выгреба́ть.

выгружа́ть, вы́грузить bar danîn; vala kirin (*освобождать, опорожнять*).

вы́грузить *сов. см.* выгружа́ть.

вы́грузка *ж.* bardanîn *ж.*; valakirin *ж.* (*освобождение, опорожнение*).

выдава́ть, вы́дать 1. daîn (*давать*); heq daîn (*выплачивать*); teslîm kirin (*вручать*); 2. xaînî kirin (*предавать*); eşkere (belû) kirin (*разглашать*); 3. (*обнаруживать*) dîtin, eyan (kivş) kirin; 4. (*передавать*) teslîm kirin; sipartin; ~ **престу́пника** merîyê gunehkar teslîm kirin; ◇ ~ **себя́ [за]** xwe kirin notila..., xwe kirin qilxê...

выдава́ться, вы́даться (*выступать*) pêşda hatin, bel bûn.

вы́давить *сов. см.* выда́вливать.

выда́вливать, вы́давить 1. (*выжимать*) helçiqandin, guvaştin, hincirandin; 2. (*продавливать*) qul kirin, tewixandin, pelixandin.

выда́ивать, вы́доить dotin.

выда́лбливать, вы́долбить qul kirin, kolan.

вы́дать *сов. см.* выдава́ть.

вы́дача *ж.* 1. parevekirin *ж.* (*раздача*); heqdaîn *ж.* (*выплата*); teslîmkirin *ж.* (*вручение*); 2. (*разглашение*) eşkerekirin *ж.*, belûkirin *ж.*; 3. (*передача*) teslîmkirin *ж.*, sipartin *ж.*

выдаю́щийся *прил.* yê navdar, yê meşûr, yê ber bi çev; ∽ **учёный** ulmdarê navdar (meşûr).

выдвига́ть, вы́двинуть 1. (*выставлять вперёд, вытаскивать*) pêşda daîn, pêşxistin; 2. (*предлагать, выставлять*) pêşda xistin, raber (kivş) kirin; ∽ **кандидату́ру** kandîdatûr pêşda xistin (kivş kirin); ∽ **на руководя́щую рабо́ту** ser (bona) xebata serkarîyê kivş kirin; 3. (*приводить*) [pêşda] anîn; ∽ **обвине́ние** gunehkarî pêşda anîn; ∽ **доказа́тельство** îzbat kirin.

выдвига́ться, вы́двинуться 1. (*продвигаться вперёд*) pêşda çûîn (hatin); 2. (*отличаться*) hatin kivşê; 3. *страд.* (*о кандидатуре*) hatin raberkirinê.

выдвиже́нец *м.* merîyê pêşdaçûî.

выдвиже́ние *с.* pêşdakişandin *ж.*; raberkirin *ж.* (*кандидатуры*).

вы́двинуть *сов. см.* выдвига́ть.

вы́двинуться *сов. см.* выдвига́ться 1, 2.

вы́делать *сов. см.* выде́лывать.

выделе́ние *с.* 1. *физиол.* derketin *ж.*, hatin *ж.*; 2. (*процесс*) başqekirin *ж.*, cudekirin *ж.*, parevekirin *ж.*

вы́делить(ся) *сов. см.* выделя́ть(ся).

вы́делка *ж.* 1. (*производство*) çêkirin *ж.*, deranîn *ж.*; 2. (*кожи*) ĥasilkirin *ж.*, dibaxkirin *ж.*; 3. (*качество*) xasî *ж.*

выде́лывать, вы́делать 1. (*изготовлять*) çêkirin, hazir kirin, deranîn; 2. (*дубить — кожу*) dibax (ĥasil) kirin.

выделя́ть, вы́делить 1. (*обособлять*) başqe (cuda) kirin, pare vekirin; 2. *физиол.* hatin, derketin; 3. *перен.* (*отмечать*) cude (kivş, nîşan) kirin; 4. (*ассигновать*) pere berdan.

выделя́ться, вы́делиться 1. (*обособляться*) xwe başqe (xwe cude, xwe cihê) kirin, cihê bûîn; 2. *физиол.* derketin; 3. *перен.* (*отличаться*) kivş bûîn, xwe kivş kirin, xwe nîşan daîn.

выдёргивать, вы́дернуть derxistin; kişandin (*вытаскивать*); ∽ **гвоздь** mix kişandin.

вы́держанный *прил.* yê serxwe; yê biterb[îy]et, yê giran, yê biferesat, yê cêribandî.

вы́держать *сов. см.* выде́рживать.

выде́рживать, вы́держать 1. (*терпеть*) tap (taqet, sebr, temûl) kirin; 2. (*удерживаться*) xwe zeft kirin, xwe girtin; ∽ **хара́ктер** ser ya xwe sekinîn, xeîsetê xwe nîşan dan; 3.: ∽ **экза́мен** êmtyan daîn.

вы́держка I *ж.* (*из книги и т. п.*) miqale *ж.*, fikir *ж.*, cî *м.*, nêt *ж.*

вы́держка II *ж.* (*самообладание*) xwegirtin *ж.*, xwezeftkirin *ж.*

вы́дернуть *сов. см.* выдёргивать.

выдира́ть, вы́драть *разг.* kişandin, derxistin.

вы́доить *сов. см.* выда́ивать.

вы́долбить *сов. см.* выда́лбливать.

вы́дох *м.* bînaxweberdan *ж.*, bînaxwestandin *ж.*, nefeskişandin *ж.*

вы́дохнуть(ся) *сов. см.* выдыха́ть(ся).

вы́дра *ж.* 1. (*животное*) seê (kûçkê) avê; 2. (*мех*) postê seê avê, sekav *м.*

вы́драть *сов. см.* выдира́ть, драть.

вы́дрессировать *сов. см.* дрессирова́ть.

вы́думать *сов. см.* выду́мывать.

вы́думка *ж.* 1. (*придуманное*) berxwederxistin *ж.*; 2. (*ложь*) vir *ж.*, derew *ж.*, buxdan *ж.*

выду́мывать, вы́думать 1. îcat kirin, ber xwe derxistin (*придумывать*); efrandin (*создавать*); 2. (*лгать*) derew (vir) kirin.

вы́дыхать, вы́дохнуть bîna xwe berdan (standin).

вы́дыхаться, вы́дохнуться 1. (*терять запах*) bêbîn bûîn, bîna xwe unda kirin; 2. *перен.* sist (bêtaqet) bûîn (*ослабевать*); westîn, qudûm ketin (*уставать*).

выеда́ть, вы́есть 1. (*выгрызать*) kotin, xwerin; 2. (*разъедать*) xwerin.

вы́еденн||ый *прич.*: **э́то не сто́ит ~ого яйца́** *погов.* ewyek qet tiştekî nehêjaîye, ewyek laîqî polê pûçê.

вы́езд *м.* 1. (*место*) cîwara rêketinê; 2. (*экипаж с лошадьми*) ereba hespgirêdaî; 3. (*действие*) çûîn *ж.*, rêketin *ж.*

выезжа́ть, вы́ехать 1. çûîn, rê ketin (*отправляться*); hiştin (*покидать*); 2. *перен. разг.* (*на ком-л., чём-л.*) piştî (*kesekî, tiştekî*) qedandin.

вы́емка *ж.* 1. (*углубление*) çel *ж.*, kor *ж.*, kûraî *ж.*; 2. (*действие*) derxistin *ж.*, hildan *ж.*

вы́есть *сов. см.* выеда́ть.

вы́ехать *сов. см.* выезжа́ть.

вы́жать *сов. см.* выжима́ть.

вы́ждать *сов. см.* выжида́ть.

вы́жечь *сов. см.* выжига́ть.

выжива́ть, вы́жить 1. (*оставаться в живых*) sax maîn, nemirin; 2. *разг.* (*выгонять*) ji cîyê xwe derxistin, berî daîn.

выжига́ть, вы́жечь 1. (*истреблять*) bi agir qir kirin, şewitandin; 2.: **~ клейм**о́ dax (nîşan, xeza) kirin.

выжида́тельн||ый *прил.*: **заня́ть ~ую пози́цию** hîvî bûîn, hîvîya (*tiştekî*) sekinîn.

выжида́ть, вы́ждать hîvîyê sekinîn, sebr kirin.

выжима́ть, вы́жать 1. guvaştin; 2. *спорт.* hildan, hilbirîn, hilbirandin.

вы́жить *сов. см.* выжива́ть.

вы́звать(ся) *сов. см.* вызыва́ть (-ся).

вы́зволить *сов. см.* вызволя́ть.

вызволя́ть, вы́зволить *прост.* xilas (aza) kirin, daîn berdanê.

выздора́вливать, вы́здороветь qenc (pak) bûn, selamet bûîn.

выздора́вливающий *взнач. сущ. м.* merîyê qencbûî, merîyê ku selamet dibe.

гли́ссер *м.* (*судно*) glîsêr *м.*

глист *м.* kurm *м.*, kurmê dil.

глицери́н *м.* glîsêrîn *ж.*

гло́бус *м.* globûs *ж.*

глода́ть *несов.* 1. kotin; 2. *перен.* şerpeze (aciz) kirin.

гложу́ *см.* глода́ть.

глота́ть *несов.* daqurçandin, qurt kirin.

гло́тка *ж.* gewrî *ж.*, boxaz *ж.*

глотну́ть *сов. см.* глота́ть.

глот||о́к *м.* qurt *ж.*, qultik *ж.*; **одни́м ~ко́м** biqurtekî.

гло́хнуть 1. *сов.* оглóхнуть (*терять слух*) ker (guhgiran) bûn; 2. *сов.* заглóхнуть (*затихать*) sekinîn, seqirîn; 3. *сов.* заглóхнуть (*приходить в запустение*) vala (xalî) bûn, çilmisîn.

глуби||на́ *ж. прям., перен.* kûraî *ж.*, emîq *ж.*; ~ **колóдца** kûraîya bîrê; **измеря́ть ~ну́** emîq (kûraî) pîvandin; ◇ **в ~не́ души́** li kûraîya dilda.

глуби́нн||ый *прил.*: **~ая бóмба** bomba kûraîyê.

глубо́к||ий *прил. прям., перен.* yê kûr, yê emîq; **~ая таре́лка** tebaxa kûr; **~ая мысль** fikira kûr; ~ **сон** xewa şîrin; **~ая ста́рость** kalbûna mezin; **~ой но́чью** nîvê şevê, li şeva terî; **в ~ой та́йне** zef binalî (mexfî).

глубоково́дный *прил.* yê kûrav, yê avemîq, yê ava kûr.

глубокомы́сленный *прил.* yê pirmenî, yê pirnêt, yê fikira kûr.

глубокомы́слие *с.* pirmenî *ж.*, pirnêtî *ж.*, fikira kûr.

глубокоуважа́емый *прил.* yê pirhurmet, yê bi qedir û qîmet.

глубь *см.* глубина́.

глуми́ться *несов.* aciz (cezaret) kirin (*мучить*); mesxere (pêkenî) kirin (*насмехаться*).

глупе́ть, поглупе́ть axmax (bodîle, xurofaş) bûn.

глупе́ц *м.* axmax *м.*, merîyê bêaqil (bodîle, bêhiş); merîyê nezan *м.* (*невежда*).

глу́пость *ж.* bêhişî *ж.*, bêaqilî *ж.*, axmaxî *ж.*, bodîletî *ж.*

глу́пый *прил.* yê axmax, yê bêhiş, yê bêaqil, yê bodîle; yê nezan (*невежественный*).

глух||о́й *прил.* 1. yê ker (*лишённый слуха*); yê guhgiran (*тугой на ухо*); 2. (*о месте*) yê ker û lal; ~ **лес** mêşê ker û lal; **~а́я у́лица** kûça xewle (ker û lal); 3. *в знач. сущ. м.* merîyê ker; ◇ ~ **согла́сный** *лингв.* sewtê bêdeng; **~а́я ночь** şeva ker û lal, şevereş *ж.*; **~а́я стена́** dîwarê tam.

глухонемо́й *в знач. сущ. м.* merîyê ker û lal.

глухота́ *ж.* kerî *ж.*; guhgiranî *ж.* (*тугоухость*).

глуши́тель *м. тех.* dengbir *м.*

глуши́ть 1. *сов.* оглушúть (*оглушать*) ker kirin; 2. *сов.* заглушúть fetisandin (*не дивать света, простора*); guvaştin (*зажимать*); pêpes kirin, tepisandin (*подавлять*).

глушь *ж.* (*захолустье*) meħela zef dûr.

гли́ба *ж.* kelûx *м.*, kuçik *м.*, pêl *ж.*; **ка́менная ~** kevirê mezin.

глюко́за *ж. хим.* glûkoz *ж.*

гляде́ть, поглядéть 1. (*смотреть*) nihêrîn, temaşe (teselî) kirin; 2. (*наблюдать*) miqat bûn; ◇ **того́ и гляди́** dikare biqewime, haşpêhebe.

гляде́ться, поглядéться: ~ **в зе́ркало** xwe eînêda nihêrîn.

гляжу́ *см.* гляде́ть.

гля́нец *м.* birq *ж.*, berqetav *ж.*; **наводи́ть ~** birqandin, daîn birqandinê.

гнать *несов.* 1. (*погонять*) ajotin; 2. (*прогонять*) derxistin, berîdan, dûr xistin; 3. *разг.* (*торопить*) lezandin, daîn lezandinê; 4. (*добывать перегонкой*) kişandin.

гна́ться, погна́ться (*за кем-л.*) dû (peî) ketin, daîn peî, daîn dû.

гнев *м.* hêrsî *ж.*, hêrsbûn *ж.*

гне́ваться, разгне́ваться *уст.* hêrs bûîn.

гне́вный *прил.* yê hêrs.

гнед||о́й *прил.*: ~а́я ло́шадь hespa kumêît.

гнезди́ться *несов.* 1. (*о птицах*) hêlûn danîn; 2. *перен.* (*ютиться*) cî girtin, ewir (misken) bûn; 3. *перен.* (*напр. о мыслях*) cî girtin.

гнездо́ *с.* hêlûn *ж.*, cî *м.*; qul *ж.* (*нора*); **вить ~** hêlûn danîn.

гнездово́й *прил.* yê hêlûnê, yê cî bi cî; **~ посе́в** toximavêtina cî bi cî.

гнести́ *несов.* guvaştin, şerpeze kirin.

гнёт *м.* nîr *м.* (*ярмо*); zulum *ж.*, xezeb *ж.* (*тирания*); xeşm *ж.* (*насилие*).

гнету́щий *прил.* yê şerpezekirinê (*беспокоящий*); yê dilteng (*мрачный, печальный*); yê acizkirinê (*мучительный*).

гнило́й *прил.* yê genî (*протухший*); yê xirabbûî (*испорченный*); yê kurmî (*червивый*).

гниль *ж.* 1. *собир.* tiştê kurmî (genî, xirabbûî); 2. (*плесень*) kefik *ж.*

гнить, сгнить genî bûn (*протухать*); xirab bûn (*портиться*); kurmî bûîn (*червиветь*).

гнои́ть, сгнои́ть genî kirin (*давать протухнуть*); kurmî kirin (*давать зачервиветь*); xirab kirin (*портить*).

гнои́ться *несов.* kêm girtin.

гной *м.* kêm *ж.*, çirk *ж.*

гнойни́к *м.* pizika (werima) kûnêra, berboqa kêmê.

гно́йный *прил.* yê kêmgirtî, yê çirkbûî.

гносеологи́ческий *прил.* yê gnosêolojîyê, yê têorîya zanbûnê.

гносеоло́гия *ж. филос.* gnosêolojî *ж.*, têorîya zanbûnê.

гнуса́вить *несов.* vinge-ving kirin, bêvila xweda xeberdan.

гнуса́вый *прил.* yê vinge-ving.

гну́сность *ж.* nemerdî *ж.*, nepaktî *ж.*, bêînsafî *ж.*, bêarî *ж.*

гну́сный *прил.* yê nemerd, yê nepak, yê pîs, yê bêînsaf, yê bêar.

гнуть, согну́ть tewandin.

гну́ться, согну́ться tewîyan, hatin tewandinê.

гнуша́ться, погнуша́ться xwe daîn alîkî, şerm kirin, medê xwe kirin.

го́вор *м.* 1. xeberdan *ж.* (*разговор*); 2. (*диалект*) lehce *м.*, zarav *м.*; 3. (*характер произношения*) gotin *ж.*, lewz *м.*

говор||и́ть 1. *сов.* сказа́ть gotin, xeberdan; **~ по-ку́рдски** kurmancî xeberdan; **~ пра́вду** rast gotin; 2. *сов.* поговори́ть (*беседовать*) gilî (sohbet, qise) kirin; 3. *тк. несов.* (*свидетельствовать*) şedetî kirin; ✧ **не ~я́ ни сло́ва** bêxeberdan, bêgilî-gotin, bê lam û çim; **как ~и́т** qewlî gotîyava, çawa ku dibêjin.

говори́т||ься *несов. безл.*: **как ~ся** çawa ku tê gotinê, qewlî gotîyava.

говорли́вый *прил.* yê zimandirêj.

говору́н *м. разг.* merîyê zimandirêj.

говя́дина *ж.* goştê dêwêr.

говя́ж||ий *прил.*: **~ье мя́со** goştê dêwêr.

гогота́ть *несов.* 1. (*о гусях*) qire-qir kirin; 2. *разг.* (*смеяться*) tîqe-tîq kirin.

год *м.* sal *ж.*; **бу́дущий ~** sala tê; **про́шлый ~** sala par, par; **високо́сный ~** sala kebîs (şên, dirêj); **кру́глый ~** salewext; **лу́нный ~** sala qemerê, sala bi hejma-

ra ser hîvê; **со́лнечный** ~ sala şems, sala bi ĥejmara ser tevê; **учёбный** ~ sala hînbûnê; **ему́ 22 ~а** ew bîst du salîye; **из ~а в ~** sal bi sal; **~ы** yaş *m.*, emir *m.*; **Но́вый** ~ sala teze, serê salê; **теку́щий** ~ îsal, sala rabertî; **коне́ц ~а** kutabûna (xilasbûna) salê; ~ **тому́ наза́д** sala par, salekê berîhingê; **с ка́ждым ~ом** her sal, sal bi sal; **реша́ющий ~ пятиле́тки** sala eslîye qedandina meremê pencsalîyê.

годи́т||ься *несов.* kêr hatin, pak bûn; ◇ **не ~ся** kêr naîye, bêkêre.

годи́чный *прил.* yê yeksale; yê salê, yê salekî (*рассчитанный на год*).

го́дность *ж.* kêrhatin *ж.*, lazimî *ж.*

го́дный *прил.* yê pak, yê rind (*хороший*); yê lazim (*нужный*); yê kêrhatinê (*пригодный*).

годова́лый *прил.* yê yeksale.

годово́й *прил.* yê salê; ~ **отчёт** ĥesabdarîya salê (salekê); ~ **дохо́д** kara salê.

годовщи́на *ж.* salewext *м.*; eîdsalî *ж.* (*празднование*).

гожу́сь *см.* годи́ться.

голени́ще *с.* saqê çêkmê.

го́лень *ж. анат.* saqling *м.*

голла́ндец *м.* ĥolandî *м.*

голла́ндский *прил.* yê holandî.

голов||а́ *ж.* 1. ser *м.*, serî *м.*, kele *м.*, qaf *м.*; **у меня́ боли́т** ~ serê min dêşe; **с непокры́той ~о́й** serqot; 2. (*ум*) aqil *м.*; **све́тлая** ~ aqilbend *м.*; **он челове́к с ~о́й** ew merivekî aqile; 3. (*счётное слово для скота*) serî *м.*; ◇ **с ~ы́ до ног** ji serî ĥeta linga; **теря́ть го́лову** (*теряться*) aqilê xwe unda kirin; **лома́ть го́лову** *разг.* serê xwe şikênandin; **вы́кинуть из ~ы́** *разг.* ji serê xwe derxistin (avêtin); **как снег на ~у** nişkêva; **городско́й** ~ *уст.* serdarê şiher.

голова́стик *м.* dilxawk *ж.*

голове́шка *см.* головня́.

голов||ка *ж.* 1. ser *м.*, serî *м.*; ~ **була́вки** serê derzîyê; ~ **гвозда́** serê mix; ~ **лу́ка** serî pîvaz; ~ **чесноко́** serî sîr; 2. *мн.* ~**ки** (*сапог*) rûîyê çêkmê.

головн||о́й *прил.* 1. yê serî; ~**а́я боль** serêşî *ж.*; ~ **мозг** mejûîyê serî; 2. (*передовой*) yê pêşin, yê pêşîyê; ~ **отря́д** desta pêşin (pêşîyê).

головня́ *ж.* (*обгоревшее бревно, полено*) şewitok *ж.*

головокруже́ние *с.* sergêjî *ж.*

головокружи́тельный *прил.* yê serunda, yê sergêjîyê.

головоло́мка *ж.* mesela çetin.

головоре́з *м. разг.* serbir *м.*, başîbizûk *м.*

головотя́п *м. разг.* merîyê bêĥiş (bêfem).

головотя́пство *с. разг.* bêĥişî *ж.*, bêfemî *ж.*

го́лод *м.* 1. birçîbûn *ж.*; **я чу́вствую** ~ ez birçîme (*я голоден*); 2. (*народное бедствие*) xelaî *ж.*

голода́ющий *в знач. сущ. м.* merîyê birçî.

го́лодный *прил.* yê birçî.

голодо́вка *ж.* 1. (*в тюрьме*) xwebirçîkirin *ж.*; 2. (*голодание*) birçîbûîn *ж.*, xelaî *ж.*

гололе́дица *ж.* şimitok *ж.*, bûzî *ж.*, erdqerimî *ж.*, bûzbendî *ж.*

го́ло||с *м. в разн. знач.* deng *м.*; avaz *м.*; **пра́во ~са** heqê dengdaînê; **пра́во реша́ющего ~са** heqê dengdaîna bijartinê; **пра́во совеща́тельного ~са** heqê dengê şewrdarîyê; **большинство́м ~со́в** bi nîvê zefîya denga; **подсчёт ~со́в** ĥesabkirina denga; **лиша́ть пра́ва ~са** dengbirî kirin, ji heqê bijartinê merûm kirin; **повыша́ть** ~ dengê xwe bilind kirin.

голосло́вный *прил.* yê bêesas, yê bêdelîl, yê bêîzbat.

голосова́ние *с.* dengdaîn *ж.*; **откры́тое** ~ dengdaîna vekirî; **та́йное (закры́тое)** ~ dengdaîna

binalî (mexfî); **поста́вить на ~** bona dengdaînê pêşda anîn.

голосова́ть *несов. и сов.* deng daîn; **~ за** deng daîn bona...; **~ про́тив** deng daîn miqabilî...; **~ предложе́ние** pirs deng daîn; **~ за мир** deng daîn bona edilaîyê.

голосов||о́й *прил.* yê deng; **~ы́е свя́зки** *анат.* perdê deng (gewrîyê).

голуби́н||ый *прил.* yê kevotka, yê kevotar; **~ая по́чта** poşta kevotka (kevotar).

голубогла́зый *прил.* yê çevşîn.

голубо́й *прил.* yê şîn, yê avreng.

голубцы́ *мн. м. кул.* tolme *м.*

го́лубь *м.* kevotk *ж.*, kevotar *м.*; **почто́вый ~** kevotka (kevotarê) poştê; **~ ми́ра** kevotka (kevotarê) edilaîyê.

голуби́тня *ж.* kevotkxane *ж.*, kevotarxane *ж.*

го́л||ый *прил.* **1.** (*раздетый*) yê tezî, yê rût; **2.** (*лишённый растительности*) yê kurkirî, yê kose; **~ая голова́** serê kurkirî; **~ые дере́вья** darê bêbelg; **~ая земля́** erdê bêhêşnaî; **3.** *перен.*: **~ая пра́вда** rastîya temîz; **~ое отрица́ние** înkara temîz; ◇ **брать ~ыми рука́ми** destvala girtin.

гомеопа́т *м.* homêopat *м.*

гоминда́н *м. полит.* gomîndan *м.*

гоминда́новец *м.* gomîndançî *м.*, terefdarê gomîndan, gomîndanvan *м.*

гондо́ла *ж.* **1.** (*лодка*) gondol *ж.*; **2.** (*у аэростата и дирижабля*) balon *ж.*

гоне́ние *с.* peîketin *ж.*, dûketin *ж.*

гоне́ц *м.* qasid *м.*, peîketî *м.*

го́нка *ж.* lec *ж.*, hucet *ж.*; **~ вооруже́ний** leca sîlihkirinê (sîlihdartîyê).

го́нор *м.* qurebûn *ж.*, berxweraçûîn *ж.*, kubarî *ж.* (*высокомерие*); pozbilindî *ж.* (*заносчивость*).

гонора́р *м.* hucret *ж.*, heq *м.*

гоноре́я *ж. мед.* sûzek *м.*, kotîbûn *ж.*, honorêî *ж.*

гончар *м.* kûzger *м.*

гончарный *прил.* yê kûzger.

гоню́ *см.* гнать.

гоня́ть *несов.* ajotin, berî dan; **~ мух** berî mêşa dan; **~ голуде́й** kevotk firandin, berî kevotka dan.

гоня́ться *несов.* (*за кем-л.*) peî (dû) ketin.

гор||а́ *ж.* **1.** çîya *м.*; **2.** *перен.* (*ворох*) qûç *ж.*; ◇ **в ~у** bi jorê, bi bilindaîyê; **не за ~а́ми** *разг.* nêzike, hindik maîye.

гора́здо *нареч.* deha; **~ бо́льше** deha zêde; **~ бли́же** deha nêzîk; **~ ме́ньше** deha hindik (kêm).

горб *м.* **1.** kûzî *ж.*, piştkotik *м.*, piştxwar *м.*; **2.** (*у верблюда*) palan *м.*, pişt *ж.*; ◇ **своим ~о́м** *разг.* bi xwêdana (bi keda) xwe.

горба́тый *прил.* **1.** yê piştxwar, yê piştkûz, yê piştgirê; **2.** *в знач. сущ. м.* piştxwar *м.*, piştkûz *м.*

го́рбиться, сго́рбиться xwe kûz (xwe piştxwar) kirin.

горбу́н *см.* горба́тый 2.

горбу́шка *ж.*: **~ хле́ба** qalçika nan.

горбы́ль *м.* pişta texte, textê nîvçe.

гордели́вый *прил.* yê bikubar, yê qure; yê pozbilind (*заносчивый*).

горди́ться *несов.* xwe qure (xwe kubar) kirin; pozê xwe bilind kirin, şerfinaz bûn (*держать себя заносчиво, задирать нос*).

го́рдо *нареч.* biserbilindtî; bikubartî (*надменно*); bişerfinaz (*заносчиво*).

го́рдость *ж.* **1.** (*то, чем можно гордиться*) îftîxarî *ж.*, şerefî *ж.*; **2.** şerfinazî *ж.* (*заносчивость*); kubarî *ж.* (*надменность*).

го́рдый *прил.* 1. yê biîftîxar, yê bişeref; 2. yê bikubar (*надменный*); yê pozbilind, yê şerfinaz (*заносчивый*).

го́ре *с.* 1. (*печаль*) xem *ж.*, derd *м.*, keder *ж.*, deltengî *ж.*; 2. (*несчастье*) bela *ж.*, teşqele *ж.*, bêbextî *ж.*

горева́ть *несов.* xem kişandin, dilteng (derdlû) bûin.

горе́лка *ж.* agir *м.*, çira *ж.*

горе́лый *прил.* yê şewitî, yê qumîyaî.

горемы́ка *м., ж.* meriyê (jina) bedbext (belengaz, telereş).

горе́ние *с.* şuxulîn *ж.*, vêketin *ж.*, agirdadan *ж.*

го́рестный *прил.* yê xemdil, yê dilteng; yê neçar, yê belengaz, yê telereş, yê bikeder, yê bêyazî-miqeder (*несчастный*).

горе́ть *несов.* 1. şuxulin; 2. (*краснеть*) sor bûin; 3. (*блестеть*) birqîn, çûrisîn, birq vedan.

го́рец *м.* çîyavan *м.*, eĥlê çîya.

го́речь *ж.* 1. telî *ж.*; 2. *перен.* (*горькое чувство*) telîtengî *ж.*, xem *ж.*, keder *ж.*, diltengî *ж.*, derd *м.*

горизо́н||т *м.* 1. pêşnezer *ж.*, ufuq *м.*; 2. *перен.* (*круг идей*) fikir *ж.*, nêt *ж.*; 3. *мн.* **~ты** *перен.* (*перспективы*) merem *ж.*; 4. *тех.* (*уровень*) bilindaî *ж.*, mîzan *ж.*

горизонта́ль *ж.* xetê ufuqê, gorîzontal *ж.*

горизонта́льный *прил.* yê ufuq, yê gorîzontalê.

горисполко́м *м.* (городско́й испо́лнительный комите́т) komîtêa qedandinê ya şiher.

горя́стый *прил.* yê çîyê; yê çîyavan (*горный*).

горко́м *м.* (городско́й комите́т) komîtêa şiher.

го́рло *с.* gewrî *ж.*, boĥaz *ж.*; **у меня́ боли́т ~** gewrîya min dêşe; ◇ **во всё ~** *разг.* bi dengê qaîm; **я сыт по ~** *разг.* ez zeî têrim.

го́рлышко *с.* (*бутылки*) dev *м.*, boĥaz *ж.*

горн I *м.* *тех.* kûre *ж.*; botek *ж.* (*горнило*).

горн II *м.* (*сигнальный рожок*) borî *ж.*

горня́ст *м.* borîçî *м.*, borîvan *м.*

горнозаво́дск||ий *прил.* yê medenê; **~ая промы́шленность** seneta medenîyê.

горнопромы́шленный *прил.* yê seneta medenê; **~ райо́н** neĥîya seneta medenîyê.

горнорабо́чий *м.* (*шахтёр*) medençî *м.*

горноста́й *м.* 1. (*животное*) ququme *м.*; 2. (*мех*) postê ququme.

го́рн||ый *прил.* yê çîyê; yê biçîya (*гористый*); **~ая ме́стность** meĥela biçîya; **~ые поро́ды** kevirê çîyê; **~ инжене́р** muĥendîsê medenê; **~ институ́т** înstîtûta medennasîyê.

горня́к *м.* (*рабочий*) medençî *м.*

го́род *м.* şiher *м.*, bajar *м.*; **~-геро́й** şiherê egît; **гла́вный ~** şiherê mezin, dêbajar *м.*; **социалисти́ческий ~** şiherê sosyalîstîyê; **за ~ом** ji şiher der.

городи́ть *несов.* 1. perçîn kirin, sûr kişandin; 2. *перен.* *разг.* (*говорить вздор*) bêhemdê xwe xeberdan; ◇ **огоро́д ~** *перен.* *разг.* şuxulê bêkêr kirin.

городо́к *м.* şiherê biçûk.

городск||о́й *прил.* yê şiher, yê bajar; **~о́е населе́ние** eĥlê şiher.

горожа́нин *м.* bajarvan *м.*, şihervan *м.*

горо́х *м.* nok *м.*, nîsk *м.*

горо́шек *м.*: **зелёный ~** nokê şîn (xang).

горсове́т *м.* (городско́й сове́т) sovêta (şêwra) şiher.

горсть *ж.* moşt *м.*, lep *ж.*, oç *ж.*, kulm *ж.*; hinek *ж.* (*немного*); **~ мукй** kulma ar.

горта́нный *прил.* yê boĥazê, yê gewrîyê, yê qirikê.

горта́нь *ж.* qirik *ж.*, ĥencerî *ж.*, boĥaz *ж.*

го́рцы *см.* го́рец.

горчи́ть *несов.* tel bûîn.

горчи́ца *ж.* herdel *ж.*, xerdel *ж.*

горчи́чник *м.* melĥema herdel (xerdel).

горшо́к *м.* kûzik *м.*

го́рьк‖ий *прил.* 1. yê tel; 2. *перен.* yê xemdil, yê dilteng (*горестный*); yê bextreş (*злосчастный*); ◇ **~ие слёзы** hêstirê xûnê.

горю́чее *с.* ardû *м.*

горю́чий *прил.* yê şuxulandinê, yê şewitandinê.

горя́ч‖ий *прил.* 1. yê germ yê kel; **~ исто́чник** kanîya ava germ; 2. *перен.* yê dilsaĥ, yê ĥelal (*искренний*); yê hêrs (*страстный*); **~ее уча́стие** dexilbûîna ĥelal.

горячи́ться, погорячи́ться, разгорячи́ться hêrs (sergerm) bûîn.

горя́чка *ж.* 1. *разг.* tah *ж.*, ricif *ж.*; 2. *разг.* (*спешка*) lezketin *ж.*

горя́чность *ж.* sergermî *ж.*, germî *ж.*; hêrsî *ж.* (*страстность*).

госаппара́т *м.* (госуда́рственный аппара́т) destgê (îdara) dewletê.

госба́нк *м.* (госуда́рственный банк) banka dewletê.

госбюдже́т *м.* (госуда́рственный бюдже́т) bûcêta dewletê.

го́спиталь *м.* nexweşxana eskerîyê, gospîtal *м.*

Госпла́н *м.* (Госуда́рственная пла́новая коми́ссия) Komîsîûna plana dewletê.

господи́н *м.* 1. aĥa *м.*, beg *м.*, efendî *м.*, maqûl *м.*; 2. *уст.* (*хозяин*) xweî *м.*, malxwê *м.*; ◇ **~ своего́ сло́ва** xweîyê gilîyê (xweîyê sozê) xwe.

госпо́дство *с.* ĥukumat *ж.*, ĥukumdarî *ж.*, serkarî *ж.*; **~ в во́здухе** ĥukumdarîya teyara li hewaê.

госпо́дствовать *несов.* 1. ĥukumat (ĥukumdarî) kirin; 2. (*возвышаться*) bilind sekinin, serra bilind bûn.

госпожа́ *ж.* 1. xanum *ж.*, xatûn *ж.*, bano *ж.*; 2. *уст.* (*хозяйка*) kevanî *ж.*

госстра́х *м.* (госуда́рственное страхова́ние) behîma dewletê.

гостеприи́мный *прил.* yê mêvanĥiz, yê qonaxĥiz.

гостеприи́мство *с.* mêvanĥizî *ж.*, qonaxĥizî *ж.*

гости́ная *ж.* oda mêvana (qonaxa).

гости́ница *ж.* mêvanxane *ж.*, qonaxxane *ж.*

гости́ть *несов.* mêvan (qonax) bûîn.

гост‖ь *м.* mêvan *м.*, qonax *м.*; **идти́ в ~и** çûîn mêvan; **быть в ~я́х** mêvan bûîn.

государственность *ж.* memleketî *ж.*, dewletbûn *ж.*

государственн‖ый *прил.* yê dewletê; **~ язы́к** zimanê dewletê; **~ перево́рот** welgerandina ĥukumatê; **~ое устро́йство** çêkirina (teşkîleta) dewletê; **~ая власть** ĥukumata dewletê; **~ая изме́на** xîyanetkarîya (xaînîya) dewletê; **~ герб** nîşana dewletê; **~ые расхо́ды** xercê dewletê.

госуда́рство *с.* dewlet *ж.*; memleket *м.* (*страна*); **Сове́тское ~** dewleta Sovêtê; **демократи́ческое ~** dewleta dêmokratîyê.

госуда́рь *м.* padşah *м.*, şah *м.*

готова́льня *ж.* *тех.* destgê pirgal.

гото́вить, пригото́вить 1. (*подготовлять*) hazir kirin, tivdarek dîtin; **~ уро́ки** ders hazir kirin; 2. (*стряпать*) xwerin hazir kirin, petin.

гото́виться, пригото́виться xwe hazir kirin, tivdarekê xwe dîtin, hazir bûîn.

гото́вность *ж.* hazirî *ж.*, hazirbûîn *ж.*, razîbûîn *ж.*; **боева́я ~** hazirbûîna bona şer (ceng).

гото́вый *прил.* yê hazir, yê hazirbûî.

гощу́ *см.* гости́ть.

грабёж *м.* talanî *ж.*, qelaşî *ж.*, ẍaret *м.*, berîdekirin *ж.*

граби́тель *м.* talançî *м.*, qelaş *м.*, ẍaretçî *м.*

граби́тельский *прил.* yê qelaşê, yê ẍaretê, yê talankirinê, yê berîdekirinê, yê talanîyê.

гра́бить, огра́бить, разгра́бить talan (qelaşî, berîde, ẍaret) kirin.

гра́бли *мн.* tirmix *ж.*, dirmix *ж.*

гравёр *м.* heqaq *м.*, gravêr *м.*, nitirçî *м.*

гра́вий *м.* kevirê hûr.

гравирова́ть *несов.* nitirandin.

гравиро́вщик *м.* heqaq *м.*, hostaê nitirandinê, nitirçî *м.*

гравю́ра *ж.* gravûr *ж.*, heqaqî *м.*, nitirandin *ж.*; neqaşî *ж.* (*рисунок*).

град *м.* 1. teîrok *ж.*, zîpik *ж.*; 2. *перен.* (*множество*) zef, bêḧesab, bêḧed; ⌣ **пи́сем** pirbûna nama.

гради́ция *ж.* parevekirin *ж.*, belakirin *ж.*, derecekirin *ж.*

градострои́тельство *с.* şîhersazî *ж.*, şîherçêkirin *ж.*, şîheravakirin *ж.*

градуи́рованный *прил.* yê derecekirî, yê gradûskirî.

гра́дус *м.* derece *ж.*, gradûs *м.*

гра́дусник *м. разг.* germpîv *м.*, têrmomêtr *ж.*

граждани́н *м.* bajarvan *м.*

граждани́нка *ж.* kulîfeta (jina) bajarvan.

граждани́нск||ий *прил.* yê bajarvanî, yê bajarvanê, yê bajarvanîyê; ⌣**ая слу́жба** qulixa bajarvanîyê; ⌣**ие права́** heqê bajarvanîyê; ⌣ **брак** zewaca bajarvanîyê; ⌣**ая война́** şerê bajarvanîyê.

граждани́ст||во *с.* bajarvanî *ж.*; ✧ **права́ ⌣ва** heqê hebûnê (emirkirinê).

грамм *м.* gram *м.*

грамма́тика *ж.* destûra (qanûnnama) ziman, gramêr *ж.*

граммати́ческий *прил.* yê gramatîkê, yê destûrê (yê qanûnê) ziman.

граммофо́н *м.* gramofon *ж.*

гра́мо||та *ж.* 1. telîm *ж.*, hînbûn *ж.*, zandarî *ж.*, sewdetî *ж.*; 2. (*документ*) name *ж.*, belg *м.*, berate *ж.*; **почётная ⌣** nama hurmetê; ✧ **верительные ⌣ты** *дип.* îtbarname *ж.*

гра́мотно *нареч.* bi zandartî, bi sewdetî, bi zanetî.

гра́мотность *ж.* telîmbûn *ж.*, zandarî *ж.*, hînbûn *ж.*, xwendkarî *ж.*

гра́мотный *прил.* 1. (*знающий грамоту*) yê hînbûî, yê zandar, yê xwendkar; 2. *перен.* (*умелый*) yê serxwe, yê pêşekar, yê hosta.

грана́т *м. бот.* ḧenar *ж.*

грана́та *ж. воен.* qumbar *ж.*; **ручна́я ⌣** qumbara desta; **противота́нковая ⌣** qumbara miqabilî tanka.

грана́тов||ый *прил.*: **⌣ое де́рево** dara ḧenarê; **⌣ая ко́рка** qalçika ḧenarê.

гранатомёт *м. воен.* tivinga qumbaravêj.

гранатомётчик *м.* qumbarçî *м.*

грандио́зный *прил.* yê ezîm, yê mezin.

гранёный *прил.* yê teniştdar, yê bitenişt.

грани́т *м.* kevirê xare (tetê), granît *м.*

грани́ть *несов.* ḧilû (pen) kirin.

грани́||ца *ж.* 1. sînor *м.*, ḧed *м.*, serḧed *м.*; **на ⌣це** ser sînor; 2. (*предел*) sînor *м.*; rê *ж.*; **перейти́ все ⌣цы** ji ḧemû rîya derketin; ✧ **за ⌣цу** li wîalî sînor; **из-за ⌣цы** ji welatê der, ji wîalî sînor; **за ⌣цей** li welatê dereke-da.

грани́чить *несов.* 1. hemsînorî bûîn; 2. *перен.* (*почти совпадать*) nêzîk (cînar) bûîn.

гра́нка *ж. полигр.* granke *ж.*, çap *ж.*

грань *ж.* 1. *см.* грани́ца 2; 2. teniṣt *ж.*, kêlek *ж.*, alî *м.*, teref *м.*

графа́ *ж.* xet *ж.*, cî *м.*, ciẍîz *м.*

гра́фик *м.* grafîk *м.*, cedwel *ж.*

гра́фика *ж.* 1. (*искусство*) qelemkêṣî *ж.*; 2. (*произведение*) honerîya grafîkê.

графи́н *м.* fîncan *ж.*, cêr *м.*, qirmîyê ṣûṣê.

графи́т *м. мин.* grafît *м.*, komir *ж.*

графи́ть *несов.* xet kiṣandin.

графи́ческий *прил.* yê xetkiṣandinê, yê grafîkê.

гра́ция *ж.* letîfî *ж.*, kaw û kubarî *ж.*, nazikî *ж.*, ẍijmekarî *ж.*

грач *м.* kelaxê (qijika) reṣ, qertel *м.*

грёб *см.* грести́.

гребёнка *ж.* ṣe *м.*; ◇ **стричь всех под одну́ ~ку** temam yek kirin, temam notila hev ẍesab kirin.

гре́бень *м.* 1. ṣe *м.*; 2. (*горы́*) piṣta (berpala) çîyê, qire *ж.*

гребе́ц *м.* qaîqçî *м.*, qaîqajovan *м.*

гре́бля *ж.* bêrkirin *ж.*, qaîqajotin *ж.*

гребно́й *прил.* yê qaîqajotinê.

гребу́ *см.* грести́.

гре́жу *см.* гре́зить.

грёза *ж.* xîyal *м.*, arzû *м.*

гре́зить *несов.* xîyal (arzû) kirin (*мечтать*); xewin dîtin (*во сне*).

гре́йдер *м. тех.* grêîdêr *м.* (*maṣîna erdrastkirinê*).

грек *м.* merîyê ẖurum *м.*, ûnan *м.*

гре́лка *ж.* germoke *ж.*, ẍîzê germkirinê.

греме́ть *несов.* 1. gure-gur (girme-girm) kirin; 2. *разг.* (*шуметь*) teqe-teq kirin; 3. *перен.* (*славиться*) bela bûn, eyan bûn, navdar bûn.

гремя́чий *прил.*: **~ая ртуть** avzîva teqandinê; **~ газ** gaza teqandinê; **~ая змея́** merê xiṣ xiṣok.

грести́ *несов.* (*bi bêrî*) qaîq ajotin.

греть *несов.* germ kirin; **~ во́ду** av germ kirin.

гре́ться *несов.* xwe germ kirin, germ bûîn.

грех *м.* guneh *м.*, eîb *ж.*, ar *ж.*; ◇ **с ~о́м пополам́** *разг.* bi zorê, bi zor du bela, ancaxî.

гре́цкий *прил.*: **~ оре́х** gûzê gir (Hurumistanê).

гре́ческий *прил.* yê Hurumistanê, yê Ûnanistanê.

гречи́ха *ж.* genimê qemer.

гре́чневый *прил.*: **~ая ка́ша** xaṣîla genimê qemer.

греши́ть *несов.* 1. gunehkarî kirin; 2. (*против чего-л.*) ṣaṣ bûîn, qelet kirin; **~ про́тив и́стины** ṣaṣ bûîn, rast negotin, miqabilî rastîyê bûn (çûîn).

гре́шник *м.* gunehkar *м.*

гре́шный *прил.* yê gunehkar.

гриб *м.* karî *ж.*; **бе́лый ~** karîya sipî; ◇ **расти́ как ~ы́** notila karîya ṣîn bûîn, zef zû ṣîn bûn.

грибно́й *прил.* yê karîya; **~ суп** ṣorba karîya.

гри́ва *ж.* poperîṣk *ж.* (*hespa*), biji *ж.*, bisk *ж.*

гри́венник *м.* deh kapêk.

грим *м.* grîm *м.*, kil *м.*

грима́са *ж.* devêxwexwarkirin *ж.*

грима́сничать *несов.* devê xwe xwar kirin.

гримёр *м.* grîmçî *м.*, kildar *м.*

гримирова́ть. загримирова́ть grîm kirin.

гримирова́ться, загримирова́ться xwe grîm kirin.

грипп *м. мед.* grîp *ж.*

гри́фель *м.* kils *ж.*

гри́фельный *прил.*: **~ая доска́** textê kilsnivisê.

гроб *м.* 1. tabût *ж.*; 2. *перен.* (*смерть*) mirin *ж.*; ◇ **вогна́ть в ~** *разг.* bi cezaret kuştin; **он**

стоя́л одно́й ного́й в ~у́ *разг.* ew pê bû (gorê bû).

гробни́ца *ж.* meẍber *м.*, kumeît *ж.*, kumbeît *ж.*

гробов||о́й *прил.* 1. yê tabûtê; 2. *перен.* yê mirinê; ◇ **до ~о́й доски́** heta mirinê.

гробовщи́к *м.* tabûtçî *м.*

гроза́ *ж.* 1. birq-birûsk *ж.*, birqetav *ж.*, bohûr *ж.*; 2. *перен.* (*нечто, внушающее страх*) bela *ж.*, teşqele *ж.*

гроздь *ж.* gûşî *м.*; **~ виногра́да** gûşîyê tirîya.

грози́ть, пригрози́ть 1. (*угрожать*) tirsandin; 2. *тк. несов.* (*внушать опасения*) xof (saw) bûîn.

гро́зный *прил.* yê bêrem, yê hêrs, yê bêînsaf (*безжалостный*); yê bixof (*страшный*).

грозов||о́й *прил.* yê birq-birûskê, yê birqetavê, yê bohûrê; **~ы́е облака́** ewrê birq-birûskê; **~ дождь** barana bi birq-birûsk.

гром *м.* gire-gir *ж.*; **~ греми́т** gire-gira ewirane; **~ и мо́лния** birq-birûsk *ж.*

грома́да *ж.* tiştê zef mezin (ezîm).

грома́дн||ый *прил.* yê ezîm, yê cesim, yê zef mezin; **~ого ро́ста** bejinbilind.

громи́ла *м.* qelaş *м.*, talançî *м.*, ẍaretçî *м.*

громи́ть, разгроми́ть 1. xirab kirin (*разорять, разрушать*); ẍaret (berîde) kirin (*грабить*); 2. *перен.* (*обличать*) eyan kirin; 3. (*врага*) alt kirin.

гро́мк||ий *прил.* 1. yê bilind, yê zîl; **~ го́лос** dengê bilind; 2. *перен.* (*известный*) yê navdar, yê meşhûr, yê eyan; **~ая сла́ва** navdarîya ezîm.

громкоговори́тель *м.* radîoa dengbilind.

громов||о́й *прил.*: **~ы́е раска́ты** gure-gura ewra.

громогла́сно *нареч.* bi dengê bilind; bieşkere (*публично*).

громогла́сный *прил.* yê zef bilind, yê bi dengê bilind; yê eşkere (*публичный*).

громозди́ть *несов.* danîn ser hev, ser hevda qûç kirin.

громозди́ться *несов.* ser hev (qûç) bûîn; bilind bûîn (*выситься*).

громо́здкий *прил.* yê bêfesal, yê giran û mezin.

громоотво́д *м.* birqgir *м.*

громыха́ть *несов.* gure-gur kirin (*о громе*); teqe-teq kirin (*о колёсах*).

гроссме́йстер *м. шахм.* grosmêîstêr *м.*, hostaê tema.

грот *м.* (*пещера*) şikeft *ж.*

гро́хнуть *сов. разг.* 1. (*уронить*) avêtin, êxistin; 2. (*ударить оземь*) erdê xistin.

гро́хнуться *сов. разг.* erdê ketin.

гро́хот *м.* gime-gim *ж.*, gire-gir *ж.*

грош *м. уст.* 1. (*монета*) kapêk *м.*; 2. *чаще мн.* (*ничтожная цена*) zef erzan; **~а́ ло́маного не сто́ит** *разг.* qet kapêkekî nehêjaîye.

грошо́вый *прил.* 1. yê zef erzan, yê mufte; 2. (*пустяковый*) yê hûr.

грубе́ть, огрубе́ть 1. (*о коже*) qaîm bûîn, terk daîn; 2. *перен.* (*становиться бессердечным*) dilkevir (bêrem) bûîn.

груби́ть, нагруби́ть xirab xeberdan; bêedebî (surtukî, bêrûmet) kirin (*быть невежливым*).

грубия́н *м.* merîyê deẍel; merîyê bêterb[îy]et (surtuk) (*невежа*).

гру́бость *ж.* deẍelî *ж.*; bêterb[îy]etî *ж.*, bêedebî *ж.*, surtuktî *ж.* (*невежливость*).

грубошёрстный *прил.* yê jî hirîya hişk (sert, qaîm).

гру́бый *прил.* 1. yê bêedeb, yê bêterb[îy]et, yê surtuk (*невежливый*); yê hilûnekirî, yê bêkemal (*неотёсанный*); 2. (*загрубелый*) yê terkdaî, yê qaîm; ◇ **~ подсчёт** hesabê teẍmîntî.

гру́да *ж.* qûç *ж.*

груди́нка *ж.* sersîng *ж.*

грудн‖о́й *прил.*: ~ **ребёнок** zara şîrxwer; **~а́я кле́тка** *анат.* sîng *м.*, qefesa (defa) sîng.

груд‖ь *ж.* sîng *м.*; bistan *м.*, çiçik *м.*, berûk *ж.* (*женская*); **дать ребёнку ~** zar çiçik dain, zar şîr dan, çiçik dan zarê; **корми́ть ~ью** şîr dain; **отнима́ть от ~й** şîre vekirin, ji çiçik qetandin.

гружу́ *см.* грузи́ть.

груз *м.* bar *м.*, pişti *ж.*

грузи́н *м.* merîyê gurc.

грузи́нский *прил.* yê gurcî, yê gurckî; **~ язы́к** zimanê gurckî (gurca).

грузи́ть, нагрузи́ть, погрузи́ть bar kirin.

грузи́ться, нагрузи́ться, погрузи́ться hatin barkirinê, xwe bar kirin.

гру́зный *прил.* yê giran (*тяжёлый*); yê xurt (*тучный*); yê qalin, yê qelew (*толстый*).

грузови́к *м.* avtoa barkêş.

грузово́й *прил.* yê barkişandinê, yê barbirinê.

грузооборо́т *м.* birin-anîna (gera) bara.

грузоподъёмность *ж.* qeweta barhilkişandinê, barhildan *ж.*

гру́зчик *м.* hemal *м.*, barkêş *м.*

грунт *м.* erd *м.*, xwelî *ж.*, binger *ж.*

грунтов‖о́й *прил.* yê xwelîyê, yê erdê, yê bingerê; **~а́я доро́га** rîya xwelîyê.

гру́ппа *ж.* deste *ж.*, tofek *ж.*, berek *ж.*, bir *ж.*

группирова́ть, сгруппирова́ть 1. deste-deste kirin; 2. (*собирать вокруг кого-л., чего-л.*) top (teşkîl, berev) kirin.

группирова́ться, сгруппирова́ться top (deste-deste, teşkil) bûîn.

группиро́вка *ж.* deste *ж.*, kom *ж.*, komle *ж.*, tofek *ж.*, bir *ж.*

групповщи́на *ж.* firqebûn *ж.*, tofektî *ж.*

грусти́ть *несов.* dilteng (dilxem) bûîn.

гру́стный *прил.* yê dilteng, yê dilxem (*полный грусти*); yê medekirî, ye pirçûkirî (*с грустным видом*)

грусть *ж.* deltengî *ж.*, xem *ж.*, bêbeşerî *ж.*

гру́ша *ж.* 1. (*дерево*) dara hurmê; 2. (*плод*) hurmê *ж.*

грущу́ *см.* грусти́ть.

гры́жа *ж. мед.* navqetandin *ж.*, taqurî *м.*

грызть *несов.* kotin.

грызу́н *м. зоол.* ĥeîwanê dirantûj.

гряда́ *ж.* 1.: **огоро́дная ~** şova (kola) bostanê; 2.: **го́рная ~** rêza (şixta) çîya.

грядущее *с.* wextê wê bê, axirî *ж.*

грядущий *прил.* yê wextê wê bê; ✧ **на сон ~** pêşîya xewê, berî razanê.

грязни́ться, загрязни́ться xwe ĥerî (xwe qirêj, xwe çamûr) kirin.

гря́зный *прил.* yê qilêr, yê qirêj, yê ĥerî, yê netemîz, yê pîs; yê mirdar.

грязь *ж.* ĥerî *ж.*, çamûr *ж.*, qirêj *ж.*, qilêr *ж.*; ✧ **не удари́ть лицо́м в ~** rûreş nebûîn.

гря́нуть *несов.* 1. gire-gir (girme-girm) kirin; 2. (*о смехе*) tîqe-tîq kirin.

губа́ I *ж.* lêv *ж.*; **ве́рхняя ~** lêva jorîn; **ни́жняя ~** lêva jêrîn.

губа́ II *ж. геогр.* dev *м.*, boxaz *ж.*

губерна́тор *м.* ĥakim *м.*, welî *м.*, qaîmeqam *м.*

губе́рния *ж. уст.* qeza *ж.*, welat *м.*

губи́тельный *прил.* yê qirkirinê; yê kuştinê (*убийственный*).

губи́ть, погуби́ть qir kirin (anîn); kuştin (*убивать*); xirab kirin (*портить*).

гу́бка *ж.* ebir *м.*

губн‖о́й *прил.* yê lêva; **~а́я пома́да** dermanê lêva.

гуде́ть *несов.* (*о гудке*) borîyê xistin.

гудка́ *см.* гудо́к.

гудо́к *м.* borî *ж.*

гужево́й *прил.*: ~ **тра́нспорт** neẍla erebê.

гужо́м *нареч.* pê erebê, bi erebê.

гужу́ *см.* гуде́ть.

гул *м.* qalmeqalm *ж.*, qare-qar *ж.*, deng *м.*

гуля́ка *м.* merîyê lotî.

гуля́нье *с.* ger *ж.*, çûîn-hatin *ж.*, gerîn *ж.*, seîran *ж.*; **наро́дное** ~ gera cimaetîyê.

гуля́ть *несов.* gerîn, çûîn-hatin, seîran kirin.

гуманизм *м.* hûmanîzm *ж.*, merivatî *ж.*, însanẖizî *ж.*

гуманист *м.* hûmanîst *м.*, merîyê însanẖiz (merivẖiz).

гуманита́рный *прил.* yê însanẖizîyê.

гума́нность *ж.* însanî *ж.*, merivẖizî *ж.*, însanẖizî *ж.*

гума́нный *прил.* yê însanẖiz, yê merivẖiz.

гумно́ *с. с.-х.* bêder *ж.*

гу́рия *ж. миф.* horî *ж.*

гурт *м.* kerî-sûrî *м.*, deste *ж.*, bir *ж.*, birek *ж.*

гурто́м *нареч.* biserẖev, bicarekêva, bitopekî, birekî, bitomerî.

гурьб||а́ *ж.* deste *ж.*; ~**о́й** tevẖev, hevra.

гу́сеница *ж.* 1. *зоол.* kurmê bostana; 2. *тех.* zincîra çerxê (tekerekê).

гу́сеничный *прил.* yê zincîra çerxdar (çerxê); ~ **тра́ктор** traktora bi zincîra çerxdar (çerxzincîr).

густе́ть *несов.* tir bûîn; qaîm bûîn (*твердеть*).

густо́й *прил.* 1. (*частый*) yê nezîkî hev; ~ **лес** meşê terî; 2. (*насыщенный*) yê tîr; ~ **суп** şorba (avsîra) tîr.

густонаселённый *прил.* yê siẍlet, yê pireẖlîyê.

густота́ *ж.* tîrbûn *ж.*

гусы́ня *ж.* qaza mê.

гусь *м.* qaz *м.*, bet *м.*

гусько́м *нареч.* peîhev, dûhev.

гутали́н *м.* gûtalîn *ж.*; dermanê sola (*сапожная мазь*).

гу́ща *ж.* 1. tort *ж.*; 2.: ~ **ле́са** orta mêşe.

Д

да I *частица* 1. (*утвердительная*) erê, belê; **да, э́то ве́рно** erê, ewyek raste; 2. (*неужели, разве*): **он прие́хал.** — **Да?** ew hatîye. Erê?; **да ну?** îja usa?, rastî?; 3. *в знач. вводн. сл.*: **да, вот что!** (*чуть было не забыл*) erê ew mabû wekî bîra min biçûîya; 4. (*усилительная*): **да что вы!** ûn çi dibêjin!; 5. (*вопросительная — при отклике*) ha, çi, erê; **Това́рищ!—Да? что хоти́те?** Hevalo!—çi? ûn çi dixwazin?

да II *частица* (*пусть*) *переводится повелительным наклонением*: de, axir, bira; **да говори́ же!** de bêje!; **да здра́вствует!** bira xweş be!, bira saẍ be!

да III *союз* 1. (*соединительный*) û, hem; ...jî (*тоже*); **я да ты** ez û tu; 2. (*противительный*) hema, feqet, lê; **я бы пришёл, да не могу́** ezê bihatama, lê nikarim; ✧ **да и...** *разг.* qet...; ...**да и то́лько** *разг.* ... û hewe, ... û tenê.

дава́||ть, дать 1. *в разн. знач.* daîn, dan; anîn (*приносить*); ~ **кни́гу** kitêb daîn; ~ **отсро́чку** milhet (molet) daîn; ~ **пра́во** heq daîn; ~ **приме́р** sermeşq daîn, rê nîşandin; ~ **напрока́т** daîn kirê, kirê daîn; ~ **взаймы́** deynî daîn, qerz dan; ~ **уро́ки** ders daîn; ~ **уве́ренность** omîd daîn; ~ **доро́гу** rê daîn; ~

сло́во 1) (*оратору*) xeber daîn; 2) (*обещать*) soz daîn; **не ~ пересдержа́ть** molet (fesal) nedaîn; **~ распоряже́ние** emir kirin, ferman daîn; 2. (*позволять*) hiştin, îzn daîn; **~ разреше́ние** hiştin, îzn daîn; ◇ **~ кля́тву** sond xwerin, qesem kirin; **~ знать** elamet kirin; **~ поня́ть** daîn femkirinê; **~ свобо́ду** aza kirin, azaî daîn; serbest kirin (*развязывать руки*); **~ возмо́жность** mecal daîn; rê daîn (*не препятствовать*); **~ при́быль** feîde (kar) daîn; **~ [свой] результа́ты** ħasil (netîce) daîn; **~ си́лу** qewet daîn; **~ согла́сие** qebûl kirin, qaîl bûn; soz daîn (*обещать*); **~ показа́ния** şehdetî kirin; **~йте начнём!** werin, em destpêbikin!; **~йте чита́ть!** werin, em bixûnin!

дава́ться, да́ться hatin daînê.

дави́ть, раздави́ть, удави́ть 1. *тк. несов.* basme kirin, guvaştin, şidandin (*сжимать, нажимать*); tepisandin, pêpes kirin (*топтать*); 2. *тк. несов.* (*мять*) qurçimandin, helçiqandin; 3. (*выжимать*) ħincirandin; **~ виногра́д** tirî ħincirandin; 4. *тк. несов.* (*истреблять*) qir (xeza) kirin, kuştin; 5. *тк. несов. перен.* (*угнетать*) zulum (xezeb) kirin; 6. (*душить*) fetisandin, xeniqandin; 7. *тк. несов.* (*давить — об обуви*) kutan, guvaştin.

дави́ться 1. *сов.* удави́ться xwe guvaştin (darda kirin); 2. *сов.* подави́ться *разг.* (*глотать с трудом*) bi zorê daqurçandin, berda maîn, bi zorê qurt kirin

да́вка *ж.* hevdevdan *ж.*, qerebalix *ж.*, heşir-meşir *ж.*

давле́ни||е *с. прям., перен.* guvaştin *ж.*; *перен.* zor *ж.*; **высо́кое ~** guvaştina bilind; **пони́женное ~** guvaştina nimz; **кровяно́е ~** guvaştina xûnê; **~ во́здуха** guvaştina hewê; **ока́зывать ~** guvaştin; ◇ **под ~ем...** bin guvaştina...

давлю́ *см.* дави́ть.

да́вний *прил.* yê zûda; yê kevin (*старый*); yê qedîm, yê bastanê (*древний*).

давно́ *нареч.* zûda, li berêda; **~ ли?** zûda bû?

давнопрошедш||ий *прил.*: **~ее вре́мя** *грам.* wextê berê zûda bihirî.

да́вност||ь *ж.* 1. zûdaî *ж.*; qedîmî *ж.*, bastanî *ж.* (*древность*); 2. *юр.* pirwextî *ж.*; **срок ~ти** moleta pirwextîyê.

давны́м-давно́ *нареч.* zef zûda, berê-berêda.

дагеста́нец *м.* eħlê Daxistanê.

дадим, дашь *см.* дава́ть.

да́же *частица* ħeta, ħeta ...jî; **~ он был там** ħeta ewjî wêderê bû.

да́лее *нареч.* dûrtir; ◇ **и так ~** û yê maîn, û yê dinê.

далёк||ий *прил.* 1. (*отдалённый*) yê dûr, yê beîd; **~ое про́шлое** zemanê zef dûr; dewra qedîm (*древность*); 2. (*длинный*) yê dirêj, yê dûr; **~ путь** rîya dûr; 3. *перен.* (*чуждый*) yê xerîb, yê bîganê, yê ne ji me.

далеко́ *нареч.* dûr, beîd; **о́чень ~** zef dûre; **~ не всё** ne temam; **~ за по́лночь** berbanga sibê.

даль *ж.* misafet *ж.*, dûrî *ж.*, rast *ж.*; **э́то така́я ~** ew zef dûre.

дальневосто́чный *прил.* yê mişriqa dûr.

дальне́йш||ий *прил.* 1. (*продолжающийся*) yê pêşda, yê dûrtir; **~ее разви́тие** pêşdaçûînâ ku wê bê; 2. (*последующий*) yê paşîyê; **~ая рабо́та** xebata paşîyê; **в ~ем** paşê; ji fro şûnda, îda, ji vir-hada (*впредь*).

да́льн||ий *прил.* yê dûr, yê beîd; **~ие ро́дственники** pizmamê dûr.

дальнобо́йность *ж.* 1. (*расстояние*) dûravêjî *ж.*, dûragirkirin *ж.*; 2. (*дальность*) dûrî *ж.*

дальнобо́йн||ый *прил.*: **~ое ору́дие** topa dûravêj.

дальнови́дность *ж.* pêşdanihêrîn *ж.*, dûrbînî *ж.*, aqûbetzanbûn *ж.*

дальнови́дный *прил.* yê pêşdabînîyê, yê dûrbîn.

дальнозо́ркий *прил.* yê dûrbîn.

дальнозо́ркость *ж.* dûrbînî *ж.*

дальноме́р *м.* dûrpîv *м.*

да́льность *ж.* dûrî *ж.*; menzîl *ж.* (*расстояние*).

дальтони́зм *м. мед.* daltonizm *ж.*

да́льше 1. (*сравнит. ст. от* далеко́ *и* далёкий) dûrtir; **идти́ ~** pêşda çûn; **не ~...** ne dûrtir...; **чем ~, тем...** her çi dûrtir, haqa..., çiqa dûrbe, haqa...; **гора́здо ~** deha dûrtir (dûr); **всё ~ и ~** dûrtir û dûrtir; 2. (*затем*) paşê; ◇ **~!** pêşda!

дам *см.* дать.

да́ма *ж.* 1. xanûm *ж.*, bano *ж.* (*госпожа*); kulfet *ж.*, jin *ж.* (*женщина*); 2. *карт.* qîz *ж.*; ◇ **~ сéрдца** *шутл. разг.* dilketî *ж.*, meşûqe *ж.*, domam *ж.*

да́мба *ж.* bend *ж.*, bênda avê.

да́мск||ий *прил.*: **~ое пла́тье** kincê (dêrê) jina; **~ портно́й** têrzîyê kincê jina.

да́нник *м* (*о стране*) borcdar *м.*, deyndar *м.*, bacdar *м.*

да́нные *мн.* elametî *м.*, delîl *м.*; esas *м.* (*основания*); **цифровы́е ~** elametîyê reqema.

да́нн||ый 1. *прич.* yê hatîye daînê, yê hazir; 2. *прил.* (*этот*) ev, ewa, vê; **в ~ моме́нт** niha, vê sehetê, vê lezê; **в ~ом слу́чае** li vê yekêda, li vê çaxî; **~ое предприя́тие** ev karxane.

дань *ж.* 1. *ист.* malîyet *м.*, herac *м.*, bac *ж.*; 2. *перен.* (*должное*) deyn *м.*, heq *м.*; **~ дру́жбе** bona xatirê hogirtîyê.

дар *м.* 1. (*подарок*) pêşkêşî *ж.*, bexşîş *ж.*; 2. (*способность*) feresat *м.*, karinaî *ж.*, qewet *ж.*, qudret *ж.*

дарвини́зм *м. биол.* darvînîzm *ж.*

дари́ть, подари́ть 1. daîn, bexşandin, pêşkêş (xelat) kirin; rewa kirin (*награждать*); 2. (*удостаивать*) laîq (serfraz) kirin.

дармое́д *м. разг.* muftexwur *м.*; tembel *м.* (*лентяй*).

дарова́ние *с.* aqil *м.*; feresat *м.* (*способность*).

дарова́ть *несов. и сов.* bexşandin, daîn, pêşkêş kirin.

дарови́тый *прил.* yê biaqil, yê biferesat.

дарово́й *прил. разг.* 1. (*бесплатный*) yê mufte, yê bêperê, yê bêheq; 2. (*напрасный*) yê badîhewa.

да́ром *нареч. разг.* 1. (*бесплатно*) bêheq, bêpere; 2. badîhewa, cîyê belasebeb (*напрасно*); bêfeîde (*бесполезно*); **тра́тить вре́мя ~** badîhewa wext unda kirin (wext zeîkirin); **труди́ться ~** badîhewa şuxul kirin.

даст *см.* дава́ть.

да́та *ж.* tarîx *ж.*, roj *ж.*, wext *м.*

дати́рованный *прич., прил.* yê tarîxkirî, yê nîşankirî.

дати́ровать *несов. и сов.* tarîx kirin; roj nîşan kirin (*указывать дату*).

да́тский *прил.* yê Danmarkê.

датча́нин *м.* merîyê Danmarkê.

дать *сов. см.* дава́ть.

да́ча *ж.* zozan *ж.*

да́чник *м.* zozançî *м.*, zozanvan *м.*

да́чный *прил.* yê zozanê.

дашь, даю́ *см.* дава́ть.

два *числ.* du, dudu; **две-три кни́ги** du-sê kitêb; **в двух шага́х** rîya (menzîla) du gava; **в два счёта** wê sehetê, zef zû, lezekêda.

двадцатиле́тие *с.* (*годовщина*) bîstsalî *ж.*, bîstsal *ж.*

двадца́тый *числ.* yê bîstî, yê bîst.

два́дцать *числ.* bîst.

два́жды *нареч.* du cara; **~ два — четы́ре** du cara dudu — çare;

~ Геро́й Сове́тского Сою́за Egîtê Tifaqa Sèwrê yê ducarî.

две *см.* два.

двенадцатипе́рстн||ый *прил.*: **~ая кишка́** *анат.* rûvîya donzdehtilî.

двена́дцатый *числ.* yê donzdeh.

двена́дцать *числ.* donzdeh.

дверно́й *прил.*: **~ порóр** şêmîka derî; **~ ключ** kilîta derî.

две́рца *ж.* derî *м.*

дверь *ж.* der *м.*, derî *м.*; dergê ĥeîyatê (*с улицы во двор*); derê xanî (*в дом*); **входна́я ~** derê derdaçûînê (derbazbûnê); **стучáть в ~** derî xistin; **запира́ть ~** derî dadan; ✧ **полúтика откры́тых ~éй** seyasetîya dergê vekirî; **при закры́тых ~я́х** piştderîyê girtî, binalî; **широко́ откры́ть ~и** hiştin, derî fire vekirin, rê daîn.

две́сти *числ.* dusud.

дви́гатель *м.* motor *ж.*, maşîne *ж.*, leqande *ж.*; **га́зовый ~** motora gazê; **~ вну́треннего сгора́ния** motora daşewitandina hundur.

дви́гать, дви́нуть 1. *тк. несов.* hereket daîn (*приводить в движение*); pêşda daîn (birin) (*вперёд*); bezaftin, devdan (*толкать*); 2. (*шевелить*) ĥejandin, leqandin.

дви́гаться, дви́нуться ĥejîn; leqîn (*трогаться, приходить в движение*); çûîn (*ходить*); **~ вперёд** pêşda çûîn.

движе́н||ие *с.* 1. hereket *ж.*, leqandin *ж.*, ĥejandin *ж.*; ĥej *ж.* (*общественное*); **~ вперёд** pêşdaçûîn *ж.*, leqandina pêşda; **рабóчее ~** ĥeja xebatçîya (pala); **революцио́нное ~** ĥeja înqlabîyê; **~ в защи́ту ми́ра** ĥeja bona xwekirina edilaîyê; **национáльно-освободúтельное ~** ĥeja miletîyê û azaîyê; **ускóренное ~** ĥeja (hereketa, leqandina) zû (lez); **замéдленное ~** ĥeja (hereketa, leqandina) dereng; **приводúть в ~** daîn ĥejandinê; **приходúть в ~** ĥejîn, hatin [ĥalê] ĥejandinê; 2. (*уличное*) çûîn-hatin *ж.*; **прáвила у́личного ~ия** qaîdê çûîn-hatîna soqaqa (kûça).

дви́жимость *ж.* malê leqandinê.

дви́жим||ый *прил.*: **~ое иму́щество** malê leqandinê.

дви́жущ||ий *прич., прил.*: **~ая сúла** qeweta pêşdabirinê (leqandinê).

дви́нуть *сов. см.* дви́гать 2.

дви́нуться *сов. см.* дви́гаться.

дво́е *числ.* 1. dudu, ĥerdu; du nefer, du merî (*о живых существах*); **~ бра́тьев** du bira; **~ су́ток** du şeva; **кто э́ти ~?** ew ĥerdu kênê?; 2. (*две пары*) du cot; **~ но́жниц** du cot meqes; ✧ **на свои́х на двои́х** *разг. шутл.* bi peya, bi lingê xwe.

двоевла́стие *с.* duĥukumatî *ж.*, dudîwantî *ж.*

двоето́чие *с. грам.* duniqitk *ж.*

двои́||ться *несов. безл.*: **у меня́ ~тся в глаза́х** ber bi çevê min dudu dibe.

двои́х *см.* два, две.

дво́йка *ж.* 1. (*цифра*) dudu *ж.*, reqema duda; 2. (*школьная отметка*) sist, dudu (*nîşan*); 3 *карт., спорт.* dudu *ж.*

двойни́||к *м.* merîyê bi rengê hevda; **~кй** du merîyê notila hev.

двойн||о́й *прил.* 1. (*вдвое больший*) yê ducarî, yê duqet; **~áя по́льза** feîda ducarî, kara duqet; 2. (*сдвоенный*) yê duber; yê puta (*о материи*); ✧ **~áя игра́** îstina dualî.

дво́йня *ж.* cêwî *м.*

дво́йственность *ж.* dualî *ж.*, dutereîî *ж.*; durûî *ж.* (*двуличие*).

дво́йственн||ый *прил.* yê dutereî, yê ducûre; yê durû (*двуличный*); **~ая полúтика** seyasetîya ducûre (duterefe); **~ое отноше́ние** helaqetîya ducûre.

двор *м.* 1. ĥeîyat *ж.*, ĥewşe *ж.*; 2. (*крестьянское хозяйство*)

mal *м.*; **в э́том колхо́зе сто ∽ о́в** li vê kolxozêda sed malin (male); 3. (*царский*) derbir *м.*, bargahê padşeh; qesr *ж.*; sera *ж.*; ✧ **постоя́лый ∽** kervansera *ж.*; **моне́тный ∽** zerrabxane *ж.*, perexane *ж.*, polxane *ж.*; **ско́тный ∽** axil *м.*, gom *м.*; **ни кола́, ни ∽а́** *погов.* bêmal û bêhal, tût--rût; **на ∽е́** (*вне помещения*) derva.

дворе́ц *м.* qesr *ж.*, qesir *ж.*, derbir *м.*, seraî *м.*, emaret *м.*, bargah *м.*; **Дворе́ц труда́** Qesra Xebatê; **Дворе́ц Сове́тов** Qesra Sovêta.

дво́рник *м.* ĥeîyatçî *м.*, ĥewşeçî *м.*

дворня́га *ж.*, **дворня́жка** *ж.* seê ĥeîyatê.

дворцо́вый *прил.* yê qesrê, yê derbir, yê bargah; ✧ **∽ перево́рот** welgerandina textê padşeh.

дворя́нин *м.* esilzade *м.*, maqûl *м.*

дворя́нский *прил.* yê esilzade, yê maqûl.

двою́родн||ый *прил.*: **∽ брат** birê neĥelal, kurmetê ĥelal (*сын сестры отца*); kurmet *м.* (*сын сестры отца или матери*); kurxalê ĥelal, kurap *м.* (*сын брата отца*); kurxal *м.* (*сын брата матери*); **∽ая сестра́** qîzap *ж.* (*дочь брата отца или матери*); qîzmet *ж.* (*дочь сестры отца или матери*).

двоя́кий *прил.* yê duteref, yê dualî, yê ducûre, yê duta.

двояковы́пуклый *прил.* yê ducara tewandî.

двугла́вый *прил.* yê duserî, yê duser.

двугорбый *прил.*: **∽ верблю́д** devê dupişt (dupalan).

двугри́венный *м. разг.* bîst kapêk.

двузна́чный *прил. мат.* yê dunîşan.

двукра́тный *прил.* yê ducarî, yê ducara.

двули́чие *с.* durûî *ж.*, durûtî *ж.*, gevezetî *ж.*

двули́чный *прил.* yê durû, yê gevezê.

двум *см.* два, две.

двумста́м *см.* две́сти.

двуно́гий *прил.* yê dupê, yê duling.

двуро́гий *прил.* yê dustire, yê duşax.

двуру́шник *м.* merîyê durû; xaîn *м.* (*предатель*).

двуру́шничать *несов.* durûî (gevezetî) kirin; xaînî kirin (*совершать предательство*).

двуру́шническ||ий *прил.*: **∽ая поли́тика** seyasetîya durûtî; seyasetîya xaînî (*предательская*).

двуру́шничество *с.* durûî *ж.*, durûtî *ж.*

двусмы́сленность *ж.* dunêtî *ж.*, dufikirî *ж.*, dumenî *ж.*

двусмы́сленный *прил.* yê dumenî, yê dunêtî.

двуспа́льн||ый *прил.*: **∽ая крова́ть** textê xewê duneferî.

двуство́лка *ж.* tivinga dulûle.

двусти́шие *с.* dubeîtî *ж.*

двусторо́нний *прил.* yê dutereîî, yê dualî; **∽ догово́р** qirarê dualî.

двух *см.* два.

двухгоди́чный *прил.* yê dusale.

двухгодова́лый *прил.* yê dusalî.

двухдне́вный *прил.* yê durojî (*о возрасте*); yê duroja (*о сроке*).

двухколе́йн||ый *прил.*: **∽ая желе́зная доро́га** rîya hesine duteref (çiq).

двухколёсный *прил.* yê dutekerek.

двухле́тний *прил.* yê dusale (*о сроке*); yê dusalî (*о возрасте*).

двухме́стный *прил.* yê ducî, yê duneferî.

двухме́сячный *прил.* yê dumehî (*о возрасте*); yê dumeha (*о сроке*).

двухмото́рный *прил.* yê dumotorî.

двухнеде́льный *прил.* yê duheftê.

двухпала́тн||ый *прил. полит.* yê duqismet, yê ducilsê; ~ая систе́ма sîstêma hukumdarîya ducilsa (duîclasî).

двухсо́т *см.* две́сти.

двухсотле́тие *с.* dusudsalî *ж.*, duqurne *ж.*

двухсо́тый *числ.* yê dusudî, yê dusud.

двухцве́тный *прил.* yê dureng.

двухэта́жный *прил.* yê duqet, yê dutaq.

дебати́ровать, продебати́ровать mozakirê kirin.

деба́ты *мн.* mozakirê *ж.*

де́бет *м. бухг.* deyn *м.*; ~ и кре́дит daîn-standin *ж.*, çixar û meya.

дебито́р *м.* deyndar *м.*

дебо́ш *м. разг.* cencel *ж.*, qalmeqalm *ж.*, lihevxistin *ж.*, şer-dew *м.*

де́бри *мн.* 1. (*лесная чаща*) kûraîya mêşe; 2. *перен. разг.* (*глухой край*) cîyê xewle (ker û lal).

дебю́т *м.* dêbût *ж.*

дева́ *ж. поэт.* zerî *ж.*, qîz *ж.*, bakire *ж.*; ✧ ста́рая ~ qîza pîr.

девальва́ция *ж. эк.* nimzbûîna qîmeta pera.

дева́ть, деть 1. (*класть, прятать*) danîn (*cîkî*), hildan, veşartin; **куда́ ты дел мою́ кни́гу?** te kitêba min çawa kir?; **я куда́-то дел свою́ очки́** nizam min berçevkê xwe danîne kêderê; 2. (*расходовать, тратить*) xerc (mesref) kirin.

дева́ться, де́ться: куда́ де́лись мои́ ту́фли? solê min çawa bûn?; **не зна́ю куда́ де́ться** nizam kuda herim; **куда́ он де́лся?** ew kuda betavebû?

де́верь *м.* tî *м.*

девиз *м.* şêar *м.*, dêvîz *ж.*

девица *ж.* qîz *ж.*, bakire *ж.*, zerî *ж.*

де́вочка *ж.* qîz *ж.*, qîzik *ж.*

де́вственность *ж.* qîztî *ж.*, bakiretî *ж.*

де́вственный *прил. прям., перен.* yê bakirê, yê degmîşnebûî, yê destnedaî.

де́вушка *ж.* qîz *ж.*, bakire *ж.*, zerî *ж.*

девяно́сто *числ.* nod.

девяностоле́тний *прил.* yê nodsalî (*о возрасте*)); yê nodsale (*о сроке*); ~ старик kalê nodsalî.

девяно́стый *числ.* yê nod, yê nodî.

девятикра́тный *прил.* yê nehcara.

девятисо́тый *числ.* yê nehsed.

девя́тка *ж.* 1. (*цифра*) reqema neha, neh *ж.*; 2. *карт.* neh *ж.*

девятна́дцатый *числ.* yê nozdeh.

девятна́дцать *числ.* nozdeh.

девя́тый *числ.* yê neha.

де́вять *числ.* neh.

девятьсо́т *числ.* nehsed.

дегаза́ция *ж.* ji gazê temîzkirin *ж.*, bêgazkirin *ж.*

дегази́ровать *несов.* bêgaz kirin, ji gazê temîz kirin.

дегенера́т *м.* merîyê bêhiş (kem aqil, şewişî).

дегенерати́вный *прил.* yê bêhiş, yê kemaqil, yê şewişî.

дёготь *м.* qetran *ж.*

деграда́ция *ж.* nimzbûîn *ж.*, ketin *ж.*, daketin *ж.*, alçaxbûn *ж.*

дегуста́ция *ж.* cêribandin *ж.*, temkirin *ж.*

дед *м.* kalê *м.*, bavpîr *м.*, kalemêr *м.*

де́довский *прил.* yê kal û bava.

дедукция *ж.* dêdûksîya *ж.*

де́душка *м.* (*обращение*) kalo *м.*, kaliko *м.*

дееспосо́бность *ж. юр.* karinaî *ж.*, qewet *ж.*, emelî *ж.*, serwextî *ж.*

дееспосо́бный *прил. юр.* yê biqewet, yê biemel, yê serxwe.

дежу́рить *несов.* nobedarî (kişîkî) kirin.

дежу́рный *прил.* 1. yê nobedar; ~ офице́р zapitê nobedar;

2. *в знач. сущ. м.* kişîkçî *м.*, nobedar *м.*

дезавуи́ровать *несов. и сов.* miqabil (nerazî) bûîn, qebûl nekirin.

дезерти́р *м.* revoke *м.*, firare *м.* (*беглец*); qaçaxê eskerîyê (*из войск*).

дезерти́рство *с.* revîn *ж.*, bezîn *ж.*, firarî *ж.*; qaçaxî ji eskerîyê (*из войск*).

дезинфе́кция *ж.* dêzînfeksîon *ж.*

дезинфици́ровать *несов. и сов.* dêzînfeksîon kirin; temîz kirin (*очищать*).

дезинформа́ция *ж.* elametîya nerast, şaşkirin *ж.*

дезинформи́ровать *несов. и сов.* nerast daîn (xirab dan) serwextkirinê, şaş kirin.

дезорганиза́тор *м.* xirabkar *м.*, bêtertîbçî *м.*

дезорганиза́ция *ж.* 1. (*действие*) beteşkîlkirin *ж.*, bêtertîbkirin *ж.*; 2. xirabkarî *ж.*; bêtertîbî *ж.* (*беспорядок*); bêteşkîlî *ж.* (*развал*).

дезориента́ция *ж.* şaşkirin *ж.*, ji rê derxistin.

дезориенти́ровать *несов. и сов.* şaş kirin, ji rê derxistin.

де́йственность *ж.* emelî *ж.*, qewet *ж.*

де́йственный *прил.* yê biemel, yê biqewet.

де́йств‖ие *с.* 1. emel *м.*, kirin *ж.* (*поступок*); hereket *ж.* (*движение*); destpêkirin *ж.* (*начинание*); **привести́ в ~** daîn xebatê; **вступи́ть в ~** dest pêbûîn; **совме́стные ~ия** hemkarî *ж.*, kirinaîya tevaviyê; **вое́нные ~ия** emelê cengîyê, şer *м.*; **~ кишéчника** navçûîn *ж.*, lingxebitîn *ж.*; **свобо́да ~ий** azaîya emel; 2. (*влияние*) tesîr *ж.*, bendûr *ж.*; 3. (*эффективность*; *тж. юр.*) qewetkirin *ж.*, zor *ж.*, êfêktî *ж.*; **ввести́ в ~** (*напр. закон*) qanûn kirin; **срок ~ия** moleta emel, wede *м.*; **коэффициéнт полéзного ~ия** koefisîênta xebata bifeîde; 4. *театр.* perde *ж.*; 5. *мат.* emel *м.*; **четы́ре ~ия арифме́тики** çar emelê arîtmêtîkê.

действи́тельно *нареч.* 1. rastî; 2. *в знач. вводн. сл.* erê, raste, belê.

действи́тельность *ж.* 1. hebûn *ж.*, heîn *ж.* (*реальность*); heqîqetî *ж.* (*истина*); 2. *юр.* îtbar *м.*

действи́тельн‖ый *прил.* 1. yê heqî, yê rastî; 2. *юр.* yê biîtbar; ◇ **~ая пое́нная слу́жба** qulixa eskerîyê ya heqîyê.

де́йств‖овать, подéйствовать 1. *тк. несов.* emel kirin; şuxul kirin, xebitîn (*работать*); **то́рмоз не ~ует** tormoz naxebite; **маши́на хорошо́ ~ует** maşîne pak dixebite; **телефо́н не ~ует** têlêfon naxebite; **~ оружием** sîlîh daîn xebatê; 2. (*воздействовать*) berge girtin; tesîr kirin (*влиять*); alîkarî kirin (*помогать*); **лека́рство не ~ует** derman berge nagire; **хорошо́ ~** (*на кого-л.*) daîn ser (*keseki*); 3. (*иметь силу*; *тж. юр.*) qewet hebûn.

де́йствующ‖ий *прич., прил.* yê biemel; **~ая си́ла** qeweta biemel; **~ие зако́ны** qanûnê biemel; **~ая а́рмия** eskerê cengîyê; **~ее лицо́** lîstekçî *м.*

декабри́ст *м. ист.* dêkabrîst *м.*

дека́брь *м.* dêsambr *ж.*, kanûna ewil.

дека́брьский *прил.* yê dêsambrê, yê kanûna ewil.

дека́да *ж.* dêkad *ж.*, dehrojî *ж.*; **втора́я ~** dêkada duda; **~ арме́нской литерату́ры и иску́сства** dêkada lîtêratûrê û honerê ya Êrmenîstanê.

дека́н *м.* dêkan *м.*, mezinê fakûltê.

деклама́тор *м.* xwendkar *м.*

мобилизо́ванный *прил.* yê mobîlîzêkirî, yê berevkirî; yê gazîkirî (*призванный*).

мобилизова́ть *несов. и сов.* mobîlîzasîûn kirin; esker top kirin (*войска*).

мог *см.* мочь.

моги́||ла *ж.* mezel *ж.*, gor *ж.*, tirb *ж.*, meẍber *м.*; ✧ **на краю́ ~лы** li devê gorê; **свести́ в ~лу** kirin gorê; **найти́ себе́ ~лу** gora xwe dîtin, ketin gorê.

моги́льный *прил.* yê mezelê, yê gorê, yê meẍber.

моги́льщик *м.* tirbkol *м.*

могу́ *см.* мочь.

могу́чий *прил.* yê biqewet, yê qaîm, yê biqudret; yê ezîm (*величественный*).

могу́ществен||ный *прил.* yê pirqudret, yê qewet; **~ое госуда́рство** dewleta pirqudret (pirqewet).

могу́щество *с.* pirqeweti *ж.*, pirqudretî *ж.*

мо́да *ж.* edet *м.*, mod *ж.*; **войти́ в мо́ду** edet bûîn; **ввести́ в мо́ду** edet kirin; **вы́йти из мо́ды** ji edet derketin.

моде́ль *ж.* modêl *ж.*, makêt *ж.*

моде́льный *прил.* yê modêlê.

модерниза́ция *ж.* tezekirin *ж.*, modêrnîzêkirin *ж.*

модернизи́ровать *несов. и сов.* teze (modêrnîzê) kirin.

модифика́ция *ж.* modîfikasîon *ж.*

модифици́ровать *несов. и сов.* modîfikasîon kirin, guhastin, ewez kirin.

мо́дный *прил.* yê biedet, yê bimod, yê biqaîde.

мо́дус *м.* modûs *ж.*, qaîde *м.*, cûre *м.*

моё *см.* мой.

мо́жет, мо́жет быть *см.* мочь I.

мо́жно *в знач. сказ.* 1. (*возможно*) dibe; **е́сли ~** hergê dibe; 2. (*разрешается, ладно*) îzne; ✧ **~ сказа́ть** *разг.* tê gotinê.

моза́ика *ж.* mozaîk *ж.*

мозаи́чный *прил.* yê mozaîkê.

мозг *м.* mejû *м.*; **голо́вной ~** mejûê serî; **спино́й ~** mejûê

piştê; **ко́стный** ~ mejûê hestûîya; **до ~а костей** *разг.* ĥeta serî.

мозгов|о́й *прил.* **1.** yê mejû; **~а́я оболо́чка** perda mejû; **2.** *перен. разг.* (*умственный*) yê aqil.

мозжечо́к *м. анат.* mejûê biçûk.

мозо́листый *прил.* yê biavildang, yê biavlik.

мозо́лить, намозо́лить: **~ кому́-л. глаза́** *разг.* zelê kesekî birîn.

мозо́ль *ж.* avildang *ж.*

мой *мест.* yê min; **э́то моё** ew yê mine; **~ друг** hogirê min; **моя́ кни́га** kitêba min.

мо́кнуть, вы́мокнуть şil (av) bûn.

мокро́та *ж.* belxem *ж.*

мокрот|а́ *ж.* şilbûîn *ж.*, avbûîn *ж.*

мо́кр|ый *прил.* **1.** yê şil, yê ter; **~ые во́лосы** porê şil; **2.** *безл. в знач. сказ.*: **сего́дня о́чень ~о** îro zef avîye.

мол I *м.* bend *ж.*, dîwarê pêlbir.

мол II *вводн. сл. разг.* yanê, hesevanî; **он, ~, ушёл** yanê ew çûîye.

молва́ *ж.* gilî-gotin *ж.*, xeîb *ж.*

мо́лвить *сов. уст.* gilî kirin, xeberdan, gotin.

молдава́нин *м.* moldavan *м.*

молдава́нский *прил.* yê moldavan; **~ язы́к** zimanê moldavana.

моле́кула *ж. физ.* molekûl *ж.*

молекуля́рный *прил. физ.* yê molekûlê.

молибде́н *м.* (*металл*) molibdên *м.*

моли́тва *ж.* dua *м.*, qewl *ж.*

моли́ть *несов.* zar (îtmaz) kirin.

моли́ться, помоли́ться dua kirin.

моллю́ск *м. зоол.* molûsk *ж.*

молниенос|ный *прил.* yê notîla bilê birûskê; yê nişkêva (*неожиданный*); yê zef zû (*очень быстрый*); **~ уда́р** derba notîla baê birûskê.

мо́лни|я *ж.* birûsk *ж.*, birq *ж.*, bapeşk *ж.*, birisk *ж.*; **с быстрото́й ~и** notîla baê birûskê.

молодёжн|ый *прил.* yê cahîla, yê cahîl; **~ые ка́дры** kadrê cahîl.

молодёжь *ж.* cahîl; **Всесою́зный Ле́нинский Коммунисти́ческий Сою́з Молодёжи** Tifaqa Cahilên Lênînîyê Komûnistîyê ya Hemtifaqîyê.

молоде́ть, помолоде́ть cahîl bûîn.

молоде́ц *м.* **1.** egit *м.*, mêrxas *м.*; **2.** *в знач. сказ. разг.* (*при выражении похвалы*) eferîm, qoçax, barîkela.

молоди́ться *несов. разг.* xwe cahîl kirin.

мо́лодня́к *м.* **1.** *собир.* (*о животных*) ĥeîwanê cahîl (kel); **2.** (*поросль молодого леса*) mêşê cahîl; **3.** *разг.* (*молодёжь*) xortê cahîl.

молодожён|ы *м.* **1.** (*молодой супруг*) mêrê teze zewicî; **2.** *мн.* **~ы** (*молодые супруги*) jin û mêrê teze zewicîne.

молод|о́й *прил.* **1.** (*юный*) yê cahîl; **~о́е поколе́ние** nesîlê cahîl; **~ челове́к** merîyê cahîl; **2.** (*недавно появившийся*) yê teze; **~ ме́сяц** meha teze; **~ карто́фель** kartolê teze; **~о́е вино́** şerava teze; **3.** (*свойственный молодости*) yê cahilîyê; **~ задо́р** hilanê cahilîyê; **4.** *в знач. сущ. м.* mêrê teze zewicî; **~а́я** *в знач. сущ. ж.* jina teze zewicî.

мо́лодость *ж.* cahiltî *ж.*; **в дни свое́й ~ти** li cahiltîya xweda; **во́-вторы́х ~** cahiltîya duda; **не пе́рвой ~ти** necahil.

молоко́ *с.* şîr *м.*; **ки́слое ~** qatix *м.*; **у него́ ~ на губа́х не обсо́хло** ew hê zef cahile, şîr hê ser lêvê wî ĥişk nebûîye.

молокосо́с *м. пренебр.* meriyê xam.

мо́лот *м. тех.* mêkutik *м.*; çakûç *м.* (*молоток*).

молоти́лка *ж. с.-х.* maşîna ekinkutanê.

молоти́ть, смолоти́ть [ekin] kutan.

молотоб|о́ец *м.* mêkutikçî *м.*

молото́к *м.* çakûç *м.*

мо́лотый *прил.* yê hêrai, yê hûrkiri; ~ **пе́рец** bîbera hêrai.

моло́ть I, смоло́ть hêran, hûr kirin.

моло́ть II *несов. разг.* (*говорить вздор*) derew kirin.

молотьба́ *ж. с.-х.* 1. (*действие*) kutan *ж.*; 2. (*пора, время*) wextê ekinkutanê.

моло́чная *ж.* dukana şîrfirotinê.

моло́чник *м.* 1. (*сосуд для молока*) kûpê şîr; 2. (*торговец молоком*) şîrfiroş *м.*

моло́чница *ж.* jina şîrfiroş.

моло́чный *прил.* 1. yê şîr; **~ые проду́кты** sipitai *ж.*; **~ая торго́вля** firotina şîr; **~ого цве́та** rengê şîr; **~ая коро́ва** çêleka dotinê.

мо́лча *нареч.* ker û lal; bêxeberdan (*безоговорочно*).

молчали́вый *прил.* 1. (*неразговорчивый*) yê ker û lal, yê bêzar; 2. (*понимаемый без слов*) yê ker û lal; yê bêxeberdan, yê bêgilî-gotin; **~ое согла́сие** razîbûna ker û lal, qaîlbûna bêgilî-gotin.

молча́ние *с.* kerbûn *ж.*, bêzarî *ж.*; **призва́ть к ~ию** dain kerkirinê; ◇ **за́говор ~ия** veşartin, eyan nekirin.

молча́ть *несов.* ker (hiş, bêzar) bûn; ~! hişbin!, kerbin!

молчко́м *см.* мо́лча.

моль *ж.* bizûz *ж.*

мольба́ *ж.* zar *м.*, îtmaz *ж.*

мольбе́рт *м. жив.* molbêrt *ж.*

моме́нт *м.* 1. (*мгновение*) lezo *ж.*; **в оди́н ~** lezekêda; 2. (*промежуток времени*) wede *м.*; zeman *м.*, wext *м.*; **в настоя́щий ~** naha; 3. (*отдельная сторона, обстоятельство*) teref *м.*, alî *м.*; qîrar *м.*

момента́льно *нареч.* zef zû; lezekêda, nişkêva (*неожиданно*).

момента́льный *прил.* yê zef zû; yê nişkêva (*неожиданный*).

мона́рх *м.* padşah *м.*, şah *м.*, sultan *м.*, hukumdar *м.*

монархи́зм *м. полит.* monarşîzm *ж.*, padşahtî *ж.*

монархи́ст *м. полит.* terefdarê padşêh, monarşist *м.*

монархи́стский *прил. полит.* yê padşahtîyê.

монархи́ческий *см.* монархистский.

мона́рхия *ж. полит.* padşahtî *ж.*, hukumdarî *ж.*

монасты́рь *м.* dêr *ж.*

мона́х *м.* rahîp *м.*

монго́л *м.* moxol *м.*

монго́льский *прил.* yê moxol; **~ язы́к** zimanê moxola.

моне́та *ж.* pere, diraf *м.*; **золота́я ~** dirafê (perê) zêr; **серебряная ~** perê zîv; ◇ **плати́ть той же ~той** heq (deq) dain; **принима́ть за чи́стую ~ту** bawer kirin.

моне́тный *прил.*: **~ двор** karxana pereçêkirinê.

мони́зм *м. филос.* monîzm *ж.*

монисти́ческий *прил. филос.* yê monistîk, yê monîzmê.

монисто *с.* tor *м.*, rext *м.*

многа́мия *ж.* yekjinî *ж.*, yekzewacî *ж.*

монограмма *ж.* monogram *ж.*

монографи́я *ж.* monografî *ж.*

моноли́тный *прил.* yê yekbûî (*единый*); yê qaîm, yê mêhkem (*крепкий*).

моноло́г *м.* monolog *ж.*

монопла́н *м. ав.* teyara yekper.

монополизи́ровать *несов. и сов.* inhisar (monopolizê) kirin.

монополи́ст *м.* monopolist *м.*, inhisarçî *м.*

монополисти́ческий *прил.* yê monopolistîyê, yê inhisarîyê.

монопо́лия *ж. в разн. знач.* monopolî *ж.*, inhisar *м.*; **~ вне́шней торго́вли** monopolîya tucareta (arîşverîşkirina) der; **капиталисти́ческие ~ии** monopolîyê kapitalistîyê.

монопо́льный *прил.* yê monopolîyê, yê inhisarê; **~ое пра́во** heqdarîya monopolîyê.

монотейзм *м.* monotêîzm *ж.*, yekdînî *ж.*

монотóнный *прил.* yê yekqaîde, yê yekdeng.

монтáж *м.* montaj *ж.*, berevkirina hacetê maşînê; **литературный ~** montaja lîtêratûrê.

монтёр *м.* montêr *м.*, sazkar *м.*

монтúровать, смонтúровать montaj (top, saz) kirin.

монумéнт *м.* heîkela mezin.

монументáльный *прил.* yê mezin, yê ezîm, yê mezin û bilind.

мор *м. уст.* qirbûîn *ж.*, qirhatin *ж.*

морá||ль *ж.* 1. (*нравственность*) xeîset *м.*, namûsî *ж.*, ruhî *ж.*, sîtq *ж.*; **прúнципы ~ли** eslê xeîset; 2. (*нравственный вывод*) nêt *ж.*, xulase *ж.*; 3. *разг.* (*нравоучение*) şîret *ж.*, temî *ж.*

морáльно-политúческ||ий *прил.* yê ruhîyê û seyasetîyê; **~ое едúнство** yekbûna ruhîyê û seyasetîyê.

морáльн||ый *прил.* 1. (*высоконравственный*) yê xeîsetê bilind, yê binamûs, yê sîtqê; 2. (*внутренний, душевный*) yê ruh; **~ое удовлетворéние** razîbûna ruhîyê.

морг *м.* morg *ж.*, cinîyazxane *ж.*, oda meîta.

морг||áть, моргнýть qutandin (*çev*); çev kirin (*делать знаки глазами*); **и глáзом не ~нýл** *разг.* qet talaş wî nîbû.

моргнýть *сов. см.* морráть.

мóрда *ж.* sûret *м.*, rû *м.*, sifet *м.*

мóре *с.* ber *ж.*, behr *ж.*; **закры́тое ~** bera hundurî welat; **откры́тое ~** bera vekirî; **~ крóви** *перен.* çemê xûnê; ◇ **емý ~ по колéно** talaşa wî nîne.

морéна *ж.* morên *ж.*

морепла́вание *с.* seferîya (çûîn-hatîna) ser berê.

морепла́ватель *м.* seferê berê, berçûî *м.*

морúть *несов.* 1. qir kirin, kok anîn; 2. (*мучить, изнурять*) aciz kirin, daîn çerçerandinê, biecandin; **~ гóлодом** birçî kirin.

морскóвный *прил.* yê gizêrê; **~ сок** şîra (ava) gizêrê.

морскóвь *ж.* gizêr *ж.*

мороженое *с.* qerimok *м.*

морóженый *прил.* yê qerimandî, yê bûzgirtî.

морóз *м.* serma *ж.*, sur *ж.*; **два грáдуса ~а** serma du derecê; **удáрили ~ы** serma hat.

морóз||ить *несов.*: **~ит** sare.

морóзно *в знач. сказ. безл. разг.*: **сегóдня ~** îro sare.

морóзный *прил.* yê surê, yê qerimî; **~ день** roja sar.

морос||ить *несов.* hûr barîn; **~йл дождь** barana hûr dibarî.

морóчить, обморóчить *разг.* gêj kirin, zele birin, çerçerandin, biecandin.

морс *м.* şerbeta êmîş.

морск||óй *прил.* yê berê; **~áя бáза** cîwara berê; **~áя войнá** şerê ser berê; **~áя торгóвля** tucareta berê; **~óе министéрство** wezîrxana berê; **~ бéрег** devê berê; ◇ **~áя болéзнь** êşa berê.

мортúра *ж. воен.* topa devbirî (kurt).

мóрфий *м.* morfîn *ж.*

морфолóгия *ж. грам.* morfolojî *ж.*

морщúна *ж.* zaxê *ж.*; qet *м.* (*на платье и т. п.*).

морщúнист||ый *прил.* yê bizaxê; **~ое лицó** sûretê qurçimî.

мóрщить 1. *сов.* намóрщить; **~ лоб** enî qurçimandin; 2. *сов.* смóрщить qurçimandin; **~ гýбы** lêv qurçimandin.

мóрщиться 1. *сов.* намóрщиться, смóрщиться (*хмуриться*) qurçimîn, pirçû bûîn, pirçûîyê xwe kirin; 2. *сов.* смóрщиться (*делать кислое лицо*) rûtirş bûîn.

моряк *м.* gemîvan *м.*, berîvan *м.*, melvan *м.*

москатéльн||ый *прил.*: **~ые товáры** heşîyaê reng bi reng.

москúт *м.* mixmixk *ж.*

московский *прил.* yê Moskvaê.

мост *м.* pir *ж.*; **подъёмный ~** pira tê hilbirandinê (bilindbûînê); **железнодоро́жный ~** pira rîya hesin; **наводи́ть ~** pir çêkirin.

мо́стик *м.*: **капита́нский ~** bilindaîya (pira) serkarê gemîyê.

мости́ть *несов.* kevir kirin.

мостова́я *ж.* soqaqa kevirkirî.

мот||а́ть I *несов.* 1. badan, zivirandin, rêsandin; 2. *разг.* (*качать*) ba kirin; **ло́шадь ~а́ла голово́й** hespê serê xwe badikir.

мота́ть II *несов. разг.* (*нерасчётливо тратить*) xerc kirin.

моти́в *м.* 1. (*причина, повод*) sebeb *ж.*, bihane *ж.*; 2. (*довод*) delîl *м.*; 3. (*мелодия*) qaîde *м.*

мотиви́рованный *прил.* yê delîlkirî, yê îzbatkirî.

мотиви́ровать *несов. и сов.* delîl (îzbat) kirin.

мотивиро́вка *ж.* delîlkirin *ж.*, îzbatkirin *ж.*

мотого́нки *мн. ж.* leca (mosebeqa) motosîklêta.

мото́к *м.* gulok *ж.*

мотопехо́та *ж.* eskerê ser avtomobîla.

мото́р *м. тех.* motor *ж.*

моториза́ция *ж.* motorîzêkirin *ж.*, motorkirin *ж.*

моторизо́ванный *прил.* yê motorîzêkirî, yê motorkirî.

моторизова́ть *несов. и сов.* motorîzê (motor) kirin.

мотори́ст *м.* motorçî *м.*, motorîst *м.*

мото́рн||ый *прил. тех.* yê bimotor; **~ая ло́дка** qeîqa bimotor.

мотоци́кл *м.*, **мотоцикле́т** *м.* motosîklêt *ж.*

мотоцикли́ст *м.* motosîklêtçî *м.*

моты́га *ж.* kuling *м.*, kulingê dudev.

моты́жить *несов. с.-х.* kuling kirin.

мотылёк *м.* pirpirk *ж.*, minminîk *ж.*

мох *м.* xeze *м.*

мохна́тый *прил.* yê bipirç, yê hirî.

моча́ *ж.* mîz *ж.*

моча́лка *ж.* kîse *ж.*, lifik *ж.*, lûfik *ж.*

мочев||о́й *прил.* yê mîzê; **~ пузы́рь** *анат.* pizdanka mîzê; **~ы́е ка́мни** *мед.* kevirê mîzê; **~ кана́л** *анат.* durba (qula) mîzê.

мочеиспуска́ние *с.* mîztin *ж.*, mîzhatin *ж.*

мочеиспуска́тельный *прил. анат.* yê mîztinê, yê mîzhatinê.

мочеполово́й *прил. анат.* yê mûzîyê, yê heîyaê.

мочето́чник *м. анат.* mîzî *ж.*, durba mîzê.

мочи́ть *несов.* şil kirin, avê xistin.

мо́чка *ж.*: **~ у́ха** kerika guh.

мочь I, смочь karin; **я могу́ принести́** ez dikarim bînim; ✧ **мо́жет быть** dibe; **не мо́жет быть!** nikarê beqewime!

мочь II *ж. разг.* (*сила, способность*) qewet *ж.*, taqet *ж.*, qudûm *м.*; **мо́чи моёй нет** qudumê min tune, ez qudûm ketîm.

мошённик *м.* delkbaz *м.*, quldir *м.*

мошённичать, смошённичать delkbazî (quldirî) kirin.

мошённичество *с.* delkbazî *ж.*, quldirî *ж.*

мо́шка *ж.* mixmixk *ж.*, mêş *ж.*

мошкара́ *ж. собир.* mixmixk.

мощёный *прил.* yê kevirkirî.

мо́щи *мн. рел.* meîtê hişkbûî.

мо́щность *ж.* qewat *ж.*, qudret *ж.*; zor *ж.* (*сила*).

мо́щный *прил.* yê biqewat, yê biqudret, yê qaîm; **~ подъём** bilindbûîna biqudret; **~ дви́гатель** motora pirqewet; **~ пласт у́гля** qetê mezin yê komira kevir.

мощу́ *см.* мости́ть.

мощь *ж.* qewat *ж.*, qudret *ж.*; zor *ж.* (*сила*).

мо́ю *см.* мыть.

мрак *м.* terîstan *ж.*; **ночно́й ~** şevereş *ж.*; **покры́то ~ом неизве́стности** *перен.* eyan nîne.

мракобе́с *м.* dujminê pêşdaçûînê, terefdarê terîstanê.

мракобе́сие *с.* tereſdarîya terîstanê.

мра́мор *м.* mermer *м.*

мра́морный *прил.* yê mermer; yê ji mermer (*из мрамора*).

мрачне́ть, помрачне́ть 1. terî bûîn; 2. *перен.* pirçû (dilteng) bûîn.

мра́чн||ый *прил.* 1. (*тёмный*) yê terî; ∽ **ве́чер** êvara terî; 2. *перен.* (*угрюмый, печальный*) yê bêkêf, yê dilteng; ∽**ое настрое́ние** bêkêfî *ж.*; 3. *перен.* (*безрадостный*) yê bêdil, yê bêşa.

мсти́тель *м.* qesas *м.*, ĥeîfçî *м.*, qesasgir *м.*, xenîm *м.*

мсти́тельный *прил.* yê qesasgirîyê, yê xenîm.

мстить, отомсти́ть ĥeîf vekirin, qesasî (xenîmî) kirin.

МТС (маши́нно-тра́кторная ста́нция) cîwara maşîna û traktora.

мудрён||ый *прил.* 1. (*странный*) yê ecêb; ∽ **челове́к** merîyê ecêb; 2. (*замысловатый, трудный*) yê çetin; ∽**ая зада́ча** pirsa çetin; ✧ **не ∽о́** ecêb nîne.

мудре́ц *м.* zandar *м.*, aqilbend *м.*, beşîr *м.*

мудри́ть, намудри́ть *разг.* ecêb kirin, zanbûna xwe nîşan daîn.

му́дрос||ть *ж.* zandarî *ж.*, aqilbendî *ж.*, beşîret *ж.*; **жите́йская ∽** aqilbendîya jînê; ✧ **зуб ∽ти** diranê aqilbûnê.

му́др||ый *прил.* yê zandar, yê aqil, yê bîlan, yê femkar, yê beşîr; ∽**ое реше́ние** qirarê aqil (beşîr).

муж *м.* mêr *м.*

мужа́ть, возмужа́ть mezin (gir) bûîn (*расти*); qaîm (qewet) bûîn, meĥkem bûn (*крепнуть*).

мужа́ться *несов.* curet kirin.

му́жественный *прил.* yê mêrxas, yê egît; yê curet (*смелый*); ∽ **челове́к** merîyê mêrxas.

му́жество *с.* mêrxasî *ж.*, egîtî *ж.*; curetî *ж.* (*смелость*).

мужи́к *м. уст.* (*крестьянин*) gundî *м.*

мужско́й *прил.* yê mêr; ∽ **пол** cinsê mêra; ✧ ∽ **род** *грам.* cinsê (qismê) nêr.

мужчи́на *м.* mêr *м.*

музе́й *м.* mûzê *ж.*

му́зыка *ж.* mûzîk *ж.*; qaîde *м.* (*мелодия*).

музыка́льный *прил.* 1. yê mûzîkê; ∽ **инструме́нт** saz *м.*; 2. (*способный к музыке*) yê bi feresatê mûzîkê; ∽ **ребёнок** zaroa bi feresatê mûzîkê; 3. (*мелодичный*) yê biqaîde, yê dengxweş.

музыка́нт *м.* sazbend *м.*

му́ка *ж.* cezaret *ж.*, zulum *ж.*

мука́ *ж.* ar *м.*; **пшени́чная ∽** arê genim.

мукомо́л *м.* aşvan *м.*

мукомо́льный *прил.* yê arhêranê.

мул *м.* qantir *м.*

мула́т *м.* melez *м.*

мулла́ *м.* mele *м.*, qewal *м.*

мультипликацио́нный *прил.*: ∽ **фильм** fîlma mûltîplîkasîyaê.

мультипликáция *ж.* mûltîplîkasîon *ж.*

му́мия *ж.* mûmîya *ж.*, meîtê ĥişkkirî.

мунди́р *м.* kincê resmî (*форменная одежда*); kincê eskerîyê (*военный*).

мундшту́к *м.* 1. (*для курения*) miştik *ж.*; 2. (*удила*) gem *ж.*, dizgîn *ж.*; 3. (*у музыкальных инструментов*) qamûş *м.*

муниципализа́ция *ж.* mûnîsîpalîzêkirin *ж.*

муниципализи́ровать *несов. и сов.* mûnîsîpalîzê kirin, beledî kirin.

муниципалите́т *м.* îdara şiher, mûnîsîpalîtêt *ж.*

муниципа́льный *прил.* yê îdara şiher, yê mûnîsîpalîtêtê.

мураве́й *м.* mûr *ж.*

мураве́йник *м.* qula mûristanga, mûristang *ж.*

муравьи́н||ый *прил.* yê mûristangê; ∽**ое я́йцо** hêka mûristangê; ∽**ая ку́ча** qûça mûristanga.

мура́ш||ка *ж.*: ~ки по те́лу бе́гают tevîzek canda diçin.

мурлы́кать *несов.* 1. (*о кошке*) mire-mir kirin; 2. *перен. разг.* (*тихо петь*) ber xweda kilam gotin, vinge-ving kirin.

муска́тный *прил.*: ~ оре́х gûza hindûstanê.

му́скул *м.* temar *ж.*; ни оди́н ~ не дро́гнул *перен.* qet temarekjî cî neḧejîya (nelipitî).

мускулату́ра *ж.* temar, tomerîya temara.

му́скус *м.* mûskûs *м.*

му́скусный *прил.* yê mûskûs.

му́сор *м.* gemar *ж.*

му́сорить, намусорить *разг.* gemar kirin.

му́сорный *прил.* yê gemarê; ~ я́щик qutîya gemarê.

муссо́н *м. геогр.* mûson *ж.*

мусульма́нин *м.* musulman *м.*

мусульма́нск||ий *прил.* yê musulmanîyê; ~ая рели́гия dînê musulmanîyê, îslam *ж.*

мусульма́нство *с.* musulmanî *ж.*

мут||и́ть, замути́ть 1. (*делать непрозрачным*) şêlû kirin; ~ во́ду av şelû kirin; 2. *тк. несов. безл.* (*тошнить*) mede hev ketin; меня́ ~и́т medê min hevdikeve; 3. *тк. несов. перен.* (*возбуждать, подстрекать*) pînc kirin, navtêdan; ✧ он воды́ не замути́т *разг.* ew merîkî girane.

мутне́ть, помутне́ть 1. (*становиться непрозрачным*) şêlû bûîn; 2. (*тускнеть*) terî bûîn.

му́тн||ый *прил.* 1. (*непрозрачный*) yê şêlû; ~ая вода́ ava şêlû; 2. (*тусклый*) yê terî, yê pirçûkirî; ~ взгляд nezera bêbeşer; ✧ в ~ой воде́ ры́бу лови́ть *погов.* li ava şêlûda mesî girtin.

муть *ж.* torta qirêj.

му́фтий *м. рел.* moftî *м.*

му́х||а *ж.* mêş *ж.*; ✧ де́лать из ~и слона́ *погов.* mêş kirin fîl; быть под ~ой *разг. шутл.* serxweş bûîn.

мухомо́р *м.* (*гриб*) karîya mêşa.

муче́ние *с.* cezaret *ж.*, azarî *ж.*, acizkirin *ж.*, çerçerandin *ж.*, biecandin *ж.*

му́ченик *м.* merîyê acizbûî.

му́ченический *прил.* yê cezaretê, yê biazar, yê çerçerandinê.

мучи́тель *м.* cezaretçî *м.*; zalim *м.* (*тиран*).

мучи́тельный *прил.* yê cezaretê, yê azarê, yê acizkirinê, yê biecandinê.

му́чить *несов.* daîn çerçerandinê (cezaretê), azar kirin.

му́читься *несов.* çerçirîn; ber xwe ketin (*переживать*); xweda şewitîn (*терзаться*).

мучно́й *прил.* yê ar (*относящийся к мукé*); yê ji ar (*из мукú*); ~ мешо́к çewalê ar.

мучу́ *см.* мути́ть.

му́шка I *ж.* (*на лице*) xal *ж.*

му́шка II *ж.* (*у огнестрельного оружия*) nîşan *ж.*

мушмула́ *ж. бот.* mûşmûle *ж.*

муштра́ *ж.* meşqa eskerîyê, telîmkirin *ж.*

муштрова́ть, вы́муштровать daîn meşqê (telîmê), hîn kirin.

муэдзи́н *м. рел.* mûêzîn *м.*

мчать *несов.* zû birin, revandin, bezandin.

мча́ться *несов.* zû çûîn, revîn, bezîn.

мще́ние *с.* ḧeîfvekirin *ж.*; qesasî *ж.*, xanimî *ж.* (*месть*).

мщу *см.* мстить.

мы *мест.* em, me; мы зна́ли me zanbû; мы приде́м emê bên; нам me, mera, meva; нам изве́стно meva eyane; э́ти кни́ги принадлежа́т нам ev kitêb yê mene; на́ми ji alîyê meda (me); э́то сде́лано на́ми ewyek ji alîyê meda hatîye çêkirinê; на́ми предло́жено me pirsdanîyê; нас me; у нас bal me, cem me; о нас derheqa meda, besa me; без нас bêî me.

мы́кать *несов.*: го́ре ~ *разг.* bêbext (telereş) bûîn.

мы́каться *несов.*: ~ по све́ту *разг.* terkeserî dunîyaê bûîn.

мы́лить, намы́лить sabûn kirin; ~ **го́лову** serî sabûn kirin.

мы́литься, намы́литься 1. xwe sabûn kirin, sabûn xwe xistin; 2. *тк. несов. безл.* (*образовывать пену*) kef daîn.

мы́ло *с.* 1. sabûn *ж.*; **жи́дкое ~** sabûna tîr; **туале́тное ~** sabûna desta; 2. (*пена на лошади*) kef *ж.*, xwêdan *ж.*

мыловáренный *прил.* yê sabûnhelandinê; **~ завóд** karxana sabûnhelandinê (sabûnkelandinê).

мы́льница *ж.* qutîya (qaba) sabûnê, sabûndang *ж.*

мы́льный *прил.* yê sabûnê; **~ая пе́на** kefa sabûnê; **~ порошóк** arê (toza) sabûnê; **~ ко́рень** koka kefdaînê; **~ пузы́рь** pifdanka kefa sabûnê.

мыс *м.* resilqet *ж.*

мы́сленно *нареч.* bixîyaltî, bi fikir.

мы́сленный *прил.* yê bifikir, yê bixîyal.

мыслúтель *м.* aqilbend *м.*; zandar *м.*, ulmdar *м.* (*учёный*).

мы́слить *несов.* 1. (*думать*) fikir kirin, dușirmiș bûîn; 2. (*представлять*) xîyal kirin.

мысль *ж.* fikir *ж.*, xîyal *м.*; nêt *ж.* (*представление*); **внеза́пная ~** fikira nişkêva; **о́браз ~лей** qaîdê fikirkirinê; **за́дняя ~** fikira veşartî; **навести́ на ~** anîn ser fikirê; **не допуска́ть и ~ли** bawer nekirin.

мыта́рство *с.* cezaret *ж.* (*мучение*); bêbextî *ж.* (*несчастье*).

мыть, вы́мыть, помы́ть şûştin; **~ ру́ки** dest şûştin; ✧ **рука́ ру́ку мо́ет** dest desta dişo.

мытьё *с.* şûştin *ж.*

мы́ться, вы́мыться, помы́ться xwe şûştin; ser çevê xwe şûştin (*мыть лицо*).

мыча́ние *с.* mire-mir *ж.*, çewte-çewt *ж.*, kale-kal *ж.*, bore-bor *ж.*

мыча́ть *несов.* mire-mir (çewte-çewt, kale-kal, bore-bor) kirin, kalîn.

мышело́вка *ж.* tela mişka.

мы́шечный *прил. анат.* yê temarê.

мышúный *прил.* yê mişka; **~ая нора́** qula mişka; **~ого цве́та** rengê qemer (terî).

мышле́ние *с.* fikirkirin *ж.*

мы́шца *ж. анат.* temar *ж.*

мышь *ж.* mişk *м.*

мышья́к *м.* arsênîk *ж.*

мэр *м.* serkarê şiher, mêr *м.*

мюри́д *м. ист.* mirîd *м.*

мя́гкий *прил.* yê nerm; yê milahîm (*о человеке*); yê nazik (*нежный*); **~ая ко́жа** çermê nazik; **~ челове́к** merîyê milahîm; ✧ **~ звук** dengê nazik; **~ вагóн** vagona cînerm; **~ кли́мат** av-hewa nerm; **~ свет** şewaqa (ronkaîya) nerm; **~ие движе́ния** hejê nerm; **~ая вода́** ava nerm.

мягкосерде́чный *прил.* yê dilrem, yê dilnerm.

мя́гкость *ж.* nermî *ж.*; milahîmî *ж.* (*характера*); nazikî *ж.* (*нежность*).

мягкоте́лый *прил.* yê sist (*слабый*); yê bêxîret (*безвольный*).

мягкоте́лость *ж.* dilnermî *ж.*; bêxîretî *ж.* (*безволие*).

мягкошёрстный *прил.* yê hirînerm.

мякúна *ж. с.-х.* qesel *м.*

мя́киш *м.* orta (nermê) nan.

мя́коть *ж.* 1. (*мяса*) goştê nerm; 2. (*плода*) nerme *м.*

мя́мля *м. разг.* merîyê fişfişok.

мяси́стый *прил.* 1. (*о мясе*) yê cî bi cî goşt; 2. (*о плодах*) yê xurt, yê kok.

мясна́я *ж.* dukana goşt.

мясни́к *м.* qesab *м.*

мясно́й *прил.* yê goşt; **~ые консе́рвы** konsêrvê goşt.

мя́со *с.* goşt *м.*; **варёное ~** goştê kelandî; **вя́леное ~** bastirme *ж.*; **жа́реное ~** goştê qelandî (biraştî); **курди́чное ~** berdûv *ж.*; ✧ **ди́кое ~** *мед.* goştê zêde; **вы́рвать с ~ом** (*напр. пуго-*

вицу) ji kokêva derxistin; **ни рыба, ни ~** ne mesîye û ne jî goşte.

мя́со-моло́чный *прил.* yê goşt û şîr.

мясору́бка *ж.* destgê goşthûrkirinê.

мя́та *ж. бот.* hamêm *ж.*

мяте́ж *м.* îsyan *ж.*, qerebalix *ж.*, qîam *ж.*

мяте́жник *м.* îsyançî *м.*, qîamçî *м.*

мяте́жный *прил.* 1. yê îsyanê; 2. (*неспокойный, бурный*) yê nerehet, yê bêaram.

мя́тный *прил.* yê hamêmê.

мять, помя́ть 1. (*комкать*) qurçimandin; **~ траву́** hêşnaî pêpes kirin (tepisandin); 2. *тк. несов.* (*месить*): **~ те́сто** hevîr kirin; 3. *тк. несов.* (*лён, коноплю и т. п.*) veçirandin.

мя́ться, помя́ться 1. qurçimîn; 2. *тк. несов. перен.* (*колебаться*) curet nekirin.

мяу́канье *с.* mire-mir *ж.*

мяу́кать *несов.* mire-mir kirin.

мяч *м.* topa lîstinê; **игра́ть в ~** top lîstin.

Н

на I *предлог* 1. (*сверху, на поверхности чего-л., куда-л.*) ser; **на ло́шади** ser hespê; **на поро́г** ser şêmîkê; 2. (*где-л.*) ser, li, di; **на уро́ке** ser dersê; **на Кавка́зе** li Qefqazê[da]; 3. (*для*) bona, seva; **на всех ученико́в** bona hemû şagirta; **на пять челове́к** bona pênc merîya; 4. (*во время, в течение*) li wextê, li wedê; **на пра́здниках** li wextê eîdada; **на про́шлой неде́ле** li heftîya derbazbûî; **на бу́дущей неде́ле** li heftîya tê; **на дня́х** li van roja; 5. (*на срок*) bona; **на вре́мя** bi wedetî; **на два дня** bona du roja; **опозда́ть на пять мину́т** pênc deqa egle bûîn; 6. (*для обозначения цели*) bona; **мате́рия на подкла́дку** perçê bona astar; 7. (*больше, меньше на...*) ser, bi; **населе́ние го́рода увели́чилось на 5000 челове́к** ehalîyê şiher bi 5000 merî zêde bûîye; **коро́че на метр** bi mêtrekî kêm; **на ме́сяц ра́ньше** mehekî pêşda, mehekî berî wextê; 8. (*на чём-л., посредством*) ser, pê, bi; **я прие́хал сюда́ на трамва́е** ez bi kongê hatime li vira; ◇ **на весу́** dardakirî, daliqîyaî; **игра́ть на зурне́** zurnê xistin; **на челове́ка** serê merî; **на на́ших глаза́х** ber çevê me; **на на́мять** bi bîr, ezber; **на лю́дях** pêşberî (ber çevê) xelqê; **на мой взгляд** bi nêta (bi fikira) min; **на два́дцать рубле́й** bi bist manêtî; **на ме́сте** li cîda; **на иностра́нном языке́** bi zimanê dereke; **на во́здухе** ber hewaê; **на э́тот раз** li vê carê; **на у́лице** li kûçê, li soqaqê; **на со́лнце** ber tevê; **разде́лить шесть на два** şeş bela ser duda kirin; **на беду́** bi teşkelê, bi roja reş; **на ча́сти** pirtî-pirtî, hûr-hûrî.

на II, **на́те** *частица разг.* hilde!, bigire!, hanê!; **~ э́ту кни́гу** hanê vê kitêbê.

набо́вить *сов. см.* набавля́ть.

набо́вка *ж.* zêdekirin *ж.*, zêdeî *ж.*, serbarê ser.

набавля́ть, набо́вить zêde kirin, serda (deha) zêde kirin.

набалда́шник *м.* çomaq *м.*, ser *м.*, gopal *м.*

набальзами́ровать *сов. см.* бальзами́ровать.

набо́т *м.* zengilê hewarê; **бить в ~** *прям., перен.* hewar-gazî daxistin.

набе́г *м.* ĥucûm *ж.*, talanî *ж.*, qelaşî *ж.*, êrîşkirin *ж.*

набега́ть, набежа́ть 1. serda hatin (revîn); hev ketin (*сталкиваться*); 2. *разг.* (*скапливаться, сбегаться*) top (berev) bûîn; 3. *разг.* (*увеличиваться в числе, количестве*) zêde bûîn.

набе́гаться *сов.* ji revê têr bûîn; têr çûîn-hatin (*находиться*).

набежа́ть *сов. см.* набега́ть.

набекре́нь *нареч. разг.*: **оде́ть ша́пку** ∽ kum xwar kirin (qot kirin).

на́бело *нареч.*: **переписа́ть** ∽ temîz nivîsandin.

на́бережная *ж.* devê berê (*у моря*); devê çem, berçem *м.* (*у реки*); soqaqa devê berê (çem) (*улица вдоль берега моря, реки*).

набива́ть, наби́ть 1. (*наполнять*) pir (tijî) kirin; devra kirin (*до отказа*); 2. (*насаживать ударами*) têra kirin, têda kutan; 3. (*повреждать ударами*) xirab kirin (*bi derba*); 4. *текст.* qalib kirin (xistin); ∽ **си́тец** çît qalib xistin; ✧ ∽ **цену** *разг.* biha bilind kirin; ∽ **карма́н** *разг.* cêv tijî kirin, dewletî bûîn, kîsikê xwe tijî kirin; ∽ **ру́ку** *разг.* hosta (pêşekar) bûîn, hîn bûn.

набива́ться, наби́ться 1. *разг.* (*скапливаться*) tijî bûîn; 2. *разг.* (*навязываться*) xwe têra kirin, xwe ortê xistin; ∽ **на знако́мство** xwe bi zorê daîn naskirinê.

наби́вка *ж.* 1. (*действие*) tijîkirin *ж.* (*напр. папирос*); têrakirin *ж.* (*обручей*); qalibxistin *ж.* (*ткани*); 2. (*материал*): **волося́ная** ∽ tijîkirina por.

набивно́й *прил.*: ∽ **си́тец** çîtê qalibxistî.

набира́ть, набра́ть 1. (*собирать*) top (berev) kirin, hildan; 2. qebûl kirin (*принимать*); top (berev) kirin (*производить набор*); ∽ **рабо́тников** qulixçî qebûl kirin; 3. *полигр.* herf top kirin.

набира́ться, набра́ться 1. (*скапливаться*) top (tijî) bûîn, berev bûîn; 2.: ∽ **хра́брости** curet kirin.

наби́тый *прич., прил.* (*плотно наполненный*) yê tijîkirî; ✧ ∽ **дура́к** *разг.* axmax *м.*, axmaxê kutabûî.

наби́ть(ся) *сов. см.* набива́ть (-ся).

наблюда́тель *м.* miqatçî *м.*, dîndar *м.*, nazir *м.*

наблюда́тельность *ж.* miqatbûîn *ж.*, guhdarîkirin *ж.*, dîndarî *ж.*, nazirî *ж.*

наблюда́тельный *прил.* 1. (*внимательный*) yê guhdar, yê serxwe, yê şereza; ∽ **челове́к** merîyê guhdar; 2. (*служащий для наблюдения*) yê miqatbûînê; ∽ **пункт** cîwara (niqitka) miqatbûînê.

наблюда́ть *несов.* 1. (*за чем-л., за кем-л.*) miqat bûîn, nihêrandin; teselî kirin; ∽ **за детьми́** miqatî zara bûîn; 2. (*внимательно следить*) guhdarî kirin; ∽ **разви́тие собы́тий** guh daîn bi rêça qewimandina; 3. (*изучать*) hîn kirin, hînî (*tiştekî*) bûn.

наблюде́ние *с.* miqatbûîn *ж.*, nihêrandin *ж.*, teselîkirin *ж.*; nezer *ж.*, dîndarî *ж.* (*надзор*).

на́божность *ж.* xudêhebandin *ж.*, xudênasî *ж.*

на́божный *прил.* yê xudênas, yê xudê dîhebîne.

набо́йка *ж.* 1. (*ткань*) qelemkar *м.*; 2. (*у обуви*) penîya sola.

на́бок *нареч.* ser kêlekê, ser teniştê.

наболе́вший *прил.* yê êşê; ∽**ее ме́сто** cîyê êşê; ✧ ∽ **вопро́с** pirsa ferz.

наболе́ть *сов.* êşandin; ✧ **на душе́** ∽**ело** dilxem (dilteng) bûîn.

наболта́ть I *сов. разг.* (*намешать*) çeliqandin, tevhev kirin.

наболта́ть II *разг.* zef xeberdan (*наговорить*); buxdan (gevezetî) kirin (*наклеветать*).

наболта́ться *сов. разг.* (*наговориться*) têr xeberdan.

набо́р *м.* 1. (*учащихся, рабочих и т. п.*) qebûlkirin *ж.*; topkirin *ж.*, berevkirin *ж.*; ~ **в техни́ческие учи́лища** qebûlkirina bi mektebê têxnîkîyê; 2. (*состав*) kom *ж.*, qebûlkirin *ж.*; **студе́нты но́вого ~а** şagirtê qebûlkirina teze; 3. *полигр.* topkirina ĥerfa (*действие*); miqala (nivîsara) topkirî (*набранный текст*); 4. (*комплект*) deste *ж.*; ~ **инструме́нтов** desta haceta; ◇ ~ **слов** ĥerfê bênêt; **по́яс с серебряным ~ом** kembera zîv.

набо́рный *прил. полигр.* yê ĥerftopkirinê; ~ **цех** oda ĥerftopkirinê.

набо́рщик *м. полигр.* qulixçîyê topkirina ĥerfa.

набра́сывать I, наброса́ть 1. (*составлять в общих чертах*) çêkirin, teşkîl kirin; ~ **план рабо́ты** meremê xebatê teşkîl kirin, reşbeleka bernama xebatê danîn; 2. (*наскоро записывать*) kurt (zû) nivîsîn; 3. *перен.* (*показывать*) nîşan kirin; 4. (*кидать*) avêtin, bela kirin.

набра́сывать II, набро́сить (*накидывать поверх*) avêtin ser; ~ **плато́к на пле́чи** laçik avêtin ser mil.

набра́сываться, набро́ситься xwe avêtin ser, ĥucûm kirin.

набра́ть(ся) *сов. см.* набира́ть (-ся).

набрести́ *сов. прям., перен.* (*натолкнуться*) rast hatin, serda çûîn.

наброса́ть *сов. см.* набра́сывать I.

набро́сить *сов. см.* набра́сывать II.

набро́ситься *сов. см.* набра́сываться.

набро́сок *м.* nivîsara ewil (*напр. плана, доклада*); sifetê xîlasnekirî (*незаконченный рисунок*).

набры́згать *сов.* pejiqandin; reşandin, şil kirin (*замочить*).

набуха́ть, набу́хнуть werimîn; fire bûîn (*расширяться*).

набу́хнуть *сов. см.* набуха́ть.

набуя́нить *сов. см.* буя́нить.

нава́ливать, навали́ть 1. (*накладывать поверх чего-л.*) danîn ser, bar kirin; 2. *разг.* (*накладывать небрежно*) qûç (top) kirin, daîn ser hev; 3. *безл. разг.* barîn, ketin; ~ **ило мно́го сне́га** berf zef ketiye (zef bariye).

нава́ливаться, навали́ться (*налегать на что-л.*) xwe serda guvaştin (avêtin), xwe daîn ser.

нава́ли́ть(ся) *сов. см.* нава́ливать(ся).

нава́лка *ж.*: ~ **у́гля** avêtina (derxistina) komira kevir.

навалоотбо́йщик *м.* medençîyê komirşikênandinê.

нава́р *м.* çêne *ж.*, avçêne *ж.*

нава́ривать, нава́ри́ть *тех.* kutan; ~ **ось** surnî kutan.

нава́ри́ть I *сов. см.* нава́ривать.

нава́ри́ть II *св.* (*пищу*) petin, çêkirin, hazir kirin (*xwerin*).

навева́ть, наве́ять (*о ветре*) hatin, bezîn.

наве́даться *сов. см.* наве́дываться.

наве́дываться, наве́даться sertêdan, dîtin, serek lêxistin; ~ **айгесь к нам ка́к-нибудь** carekê serekê mexin.

навезти́ *сов.* [zef] anîn; ~ **дров** dar zef anîn.

наве́к, наве́ки *нареч.* ĥeta-ĥetaiyê, deĥim.

навербова́ть *сов. см.* вербова́ть.

наве́рно 1. *вводн. сл.* (*по видимому*) dibe, helbet, miqîm; **так, ~, и бу́дет** dibe usajî biqewime; 2. *нареч., в знач. сказ.* (*наверняка*) ese, miqîm; ~ **так и бу́дет** miqîm wê usajî biqewime.

наве́рное *см.* наве́рно 1.

наверняка́ *нареч. разг.* 1. miqîm, ese, bêşik (*обязательно*); bêgilî (*безоговорочно*); 2. (*безошибочно*) bêxeta, bêşaşî, rastî, gendî.

наверста́ть *сов. см.* навёрстывать.

навёрстывать, наверста́ть gihîştin, xwe pêra gîhandin.

наве́рх *нареч. в разн. знач.* jorê; **положи́ть ~** danîn jorê; **посмотре́ть ~** dîna xwe daîn jorê, jor nihêrîn.

наверху́ *нареч.* jorê.

наве́с *м.* arîk *ж.*, ban *м.*

навеселе́ *нареч. разг.* serxweş; **быть ~** serxweş bûîn.

наве́сный *прил.*: **~ ого́нь** *воен.* agirkirina tîk (quloz).

навести́ *сов. см.* наводи́ть.

навести́ть *сов. см.* навеща́ть.

наве́тренн||ый *прил.*: **с ~ой стороны́** ji alîyê baê (bê).

наве́чно *нареч.* ĥeta-ĥetaîyê, deĥim.

навеща́ть, навести́ть *разг.* sertêdan,dîtin; çûîn mêvan (*ходить в гости*).

наве́ять I *сов. см.* навева́ть.

наве́ять II *сов. см.* ве́ять.

на́взничь *нареч.* devrû, ser zik; **упа́сть ~** devrû ketin.

навзры́д *нареч.*: **пла́кать ~** kûre-kûr kirin.

навига́тор *м. мор.* rênîşê gemîyê.

навигацио́нный *прил.* yê rênîşê gemîya, yê birin-anîna gemîya, yê rêketinê; **~ пери́од** wedê çûîn-hatina gemîya.

навига́ция *ж.* 1. (*сезон*) wextê çûîn-hatina gemîya; 2. (*наука*) ulmê rênîşa (birin-anîna) gemîya.

нависа́ть, нависнуть 1. darda bûîn; 2. *перен.* (*угрожать*) tirsandin.

нависнуть *сов. см.* нависа́ть.

навлека́ть, навле́чь anîn (avêtin) ser.

навле́чь *сов. см.* навлека́ть.

наводи́ть, навести́ 1. danîn (anîn) ser; 2. *перен.* anîn, gîhandin; **~ на мысль** anîn ser fikirê (nêtê); 3. (*целиться*) rast kirin ser, berandin, nîşan girtin; ✧ **~ гля́нец** biriqandin; **~ поря́док в ко́мнате** otax daîn hev; **~ страх** *разг.* tirsandin; **~ мост** pir çêkirin; **~ красоту́** *разг.* xemilandin.

наво́дк||а *ж.* rastkirin ser, nîşangirtin *ж.*, berandin *ж.*; **~ору́дия** berandina topê; **бить прямо́й ~ой** rast agir kirin; ✧ **~ мо́ста** çêkirina pirê.

наводне́ние *с.* sêlav *ж.*, rabûna avê.

наводни́ть *сов. см.* наводня́ть.

наводня́ть, наводни́ть 1. sêlav kirin; 2. *перен.* (*переполнять*) tijî (zef, gumreh) kirin.

наво́дчик *м. воен.* nîşandar *м.*

наводя́щий *прич., прил.*: **~ вопро́с** pirsa femkarîyê, pirsa tîne ser nêtê.

наво́з *м.* rêx *ж.*, peîn *м.*

наво́зн||ый *прил.* yê rêxê, yê peîn; **~ая ку́ча** qûçe rêxê; **~ жук** kêzika rêxê.

на́волочка *ж.* rûbelgî *м.*

навостри́ть *сов. разг.*: **~ у́ши** guhê xwe tûj kirin.

навостри́ться *сов. разг.* hîn bûîn (*научиться*); edet kirin (*привыкнуть*).

навощи́ть *сов. см.* вощи́ть.

навря́д, навря́д ли *нареч. разг.* çetîn, tucara; **навря́д ли он придёт** dibe ew nehê.

навсегда́ *нареч.* ĥeta-ĥetaîyê, deĥim.

навстре́чу *нареч.* pêşîya; **вы́йти ~ го́стю** çûîn pêşîya mêvan; **они́ шли друг дру́гу ~** ew diçûne pêşîya hev; ✧ **идти́ ~** arîkarî kirin, komek daîn, berda (berbirî) çûîn.

навы́ворот *нареч. разг.* vajî, beravêj, paşopê, ters; **оде́ть руба́шку ~** kiras vajî xwe kirin; **всё получи́лось ~** temam paşopê qewimî.

на́вы||к *м.* pêşe *м.* (*уменье*); edet *м.*, xeîset *м.* (*привычка*); **трудовы́е ~ки** pêşê xebatê; **приобрести́ ~** hîn bûîn.

навы́кат, навы́кате *нареч.*: **глаза́ ~** çevbijiqî, çevfitiqî.

навы́нос *нареч. разг.* birin der.

навы́рез *нареч.* bi kerkirinê, bi birînê.

навы́тяжку *нареч.*: **стоя́ть ~** rast (tîk) sekinîn.

навью́чивать, навью́чить bar kirin, dan piştê (ser); **~ ло́шадь** hesp bar kirin.

навью́чить *сов. см.* навью́чивать.

навяза́ть(ся) *сов. см.* навя́зывать(ся).

навя́зчивый *прил.*: **~ челове́к** merîyê zelebir.

навя́зывать, навяза́ть 1. (*привязывать, прикреплять*) girêdan, pêçandin, tewl dan; 2. *перен.* (*принуждать, заставлять взять*) bi zorê dan hildanê, mecbûr kirin.

навя́зываться, навяза́ться *разг.* (*приставать*) bi zorê xwe têra kirin (pêşda dain).

нага́дить *сов. см.* га́дить 2.

нага́йка *ж.* qamçû *м.*, şelaq *м.*

нага́н *м.* nagan *ж.*

нага́р *м.* komir *ж.*; **~ свечи́** komira mûmê; **порохово́й ~** komira barûtê.

нагиба́ть, нагну́ть tewandin (*сгибать*); qûz (nimz) kirin, daxistin (*опускать*).

нагиба́ться, нагну́ться xwe qûz (xwe nimz) kirin.

нагишо́м *нареч. разг.* rût-tezî, başewal.

нагле́ть, обнагле́ть bênamûs bûîn, bêşerm bûin, bêhetik bûîn.

нагле́ц *м.* merîyê bênamûs (bêhetik, bêşerm).

на́гло *нареч.* bênamûstî, bêhetiktî.

на́глость *ж.* bênamûsî *ж.*, bêşermî *ж.*, bêhetikî *ж.*

на́глухо *нареч.* qaîm, meḧkem, kîp; **~ застегну́ть** kîp pev xistîn; **~ закры́ть** qaîm dadan.

на́глый *прил.* yê bênamûs, yê bêşerm, yê bêhetik.

нагляде́ться *сов.* têr nihêrandin (teselî kirin), zef dîtin.

нагля́дность *ж.* temaşekirin *ж.*; **для ~и** bona temaşekirinê; **со всей ~ью** eşkere.

нагля́дный *прил.* yê kivşbûî (*заметный*); yê eyan (*видимый*); yê eşkere (*очевидный*); **~ приме́р** mesela eşkere; ✧ **~ые посо́бия** kart û plakat, sifetê nîşankirinê.

нагна́иваться, нагнои́ться kêm girtin.

нагна́ть *сов. см.* нагоня́ть.

нагнести́ *сов. см.* нагнета́ть.

нагнета́тельный *прил.*: **~ насо́с** tulumba guvaştinê.

нагнета́ть, нагнести́ guvaştin.

нагное́ние *с.* kêmgirtin *ж.*

нагнои́ться *сов. см.* нагна́иваться.

нагну́ть(ся) *сов. см.* нагиба́ть (-ся).

наговáривать, наговори́ть (*сплетничать*) gevezetî (buxdan) kirin.

наговори́ть I *сов.* zef (têr) xeberdan; **~ неприя́тностей** tiştê xirab gotin.

наговори́ть II *сов. см.* наговáривать.

наговори́ться *сов.* têr (zef) xeberdan.

нагой́ *прил.* yê tezî, yê rût, yê rût-tezî, yê tût-rût.

на́голо *нареч.* tezî; **с ша́шкой ~** bi şûrê tezî; **он обри́т ~** ewî porê xwe pêda kur kirîye (hildaîye).

на́голову *нареч.*: **разби́ть ~** bicarekêva alt kirin.

наголода́ться *несов.* birçî bûîn, zef birçî bûn.

нагоня́й *м. разг.* çêrkirin *ж.*; **дать ~** bela dain, çêr kirin.

нагоня́ть, нагна́ть 1. (*догонять*) gihîştin; weke hev bûîn (*поравняться*); 2. *разг.* (*сосредоточивать*) merkez kirin, cîkî top kirin; 3. *перен. разг.* (*внушать*): **~ страх** tirsandin.

нагора́ть, нагоре́ть 1. *безл.* (*дать нагар*) komir (bin) girtin; 2. (*сгореть*) şewitîn; 3. *тк.*

сов. безл. разг.: **мне нагоре́ло** bela min hate daînê.

нагоре́ть *сов. см.* нагора́ть.

нагóрный *прил.* yê serê çîyê.

нагóрье *с.* tepe *ж.*, rasta serê çîyê.

нагота́ *ж.* rûtbûn *ж.*, tezîbûn *ж.*

нагота́вливать, наготóвить *разг.* [zef] hazir kirin.

наготóве *нареч.* hazir, bi îhalê hazirbûnê; **держа́ть ~** hazir bûîn.

наготóвить *сов. см.* нагота́вливать.

награ́бить *сов.* talan (qelaşî) kirin.

награ́да 1. *ж.* rewakirin *ж.*, xelatkirin *ж.*; **правúтельственная ~** rewakirina dewletê; **дéнежная ~** rewakirina bipera (peretîyê); **в ~ду** bona rewakirinê; 2. (*знак отличия*) nîşana cudekirinê; ordên *ж.* (*орден*).

наградúть *сов. см.* награжда́ть.

наградно́й *прил.* yê rewakirinê; **~ лист** belgê rewakirinê.

награжда́ть, наградúть rewa kirin, xelat kirin; **~ óрденом** bi ordên rewa kirin.

награжде́ние *с.* rewakirin *ж.*, xelatkirin *ж.*

нагре́в *м.* germkirin *ж.* (*нагревание*); germ *ж.*, kel *ж.* (*нагретость*).

нагрева́ние *с.* 1. (*по гл.* нагрева́ть) germkirin *ж.*, kelandin *ж.*; 2. (*по гл.* нагрева́ться) germbûîn *ж.*, kelbûîn *ж.*

нагрева́тельный *прил.* yê germkirinê, yê kelandinê; **~ прибóр** destgê kelandinê.

нагрева́ть, нагре́ть germ kirin, kelandin.

нагрева́ться, нагре́ться germ (kel) bûîn.

нагре́ть(ся) *сов. см.* нагрева́ть (-ся).

нагромажда́ть, нагромоздúть qûç (lod, bender) kirin, danîn ser hev.

нагромождáться qûç (lod, bender) bûn.

нагромождéние *с.* (*груды*) qûç *ж.*, lod *ж.*, bender *ж.*

нагромоздúть *сов. см.* громоздúть, нагромождáть.

нагрубúть *сов. см.* грубúть.

нагрýдник *м.* (*фартук*) şalik *ж.*

нагрýдный *прил.* yê sersînê; **~ знак** nîşana sersînê.

нагружáть(ся) *см.* грузúть(ся).

нагрузúть(ся) *сов. см.* грузúть(ся).

нагрýзка *ж.* 1. (*действие*) barkirin *ж.*; 2. (*груз*) bar *м.*, piştî *м.*; 3. (*занятость*) şuxul *м.*, xebat *ж.*; **большáя ~** xebata zef; 4. *физ.* giranî *ж.*, bar *м.*

нагря́нуть *сов.* nişkêva ketin, serda ketin; qewimîn (*случиться*).

нагýл *м. с.-х.* xurtbûîn *ж.*, kozîkirin *ж.* (*heîwanet*).

нагýливать, нагуля́ть mezin (kok, kozî) kirin; **~ жир** xurt bûîn.

нагуля́ть *сов. см.* нагýливать.

нагуля́ться *сов.* têr gerîn.

над, нáдо *предлог в разн. знач.* ser; **над гóродом** ser şiherra; **над головóй** ser serî; jorê (*вверху*); **побéда над врагóм** altkirina dujmin; **смеяться над кéм-л.** serê kesekî kenîn, kesek pêkenî kirin.

надавúть *сов. см.* нада́вливать.

нада́вливать, надавúть guvaştin, xwe daîn ser.

нада́ивать, надоúть dotin.

надба́вить *сов. см.* надбавля́ть.

надба́вка *ж.* zêdeî *ж.*, zêdebûn *ж.*, serbarê ser.

надбавля́ть, надба́вить zêde kirin, serda zêde kirin.

надвига́ть, надви́нуть serda (pêşda) daîn, nêzîk kirin.

надвига́ться, надви́нуться serda (pêşda) hatin, nêzîk bûîn; **~áется лéто** havîn nêzîk dibe, havîn tê.

надви́нуть(ся) *сов. см.* надвига́ть(ся).

надвóдный *прил.* yê ser avê; **~ флот** flota ser avê.

на́двое *нареч.* bi du qismeta, bi du para.

надвóрн||ый *прил.* yê li ĥeyatêda; **~ые постро́йки** avaîyê li ĥeyatêda (ĥewşêda).

надвя́зать *сов. см.* надвя́зывать.

надвя́зывать, надвязáть (*верёвку и т. п.*) ĥeva (serra) girêdan, dirêj kirin, pêva kirin.

надгро́бие *с.* meẍber *м.*, tirb *ж.*

надгро́бный *прил.* yê ser meẍber, yê tirbê, yê mezelê; **~ ка́мень** kevirê mezelê (tirbê).

надгрыза́ть, надгры́зть serra kotin.

надгры́зть *сов. см.* надгрызáть.

надева́ть, наде́ть xwe kirin, têra kirin; **~ ша́пку** kum kirin serê xwe; **~ очки́** berçevk daîn ber çevê xwe; **~ ожере́лье** tor kirin stûîyê xwe.

наде́ж||да *ж.* guman *ж.*, omîd *м.*, îtbar *м.*, îman *ж.*, çare *ж.*; **вся моя́ ~ на вас** ĥemû gumana min ser weîye; **пита́ть ~ду** guman hebûn; **теря́ть ~ду** guman tunebûn, bêomîd (bêçare) bûn; **возлага́ть ~ды** guman kirin (danîn ser); **подава́ть ~ды** guman daîn.

наде́жно *нареч.* bi îtbar, bi guman; qaîm (*крепко*).

наде́жность *ж.* gumanbûîn *ж.*, îtbarbûîn *ж.*; qaîmbûîn *ж.* (*прочность*).

наде́жн||ый *прил.* yê îtbarîyê, yê biîtbar, yê biguman (*достоверный*); yê qaîm (*прочный*); **~ челове́к** merîyê biîtbar; **~ая опо́ра** ĥîmê qaîm (îtbarîyê).

наде́л *м.*: **~ земли́** qismeta xwelîyê, zevî *ж.*

наде́лать *сов. в разн. знач.* kirin; **~ глу́постей** axmaxî kirin; **~ оши́бок** şaşî (qelet) kirin.

наделúть *сов. см.* наделя́ть.

наделя́ть, наделúть pare ye-kirin, bela kirin; daîn (*давать*).

надерзúть *сов. см.* дерзúть.

наде́ть *сов. см.* надева́ть.

наде́яться *несов.* 1. (*возлагать надежды*) guman hebûn; 2. (*полагаться*) îtbar lêanîn (jêanîn).

надзе́мн||ый *прил.* yê ser erdê; **~ые сооруже́ния** avaîyê ser erdê.

надзира́тель *м.* qerewil *м.*, bekçî *м.*

надзира́ть *несов.* qerewilî (bekçîtî) kirin, miqat bûîn.

надзо́р *м.* qerewilî *ж.*, miqatbûîn *ж.*, bekçîtî *ж.*

надúвиться *сов. разг.* tér ecêb dîtin, tér temaşe kirin.

надкла́ссовый *прил.* yê ser sinifê.

надко́стни||ца *ж.* temarê hestû; **воспале́ние ~цы** *мед.* werima temarê hestûîya.

надлáмывать, надломúть serra şikênandin.

надлежа́щ||ий *прил.* yê lazim (*должный*); yê bihewce (*надобный*); **в ~ем смы́сле** bi nêta lazim; **в ~ срок** bi wedê lazim; **~им о́бразом** çawa ku lazime.

надлежúт *безл.* lazime, ĥewceîye; **~ сде́лать** gereke bê kirinê.

надло́м *м.* (*место надлома*) cîyê şikestî.

надломúть *сов. см.* надлáмывать.

надме́нно *нареч.* kubartî; qutamtî, pozbilindtî (*заносчиво*).

надме́нность *ж.* kubari *ж.*; pozbilindî *ж.*, qutamtî *ж.* (*заносчивость*).

надме́нный *прил.* yê kubar; yê qutam, yê pozbilind (*заносчивый*).

на́до I *безл.* (*нужно*) lazime. ĥewceîye, gereke.

на́до II *см.* над.

на́добно *безл.* (*нужно*) lazime, ĥewceîye, gereke.

на́добнос||ть *ж.* ĥewce *м.*, lazimati *ж.*; **в слу́чае ~ти** hergê ĥewce be, hergê lazim be; **нет ~ти** lazim (ĥewce) nîne.

надоеда́ть, надоéсть zele birin: şerpeze kirin (*беспокоить*);

мне э́то надое́ло ewyek zelê min bir; ~ **кому́-л.** zelê kesekî birin.

надое́дливый *прил.* yê zelebirinê; yê şerpeze (*беспокойный*).

надое́сть *сов. см.* надоеда́ть.

надои́ть *сов. см.* нада́ивать.

надо́й *м. с.-х.* şîrdaîn *ж.*, dotin *ж.*, doş *ж.*

надо́лго *нареч.* pirwext.

надорва́ть *сов. см.* надрыва́ть.

надорва́ться *сов. см.* надрыва́ться 1, 2.

надоу́мить *сов.* hîn kirin, rê daîn ber; şîret kirin (*посоветовать*).

надпи́ливать, надпили́ть serra birîn.

надпили́ть *сов. см.* надпи́ливать.

надписа́ть *сов. см.* надпи́сывать.

надпи́сывать, надписа́ть serra nivîsandin, ser (*tişteki*) nivîsandin.

на́дпись *ж.* nivîsar *ж.*; ~ **на ка́мне** nivîsara ser kevir.

надре́з *м.* 1. (*действие*) serrabirîn *ж.*; 2. (*место надреза*) qeliştok *ж.*, qul *ж.*

надре́зать *сов. см.* надре́зывать.

надреза́ть *см.* надре́зывать.

надре́зывать, надре́зать serra birîn (jêkirin).

надруга́тельство *с.* bênamûskirin *ж.*, bêhurmetkirin *ж.*; çiraxkirin *ж.*, robetkirin *ж.*, sosretkirin *ж.*, rezîlkirin *ж.*

надруга́ться *сов.* bênamûs (bêhurmet) kirin; çirax (robet, sosret, rezîl) kirin (*опозорить*).

надры́в *м.* 1. (*надорванное место*) cîyê qelişî, qeliştok *ж.*; 2. *перен.* (*болезненное проявление чувства*) sergermî *ж.*, hêrsbûn *ж.*; **говори́ть с ~ом** bi sergermî xeberdan.

надрыва́ть, надорва́ть 1. (*слегка разрывать*) neîser qelaştin; 2. *перен.* (*вредить себе чрезмерным усилием*) bi zorê xwe tel kirin, xwe qetandin.

надрыва́ться, надорва́ться 1. (*разрываться*) hatin qelaştine; 2. *тк. сов.* (*вредить себе чрезмерным усилием*) xwe qetandin; 3. *тк. несов.* (*работать через силу*) bi zorê şuxul kirin.

надсмо́тр *м.* miqatbûîn *ж.*, qerewilîkirin *ж.*

надсмо́трщик *м.* qerewil *м.*, miqatçî *м.*, bekçî *м.*

надста́вить *сов. см.* надставля́ть.

надста́вка *ж.* 1. (*действие*) serdazêdekirin *ж.*, danîn ser hev; 2. (*надставленное место*) kobe *ж.*

надставля́ть, надста́вить danîn ser hev, serda zêde kirin.

надстра́ивать, надстро́ить serra ava kirin.

надстро́ить *сов. см.* надстра́ивать.

надстро́йка I *ж. филос.* serban *м.*, avaî *м.*, teşkîleta serda, seraî *ж.*

надстро́йка II *ж.* 1. (*строительство*) serraçêkirin *ж.*, serraavakirin; 2. (*то, что надстроено*) avaîyê serra çêkirî.

надтре́снутый *прил. прям., перен.* yê terkdaî, yê ketî; ~ **го́лос** dengê ketî.

надува́тельство *с. разг.* (*обман*) xapandin *ж.*

надува́ть, наду́ть 1. pifdan, werimandin (*наполнять воздухом*); rast kirin (*расправлять*); **ве́тер наду́л паруса́** baê babirk rast kir; 2. *безл.* (*наносить течением воздуха*) surê birin; 3. *перен. разг.* (*обманывать*) xapandin.

надува́ться, наду́ться 1. hatin pifdanê (*наполняться воздухом*); rast bûîn (*расправляться*); **паруса́ наду́лись** babirk rast bûn; 2. *перен. разг.* (*обижаться*) xeîdîn, pin girîn.

наду́манный *прил.* yê ber xwe derxistî (*выдуманный*); yê çêkirî, yê qelp (*неестественный*).

наду́мать *сов. разг.* (*решить*) qirar (teşkîl) kirin, hatin ser qirarê.

надýтый *прил. разг.* 1. (*спесивый*) yê qure; 2. (*обиженный, угрюмый*) yê pingirî, yê pirçûkirî, yê xeîdî.

надýть(ся) *сов. см.* надувáть (-ся), дýть(ся).

надушúть *сов. см.* душúть II.

надушúться *сов. см.* душúться II.

надымúть *сов. см.* дымúть.

наедáться, наéсться têr bûîn (xwerin).

наединé *нареч.* tenê; **побы́ть ∽** tenê bûîn; **поговорúть ∽** tenê xeberdan.

наéзд *м.* 1. (*посещение*) hatin *ж.*, sertêdan *ж.*; 2. (*кавалерийский набег*) hucûm *ж.*, hucûma sewara (sîyara).

наéздник *м.* sîyar *м.*, sewarî *м.*

наéздом *нареч. разг.* nişkêva; **побывáть ∽** nişkêva hatin.

наезжáть, наéхать 1. *тк. несов.* (*посещать*) cara-cara hatin, cara-cara hatin sertêdanê; 2. (*наталкиваться*) hev ketin, daîn ser; 3. *разг.* (*скопляться*) top bûn, hatin ser hev.

наём *м.* kirê *ж.*, kirêkirin *ж.*; **рабóтать по нáйму** bi kirê paletî kirin; **∽ рабóчих** kirêkirîna pala.

наёмник *м.* 1. kirêçî *м.*; 2. *ист.* (*солдат*) eskerê kirêkirî; 3. *перен. презр.* xulam *м.*, noûker *м.*

наёмн‖ый *прил.* 1. yê kirê, yê kirêkirî; **∽ труд** xebata (cefa) kirê; **∽ые войскá** eskerê kirêkirî; 2. *перен.* (*продажный*) yê firotanê, yê tê kirînê; **∽ писáка** nivîskarê xwefiroş.

наéсться *сов. см.* наедáться.

наéхать *сов. см.* наезжáть 1, 2.

нажáть I *сов. см.* нажимáть.

нажáть II *сов. см.* жать I.

нажúва *ж.* kar *ж.*, qazanc *ж.*, feîde *ж.*

наживáть, нажúть 1. (*приобретать*) qazanc kirin, dest anîn, dest xistin; 2. kar dîtin (*получать прибыль*); dewlemend bûn (*богатеть*).

наживáться, нажúться (*обогащаться*) dewletî (axa) bûîn, zef qazanc kirin.

наживн‖óй *прил.*: **э́то дéло ∽ óе** *разг.* ewyek tiştekî qazancêîye.

нажúм *м.* guvaştin *ж.*, basmekirin *ж.*, şidandin *ж.*

нажимáть, нажáть 1. guvaştin; 2. *перен. разг.* (*торопить*) lez kirin, daîn lezketinê, lezandin.

нажúть(ся) *сов. см.* наживáть (-ся).

назáвтра *нареч. разг.* roja dinê, sibêra, bona sibê, sibê, sibetirê.

назáд *нареч.* 1. (*в обратном направлении*) paşda, şûnda, para; **возврати́ться ∽** şûnda (paşda) hatin, vegerîyan; **пя́титься ∽** xwe paşda daîn; 2. (*обратно*) paşda, şûnda; **отдáть ∽** vegerandin, şûnda daîn; 3. (*раньше*) berê, şûnda; **три дня [тому́] ∽** sê roja şûnda (berîhinga).

назади́ *нареч. разг.* parava, li paşîyê.

назва́н‖ие *с.* nav *м.*; **под ∽ием** bi navê; **по ∽ию** bi navê.

назва́ный *прил.*: **∽ брат** destebirak *м.*

назвáть I *сов. см.* называ́ть.

назвáть II *сов. разг.* (*пригласить*) teklîf (gazî) kirin.

назвáться *сов.* 1. (*назвать своё имя*) navê xwe hildan (gotin); 2. (*присвоить себе имя*) xwe nav kirin.

назéмн‖ый *прил.* yê ser erdê; **∽ые войскá** eskerê ser erdê, eskerê peîya.

нáземь *нареч. разг.* ser erdê.

назидáние *с.* şîret *ж.*, temî *ж.*; **в ∽** (*кому-л.*) bona temîyê.

назидáтельный *прил.* yê [bona] hînbûnê, yê temîkirinê.

нáзло *нареч.* rikava, rikî; **∽ тебé** rikî teva.

назначáть, назнáчить kivş kirin; **∽ на дóлжность** kivş kirin ser qulix; **∽ день отъéзда** roja çûînê kivş kirin.

назначе́ние *с.* 1. (*установление*) kivşkirin *ж.*, nîşankirin *ж.*; 2. (*на работу*) xebatdan *ж.*, şuxuldan *ж.*; **по ~ию** bi cîyê xebatê; 3. (*цель, задача*) mecem *м.*, mêt *ж.*; pirs *ж.*; **~ этого учебника** meremê vê kitêbê; 4. (*предписание*) destûr *ж.*, emir *м.*, hukum *ж.*; **по ~ию врача** bi destûra hekîm.

назначи́ть *сов. см.* назнача́ть.

назо́йливость *ж.* zelebirin *ж.*, şerpezekirin *ж.*

назо́йлив||ый *прил.* yê şerpeze, yê zelebirinê; yê nerehet (*беспокойный*); **~ челове́к** merîyê şerpeze; **~ые мысли** fikirê nerehet.

назре́ть, назре́ть 1. gihîştin, mezin bûn; 2. *перен.* (*приблизиться*) nêzîk (lerz) bûîn.

назре́ть *сов. см.* назрева́ть.

называ́емый *прич.* yê navhildanê; **так ~ые** usa gotî, yê binav.

наэлектризóвывать, наэлектризовáть 1. êlêktrîzê kirin; 2. *перен.* pînc kirin, navtêdan.

наябедничать *сов. см.* ябедничать.

наяву́ *нареч.* rastî; **сон ~** xewna rastî.

не *отриц. частица в разн. знач.* ne, na; **я не пое́ду домóй** ez naçime malê; **не уходи́** neçe; **я его́ не зна́ю** ez wî naznakim; **идёт не идёт** tê-naê; ◇ [a] **не то** (*в противном случае*) yanê; **не то..., не то ...** ya... ya...; **не то éхать, не то нет** herim ya neçim; **не páз** ne carekê; **не до** (*чего-л.*) ne wextê (*tiştekiye*); **ему́ не до меня́** wîra ne wextê mine, talaşa wî ez nînim; **не по себé** bêkêf; **не кто иной, как** kesek na, xenîjî; **тем не мéнее** li wê wextêjî..., hingêjî ...; **нé за что!** ne hêjaîye!

неаккура́тность *ж.* 1. (*неточность*) nerastî *ж.*; 2. (*небрежность*) nepakî *ж.*, xirabî *ж.*, tewekelî *ж.*

неаккура́тный *прил.* 1. (*неточный*) yê nerast; 2. (*небрежный*) yê nepak, yê tewekel.

неаппети́тный *прил.* yê bêîşte, yê netem.

небезопáсный *прил.* yê nebêxof, yê nebêsaw.

небезоснова́тельный *прил.* yê nebêesas, yê nebêîzbat, yê nebêhîm.

небезразли́чный *прил.* yê nebêtalaş.

небезрезульта́тный *прил.* yê nebêhasil, yê bihasil.

небезупре́чный *прил.* yê nebêqusûr.

небезызве́стно *в знач. сказ. безл.*: ~, что eyane wekî, ku; **э́то ~** ewyek eyane.

небезызве́стный *прил.* yê eyan, yê merûf, yê navdar.

небезынтере́сный *прил.* yê nebêhewas.

небелёный *прил.* yê sipînekirî.

небережли́вый *прил.* yê xerckirine, yê mesrefkirinê.

небесá *см.* нéбо.

небескоры́стный *прил.* yê timakar.

небéсно-голубóй *прил.* yê rengê ezman.

небéсн||ый *прил.* yê ezmên; **~ые светúла** steîrkê ezman.

неблаговúдный *прил.* yê nepak, yê nerast, yê xirab; **~ поступóк** kirinaîya nepak.

неблагодáрность *ж.* nerazîbûn *ж.*, neşêkirandin *ж.*, bêşikirî *ж.*; nepakî *ж.*

неблагодáрн||ый *прил.* yê bêşikir; yê nepak; **~ сын** kurê bêşikir; **~ая задáча** pirsa nepak.

неблагожелáтельность *ж.* xirabxwazî *ж.*

неблагожелáтельн||ый *прил.* yê xirabxwazîyê; **~ое отношéние** helaqetîya xirabxwazîyê.

неблагозвýчие *с.* bêdengî *ж.*, xirabdengî *ж.*

неблагозвýчный *прил.* yê bêdeng, yê xirabdeng.

неблагонадёжность *ж.* bêîtbarî bêbawerî *ж.*, qelsî *ж.*

неблагонадёжный *прил.* yê bêîtbar, yê bêîtmad, yê bêbawer, yê qels.

неблагополýчно *нареч.*: **у них ~** halê wana xirabe.

неблагополу́чный *прил.* yê xirab (*плохой*); yê nerehet (*неспокойный*).

неблагопристо́йный *прил.* yê nelaîq, yê bêkêr, yê bênamûs.

неблагоприя́тный *прил.* yê xirab, yê nepak; ~ **отве́т** cihaba xirab; ~ **оборо́т де́ла** xirabbûîna şuxul.

неблагоразу́мие *с.* bêaqilî *ж.*, bêhişî *ж.*

неблагоразу́мный *прил.* yê bêhiş, yê bêaqil.

неблагоро́дный *прил.* yê nepak, yê nelaîq, yê bêkêr, yê bêmerîfet.

неблагоустро́енный *прил.* yê xirabçêkirî, yê neavakirî, yê neçêkirî.

нёбн||ый *прил. в разн. знач.* yê pirîyê; ~**ые согла́сные** *лингв.* sewtê bêdenganî yê pirîya.

нёб||о *с.* ezman *м.*; ✧ **превозноси́ть до небе́с** heta ezman bilind kirin, zef paî (zef pesn) daîn; **под откры́тым ~ом** derva; **э́то земля́ и ~** (*о противоположностях*) ew notila erd û ezmêne; **с ~а свали́ться** *разг.* ji ezman ketin; **ме́жду ~ом и землёй** *разг.* orta erd û ezman.

нёбо *с. анат.* pirî *ж.*, dimaχ *ж.*

небога́тый *прил.* yê nedewlemend; yê feqîr (*бедный*); yê desteng (*скудный*).

небольш||о́й *прил.* yê biçûk (*маленький*); yê hûr (*мелкий*); yê hindik (*в количественном отношении*); **в ~о́м коли́честве** zef hindik.

небосво́д *м.* ezman *м.*, banî *м.*

небоскло́н *м.* ezman *м.*

небоскрёб *м.* avaîyê ezmanbir.

небре́жность *ж.* tewekelî *ж.*, nepakî *ж.*

небре́жный *прил.* yê tewekel, yê nepak.

небри́т||ый *прил.* yê kurnekirî; **~ое лицо́** sûretê kurnekirî.

небыва́лый *прил.* yê nebûî, yê nedîtî, yê neqewimî; ~ **слу́чай** qezîya nebûî.

небыли́ца *ж.* çîrok *ж.*, metelok *ж.* (*вымысел*); tiştê nebûî (*небывалое*).

небытие́ *с.* nebûîn *ж.*

нева́жно 1. *нареч.* xirab; **я себя́ ~ чу́вствую** halê min xirabe (tune), ez bedhalim; 2. *в знач. сказ. безл.*: **э́то ~** ewyek tişt nake.

нева́жный *прил.* 1. (*несущественный*) yê nemohîm, yê neferz; 2. (*довольно плохой*) yê xirab, yê nepak.

невдалеке́ *нареч.* nêzîkî, rex, fêza.

невдомёк *нареч. разг.*: **мне ~** nagîje (nakeve) aqilê min, ez fem nakim.

неве́дение *ж.* nezanbûnî *ж.*, belednebûîn *ж.*; bêxeberî *ж.* (*отсутствие сведений*).

неве́домый *прил.* yê neeyan, yê nekivş; yê mexfî, yê ecêb (*таинственный*).

неве́жа *м.*, *ж.* merîyê (jina) bêterb[îy]et (bêmerîfet).

неве́жда *м.*, *ж.* merîyê (jina) nezan (cahil, bêmerîfet, bêxeber).

неве́жественный *прил.* yê nezan, yê cahil, yê bêsewde, yê bêhaj.

неве́жество *с.* 1. (*незнание*) nezanî *ж.*, bêsewdebûîn *ж.*, nebeledî *ж.*; 2. *разг.* (*невоспитанность*) bêterb[îy]etî *ж.*, bêhurmetî *ж.*, bêedebî *ж.*

неве́жливость *ж.* bêmerîfetî *ж.*, bêterb[îy]etî *ж.*, bêhurmetî *ж.*, bêedebî *ж.*

неве́жливый *прил.* yê bêmerîfet, yê bêterb[îy]et, yê bêhurmet, yê bêedeb.

неве́рие *с.* bêbawerî *ж.*, bêîtbarî *ж.*, bêîtmadî *ж.*

неве́рность *ж.* 1. nerastî *ж.* (*неправильность*); bêheqîqetî *ж.* (*несправедливость*); 2. (*измена*) xaînî *ж.*

неве́рный *прил.* 1. (*ошибочный*) yê nerast, yê neheq, yê yaniş; 2. yê bêîtbar, yê bêbawer (*неуверенный*); yê sist (*слабый*);

3. (*вероломный*) yê xaînî, yê bêbawer.

невероя́тный *прил.* **1.** yê nerast (*неправдоподобный*); yê ecêb (*удивительный*); **2.** (*чрезвычайный*) yê neqewimî, yê nebûî.

неве́рующий *прил.* **1.** yê bêdîn, yê bêxudê; **2.** *в знач. сущ. м.* merîyê bêdîn (bêxudê).

невесёлый *прил.* yê neşa, yê bêkêf, yê bêbeşer.

неве́ста *ж.* bûk *ж.*, dergîstî *ж.*

неве́стка *ж.* bûk *ж.*, jina kur (*жена сына*); jinbire *ж.*, jina birê (*жена брата*).

невзго́да *ж.* bedbextî *ж.*, teşqele *ж.*; bela *ж.* (*беда*).

невзира́я *предлог*: ~ **на ли́ца** li merîya nenihêrî, kê ku nebe.

невзлюби́ть *сов.* ḧiz nekirin.

невзнача́й *нареч. разг.* nişkêva.

невзра́чный *прил.* yê hûr (*неказистый*); yê nebedew (*некрасивый*).

невзыска́тельный *прил.* yê bêdew.

неви́данный *прил.* yê nebûî, yê nedîtî, yê neqewimî.

неви́димый *прил.* yê nekivş, yê neeyan.

неви́нность *ж.* **1.** (*невиновность*) gunehkarnebûîn *ж.*, bêsûctî *ж.*; **2.** (*девственность*) qîzbûîn *ж.*, namûsî *ж.*, bakirebûn *ж.*

неви́нный *прил.* **1.** (*невиновный*) yê negunehkar, yê bêsûc; **2.** (*девственный*) yê binamûs, yê bakire.

невино́вность *ж.* gunehkarnebûîn *ж.*, bêsûctî *ж.*, bêtexsîrî *ж.*

невино́вный *прил.* yê negunehkar, yê bêeîb, yê bêsûc, yê bêtexsîr.

невку́сный *прил.* yê nexweş; yê bêtem (*безвкусный*).

невменя́емость *ж.* bêḧişî *ж.*, bêḧemdêxwebûîn *ж.*

невменя́ем||ый *прил.* yê bêḧemdê xwe, yê bêḧiş; ~**ое состоя́ние** ḧalê bêḧemdê xwe.

невмеша́тельство *с.* tevnebûîn *ж.*, dexilnebûîn *ж.*, bêdexaletî *ж.*

невмоготу́ *нареч. разг.* bi bedḧal, nikar bûn; **мне** ~ ez nikarim.

невнима́тельность *ж.* bêguhdarî *ж.*, guhdarînekirin *ж.*, neserwextî *ж.*

невнима́тельный *прил.* yê neguhdar, yê guhnedaînê, yê neserwext.

невня́тный *прил.* yê bêfem (*непонятный*); yê neeyan (*неясный*).

не́вод *м.* torê mesîya.

невозвра́тный *прил.* yê nevegerandinê, yê paşda nehatinê.

невозде́ланн||ый *прил.* yê bejî, yê bêcarnekirî, ~**ая земля́** erdê bêcarnekirî.

невозде́ржанность *ж.* netebitîbûîn *ж.*, bêqenaetî *ж.*, bêterb[îy]etbûîn *ж.*, berxwenedaîn *ж.*; bêsebirî *ж.* (*нетерпеливость*).

невозде́ржанный *прил.* yê netebitî, yê bêqenaet, yê nesitirî, yê berxwenedaî; yê bêsebr (*нетерпеливый*).

невозмо́жно *нареч.* **1.** (*недопустимо*) nabe; **э́то** ~ ewyek nabe, çare (îmkan) tune, naê qedandinê; **2.** *разг.* (*чрезвычайно*) zef, bêḧesab; **здесь** ~ **жа́рко** vira zef germe.

невозмо́жно||сть *ж.* nekarin *ж.*, bêîlacî *ж.*, bêîmkanî *ж.*, bêçaretî *ж.*, bêlaqtî *ж.*; ◇ **до** ~**сти** *разг.* ḧeta nikarbûnê, zef.

невозмо́жный *прил.* **1.** (*невыполнимый*) yê bêîlac, yê naê qedandinê, yê bêlaq, yê bêîmkan; **2.** *разг.* (*нестерпимый*) yê qaîm, yê bêḧesab, yê naê temûlkirinê, yê bêtab.

невозмути́мый *прил.* yê bêşerpeze, yê rehet, yê dilnerm, yê aram.

нево́лить *несов.* zor (mecbûr) kirin, daîn ser.

нево́льник *м.* bende *м.*, hêsîr *м.*, qûl *м.*

невóльно *нареч.* nişkêva, bêêxtîyartî.

невóльный *прил.* 1. (*вынужденный*) yê bizorê, yê mecbûr; 2. (*непроизвольный*) yê nişkêva, yê bêêxtîyar.

невóля *ж.* 1. (*рабство, плен*) hêsîrî *ж.*; **фашúстская ~** hesîrîya faşîstîyê; 2. *разг.* (*необходимость*) lazimî *ж.*

невообрази́мый *прил.* yê nebûî (*небывалый*); yê nedîtî (*несказанный*); yê ecêb (*удивительный*).

невооружённ||ый *прил.* yê bêsîliħ, yê sîliħnekirî; ◇ **~ым глáзом** bi çevê xwe, bê dûrbînê.

невоспúтанность *ж.* bêterb[îy]etî *ж.*, bêedebî *ж.*, bêperdaqî *ж.*

невоспúтанный *прил.* yê bêterb[îy]et, yê bêedeb, yê bêperdaq.

невосприи́мчивый *прил.* 1. yê bêfem, yê direngfem; 2. (*к болезням*) yê pênakeve, yê nexweşnakeve.

невпопáд *нареч.* bêwext (*не вовремя*); bêcî, bêçax (*некстати*).

невразумúтельный *прил.* (*непонятный*) yê neşem, yê bêfem.

невралги́я *ж. мед.* nêvraljî *ж.*

неврастéник *м.* merîyê nêvrastênîk.

неврастéния *ж. мед.* nêvrastênî *ж.*

невреди́мый *прил.* yê saxlem; yê saxî û selamet (*о людях*).

невро́з *м. мед.* nêvroz *ж.*

невропатóлог *м. мед.* nêvropatolog *м.*

невтерпёж *нареч. разг.*: **емý стáло ~** ewî temûl nekir, ewî sebr nekir, ewî tab nekir.

невы́года *ж.* feîdetunebûn *ж.*, kartunebûn *ж.*; zerar *ж.*, zîyan *ж.* (*убыток*).

невы́годный *прил.* yê bêfeîde, yê bêkar; yê bizerar, yê bizîyan (*убыточный*).

невы́держанный *прил.* 1. yê netebitî (*неуравновешенный*); yê bêperdaq, yê bêperseng (*невежливый*); yê bêterb[îy]et (*невоспитанный*); 2. (*не вполне готовый — о вине и т. п.*) yê hazirnebûî, yê xweînekirî.

невыноси́мый *прил.* yê naê temûlkirinê, yê bêtab.

невыполне́ние *с.* neqedandin *ж.*; **~ обяза́тельств** neqedandina borc (wezîfê).

невырази́мый *прил.* yê naê gotinê; yê ecêb (*удивительный*).

невырази́тельный *прил.* yê nekivş, yê neeyan, yê ne ber bi çev.

невысóкий *прил.* yê nebilind; yê kin, yê nimz (*низкий*); **~ рост** bejina kin; **~ у́ровень разви́тия** mîzana pêşdaçûîna nebilind.

невы́ход *м.* derneketin *ж.*; **~ на рабóту** derneketin ser xebatê.

негати́в *м. фот.* klîşê *ж.*, nêgatîv *ж.*

негашён||ый *прил.*: **~ая и́звесть** kirêca neşewitandî.

нéгде *нареч.* cî tune (*нет места*); ji tucîya (*неоткуда*); **~ взять** cîyê hildanê tune, cî tune ku hildin; **~ сесть** cîyê rûniştinê tune.

негигиени́ческий *прил.*, **негигиени́чный** *прил.* (*нечистый*) yê netemîz, yê qirêj, yê pîs.

негла́сный *прил.* yê binalî, yê mexfî; yê xepe-xep (*тайный*).

неглу́пый *прил.* yê neaxmax, yê nebêaqil, yê serwext.

негóдность *ж.* bêkêrî *ж.*, kêrnehatin *ж.*; nelazimî *ж.*, netêî *ж.* (*ненужность*); xirabbûîn *ж.* (*испорченность*).

негóдный *прил.* yê bêkêr; yê nelazim, yê netê (*ненужный*); yê xirabbûî (*испорченный*).

негодова́н||ие *с.* hêrs *ж.*, kel *ж.*; **взрыв ~ия** kela hêrsbûînê (nerazîbûnê).

негодова́ть *несов.* hêrs bûîn.

негодя́й *м.* nemerd *м.*, merîyê bênamûs.

негостеприи́мный *прил.* yê bêmerîfet, yê bêezet-qulix.

негр *м.* reşî *м.*, zengî *м.*

негра́мотность *ж.* nezanî *ж.*; nebeledî *ж.* (*неосведомлённость*);

bêsewdebûîn *ж.*, nexwendîtî *ж.* (*безграмотность*).

негра́мотный *прил.* yê nezan; yê nebeled (*неосведомлённый*); yê bêsewde, yê nexwendî (*безграмотный*).

негрита́нский *прил.* yê zengî, yê reşî.

неда́вно *нареч.* li wê axirîyê; van roja (*на днях*).

недалёк||ий *прил.* 1. (*близкий — о расстоянии*) yê nêzîk, yê nedûr; ~ **путь** rîya nêzîk; 2. (*близкий по времени*) li weda nêzîk; **в ~ом бу́дущем** li nêzîkaîya wê bê; 3. *перен.* (*глуповатый*) yê neaqil, yê kêmaqil.

недалеко́ *нареч.* nêzîk; ◇ **за приме́ром ~ идти́** bona sozmesel dûr ketin lazim nîne, bona mesela lazim nîne ku herne dûr.

недальнови́дность *ж.* dûrnebînî *ж.*, pêşdanenihêrîn *ж.*; bêtevdîrî *ж.* (*непредусмотрительность*).

недальнови́дный *прил.* yê dûrnebîn, yê dûr nabîne; yê bêtevdîr (*непредусмотрительный*).

неда́ром *нареч.* 1. (*не без причины*) lema; ~ **говоря́т** lema dibêjin; 2. (*не без цели*) cîyê belasebeb + *отрицательная форма глагола*: ~ **он прие́хал** ew cîyê belasebeb nehatîye.

недви́жим||ый *прил. юр.*: ~**ое иму́щество** mal-ħal *м.*, malê cîneleqîyaî.

недееспосо́бность *ж.* 1. *юр.* bêheqî *ж.*; 2. bêqewetî *ж.*, sistbûîn *ж.*, nekarbûn *ж.*, bêħalî *ж.*

недееспосо́бный *прил.* 1. *юр.* yê bêheq; 2. yê bêqewet (*бессильный*); yê sist, yê bêħal (*слабый*).

недействи́тельный *прил. юр.* yê bêkêr, yê bêqewet, yê naê ħesabê, yê nerast, yê netê.

недели́мый *прил.* yê naê parevekirinê (belakirinê).

неде́льный *прил.* yê ħeftê, yê ħeftekê; ~ **срок** ħeftêk *ж.*, wedê ħefteke.

неде́||ля *ж.* ħeftê *ж.*; **ка́ждую ~лю** her ħeftê; **за две ~ли** li du ħeftîyada.

недисциплини́рованность netebitî *ж.*, nesbûîn *ж.*, bêîntîzamî *ж.*

недисциплини́рованный *прил.* yê netebitî, yê nes, yê bêîntîzam.

недоброжела́тельность *ж.* xirabxwezî *ж.*, bêxêrî *ж.*; neyarî *ж.* (*недружелюбие*).

недоброжела́тельный *прил.* yê xirabxwez, yê bêxêr; yê neyar (*недружелюбный*).

недоброка́чественный *прил.* yê nepak (*нехороший*); yê xirab (*испорченный*); yê biqusûr (*с изъяном*).

недобросо́вестный *прил.* yê neħelal, yê nerast; yê bênamûs, yê bedîman (*бесчестный*); yê bêvîjdan (*бесовестный*).

недове́рие *с.* bêîtbarî *ж.*, bêîtmadî *ж.*, bêbawerî *ж.*

недове́рчивый *прил.* yê bêîtbar, yê bêbawer, yê bêîtmad.

недово́льный *прил.* yê nerazî.

недово́льство *с.* nerazîtî *ж.*

недоглядéть *см.* недосмотре́ть.

недоеда́ние *с.* têrnexwerin *ж.*, birçîbûîn *ж.*

недоеда́ть *несов.* têr nexwerin, birçî bûîn.

недозво́ленный *прил.* yê bêîzn; yê qedexe (*запрещённый*); yê bêqanûn, yê bêqirar (*незаконный*); yê bêdestûr (*неразрешённый*).

недозре́лый *прил.* yê negihîştî, yê xang; yê şîn (*зелёный*).

недо́лгий *прил.* yê kurt, yê hindik.

недо́лго *нареч.*: ~ **ду́мая** zef duşirmîş nebûîn; ~ **и...** çetin nîne; ~ **и упа́сть** ketin çetin nîne.

недолгове́чность *ж.* kêmwextî *ж.*, kêmwedetî *ж.*, wedê hindik, nehergavtî *ж.*

недолгове́чный *прил.* yê kêmwede, yê kêmwext, yê nehergav.

недомога́ние *с.* bêkêfbûîn *ж.*, bêtaqetbûîn *ж.*, qudûmketin *ж.*, zeîfî *ж.*, bedħalî *ж.*

недомога́ть *несов. разг.* bêkêf (bêtaqet, zeîf) bûîn, qudûm ketin.

недомы́слие *с.* kêmaqilî *ж.*, bêhişî *ж.* (*глупость*); femnekirin *ж.* (*непонимание*).

недооце́нивать, недооценить biha (qîmet) nekirin.

недооценить *сов. см.* недооце́нивать.

недооце́нка *ж.* bihanekirin *ж.*, qîmetnekirin *ж.*

недопусти́мый *прил.* yê nekirî; yê nelaîq (*недостойный*); yê xirab (*плохой*); yê bêîzn (*неразрешённый*).

недоразуме́н||ие *с.* 1. şaşî *ж.*; qelet *ж.*, xeta *ж.* (*ошибка*); **по ~ию** şaştî; 2. *разг.* (*спор, ссора, пререкание*) qezîya *ж.*, şer-dew *ж.*, şert *м.*

недо́рого *нареч.* nebiha; erzan (*дёшево*).

недорого́й *прил.* yê nebiha; yê erzan (*дешёвый*).

недоро́д *м.* xelaî *ж.*

не́доросль *м.* 1. *ист.* maqûlê cahil; 2. *разг. ирон.* xortê axmax (femkor).

недосмо́тр *м.* guhnedaîn *ж.*, nenihêrîn *ж.*, qerewilînekirin *ж.*, miqatnebûn *ж.*

недосмотре́ть *сов.* pak nenihêrîn, pak guh nedaîn (miqatnebûn).

недоспа́ть *сов. см.* недосыпа́ть.

недоспе́лый *прил.* yê xang, yê negihîştî; yê şîn (*зелёный*).

недоставать, недоста́ть kêm bûîn, têrênekirin.

недоста́ток *м.* 1. (*нехватка*) kêmasî *ж.*; 2. (*дефект*) qusûr *ж.*

недоста́точный *прил.* yê hindik, yê kêm, yê têrê nake.

недоста́ть *сов. см.* недоставать.

недоста́ча *ж. разг.* kêmasî *ж.*, hindikbûîn *ж.*, têrênekirin *ж.*

недостове́рный *прил.* yê nerast, yê nekivş; yê nemiqîm (*неточный*).

недосто́йный *прил.* yê nelaîq; **~ внима́ния** yê laîqî qedr-qîmetê nîne; **~ челове́к** merîyê nelaîq.

недосту́пн||ый *прил.* 1. (*непонятный, трудный*) yê bêfem, yê çetin; **э́та кни́га ~а де́тям** ev kitêb bona zara çetine; 2. (*неприступный*) yê mehkemkirî, yê ku naê altkirinê, yê ku naê qedandinê; **~ая высота́** bilindaîya ku naê altkirinê; **~ые це́ли** meremê ku naêne qedandinê; 3. (*по цене*) yê biha, yê pirqîmet.

недосу́г *м. разг.*: **мне ~ с ним разгова́ривать** mecala min tune wîra xeberdim.

недосчита́ться *сов. см.* недосчи́тываться.

недосчи́тываться, недосчита́ться kêm bûîn, nedîtin; **~ не́скольких книг** çend kitêb nedîtin.

недоспа́ть, недоспа́ть têr ranezan, têr xewa xwe nestandin (hilnedan).

недосяга́емый *прил.* yê naê gihîştinê; yê çetin (*трудный*).

недоу́здок *м.* hefsar *м.*, qetirme *ж.*, dizgîn *ж.*

недоумева́ть *несов.* şaş (metel, heîr) maîn; fem nekirin (*не понимать*).

недоуме́н||ие *с.* şaşmaîn *ж.*, metelmaîn *ж.*, heîrmaîn *ж.*; femnekirin *ж.* (*непонимание*); **с ~ием, в ~ии** bi metel, şaşmaî.

недоуме́нный *прил.*: **~ вопро́с** pirsa şaşkirinê.

недочёт *м.* 1. (*недостаток*) kêmasî *ж.*; 2. (*изъян*) qusûr *ж.*

не́дра *мн.* 1. erd *м.*, xwelî *ж.*; 2. *перен.* hundurê erdê.

не́друг *м.* neyar *м.*; dujmin *м.* (*враг*).

недружелю́бн||ый *прил.* yê neyarîyê; yê dujminatîyê (*враждебный*); **~ое отноше́ние** helaqetîya neyarîye.

неду́г *м.* merez *ж.*, nexweşî *ж.*

неду́рно *нареч.* xirab (*при отрицательном глаголе*); **он ~ сказа́л** ewî xirab negot, ewî baş got.

недурно́й *прил.* yê nexirab; yê baş (*хороший*).

недю́жинный *прил.* yê navdar, yê merûf, yê zef aqil.

неесте́ственный *прил.* 1. (*притворный*) yê nerastî; 2. (*необычный, деланный*) yê netebîetîyê; yê çêkirî, yê qelp.

нежда́нно *нареч.*: ~**-нега́данно** *разг.* nişkêva.

нежда́нный *прил.* yê nişkêva.

нежела́ние *с.* nexwestin *ж.*, dilnekirin *ж.*, hiznekirin *ж.*

нежела́тельный *прил.* yê bêhewas; yê nelazim (*ненужный*).

не́жели *союз уст.* ji; **му́лы вы́носливей,** ~ **ло́шади** qantir ji hespa teyaxmîştirin.

неженáтый *прил.* 1. yê azep, yê bêjin; 2. *в знач. сущ. м.* merîyê azep.

не́женка *м., ж. разг.* merîyê (jina) nazik.

неживо́й *прил.* 1. (*мёртвый*) yê bêruh, yê nesax, yê candaî, yê mirî; 2. (*вялый*) yê sist, yê bêqudûm, yê zeîf.

нежи́зненный *прил.* yê neferz, yê nemohîm (*ненасущный*); yê bêemel (*непрактичный*).

нежил||о́й *прил.* yê ne ku bona jîînê; ~**óе помеще́ние** oda ne bona jîînê.

не́жить *несов.* naztî (delal) xweî kirin.

не́житься *несов.* xwe nazî kirin.

не́жность *ж.* nazî *ж.*, letîfî *ж.*

не́жный *прил.* 1. (*ласковый*) yê naz; 2. (*негрубый, мягкий*) yê tenik, yê nerm; 3. (*хрупкий, слабый*) yê sist, yê zeîf.

незабве́нный *прил.* yê ku naê bîrkirinê.

незабу́дка *ж.* çîçek *ж.*

незабыва́емый *прил.* yê bîrnekirinê, yê ku naê bîrkirinê.

незави́дн||ый *прил.* yê nepak, yê xirab, yê çetin; ~**ое положе́ние** halê çetin.

незави́симо *нареч.* xenîjî ..., nenihêrî li ..., serbestî ji ..., beî wêyekê; ~ **от того́, что** ... xenîjî wê yekê ku...

незави́симость *ж.* xwexwetî *ж.*, xweîbûn *ж.*, serbestî *ж.*

незави́симый *прил.* yê xwexwetîyê, yê xweîbûnê, yê serbest.

незадо́лго *нареч.* pêşîya, nêzîkaîya; ~ **пе́ред пра́здником** pêşîya eîdê.

незако́нный *прил.* yê bêqanûn, yê bêqirar, yê bêraî.

незамедли́тельно *нареч.* vê lezê, niha, ferz.

незамени́мый *прил.* yê naê guhastinê; yê zef lazim (*очень нужный*).

незаме́тно *нареч.* (*украдкой*) tele-tel, xepe-xep, dizîkava.

незаме́тный *прил.* 1. yê nekivş; yê naxwîyê (*почти не видный*); 2. (*незначительный*) yê biçûk, yê neîser.

незамýжняя *прил.* jina azep (mêrnekirî).

незамыслова́тый *прил. разг.* yê neçetin, yê hêsa.

неза́нятый *прил.* yê bêxebat, yê betal, yê bêşol (*работой*); yê vala (*пустой, свободный*).

незапáмятн||ый *прил.* yê qedîm; **с** ~**ых времён** ji zemanê qedîm.

незапя́тнанный *прил.* yê bêleke, yê bêqusûr; yê temîz (*чистый*).

незаслýженный *прил.* yê neheq, yê nelaîq; yê nerast (*неправильный*).

незате́йливый *прил. разг.* yê hêsa, yê neçetin.

незауря́дн||ый *прил.* yê zef baş, yê biferesat; ~**ая ли́чность** merîyê biferesat.

не́зачем *нареч.* bêfeîdeîye, bêkêre, cîyê belesebeb (*напрасно*); bêhûdê (*бесполезно*).

незва́ный *прил.* yê teklîfnekirî, yê nexwendî; ~ **гость** mêvanê nexwendî.

нездоро́вит||ься *безл.*: **мне немно́го** ~**ся** halê min tuneîye, ez hinekî bêkêfim (xwe digazînim).

нездоро́в|ый *прил.* 1. yê nexweş (*больной*); yê nesaẍ, yê bedẖal (*болезненный*); 2. (*вредный*) yê bizerar, yê zîyankar; yê nepak.

нездоро́вье *с.* bêselhetî *ж.*, bêsehetbûîn *ж.*, nexweşbûîn *ж.*, bedẖalî *ж.*

незлоби́вый *прил.* yê nehêrs.

незнако́мец *м.* merîyê nenas.

незнако́мство *с.* (*незнание чего-либо*) nenasî *ж.*, nezanî *ж.*, nebeledî *ж.*

незнако́мый *прил.* yê nenas; ~ **челове́к** merîyê nenas.

незна́ние *с.* nezanbûn *ж.*, nezanî *ж.*, nebeledbûîn *ж.*

незначи́тельный *прил.* 1. (*небольшой*) yê zef hindik, yê zef kêm, yê neîser; yê hûr (*мелкий*); 2. (*маловажный*) yê neferz, yê nemohîm.

незре́л|ый *прил.* 1. yê negihîştî, yê xang, yê şîn (*о фруктах, овощах*); yê kal (*об арбузах*); 2. *перен.* yê cahil, yê negihîştî; ~**ая мысль** fikira negihîştî.

незри́мый *прил.* yê ku naê dîtine, yê nekivş, yê binalî, yê naê xwuyanê; yê mexfî (*тайный*).

незы́блемость *ж.* meẖkembûîn *ж.*, qaîmbûîn *ж.*, bêşikî *ж.*

незы́блемый *прил.* yê meẖkembûî, yê qaîmbûî, yê ji cî naleqe, yê bêhej.

неизбе́жно *нареч.* ese, miqîm, hebe-tunebe.

неизбе́жность *ж.* eseî *ж.*, miqîmî *ж.*

неизбе́жный *прил.* yê eseî, yê miqîm.

неизве́данный *прил.* 1. (*неиспробованный, неиспытанный*) yê necêribandî, yê temnekirî; 2. yê hînnekirî, yê şirovenekirî (*неизученный*); yê nenas (*незнакомый*).

неизве́стно *в знач. сказ. безл.* eyan nîne; **мне** ~ minva eyan nine, ez nizanimê, minva neeyane.

неизве́стность *ж.* 1. (*отсутствие сведений*) neeyanî *ж.*, nekivşî *ж.*; 2. (*отсутствие известности*) eyannebûîn *ж.*, kivşnebûn *ж.*

неизве́стный *прил.* yê nekivş, yê neeyan; yê nenas (*незнакомый*).

неизгладимый *см.* незабыва́емый.

неи́зданный *прил.* yê neşirnekirî.

неизлечи́м|ый *прил.* yê qenc nabe; yê bêderman; ~**ая боле́знь** nexweşîya qenc nabe; **он неизлечи́м** ew qenc nabe, qencbûna wî tuneîye.

неизме́нно *нареч.* hergav, hertim; deẖim (*постоянно*).

неизме́нный *прил.* yê bêveguhastinê, yê hergav, yê hertim; yê deẖim (*постоянный*).

неизмери́мый *прил.* (*огромный*) yê zef, yê bêhesab, yê naê gotinê, yê ku naê pîvandinê.

неимéн|ие *с.* tunebûn *ж.*, kêmasî *ж.*, têrênekirin *ж.*; **за** ~**ием** bi sebeba têrênekirinê; **за** ~**ием вре́мени** bi sebeba wexttunebunê.

неимове́рный *прил.* yê zef, yê bêhesab (*бессчётный*); yê ecêb (*удивительный*); yê naê bawerkirinê (*невероятный*).

неиму́щий *прил.* 1. yê desteng, yê belengaz, yê feqîr, yê kesîb; 2. *в знач. сущ. м.* merîyê belengaz (feqîr, kesîb).

неискренний *прил.* yê neẖelal; yê qelp (*фальшивый*).

неискренность *ж.* neẖelalî *ж.*; qelpî *ж.* (*фальшь*).

неискушённый *прил.* yê necêribandî, yê xam.

неисполне́ние *с.* neqedandin *ж.*; ~ **распоряже́ния** neqedandina emir.

неисполни́мый *прил.* yê ku naê qedandinê, yê ku naê serî.

неисполни́тельность *ж.* neqeqedandinî *ж.*, neanîn sêrî.

неисправи́мый *прил.* yê rast nabe, yê ku naê terb[îy]etkirinê.

неиспра́вность *ж.* 1. (*машины и т. п.*) xirabbûîn *ж.*, şikestin *ж.*, ciderketin *ж.*; 2. (*ошибка, недосмотр*) şaşî *ж.*, qelet *ж.*

неиспра́вный *прил.* 1. (*поломанный*) yê xirab; 2. *разг.* (*неаккуратный*) yê bêterb[iy]et, yê tewekel.

неиспы́танный *прил.* yê neceribandî, yê xam.

неиссле́дованный *прил.* yê eyannekirî, yê nenihêrî, yê şirovenekirî, yê dornenihêrî.

неиссяка́емый *прил.* yê ku xilas nabe, yê kutanabe, yê bêxilasbûn, yê bêkutabûn.

нейстовство *с.* 1. (*исступление*) xezebbûîn *ж.*, hêrsbûîn *ж.*, ĥarbûîn *ж.*; 2. (*жестокий поступок*) zulumî *ж.*, bêremî *ж.*, bêkeremî *ж.*

нейстовствовать *несов.* hêrs (ĥar) bûîn.

нейстовый *прил.* 1. (*исступлённый*) yê hêrs, yê xezeb; 2. (*жестокий*) yê bêrem.

неисцели́мый *см.* неизлечи́мый.

неисчерпа́емый *см.* неистощи́мый.

неисчисли́мый *прил.* yê bêĥed, ye bêhesab, yê bêhejmar.

ней *см.* она́.

нейтрализа́ция *ж.* 1. (*кого-л., чего-л.*) bêterefkirin *ж.*; ~ **середня́к** bêterefkirina gundiyê orte; 2. *хим.* nêûtralîzêkirin *ж.*, bêĥasilkirin *ж.*

нейтрализова́ть *несов. и сов.* 1. bêteref kirin; 2. *хим.* bêĥasil (nêûtralîzê) kirin.

нейтралите́т *м.* bêterefî *ж.*, tevnebûîn *ж.*, bêdixaletî *ж.*; **соблюда́ть** ~ bêterefî kirin.

нейтра́льный *прил.* 1. yê bêteref; ~**ая зо́на** nehîya bêteref; ~**ое госуда́рство** dewleta bêteref; 2. *хим.* yê bêĥasil.

нейтро́н *м. физ.* nêûtron *ж.*

неквалифици́рованный *прил.* yê necêribandî, yê bêpêşe; ~ **рабо́чий** palê necêribandî (bêpêşe).

не́кем *твор. п. от* не́кого.

не́кий *мест.* yekê, merîk, bêvan; ~**ие ли́ца** hinek merî, hineka.

не́когда I *нареч.* (*нет времени*): **мне сего́дня** ~ îro wextê min tune; ez îro betal nînim (*я сегодня занят*).

не́когда II *нареч.* (*когда-то*) wextekê, zemanekê; rojekê (*однажды*).

не́кого *мест.* kes tune; ~ **посла́ть** kesek tune wekî ku wî bişînin; **его́ не́кем заменя́ть** kesek tune wekî wî buguhêzin; **не́ у кого спроси́ть** kesek tune wekî ku lêpirskin; **не́кому пойти́ за кни́гами** kesek tune wekî ku here peî kitêba.

некомпете́нтность *ж.* nezanbûn *ж.*, başernekirin *ж.*, belednebûîn *ж.*

некомпете́нтный *прил.* yê nebeled, yê nezan.

не́кому *дат. п. от* не́кого.

не́который *мест.* 1. ~**ое вре́мя** wextekê; 2. *в знач. сущ. мн.* ~**ые** hinek; ~**ые лю́ди** hinek merî, hineka.

некраси́вый *прил.* 1. yê nebedew, yê nerind, yê nekaw; 2. *разг.* (*непорядочный*) yê nelaîq, yê nebaş, yê bêmerîfet, yê bêşuhret; ~ **посту́пок** kirina nepak, kirina (emelê) nelaîq.

некрити́ческий *прил.* yê netenqîdî; ~**ое отноше́ние** helaqetîya netenqîdî.

некроло́г *м.* nêkrolog *ж.*

некста́ти *нареч.* 1. (*не к месту*) bêcî; 2. (*не вовремя*) bêwext, bêçax.

нектар *м.* 1. *миф.* nêktar *ж.*; 2. *бот.* şîra şîrin.

не́кто *мест.* merîkî *м.*, yekê *м.*; ~ **мне сказа́л** yekê (merîkî) gote min, mirovekî minra got.

не́куда *нареч.* cî tune, tuciya.

некульту́рность *ж.* bêkûltûrî *ж.* (*отсутствие культуры*); bêmerîfetî *ж.*, bêterb[iy]eti *ж.*, bêedebî *ж.* (*некультурное поведение*).

некульту́рный *прил.* 1. yê bêterb[îy]et; 2. (*о поведении*) yê bêkûltûr, yê bêedeb.

некуря́щ|ий *прил.* yê ciẍarê nekişîne; 2. *в знач. сущ. м.* merîyê ciẍarê nekişîne; **вагóн для ~их** vagona ciẍarenekêşa.

нелады́ *мн. разг.* hevnekirin *ж.*, qerebalix *ж.*, qalmeqal *ж.*

нелега́льн|ый *прил.* yê neeşkere; yê binalî, yê mexfî (*тайный*); **на ~ом положе́нии** bi halê binalî.

нелёгкий *прил.* 1. (*трудный*) yê nesivik, yê çetîn; 2. (*тяжёлый*) yê giran, yê bicefa.

нелéпость *ж.* bênêtî *ж.*, bêmenî *ж.*; axmaxî *ж.* (*глупость*).

нелéпый *прил.* yê bênêt, yê bêmenî; yê axmax (*глупый*).

нело́вкий *прил.* 1. (*неуклюжий*) yê giran; 2. (*неудобный*) yê bêfesal; 3. (*неприятный, затруднительный*) yê nepak, yê çetîn.

нело́вко *нареч.* 1. *в знач. сказ. безл.* (*неудобно*) bêfesale; 2. (*стеснительно, неприятно*) şerme, eîbe.

нело́вкость *ж.* 1. (*неуклюжесть*) giranî *ж.*; 2. (*неудачный поступок*) kirina xirab; 3. (*чувство смущения, стеснительности*) şermkirin *ж.*

нелогúчный *прил.* yê bêmenî.

нельзя́ *нареч.* 1. (*невозможность*) nabe, mecal tune; **мне ~ бы́ло** mecala min tunebû; **мне ~ бы́ло приходи́ть** ez nikarbûm bihatama; **~ отрица́ть** înkar nabe; 2. (*не разрешается*) îzn nîne; ◇ **как ~ лу́чше** çawa ku lazime, zef baş; **~ ли** nabe wekî ku; **~ сказа́ть, что́бы...** naê gotinê wekî ku..., em nikarin bejin wekî ku...

нелюбе́зный *прил.* yê bêmerîfet, yê bêhurmet.

нелюби́мый *прил.* yê ĥiznekirinê, yê bêbengî, yê bêĥiz.

нелюбо́вь *ж.* ĥiznekirin *ж.*

нелюди́мый *прил.* yê pirçûkirî (*нелюдимый*); yê beyanî (*дикий*).

нём *предл. п. от* **он, оно́**.

немáло *нареч.* 1. nehindik; zef (*много*); 2. hindik (*с отрицательным глаголом*); **я ~ сде́лал** min hindik nekir.

немалова́жный *прил.* yê mohîm, yê ferz; yê lazim (*нужный*).

немáл|ый *прил.* yê zef, yê mezin; **~ое значе́ние** qîmeta zef; **~ая по́льза** feîda mezin.

неме́дленно *нареч.* ferz, vêlezê; vêsehetê, ese, vêgavê (*сейчас*).

неме́дленный *прил.* yê ferz, yê vêlezê; yê eseî, yê vêgavê.

немéркнущ|ий *прил.* (*вечный, постоянный*) yê hergavîyê, yê natemire, yê dehîm, yê heta-ĥetaîyê; **~ая сла́ва** rûmeta heta-ĥetaîyê; **~ свет** şewaqa natemire.

немéть, онеме́ть 1. (*терять дар речи*) lal bûîn; 2. *перен.* tevizîn (*мертветь, цепенеть*); req bûîn (*терять чувствительность*).

нéмец *м.* lems *м.*, alman *м.*

немéцкий *прил.* yê lemsa, yê almanî; **~ язы́к** zimanê lemsa (almanî).

немилосéрдный *прил. прям., перен.* yê bêrem (*безжалостный*); yê dilkevir, yê bêkerem, yê dilqaîm (*жестокосердный*); **~ хóлод** serma bêrem.

немúлость *ж.* bêremî *ж.* (*безжалостность*); dilkeyirî *ж.*, dilqaîmî *ж.*, bêkeremî *ж.* (*жестокосердие*).

неминýемый *прил.* yê miqîm.

немнóг|ий *прил.*: **~им бóльше** hinekî (neîser) zêdetir; **в ~их слова́х** bi xeberê kurt, xulase.

немнóго *нареч.* 1. (*в некоторой степени*) hinekî, hindikî; **я ~ уста́л** ez hinekî westîyame; 2. (*мало, чуть-чуть*) hindik, kêm; **оста́лось ~ вре́мени** wext hindik maîye.

немногосло́вный *прил.* yê kêmxeber.

немногочúсленный *прил.* yê nezef, yê hindik.

немно́жечко, немно́жко *см.* немно́го.

немо́й *прил.* 1. yê lal; 2. *в знач. сущ. м.* meriye lal.

немолодо́й *прил.* yê necahil; yê pir, yê kal (*старый*).

немота́ *ж.* lalî *ж.*, lalbûn *ж.*

не́мощный *прил.* yê bêhal, yê sist, yê zeîf (*слабый*); yê nexweş (*больной*).

нему́ *дат. п. от* он, оно́.

не мудрено́ *в знач. сказ. безл.* çetin nîne; ~ **ошиби́ться** şaşbûn çetin nîne.

немы́слимый *прил.* yê nakeve aqila; yê nebûî, yê neqewimî (*небывалый*).

ненави́деть *сов.* nefret (mede) kirin.

ненави́стный *прил.* yê binefret.

не́нависть *ж.* nefret *ж.*, adkirin *ж.*; **пита́ть (испы́тывать)** ~ nefret kirin.

ненадёжный *прил.* 1. (*непрочный*) yê neqaîm; 2. (*недостоверный*) yê bêbawer, yê bêitbar, yê bêîtimad.

нена́добно||сть *ж.* bêkêrî *ж.*, nelazimî *ж.*; **за ~стью** bona nelazimîyê.

ненадо́лго *нареч.* bi weda kurt.

ненападе́н||ие *с.* ĥucûmnekirin *ж.*; **пакт о ~ии** qirarê (pêîmana) ĥucûmnekirinê.

нена́стный *прил.* yê biewir; yê baranî (*дождливый*); ~ **день** roja ewirai.

ненорма́льность *ж.* 1. (*отклонение от нормы*) bêqaîdebûn *ж.*, bêtertîbbûn *ж.*; 2. (*душевное заболевание*) bêaqili *ж.*, dînî *ж.*

ненорма́льный *прил.* 1. (*уклоняющийся от нормы*) yê bêqaîde, yê bêçar; 2. (*душевнобольной*) yê dîn, yê gêj, yê tepaketî, yê cinaketî.

нену́жный *прил.* yê nelazim, yê bêkêr.

необду́манный *прил.* yê bêĥiş, yê bêaqil; ~ **посту́пок** kirina bêaqil.

необеспе́ченный *прил.* yê bêîlac, yê bêtîvdarek, yê bêabûr, yê bêçare.

необита́емый *прил.* yê bêmerî, yê xalî; ~ **о́стров** cezîra bêmerî.

необозри́мый *прил.* yê bêĥed, yê bêsînor, yê bêser û bini.

необосно́ванность *ж.* bêsasî *ж.*, bêesli *ж.*, îzbatnebûn *ж.*, bêîzbatî *ж.*

необосно́ванный *прил.* yê bêesas, yê bêesil, yê bêizbat.

необрабо́танный *прил.* 1. (*о земле*) yê bêcarnekirî, yê bejî, yê beyaz; 2. (*о материале*) yê çênekirî; 3. (*о литературном произведении и т. п.*) yê ĥasilnekirî, yê hazirnekirî.

необразо́ванный *прил.* yê hînnebûî, yê nexwendî; yê nezan (*невежественный*).

необу́зданный *прил.* yê ku naê zeftkirinê, yê ĥar, yê ku naê gemkirinê, yê ku naê dizgînkirinê.

необходи́мо *в знач. сказ. безл.* lazime, ĥewceîye, gereke; **э́то ~ сде́лать** ew yek gerekе bê kirinê.

необходи́мос||ть *ж.* lazimî *ж.*, kêrhatin *ж.*, ĥewcebûn *ж.*; **по ~ти** bona lazimîyê; **нет ~ти** lazim (ĥewce) nîne; **кра́йняя (о́страя) ~** lazimatiya laptei; **предме́ты пе́рвой ~ти** ĥeşîyaê zef lazim.

необходи́м||ый *прил.* 1. (*нужный*) yê lazim, yê ferz; **~ые мероприя́тия** tîvdarekê lazim; 2. (*обязательный*) yê eseî, yê miqîm.

необщи́тельный *прил.* yê tenê, yê bêhelaqetî.

необъясни́мый *прил.* yê ku naê şiroyekirinê.

необъя́тный *прил.* yê bêĥed, yê bêsînor (*безграничный*); yê zef mezin (*огромный*).

необыкнове́нно *нареч.* 1. eceb (*удивительно*); 2. (*чрезвычайно*) zef.

необыкнове́нный *прил.* 1. yê nebûî (*небывалый*); yê nedîtî (*несказанный*); yê ecêb (*удивительный*); 2. (*чрезвычайный*) yê zef, yê mezin, yê bêhesab.

необыча́йный *см.* необыкнове́нный.

необы́чн||ый *прил.* yê bêresa; **в ~ое вре́мя** bêwext, bêçax.

необяза́тельный *прил.* yê neeseî, yê nemiqîm, yê neferz.

неограни́ченный *прич., прил.* yê bêhed, yê bêsînor; yê firaqetê, yê aza (*свободный*).

неодина́ковый *прил.* yê neberanberî hev, yê neweke hev, yê nenotîla hev.

неоднокра́тно *нареч.* zef (gelek) cara, necarekê.

неодобре́ние *с.* qebûlnekirin *ж.*, tesdîqnekirin *ж.* (*непринятие*); razînebûn *ж.* (*несоеласие*).

неодоли́мый *прил.* yê ku naê altbûînê, yê ku naê raê, yê bêalt (*непобедимый*); yê qaîm,yê biqudret (*сильный*).

неодушевлённый *прил.* yê neruhber; **~ предме́т** tiştê neruhber.

неожи́данно *нареч.* nişkêva; **~ я встре́тил знако́мого** nişkêva ez rastî nasê xwe hatim.

неожи́данность *ж.* 1. (*внезапность*) nişkêvabûîn *ж.*; 2. (*неожиданное событие*) qewimandina (qezîya) nişkêva.

неожи́данный *прил.* (*внезапный*) yê nişkêva.

неоко́нченный *прил.* yê xilasnekirî, yê temamnebûî, yê kutanebûî.

неологи́зм *м. лингв.* nêolojîzm *ж.*

нео́н *м. физ.* nêon *ж.*

неопа́сный *прил.* yê bêxof, yê bêsaw, yê bêxeter; yê bêzerar (*безвредный*).

неопису́емый *прил.* (*очень сильный*) yê zef qaîm (mezin).

неопла́тн||ый *прил.* yê dehim, yê hertim; **быть в ~ом долгу́ пе́ред ке́м-л.** deyndarê dehimê kesekî bûîn.

неопла́ченный *прил.* yê bêheq, yê bêpere, yê bêmizd; **~ труд** *эк.* kara bêheq, xebata bêmizd.

неопра́вданный *прил.* yê bêesas, yê îzbatnebûî (*необоснованный*); yê bêkêr, yê bêfeîde (*бесполезный*); yê nelazim (*ненужный*).

неопределённый *прил.* yê neeyan, yê bêqirar; yê nekivş (*неясный*).

неопровержи́мый *прил.* yê îzbatbûî, yê ku naê înkarkirinê, yê înkar nabe; **~ до́вод** delîlê îzbatbûî.

неопря́тный *прил.* yê netemîz; yê qirêj (*грязный*).

неопублико́ванный *прил.* yê neşirnekirî, yê neşirnebûî.

неопытность *ж.* xamî *ж.*, neceribandin *ж.*, cahilî *ж.*

неопытный *прил.* yê necêribandî, yê xam, yê cahil.

неорганизо́ванность *ж.* bêteşkîlî *ж.*; bêtertîbî *ж.* (*беспорядок*).

неорганизо́ванный *прил.* yê teşkîlnekirî, yê bêteşkîl; yê bêtertîb (*беспорядочный*).

неорга́ни́ческ||ий *прил.* yê neruhber; **~ая хи́мия** kimîya neruhber.

неосведомлённый *прил.* yê bêxeber; yê nebeled, yê nezan (*незнающий*).

неосла́бн||ый *прил.* yê hertim, yê dehim; yê bêvegerandin (*неуклонный*); **~ое внима́ние** guhdarîya dehim (hertim).

неосмотри́тельный *прил.* yê tewekel, yê neserwext; yê bêguhdar (*невнимательный*).

неоснова́тельный *прил.* yê bêesas, yê îzbatnebûî.

неоспори́мый *см.* неопровержи́мый.

неосторо́жность *ж.* tewekelî *ж.*, bêguhdarî *ж.*, bêfesalî *ж.*

неосторо́жный *прил.* yê tewekel, yê bêguhdar, yê bêfesal.

неосуществи́мый *прил.* yê ku naê qedandinê, yê ku nae sêrî, yê neqedandinê.

неосяза́емый *прил.* 1. (*неощутимый*) yê ku naê kivşê; 2. (*ничтожный*) yê zef hindik, yê neîser.

неотдели́мый *прил.* yê ku naê cudakirinê.

неотврати́мый *прил.* yê eseî, yê miqîm, yê bêvegerandin.

неотвя́зный *прил.* yê dûrnakeve, yê zelebirinê.

неотёсанный *прил.* 1. yê rindenekirî; 2. *перен.* (*грубый*) yê bêedeb, yê bêmerîfet.

не́откуда *нареч.* ji tucîya, ji tudereka, ji tudera.

неотло́жн||ый *прил.* yê ferz, yê zef lez, yê bêdereng; **~ая по́мощь** komekdarîya ferz; **~ое де́ло** şuxulê ferz.

неотло́жно *нареч.* hertim, bêderketin, bêdûrketin; dehim (*постоянно*).

неотло́жный *прил.* yê hertim, yê bêderketin; yê dehim (*постоянный*).

неотрази́мый *прил.* 1. yê ku naê altkirinê; 2. *перен.* (*захватывающий, обаятельный*) yê bihewas, yê hewasanînê.

неотсту́пный *прил.* yê hertim; yê dehim (*постоянный*).

неотчётливый *прил.* yê neeyan, yê nekivş.

неотъе́млем||ый *прил.* yê eseî, yê miqim, yê mitleq; **~ое пра́во** heqdarîya eseî; **~ое ка́чество** xasbûna miqîm.

неофициа́льн||ый *прил.* yê neresmî; **~ое сообще́ние** elametîya neresmî.

неохо́та *ж.*: **мне ~** ez naxwezim, ez dilnakim, kêfa min tuneîye.

неохо́тно *нареч.* bê dil, bê rizadilî.

неоцени́мый *прил.* (*исключительно ценный*) yê zef biha, yê pirqîmet, yê naê bihakirinê.

неощути́мый *прил.*, **неощути́тельный** *прил.* yê sist (*слабый*); yê sivik (*лёгкий*); yê bêêş (*безболезненный*).

непа́рный *прил.* yê tek, yê necot, yê kit.

непарти́йный *прил.* 1. (*беспартийный*) yê bêpartîvan, yê bêfirqe, yê bêhîzb; 2. (*несовместимый с принадлежностью к партии*) yê nelaîqî uzvê hîzbê.

непереводи́мый *прил.* yê ku naê tercimekirinê.

непередава́емый *прил.* (*невыразимый*) yê ku naê gotinê.

неперехо́дный *прил.*: **~ глаго́л** *грам.* fêla derbaznebûnê.

непи́санный *прил.*: **~ зако́н** qanûna nenivîsî, qirarê ezber.

неплатёж *м.* heqnedaîn *ж.*, perenedaîn *ж.*

неплатёжеспосо́бный *прил.* yê deyndarê bêqewet.

неплате́льщик *м.* (*должник*) deyndar *м.*

неплодоро́дн||ый *прил.* yê bêhasil; **~ые зе́мли** xwelîyê (erdê) bêhasil.

неплодотво́рный *прил.* yê bêkêr, yê bêfeîde, yê bêhasil.

непобеди́мость *ж.* altnebûîn *ж.*, bêaltî *ж.*

непобеди́мый *прил.* yê altnebûînê, yê bêaltî.

непови́нный *прил.* yê negunehkar, yê bêguneh, yê bêsûc.

неповинове́ние *с.* gurnekirin *ж.*, gura (*keseki*) nekirin, îtaetnekirin *ж.*

неповоро́тливый *прил.* yê fiş-fişok, yê sertapêl.

непого́да *ж.* hewa xirab.

непогреши́мый *прил.* 1. (*никогда не ошибающийся*) yê bêqusûr; 2. (*безусловно верный*) yê rast.

неподалёку *нареч.* nêzîkî, rex, fêza; **~ от меня́** fêza minda.

непода́тливый *прил.* yê birik, yê biînk, yê bêtivaq; yê ku naê xeberdane (*несговорчивый*).

неподви́жный *прил.* yê bêhereket, yê bêhej, yê cîda sekinî, yê bêlipat.

неподде́льный *прил.* yê hêlal (*искренний*); yê rastî (*подлинный*).

неподку́пный *прил.* yê ku naê kirînê; yê binamûs, yê helal (*честный*).

неподоба́ющий *прил.* yê nelaîq; yê bêkêr (*ненужный*).

неподсу́дный *прил.* yê ku nakeve bin sûcdê.

неподходя́щ||ий *прил.* yê bêminasib; **в ~ее вре́мя** bêwext, bêçax, wede nîne, newexte.

непочине́ние *с.* gurnekirin *ж.*, gura (*kesekî*) nekirin, bêîtaet *ж.*

непозволи́тельный *прил.* yê bêîzn; yê qedexe (*запрещённый*).

непознава́емость *ж.* nezanî *ж.*, eyannekirin *ж.*, şirovenekirin *ж.*

непознава́емый *прил.* yê ku naê eyankirinê, yê şirovenekirinê.

непоколеби́мый *прил.* yê qaîm, yê mehkem; yê bêvegerandin (*неуклонный*).

непокорённый *прил.* yê altnebûî, yê zeftnekirî.

непоко́рность *ж.* gurnekirin *ж.*, bêîtaetî *ж.*

непоко́рный *прил.* yê gurnekirinê, yê bêîtaet.

непокры́тый *прил.* 1. (*без шапки*) yê bêkum, yê serqot; 2. (*открытый*) yê servekirî.

непола́дки *мн. ж.* 1. xirabî *ж.*; 2. (*недочёты*) şaşî *ж.*, qusûr *ж.*, kêmasî *ж.*

неполноце́нный *прил.* yê bikêmasi; yê biqusûr (*с недостатками*).

непо́лн||ый *прил.* 1. (*ненаполненный*) yê netijî; **~ая корзи́на** sebeta netijî; 2. (*не целиком*) yê nîvî; **~ рабо́чий день** nîvroja xebatê; ◇ **~ая сре́дняя шко́ла** (*семилетка*) mekteba ortê ya heftsalîyê.

непоме́рный *прил.* yê bêhesab; yê bêhed (*безграничный*); yê zef (*огромный*).

непонима́ние *с.* femnekirin *ж.*, femkorî *ж.*; nezanbûn *ж.* (*незнание*).

непоня́тливый *прил.* yê bêfem, yê femkor.

непоня́тно *в знач. сказ. безл.*: **~, что он хоте́л сказа́ть** eyan nîne, ewî çi dixwast bigota.

непоправи́мый *прил.* yê ku rast nabe, yê ku naê çêkirinê, yê xirabbûî.

непоро́чный *прил.* yê binamûs, yê bêqusûr; yê bakire (*девственный*).

поря́док *м.* bêtertîbî *ж.*, bêteşkîletî *ж.*, bêqaîdetî *ж.*

непосе́да *м.*, *ж.* *разг.* merîyê (jina) nes (netebitî, nesitirî, berxwenedaî).

непоси́льн||ый *прил.* yê zef çetin, yê zef giran; **~ая зада́ча** pirsa zef çetin.

непосле́довательность *ж.* xweîyê sozê xwe nebûîn (*в словах*); bêtertîbîya fikira (*нелогичность*).

непосле́довательный *прил.* yê xweîyê sozê xwe nîne (*в словах*); yê bêtertîbîya fikira (*нелогичный*).

непослуша́ние *с.* gurnekirin *ж.*, guhnedaîn *ж.*, bêîtaetî *ж.*

непосло́шный *прил.* yê nes, yê netebitî, yê gura (*kesekî*) nake, yê bêîtaet.

непосре́дственность *ж.* (*искренность*) helalî *ж.*, dilsaxî *ж.*, bêwesyetî *ж.*

непосре́дственный *прил.* 1. (*прямой*) yê rast, yê nêzîk; 2. (*искренний*) yê helal, yê dilsax, yê bêwesyet.

непостижи́м||ый *прил.*: **умо́ ~о** *разг.* nagîje (nakeve) aqila.

непостоя́нн||ый *прил.* yê nehertim, yê nedehim; yê tê guhastinê (*изменчивый*); **~ая пого́да** hewa tê guhastinê; **~ хара́ктер** xeîsetê tê guhastinê.

непостоя́нство *с.* veguhastin *ж.*; guhastin *ж.*, ewezbûîn *ж.*; **~ хара́ктера** veguhastina xeîset.

непохо́жий *прил.* yê nenotila hev, yê nemîna hev.

непоча́тый *прил.* *разг.* 1. (*неначатый*) yê destpênebûî, yê destpêkirî; 2. (*неисчерпаемый*)

yê bêhed, yê bêhesab, yê bêser û binî; ~ край рабо́ты xebata bêhed.

непочти́тельный *прил.* yê bêhurmet, yê bêmerîfet, yê bêrûmet, yê bêqedir-qîmet, yê bêxatir.

непра́вда *ж.* derew *ж.*, vir *ж.*, nerastî *ж.*; ✧ все́ми пра́вдами и ~ми *разг.* bi rast û derewa.

неправдоподо́бный *прил.* yê nerast, yê ne notila rastîyê.

непра́вильность *ж.* nerastî *ж.*; şaşî *ж.* (*ошибочность*).

непра́вильный *прил.* yê nerast; yê şaş (*ошибочный*); ✧ ~ глаго́л *грам.* fêla nerast.

неправоме́рный *прил.* yê bêqanûn.

неправомо́чность *ж.* bêqanûnî *ж.*

неправомо́чный *прил.* yê bêqanûnî.

неправота́ *ж.* 1. (*несправедливость*) neheqî *ж.*, bêedilaî *ж.*, bêheqîqetî *ж.*; 2. (*заблуждение*) şaşbûn *ж.*, şaşî *ж.*, qelet *ж.*

непра́вый *прил.* 1. (*несправедливый*) yê neheq, yê bêedilaî, yê bêheqîqet; 2. (*заблуждающийся*) yê neheq, yê şaş dibe; он непра́в ew neheqe, ew şaş dibe, ew neraste.

непредви́денный *прил.* yê nedîtî, yê teẍmînnekirî; yê nişkêva (*неожиданный*).

непредубеждённый *прил.* yê heq, yê rast.

непредусмо́тренный *прил.* yê kivşnekirî, yê tesdîqnekirî.

непредусмотри́тельность *ж.* bêtedbîrî *ж.*, teẍmînnekirin *ж.*, bêtevdîrî *ж.*

непредусмотри́тельный *прил.* yê bêtedbîr, yê teẍmînnekirî, yê kivşnekirî, yê bêtevdîr.

непрекло́нность *ж.* qaîmî *ж.*, meẖkemî *ж.*, netewandinî *ж.*

непрекло́нный *прил.* yê qaîm, yê naê tewandinê, yê meẖkem.

непрело́жный *прил.* 1. (*твёрдый*) yê miqîm, yê eseî; 2. (*неоспоримый*) yê bêqîrar, yê bêşert, yê bêgilî, yê ku naê guhastinê, yê ferz.

непреме́нно *нареч.* miqîm, ese; я ~ прие́ду ezê ese bêm.

непреме́нный *прил.* yê miqîm, yê eseî; yê bêgilî, yê bêşibhe (*несомненный*).

непреодоли́мый *прил.* yê naê zorê, yê naê altkirinê.

непрерывно *нареч.* serhev, dûhev, bêmolet, peîhev.

непрерывный *прил.* yê serhev, yê dûhev, yê bêmolet.

непрестанно *см.* непрерывно.

непривётливый *прил.* yê nepak, yê bêmerîfet, yê bêhurmet.

непривы́чка *ж.* bêedetî *ж.*, hînnebûîn *ж.*

непривы́чный *прил.* yê bêedet, yê hînnebûî.

непригля́дный *прил.* yê nepak, yê nerind.

неприго́дность *ж.* bêkêrî *ж.*

неприго́дный *прил.* yê bêkêr.

непри́е́млем||ый *прил.* yê ku naê qebûlkirinê, yê ku naê hildanê; ~ые усло́вия qirarê ku naêne qebûlkirinê.

непри́знанный *прил.* yê nasnekirî, yê qebûlnekirî.

неприкосновéнность *ж.* xweîkirin *ж.*, destnedaîn *ж.*; ~ ли́чности xweîkirina merîya.

неприкосновéнный *прил.* yê xwêîkirinê, yê destnedaînê.

неприкра́шенный *прил.* yê neqşnekirî; yê rastî (*действительный*).

неприкры́тый *прил.* yê eşkere, yê vekirî, yê rûvekirî.

неприли́чие *с.* bêedebî *ж.*, bêmerîfetî *ж.*; nepakî *ж.*

неприли́чно *нареч.* nelaîq.

неприли́чный *прил.* yê bêedeb, yê bêmerîfet; yê nêpak (*нехороший*).

непримири́мость *ж.* hevnehatin *ж.*, miqabilî *ж.*, muxalêfî *ж.*, pevneketin *ж.*

непримири́м||ый *прил.* yê hevnehatinê, yê miqabil, yê pevne-

ketinê, yê bêbarîş; ~ые противоре́чия miqabildarîyê pevneketinê (hevnehatinê).

непринуждённость *ж.* azaî *ж.*, serbestî *ж.* (*свобода*); rehetî *ж.*, aramî *ж.* (*спокойствие*).

непринуждённый *прил.* yê aza, yê serbest (*свободный*); yê rehet, yê aram (*спокойный*).

непринятие *с.* qebûlnekirin *ж.*; ~ предложе́ния qebûlnekirina qirarê.

неприспосо́бленность *ж.* hînnebûîn *ж.*, cînebûîn *ж.*

неприспосо́бленный *прил.* yê hînnebûî, yê cîyê xwe nedîtî, yê cînebûî.

непристо́йный *прил.* yê bêedeb, yê bêeîb, yê bênamûs; yê şermê (*постыдный*).

непристу́пный *прил.* 1. (*о крепости и т. п.*) yê zor, yê qaîm, yê ku naê altkirinê; 2. (*надменный*) yê pozbilind, yê zef qure, yê zef kubar, yê qutam.

непритво́рн||ый *прил.* yê ĥelal, yê dilsaï; ~ое уча́стие tevbûîna dilsaï.

непритяза́тельный • *прил.* yê dewnekirinê.

непричáстный *прил.* yê pêvanegirêdaî, yê bêhelaqe, yê tevnebûî.

неприя́зненный *прил.* yê neyar (*недружелюбный*); yê dujminaîyê (*враждебный*).

неприя́знь *ж.* nefret *ж.* (*ненависть*); ĥiznekirin *ж.* (*нелюбовь*); neyarî *ж.* (*недружелюбие*); dujminatî *ж.* (*вражда*).

неприя́тель *м.* neyar *м.*; dujmin *м.* (*враг*).

неприя́тельский *прил.* yê neyarîyê; yê dujminaîyê (*вражеский*).

неприя́тность *ж.* qezîya *ж.*, şer-dew *ж.*, qerebalix *ж.*

неприя́тный *прил.* yê xirab, yê nepak; ~ на вкус yê temxirab, yê bêtem.

непробу́дный *прил.* yê ser hev, yê zef dirêj, yê pirwext; ~ сон xewa pirwext.

непрогля́дн||ый *прил.* yê zef terî; ~ая ночь şevereş *ж.*, terî-terîstan *ж.*

непродолжи́тельный *прил.* yê kin, yê hindik, yê kêmwext, yê wedê kurt.

непродукти́вный *прил.* yê bêĥasil, yê bêfeîde, yê bêĥasilet.

непрое́зж||ий *прил.*: ~ая доро́га rîya zef çetin bona çûîn-hatinê, rîya xirab.

непрозра́чный *прил.* yê nezelal; yê şêlû (*мутный*).

непроизводи́тельный *прил.* yê bêĥasil (*безрезультатный*); yê bêfeîde (*бесполезный*); yê bêĥasilet (*непродуктивный*).

непроизво́льный *прил.* yê bêêxtîyar; yê nişkêva (*неожиданный*).

непромока́емый *прил.* yê ku şil nabe, yê ter nabe, yê miqabilî şilbûnê.

непроница́емый *прил.* 1. (*для газов, жидкостей и т. п.*) yê dergirtî; 2. *перен.* (*скрытый*) yê binalî, yê mexfî, yê veşartî.

непропорциона́льный *прил.* yê neweke hev, yê neberanberî hev, yê neangorî hev.

непрости́тельн||ый *прил.* yê nebexşandinê, yê naê bexşandine; ~ая оши́бка qeleta nebexşandinê.

непроходи́мый *прил.* yê zef çetin bona derbazbûînê, yê bêrê, yê bêrê-bêdirb.

непро́чный *прил.* yê sist, yê zeîf, yê neqaîm, yê nemeĥkem.

не про́чь: он ~ ew hazire, ew razîye, ew miqabil nîne.

непро́шенный *прил.* yê teklîfnekirî; ~ гость mêvanê teklîfnekirî (nexwendî).

нерабо́тоспосо́бный *прил.* yê nîkare bixebite, yê bêkêr; yê zeîf, yê sist, yê bêtaqet.

нерабо́ч||ий *прил.* yê aza, yê nexebatê, yê hêsabûnê; ~ее вре́мя wextê aza, wextê nexebatê; ~ день roja hêsabûnê, roja nexebatê.

нера́венство *с.* neberanberî *ж.*, nenotilahevî *ж.*, neangorîhevî *ж.*

неравноме́рность *ж.* neberanberî *ж.*

неравноме́рный *прил.* yê neberanberî hev.

неравнопра́вие *с.* heqdarîya neberanber.

неравнопра́вный *прил.* yê heqdarîya neberanberî hev; ~ **догово́р** qirarê heqdarîya neberanberî hev.

нера́вн||ый *прил.* yê neberanber, yê neangorî hev; ~**ые си́лы** qewetê neangorî hev, qewetê neweke hev.

неради́вый *прил.* yê tewekel, yê qafil.

неразбери́ха *ж. разг.* bêtertîbî *ж.*, qalmeqal *ж.*, bêqaîdetî *ж.*

неразбо́рчивый *прил.* 1. (*о почерке*) yê neeyan, yê nekivş; 2. (*в еде*) yê pirxwur; 3. *неодобр.* (*в средствах*) yê tewekel.

нера́звитый *прил.* 1. (*отсталый*) yê paşdamaî; 2. (*физически*) yê sist, yê begewet, yê zeîf.

неразгово́рчивый *прил.* yê hindik xeberdide, yê zimankin.

нераздéльный *прил.* yê ku naê parevekirinê (cudakirinê), yê tomerî.

неразлу́чный *прил.* yê ku ji hev naê qetandinê, yê hevneqetandinê.

неразрешённый *прил.* 1. (*нерешённый*) yê zelalnekirî, yê safînekirî; 2. (*запрещённый*) yê bêîzn, yê qedexe.

неразреши́мый *прил.* yê ku naê zelalkirinê (safîkirinê).

неразры́вный *прил.* yê qaîm, yê mehkem, yê yekbûî, yê hevagirêdaî.

неразу́мный *прил.* yê bêaqil, yê bêhiş, yê bêfem; ~ **посту́пок** kirina bêaqil.

нераствори́мый *прил.* yê ku naê helandinê, yê ku têda nahele.

нерв *м.* temar *ж.*, temara hêrsê.

нерви́ровать *несов.* hêrs (kerbûî) kirin, dan hêrsê.

не́рвничать *несов.* hêrs (kerbûî) bûîn, nava xwe xistin.

не́рвн||ый *прил.* yê temara; yê hêrs, yê kerbûî (*о человеке*); ~**ая систе́ма** sîstêma temara; ~**ое заболева́ние** nexweşîya temarê hêrsê.

нереа́льный *прил.* 1. (*недействительный*) yê neneẍd, yê bixîyal, yê nerastî, yê nemiqîm; 2. (*невыполнимый*) yê ku naê qedandinê.

нерегуля́рный *прил.* yê nehertim, yê nehergav, yê neherwext.

нере́дко *нареч.* gelek cara; cara-cara (*иногда*).

нерента́бельный *прил. эк.* yê bêfeîde, yê bêkar, yê bêbereket.

нереши́тельнос||ть *ж.* bêcuretî *ж.*, becisaretî *ж.*; **быть в** ~**ти** curet nekirin.

нереши́тельный *прил.* (*трусливый, несмелый*) yê tirsonek, yê bêcuret.

нержаве́ющ||ий *прил.* yê ku zeng nagire; ~**ая сталь** pola ku zeng nagire.

неро́вный *прил.* 1. yê nerast, yê xwar; ~ **по́черк** destnivîsara nerast; 2. (*изменчивый*) yê ku tê guhastinê, yê nerast; ~ **хара́ктер** xeîsetê nerast.

неруши́мый *прил.* yê qaîm, yê pevgirêdanê, yê mehkembûî, yê yekbûî.

неря́ха *м., ж.* merîyê (jina) qirêj (pîs, mirdar).

неря́шливый *прил.* yê qirêj, yê pîs, yê mirdar.

нёс *см.* нести.

несамостоя́тельный *прил.* yê nexwemuxtar; yê neserbest (*зависимый*); yê nexwexatîyê, yê neaza (*несвободный*).

несбы́точный *прил.* yê ku naê serî, yê ku naê qedandinê, yê bixîyal.

несве́дущий *прил.* yê nebeled, yê nezan.

несве́жий *прил.* yê neteze; yê kevin (*старый*).

несвоевре́менный *прил.* yê bewext, yê ne li wextêda, yê bêça[x]ê-

несвóйственный *прил.* yê nemexsûs.

несвя́зный *прил.* yê bênêt, yê heva negirêdaî, yê bêrabet, yê bêhelaqet.

несгиба́емый *прил.* yê ku naê tewandinê, yê meḧkem, yê netewikok.

несгово́рчивый *прил.* yê ku naê xeberdanê, yê biînk, yê bêtivaq.

несгора́емый *прил.* yê ku naê şewitandinê, yê neşewitok; ~ **шкаф** qutîya neşewitok.

несде́ржанность *ж.* berxwenedaîn *ж.*, nesetirî *ж.*

несде́ржанный *прил.* yê berxwenedaî, yê nesitirî.

несерьёзный *прил.* yê nemoḧîm (*неважный*); yê bêesas (*неосновательный*); yê aqilsivik (*легкомысленный*).

несказа́нно *нареч.* zef, bêḧesab, negotî.

несказа́нный *прил.* yê zef, yê bêḧesab.

нескла́дный *прил.* 1. (*неуклюжий*) yê neangorî hev; 2. (*несвязный*) yê bênêt, yê bêrabet.

не́сколько I *числ.* çend, hinek; ~ **раз** çend cara; ~ **челове́к** çend merî.

поже́ртвование *с.* qurbankirin *ж.*

поже́ртвовать *сов. см.* же́ртвовать.

пожива́‖ть *несов. разг.*: **как вы** ~**ете?** halê we qe çawane?, hûn qe çawa derbaz dikin?, hûn kêfxweşin selametin?

пожи́ться *сов. разг.* kar (feîde) dîtin, zef qazanc kirin.

пожи́зненн‖ый *прил.* yê heta mirinê, yê heta jînê, yê heta-hetaîyê; ~**ая пе́нсия** mehheqê (pênsîya) heta jînê.

пожило́й *прил.* yê kal, yê pîr, yê piryaş.

пожима́ть, пожа́ть guvaştin.

пожина́ть, пожа́ть 1. (*сжинать*) (*ekin*) dirûtin; 2. *перен.* hasil kirin.

пожира́ть, пожра́ть xwerin; xirab kirin (*портить, поедать*); ◇ ~ **глаза́ми** (*кого-л.*) çev kutan (*li keseki*).

пожи́тки *мн. разг.* hûrmûr *м.*, ĥeşîya *м.*

пожра́ть *сов. см.* пожира́ть.

по́за *ж.* 1. (*положение*) qaîdê sekinandinê, poz *ж.*, ĥal *м.*; 2. (*притворство*) delkbazî *ж.*

позабо́титься *сов. см.* забо́титься.

позабыва́ть, позабы́ть bîr kirin.

позабы́ть *сов. см.* забы́ть, позабыва́ть.

позави́довать *сов. см.* зави́довать.

позáвтракать *сов.. см.* зáвтракать.

позавчера́ *нареч.* pêr, duh na pêr.

позади́ 1. *нареч.* para, parava; **дом стои́т ∽** xanî parava sekinîye; 2. *предлог* paşîya, pişt; **∽ шка́фа** pişt êşkafê.

позапро́шл‖ый *прил.*: **в ∽ом году́** pêrar.

позва́ть *сов. см.* звать.

позволе́н‖ие *с.* îzn *ж.*; **с ва́шего ∽ия** îzna we hebe, bi îzna we.

позво́лить *сов. см.* позволя́ть.

позволя́ть, позво́лить hiştin, îzn daîn; ◇ **∽ себе́** (*осмелиться*) curet kirin; **∽ себе́ сли́шком мно́го** ser xwara avêtin.

позвони́ть *сов. см.* звони́ть.

позвоно́к *м. анат.* mezmezk *м.*

позвоно́чник *м. анат.* mezmezk *м.*, pişta pîl, darê pişтê.

по́здний *прил.* yê dereng; yê eglebûî, yê paşdamaî (*запоздалый*).

по́здно *нареч.* derenge; bêwexte (*с запозданием*); **∽ но́чью** nîvê şevê; **сли́шком ∽** zef derenge.

поздоро́ваться *сов. см.* здоро́ваться.

поздрави́тельн‖ый *прил.* yê binbarekkirinê, yê binbarekîyê, yê çevronaîyê; **∽ое письмо́** nama binbarekkirinê.

поздра́вить *сов. см.* поздравля́ть.

поздравле́ние *с.* binbarekî *ж.*, çevronaî *ж.*

поздравля́ть, поздра́вить binbarek kirin, çevronaî daîn.

позелене́ть *сов. см.* зелене́ть 1, 2.

поземе́льный *прил.* yê ji xwelîyê, yê ji erdê.

по́зже *нареч.* derengtir; **не́сколько ∽** hinekê şûnda, hinekê dereng.

позити́вный *прил.* yê pozîtîv.

позитиви́зм *м.* pozîtîvîzm *ж.*

позицио́нн‖ый *прил.* yê nava sengera; **∽ая война́** şerê nava sengera.

пози́ция *ж.* 1. tavî *ж.*, senger *м.*; 2. *перен.* ĥal *м.*, nêt *ж.*, fikir *ж.*; **выжида́тельная ∽** nêta hîvîbûnê.

познава́емость *ж. филос.* zanbûn *ж.*

познава́емый *прил. филос.* yê tê zanbûnê, yê dikeve aqila.

познава́ть, позна́ть zanbûn, eyan kirin.

познако́мить(ся) *сов. см.* знако́мить(ся).

позна́н‖ие *с.* zanbûn *ж.*; **тео́рия ∽ия** *филос.* têorîya zanbûnê.

позна́ть *сов. см.* познава́ть.

позоло́та *ж.* avzêr *м.*

позолоти́ть *сов. см.* золоти́ть.

позо́р *м.* eîb *ж.*, robet *ж.*, çirax *м.*, rezîlî *ж.*; **быть ∽ом** robet bûîn; **с ∽ом** bi rezîlî.

позо́рить, опозо́рить robet (bênamûs, rezîl, çirax) kirin, daîn şermê.

позо́риться, опозо́риться robet (rezîl, bênamûs, çirax) bûîn.

позо́рный *прил.* yê bêeîb, yê robet, yê rezîl, yê çirax.

позуме́нт *м.* gulaftûn *м.*

позывно́й *прил.* yê gazîkirinê.

позывны́е *мн.* nîşanê elametîyê.

поимённо *нареч.* nav bi nav.

поймка *ж.* girtin *ж.*

по-ино́му *нареч.* wekî maîn.

поинтересова́ться *сов. см.* интересова́ться.

поиска́ть *сов.* gerin; **∽ кни́гу** kitêb gerîn.

по́иск||и *мн.* gerîn *ж.*; **в ~ах** bi gerê.

пойстине *нареч.* rastî; **~ говоря́** rastî bêjim, rastî gotî.

пойть, напои́ть [têr] daîn vexwerînê; serxweş kirin (*вином*); av daîn (*животных*).

пой *см.* петь.

по́йло *с.* ava ĥeîwanet.

по́йма *ж.* cîyê sêlavê, cîwara avrabûnê.

пойма́ть *сов. см.* лови́ть; **~ на ме́сте** cîda girtin.

пойму́ *см.* поня́ть.

пойти́ *сов. см.* идти́ *во всех знач. кроме* 2 *и* 4, ходи́ть; **пойди́те сюда́!** werne vira!

пока́ 1. *нареч.* niha, hela (*в данный момент*); ĥeta niha, hê (*до сего времени*); **~ он не пришёл** ew hê nehatîyê; **~ что** hela-hê; **~ всё** hela bese; 2. *союз* ĥeta (*до тех пор, пока*); ĥeta, hela-hê (*в то время, как*); **~ я жив** ĥeta [kî] ez saxîm; **сиди́ здесь, ~ я не приду́** wira (vêderê) rûne ĥeta ez têm; **куй желе́зо ~ горячо́** *посл.* hesin bikute hela-hê germe.

пока́з *м.* nîşankirin *ж.*, nîşandaîn *ж.*

показа́ние *с.* 1. gotin *ж.*, nîşandaîn *ж.*; 2. (*прибора*) derece *ж.*; 3. *юр.* (*свидетельство*) şedetî *ж.*

показа́те||ль *м.* delîl *м.*, elamet *м.*, ĥeqem *ж.*; **ка́чественные ~ли** nîşanê xasîyê; **~ сте́пени** *мат.* elametîya derecê.

показа́тельный *прил.* 1. (*образцовый*) yê ber bi çev, yê zef pak; 2. (*характерный*) yê mexsûs, yê ber bi çev.

показа́ть *сов. см.* пока́зывать.

показа́ться *сов. см.* пока́зываться, каза́ться.

показно́й *прил.* yê bona nîşankirinê.

пока́зыв||ать, показа́ть 1. nîşandin; **~ себя́** xwe nîşan kirin; 2. *юр.* (*свидетельствовать*) şedetî kirin; 3. (*о приборе*) nîşan kirin; **часы́ ~ают 5** sehet 5 nîşan dike.

пока́зываться, показа́ться hatin xwyanê, kivş bûîn, hatin kivşê.

покара́ть *сов. см.* кара́ть.

поката́ть *сов. см.* ката́ть 1.

поката́ться *сов. см.* ката́ться.

покати́ть(ся) *сов. см.* кати́ть (-ся).

пока́тость *ж.* bewrar *ж.*, berjêr *м.*

пока́т||ый *прил.* yê bewrarê, yê berjêr; yê xwar; **~ая кры́ша** banê xwar; **~ лоб** enîya xwar.

покача́ть *сов.* ĥejandin; **~ голово́й** serê xwe ĥejandin.

пока́чивать ĥejandin, leqandin, likumandin.

пока́чиваться likumîn, çûîn-hatin, ĥejîyan.

покая́ние *с.* tobekirin *ж.*; poşmanbûîn *ж.* (*раскаяние*).

пока́яться *сов. см.* ка́яться.

покида́ть, поки́нуть terk daîn, hiştin.

поки́нуть *сов. см.* покида́ть.

покла́жа *ж.* piştî *м.*, ĥeşîya *м.*; bar *м.* (*груз*).

поклёп *м.* xetb *ж.*, buxdan *ж.*; **возводи́ть ~** buxdan avêtin.

покло́н *м.* selam *ж.*, selav *ж.*; **переда́йте ~** wekîlê selava bin.

поклоне́ние *с.* selamdaîn *ж.*, ĥebandin *ж.*

поклони́ться *сов. см.* кла́няться.

покля́сться *сов. см.* кля́сться.

поко́иться *несов.* 1. (*основываться*) esas (hîm) bûîn; 2. (*быть похороненным*) defn (çel) bûîn.

пок||о́й *м.* rehetî *ж.*, hêsabûn *ж.*; **не име́ть ~о́я** nerehet (şerpeze) bûîn; **оставля́ть в ~о́е** dest li yaxê kişandin; **не дава́ть ~о́я** şerpeze kirin, zele birin, molet (mecal) nedan.

поко́йник *м.* cinîyaz *м.*, meît *м.* (*труп*); mirî *м.* (*умерший*).

поко́йный I *прил.* yê rehet, yê hêsa.

поко́йный II *прил.* 1. (*умерший*) yê wefatbûî, yê mirî; 2. *в знач. сущ. м.* (*покойник*) mirî *м.*

поколеба́ть *сов. см.* колеба́ть.
поколе́н||ие *с.* neŝil *ж.*, ewlad *м.*, dûmik *ж.*; **молодо́е ~** nesila cahila; **из ~ия в ~** ji nesilê heta nesilê, ji nesilekê heta nesila dinê.
поколоти́ть *сов. разг.* kutan, lêdan, lêxistin.
поко́нчить *сов.* xilas (kuta, temam) kirin; ✧ **~ с собо́й** xwe kuştin.
покоре́ние *с.* zeftkirin *ж.*, altkirin *ж.*
покори́тель *м.* altindar *м.*, fetêh *м.*
покори́ть(ся) *сов. см.* покоря́ть(ся).
покорми́ть *сов. см.* корми́ть 1.
поко́рно *нареч.*: **~ благодарю́** *разг.* zef razîme.
поко́рность *ж.* teslîmbûîn *ж.*, îtaet *ж.*
поко́рный *прил.* yê bindestî, yê îtaetê, yê bin bendûrê; ✧ **ваш ~ слуга́** xulamê weî hertim.
покоро́бить(ся) *сов. см.* коро́бить(ся).
покоря́ть, покори́ть bi zorê zeft kirin (alt kirin).
покоря́ться, покори́ться alt (bindestî) bûîn.
поко́с *м. с.-х.* 1. (*сенокос*) gîhadirûnî *ж.*; 2. (*луг*) çaîr *ж.*
покоси́ться *сов.* 1. (*наклониться на бок*) xwar bûîn, ser kêlekê ketin; 2. *см.* коси́ться.
покра́жа *ж.* dizîkirin *ж.*, talanî *ж.*
покра́сить *сов. см.* кра́сить.
покраснéть *сов. см.* краснéть 1.
покро́в *м.* liŝêf *ж.*, qet *м.*, şel *м.*; **снéжный ~** qetê (şelê) berfê.
покрови́тель *м.* piştovan *м.*
покрови́тельственный *прил.* yê piştovanîyê; **~ тон** dengê piştovanîyê.
покрови́тельство *с.* piştovanî *ж.*, piştgirtin *ж.*
покрови́тельствовать *несов.* (*кому-л., чему-л.*) piştovanê (*kesekî, tiştekî*) bûîn, pişt girtin.
покро́й *м.* dirûtin *ж.*, birîn *ж.*
покрыва́ло *с.* liŝêf *ж.*
покрыва́ть, покры́ть 1. (*чем-л.*) serra girtin, avêtin ser, serra nuxamdin; **~ стол ска́тертью** desterxan ser texte rast kirin (raxistin); 2. (*оплачивать—расходы и т. п.*) (*pere*) daîn, xerc rast kirin; **~ долги́** deyn daîn; 3. (*скрывать, не выдавать*) veşartin; **~ вино́вных** gunehkar veşartin; 4. (*заглушать*) temirandin, ker kirin, sekinandin; **~ шум мото́ра** dengê motorê temirandin; 5. *спорт.* (*расстояние*) derbaz bûîn, buhurîn; **~ расстоя́ние в 500 м** menzîla 500 m buhurîn; ✧ **~ себя́ сла́вой** navê xwe derxistin, xwe şuhret kirin.
покрыва́ться, покры́ться bûîn, girtin; **~ пе́ной** kef girtin; **~ румя́нцем** sor bûîn.
покры́тие *с.* 1. (*действие*) raxistin *ж.*, serra girtin; 2. (*материал*) heşîyaê serragirtinê.
покры́ть *сов. см.* покрыва́ть, крыть.
покры́ться *сов. см.* покрыва́ться.
покры́шка *ж.* 1. qalpax *м.*; 2.: **автомоби́льная ~** rêzîna tekera avtomobîla; **~ мяча́** pivdanga topê.
поку́да *см.* пока́.
покупа́тель *м.* mişterî *м.*, bikirçî *м.*
покупа́тельн||ый *прил.* yê kirînê; **~ая спосо́бность** qeweta (karinaîya, taqeta) kirînê.
покупа́ть, купи́ть kirîn, standin.
поку́пка *ж.* 1. (*действие*) kirîn *ж.*, standin *ж.*; 2. (*вещь*) tiştê kirî.
покупн||о́й *прил.* yê kirînê; **~а́я цена́** bihaê kirînê.
покуси́ться *сов. см.* покуша́ться.
поку́шать *сов.* xwerin.
покуша́ться, покуси́ться 1. (*посягать*) zeft kirin; **~ на чужо́е добро́** malê xelqê zeft kirin; 2. xwestin (*пытаться*); nêt hebûn (*na-*

мереваться); ~ **на самоубийство** xwestin xwekuştin; ~ **на кра́жу** xwestin dizîkirin.

покуше́ние *с.* xwestin *ж.*; ~ **на уби́йство** xwestina kuştinê.

пол I *м.* (*в помещении*) erdê otaxê.

пол II *м. биол.* cins *м.*, qism *м.*; **мужско́й** ~ cinsê nêr, qismê mêra; **же́нский** ~ cinsê mê, qismê jina.

пол- (*половина*) nîv; **полхле́ба** nîvê nan; **на полпути́** nîvê rêda; **полчаса́** nîvsehet *ж.*; **полме́сяца** nîvmeh *ж.*

пол||а́ *ж.* etek *ж.*, pêşe *ж.*; ◇ **из-под ~ы́** *разг.* dizîkava, binalî, tele-tel.

полага́ть *несов.* 1. (*думать*) fikirîn, texmîn (guman) kirin; 2. *офиц.* (*считать*) hesab kirin.

полага́ться, положи́ться guman kirin ser (*рассчитывать на...*); îtimad kirin, îtbara xwe lêanîn (*доверяться*); bawer kirin (*верить*).

пола́дить *сов.* hev hatin, hev qaîl bûîn, hevra razî bûîn (bariş bûn).

пола́комиться *сов. см.* ла́комиться.

полве́ка *м.* nîvqurn *ж.*, nîvê qurnê.

полго́да *м.* nîvê salê, şeş meh.

по́лдень *м.* nîvro *ж.*; **до полу́дня** pêşîya (berî) nîvroê; **по́сле полу́дня** paşî nîvroê.

по́ле *с.* 1. çol *ж.*, deşt *ж.*, rast *ж.*; zevî *ж.* (*возделанное*); 2. meîdan *ж.*, deşt *ж.*; ~ **би́твы** meîdana (deşta) şerkirinê; **футбо́льное** ~ meîdana topîstinê; 3. (*сфера*): ~ **де́йствия** meîdana şuxulkirinê; 4. (*шляпы, книги и т. п.*) dev *м.*, lêv *ж.*; ◇ ~ **зре́ния** meîdana ber çeva, meîdana dîtinê.

полеве́ть *сов. см.* леве́ть.

полев||о́й *прил. в разн. знач.* yê çolê, yê deştê; yê zevîyê; ~**ы́е цветы́** gulê çolê; ~**а́я артилле́рия** topxana çolê; ~ **го́спиталь** nexweşxana deştê; ◇ ~ **суд** sûcda (dîvana) eskerîyê, sûcda çolê; ~ **шпат** *мин.* fêldspat *м.*

полежа́ть *сов. см.* лежа́ть.

полезащи́тны||й *прил.* yê çolxweîkirinê; yê zevîxweîkirinê; ~**ые насажде́ния** darê çolxweîkirinê.

поле́зно *в знач. сказ. безл.* feîdeîye; **э́то** ~ **для здоро́вья** evyek bona seheta feîdeîye, evyek bona saxlemîya başe.

поле́зн||ый *прил.* yê feîde; **быть** ~**ым** feîde bûîn; ~**ые указа́ния** destûrê feîde, nîşandarîyê karê.

поле́зть *сов. см.* ла́зить, лезть.

полемизи́ровать *несов.* şert girtin, hevra ketin lecê (hucetê).

поле́мика *ж.* şertgirtin *ж.*, ketin lecê, polêmîk *ж.*, hucet *ж.*

по-ле́нински *нареч.* notîla (mîna) Lenîn, bi lênînî; **рабо́тать** ~ notîla Lenîn şuxul kirin, bi lênînî xebitîn.

поле́но *с.* darek *ж.*, kiran *м.*

полёт *м.* fir *ж.*, firîn *ж.*; ~ **снаря́да** firîna topê; ~ **самолёта** fira teyarê; **высо́тный** ~ firîna bilindaîyê; **слепо́й** ~ firîna kor; **соверши́ть** ~ firîn.

полете́ть *сов.* 1. *см.* лета́ть; 2. *разг.* (*упасть*) ketin; 3. *см.* лете́ть.

по́лзать *несов.* çalepîya çûîn, kişîyan.

ползко́м *нареч.* bi çalepîya.

ползти́, поползти́ 1. *см.* по́лзать; 2. *разг.* (*едва передвигаться*) ancax rêva çûîn.

поливать, полить av kirin, reşandin.

поли́вка *ж.* avkirin *ж.*, reşandin *ж.*

полигон *м. воен.* meîdana agirkirinê, polîgon *ж.*

полиграфи́ческий *прил.* yê çapxanê, yê neşirxanê, yê neşirnigarîyê.

полиграфи́я *ж.* seneta neşirkirinê, neşirnigarî *ж.*

поликли́ника *ж.* polîklînîk *ж.*, nexweşxane *ж.*

полиня́лый *прил.* yê rengdaî, yê qîçikbûî, yê rengavêtî.

полиня́ть *сов. см.* линя́ть.

полирова́ть, отполирова́ть ẖilû (çîl) kirin, biriqandin.

полиро́вка *ж.* biriqandin *ж.*, çîlkirin *ж.*, ẖilûkirin *ж.*

политбюро́ *с.* bûroa seyasetîyê.

политгра́мота *ж.* sewda (hînbûna) seyasetîyê.

политэ́кникум *м.* mekteba polîtêxnîkîyê.

политехни́ческ‖ий *прил.* yê polîtêxnîk[îyê]; **∽ое образова́ние** xwendina (hînbûna) polîtêxnîkîyê.

политзаключённый *м.* girtîyê seyasetîyê.

поли́тик *м.* 1. merîyê seyasetîyê; 2. *ирон.* seyasetçî *м.*

поли́тика *ж.* seyasetî *ж.*; **вне́шняя ∽** seyasetîya der; **∽ ми́ра** seyasetîya edilaîyê; **∽ откры́тых две́рей** seyasetîya dervekirî.

политика́н *м.* seyasetçî *м.*

полити́ческ‖ий *прил.* yê seyasetîyê; **∽ая эконо́мия** îqtîsadîya (malhebûna, êkonomîya) seyasetîyê.

политкружо́к *м.* desta (koma) hînbûna seyasetîyê.

политотде́л *м.* îdara seyasetîyê.

политрабо́тник *м.* qulixçîyê seyasetîyê.

политуправле́ние *с* îdara seyasetîyê.

политучёба *ж.* hînbûna seyasetîyê.

поли́ть *сов. см.* поливáть, лить.

политэконо́мия *ж.* îqtîsadîya (malhebûna, êkonomîya) seyasetîyê).

политэмигра́нт *м.* muẖacirê seyasetîyê.

полице́йский *прил.* 1. yê polîsê; **∽ терро́р** têrora (xezeba) polîsê; **∽ режи́м** rêjîma polîsê; 2. *в знач. сущ. м.* polîs *м.*

поли́ция *ж.* polîs *ж.*

поли́чн‖ое *с.*: **пойма́ть с ∽ым** cîda girtin.

полк *м.* ẖeng *м.*, bêlûk *ж.*; **командúр ∽á** serẖeng *м.*, serkarê ẖengê, qumandarê bêlûkê.

по́лка I *ж.* textê *м.*; **кни́жная ∽** tara (textê) kitêba.

по́лка II *ж.* (*огорода и т. п.*) kolan *ж.*, dorkolan *ж.*

полко́вник *м.* serẖeng *м.*; *уст.* begbaşî *м.*

полково́дец *м.* ordîvan *м.*, qumandar *м.*, serkarê eskerê.

полков‖о́й *прил.* yê ẖeng; **∽о́е зна́мя** bêîraqa ẖeng.

полне́йший *прил.* (*абсолютный*) .yê lapteî, yê bicarekêva, yê tewretijî; **∽ поко́й** rehetbûna lapteî.

полне́ть, пополне́ть qalin (xurt, tijî) bûîn.

по́лно *нареч. разг.* 1. (*довольно*) bese!; 2. (*да что вы?*) ûn çi dibêjin?

по́лно́ *нареч.* tijî, devra; **нали́ть ∽** tijî (devra) kirin.

полновла́стный *прил.* yê bi ẖukumdarîya temamîyê.

полново́дный *прил.* yê avtijî, yê sêlavê.

полнокро́вный *прил.* yê xûna zef, yê pirxûn.

полнолу́ние *с.* hîva temam (gulover).

полномо́ч‖ие *с.* wekîlî *ж.*, êxtîyar *ж.*; **дава́ть ∽ия** êxtîyar daîn; **переда́ть ∽ия** êxtîyar teslîm kirin.

полномо́чный *прил.* yê muxtar; **∽ представи́тель** wekîlê muxtar.

полнопра́вие *с.* heqdarîya temamîyê (kamil).

полнопра́вный *прил.* yê heqdarîya kamil; **∽ граждани́н** bajarvanê bi heqdarîya kamil.

по́лностью *нареч.* temamtî, bicarekêva, lapte.

полнота́ *ж.* 1. temamî *ж.*; 2. (*человека*) qalinaî *ж.*, xurtbûîn *ж.*

полноце́нный *прил.* 1. yê pirqîmet; 2. *перен.* yê xas.

по́лночь *ж.* nîvê şevê.

по́лн||ый *прил.* 1. (*наполненный*) yê tijîbûî; ~ **до краёв** yê devrakirî; 2. (*исполненный чего-л.*) yê hazir; ~ **реши́мости** yê pêda hazirbûî; 3. (*целый, весь, абсолютный*) yê kamil, yê bicarekêva, yê pêda, yê tomerî; **в ~ом соста́ве** bicarekêva, bi temamîya xwe, ĥemû pêda; ~**ая безопа́сность** bêxofîya kamil; 4. (*толстый*) yê qalin, yê xurt; ✧ ~**ым го́лосом** bi dengê bilind; ~**ая луна́** hîva temam (qedimî); ~**ым-полно́** *разг.* devra, tijî.

полобоpо́та *м.* nîvzivir *ж.*

полови́к *м.* cila erdê.

полови́||на *ж.* nîv *м.*, kerî *м.*; ~ **пе́рвого** nîvê yekê; ~ **пя́того** nîvê pênca; ~ **я́блока** nîvê (kerîyê) sêvê; **два с ~ной** du û nîv; **бо́лее ~ны** nîvê zeîî; **ме́нее ~ны** ji nîvî hindiktir.

полови́нн||ый *прил.* yê nîvî, yê nîvekarî; **в ~ом разме́ре** nîvekarî.

полови́нчатость *ж.* nîvekarî *ж.*, netemamî *ж.*

полови́нчатый *прил.* yê nîvekarî, yê netemam.

полово́дье *с.* avrabûn *ж.*, sêlav *ж.*

полово́й I *прил. биол.* yê can, yê cîns, yê qism.

полов||о́й II *прил.* yê erdê; ~**а́я щётка** brosa erdtemîzkirinê.

по́лог *м.* perde *ж.*

поло́гий *прил.* yê bewrarê, yê berjêr.

положе́н||ие *с.* 1. (*состояние*) vezyet *ж.*, ĥal *м.*; **материа́льное ~** ĥalê malhebûne; 2. (*местонахождение*) cî *м.*, cîwar *ж.*, misken *м.*; **определи́ть ~** cî eyan kirin; 3. (*поза, позиция*) ĥal *м.*; 4. nêt *ж.* (*утверждение, тезис*); fikira eslî (ĥîmlî) (*основная мысль*); 5. (*свод правил*) qanûn *ж.*; ✧ **быть в ~ии** giran (duĥal) bûîn.

поло́|женн||ый *прил.* yê lazim; **в ~ое вре́мя** li wextê lazim.

поло́|жим *вводн. сл.* (*допустим*): ~, **что...** ferz kin wekî ku...

положи́тельн||ый *прил.* 1. (*утвердительный*) yê bîîzbat, yê pakîyê, yê pozîtîv; ~ **отве́т** cihaba bîîzbat (pakîyê); 2. (*хороший*) yê baş, yê pak; ~**ая оце́нка** nêta (fikira) bîîzbat; ~ **результа́т** netîca baş (pakîyê).

положи́ть *сов. см.* класть 1.

положи́ться *сов. см.* полага́ться.

поломáть *сов. см.* лома́ть.

поломáться *сов. см.* лома́ться 1.

поло́мка *ж.* 1. (*действие*) şikestin *ж.*; 2. (*повреждённое место*) cîyê şikestî.

полоса́ *ж.* 1. xet *ж.*, rêze *ж.*, rê *ж.*; **лесна́я ~** rêza (xeta) mêşa; 2. (*зона, область*) neĥîye *ж.*; 3. (*время, период*) dewr *ж.*, zeman *м.*; 4. *с.-х.* xet *ж.*, zevi *ж.*; ~ **кукуру́зы** xeta (zevîya) kûkûrûzê.

полоса́тый *прил.* yê birêze.

полоска́ние *с.* 1. (*действие*) têwerdan *ж.*, werdan *ж.*; 2. (*жидкость*) av *ж.*

полоска́ть *несов.* avê xistin (*бельё*); avêda kirin, têwerdan (*посуду*); ~ **рот** devê xwe werdan; ~ **го́рло** gewrîya xwe werdan.

по́лость *ж. анат.* ĥucre *ж.*

полоте́нце *с.* pêjgîr *ж.*

поло́тнище *с.* kerîyê perçe.

полотно́ *с.* 1. (*ткань*) bez *м.*, kitan *ж.*; 2. *ж.-д.* rîya maşînê; 3. (*картина*) sûret *м.*, sifet *м.*, şikil *м.*

полотня́ный *прил.* yê bez, yê kitanê.

поло́ть *несов.* dorê kolan, vekolan.

полоу́мный *прил.* yê dîn, yê bêaqil, yê kêmaqil.

полпре́д *м. дип.* (полномо́чный представи́тель) wekîlê muxtar.

полпре́дство *с. дип.* (полномо́чное представи́тельство) wekîlxana muxtarîyê.

полпути́ *м.*: **на ~** li nîvê rêda.

полсло́ва *с.*: **понима́ть с пол[у]-сло́ва** zû fem kirin, ji nîvê xeberê fem kirin.

полти́нник *м. разг.* (*пятьдесят копеек*) deh şeî.

полтора́ *числ.* yek û nîv; ~ **рубля́** manat nîv, manat deh şeî; ~ **го́да** salnîvek *ж.*; ~ **часа́** sehetnîvek *ж.*

полтора́ста *числ.* sed û pêncî.

полуботи́нки *мн.* sol *м.*; kondere *ж.* (*женские*).

полуго́дие *с.* şeşmehî *ж.*, nîvsalî *ж.*

полугодова́лый *прил.* yê nîvsale, yê nîvsalî.

полугодово́й *прил.* yê şeş meh, yê nîvê salê, yê nîvsalî.

полуго́лый *прил.* yê rût-tezî, yê tût-rût.

полу́да 1. (*лужение*) qelakirin *ж.*; 2. (*сплав*) qela *ж.*

полу́денн||ый *прил.* yê nîvroê; ~**ое со́лнце** teva nîvroê.

полуживо́й *прил.* yê hinekî (yê neîserî) saxˇ, yê nîvruh.

полузабы́тый *прил.* yê nîvîda bîrkirî.

полуколониа́льн||ый *прил.* yê nîvîda mostemere, yê nîvmostemerî; ~**ая страна́** welatê nîvîda mostemere.

полуколо́ния *ж.* mostemera nîvî, nîvmostemer *ж.*

полукру́г *м.* nîvê dorê.

полукру́глый *прил.* yê nîvê dorê, yê nîvgulover.

полуме́ра *ж.* nîvçarî *ж.*

полумёртвый *прил.* yê nîvîda candaî, yê nîvruh, yê nîvmirî.

полуме́сяц *м.* nîvhîv *ж.*; ✧ **Кра́сный Полуме́сяц** Nîvhîva Sor.

полумра́к *м.* nîvîda terî.

полуоборо́т *м.* nîvzivir *ж.*

полуо́стров *м.* nîvade *ж.*, nîvcezîre *ж.*

полуофициа́льный *прил.* yê nîvîda resmî, yê nîvresmî.

полуподва́л *м.* otaxa li nîvîda bin erdê dane.

полупролета́рий *м.* nîvîda prolêtar, nîvprolêtar *м.*

полупролета́рский *прил.* yê nîvprolêtarîyê.

полуста́нок *м. ж.-д.* êstansîona biçûk, ewira ser rîya hesin (maşînê).

полуфабрика́т *м.* tiştê nîvîda hatîye hazirkirinê.

получасово́й *прил.* yê nîvsehetê.

получа́тель *м.* standkar *м.*

получа́ть, получи́ть 1. *в разн. знач.* standin; ~ **письмо́** name standin; ~ **прика́з** hukum standin; 2. (*добывать, производить*) deranîn, derxistin; 3. (*зарабатывать*) qazanc kirin.

получа́ться, получи́ться qewîmîn, qewimandin, pêşda hatin, têderketin; **из него́ полу́чится хоро́ший рабо́тник** ji wî xebatçîkî baş wê derkeve.

получе́ние *с.* standin *ж.*, hildan *ж.*

получи́ть(ся) *сов. см.* получа́ть(ся).

полу́чка *ж. разг.* 1. *см.* получе́ние; 2. (*зарплата*) qazanc *ж.*, heq *м.*

полуша́рие *с.* nîvê topê; **земно́е** ~ nîvê [gera] dunîyaê.

полушу́бок *м.* nîvkurk *м.*, kurtkê kurt.

полчаса́ *м.* nîvsehet *ж.*

по́лый *прил.* (*пустой*) yê vala, yê xalî.

по́лымя *с.*: **из огня́ да в** ~ *погов.* ji agir ketin alavê.

полысе́ть *сов. см.* лысе́ть.

по́льз||а *ж.* feîde *ж.*; kar *ж.* (*выгода*); **с** ~**ой** bi feîde; **в свою́** ~**у** bona kara xwe; **принести́** ~**у** kar daîn; **идти́ на** ~**у** bergeh girtin; **кака́я вам** ~ **от э́того?** wera ji wê yekê çi feîdeîye?, çi kara we ji wêyekê heîye?

по́льзование *с.* daîn xebatê.

по́льзоваться *несов.* daîn xebatê, kar dîtin (*употреблять*); feîde dîtin (*использовать*); ~ **слу́чаем** mecal standin; ~ **пра́вом** heq hebûn; ~ **уваже́нием** hurmet hebûn.

по́льский *прил.* yê Lohêstanê; **~ язы́к** zimanê lohêstanîyê.

польсти́ть *сов. см.* льстить.

польсти́ться *сов.* hewas (dil) kirin, çev berdan.

полюби́ть *сов.* hiz kirin; dil ketin (*влюбиться*).

полюбова́ться *сов. см.* любова́ться.

полюбо́вн||ый *прил.* yê notila dosta (hogira), yê hevaltîyê, yê hogirtîyê; **~ое соглаше́ние** qafilnama hogirtîyê.

полюбопы́тствовать *сов. см.* любопы́тствовать.

по́люс *м.* qutb *м.*; **Се́верный ~** qutbê Şîmalê; **Ю́жный ~** qutbê Cenûbê.

поля́к *м.* merîyê Lohêstanê.

поля́на *ж.* meîdan *ж.*, deşt *ж.*, rast *ж.*

поля́рник *м.* qulixçîyê qutbê.

поля́рный *прил.* yê qutb; **Поля́рный круг** nehîya dora qutbê; **Поля́рная звезда́** steîrka Şimalê.

пома́да *ж.*: **губна́я ~** dermanê lêva.

пома́зать *сов. см.* ма́зать.

пома́леньку *нареч. разг.* hêdî-hêdî, bere-bere.

пома́лкивать *несов.* dengê xwe nekirin, ker (hiş) bûn.

помани́ть *сов. см.* мани́ть.

пома́рка *ж.* leke *ж.*

пома́слить *сов. см.* ма́слить.

поме́ньше (*сравнит. ст. от* ма́ленький) deha hindik (kêm), kemtir, hindiktir.

поменя́ть(ся) *сов. см.* меня́ть (-ся).

помера́нец *м.* 1. (*плод*) turunc *м.*; 2. (*дерево*) dara turunca.

помере́щиться *сов. см.* мере́щиться.

поме́риться *сов. см.* ме́риться.

поме́ркнуть *сов. см.* ме́ркнуть.

помести́ть(ся) *сов. см.* помеща́ть(ся).

поме́стье *с.* milk *м.*

по́месь *ж.* ducinsî *м.*

поме́сячно *нареч.* her meh, meh-meh.

поме́сячный *прил.* yê hermeh, yê meh-meh.

помёт *м.* peîn *м.*, ters *м.*; **ове́чий ~** bişkul; **пти́чий ~** çîrt *ж.*

поме́тить *сов. см.* помеча́ть.

поме́тка *ж.* nîşan *ж.*, daĸ *ж.*

поме́х||а *ж.* mene *ж.*, şerpeze *ж.*; **быть ~ой** şerpeze bûîn.

помеча́ть, поме́тить nîşan (kivş) kirin.

поме́шанный *прил.* yê dîn, yê gêj, yê bêhemdê xwe.

помеша́тельство *с.* dînbûîn *ж.*, têpaketin *ж.*, gêjbûîn *ж.*

помеша́ть I, II *сов. см.* меша́ть I, II.

помеша́ться *несов.* dîn (gêj) bûîn, têpa ketin, aqilê xwe unda kirin.

помеща́||ться, помести́ться 1. (*находиться*) bûîn, ewir (binalî) bûîn; **где ~ется...** kêderêîyê...; 2. (*вмещаться*) cî bûîn (girtin); **сюда́ ~ется...** têda ... cî dibe.

помеще́ние *с.* 1. (*дом, квартира*) xanî *м.*, avaî *м.*; 2. (*действие*) cîkirin *ж.*

поме́щик *м.* milkdar *м.*

поме́щичий *прил.* yê milkdar, yê milkdarîyê.

помидо́р *м.* pomîdor *м.*, tomat *м.*

помо́лование *с.* bexşandin *ж.*

помо́ловать *сов.* bexşandin.

помо́мо *предлог* 1. (*сверх*) xênî [ji...]; **~ меня́** xênî ji min; 2. (*без ведома*) bêî; **~ тебя́** bêî te.

помин||а́ть, помяну́ть anîn bîra xwe; ◇ **~а́й, как зва́ли** *разг.* betavebûn, unda bûîn, bîne bîra xwe navê wî çi bû.

помо́йки *мн.* xêra mirîya.

помину́тно *нареч.* her deqe, deqe-deqe.

помину́тный *прил.* yê herdeqe, yê deqe-deqe.

помири́ть(ся) *сов. см.* мири́ть (-ся) 1.

по́м||нить *несов.* bîra xweda xweî kirin, bîr nekirin; **я не ~ню**

naê bîra min; ~ни! bîr neke!, bîratedabe!

помножáть *сов. см.* мнóжить.

помнóжить *сов. см.* мнóжить 1.

помог||áть, помóчь komek daîn, alîkarî (alî) kirin; **лекáрство ~áет** derman alîkarîyê dike (dide).

по-мóему *нареч.* 1. (*по моему мнению*) bi fikira (bi aqilê) min; 2. (*по моему совету*) bi şîreta min; 3. (*по моему желанию*) bi xwestina (bi hewasa, bi arzûîyê) min.

помó||и *мн.* ava qirêj (pîs); ◇ **обливáть ~ями** *разг.* robet (çirax, rezîl, buxdan) kirin.

помóйн||ый *прил.*: **~ая ямá** cîyê gemarê, kulîbek *ж.*

помó||я *м.* hêran *ж.*; **мукá крýпного ~ла** arê gir hatîye hêranê.

помолúться *сов. см.* молúться.

помолодéть *сов. см.* молодéть.

поморúть *сов. см.* морúть 1.

помóрщиться *сов. см.* мóрщиться.

помóст *м.* darbest *ж.*, bilindaî *ж.*

помóчь *сов. см.* помогáть.

помóщник *м.* (*о должности*) dewsgirtî *м.*; **~ дирéктора** dewsgirtîyê serkar (modîr).

пóмо||щь *ж.* komek *ж.*, alîkarî *ж.*; **медицúнская ~** komeka hekîmîyê; **посторóнняя ~** komeka başqe; **прийтú на ~** xwe pêra gîhandin, komek daîn, alîkarî kirin; **прибéгнуть к ~щи** komek xwestin; **оказывать ~** komek daîn, alîkarî kirin; **при ~щи, с ~щью** bi komeka, bi alîkarîya; **подáть рýку ~щи** komek daîn, destê alîkarîyê daîn.

пóмпа I *ж.* (*насос*) lûle *ж.*, destgê hilçinandinê.

пóмпа II *ж.* (*пышность*) kubarî *ж.*, pomp *ж.*

помрачнéть *сов. см.* мрачнéть.

помутнéть *сов. см.* мутнéть.

помчáться *сов.* zû bezîn.

пóмысел *м.* fikir *ж.*, nêt *ж.*

помы́ть(ся) *сов. см.* мы́ть(ся).

помышля́ть *несов.* xwestin, dil kirin (*хотеть*); nêt hebûn (*намереваться*); xwe hazir kirin, tivdarekê xwe kirin (*подготовляться*).

помянýть *сов. см.* поминáть.

помя́тый *прич., прил.* yê qurçimî.

помя́ть *сов. см.* мять.

понадéяться *сов. разг.* guman kirin, îtbara xwe (*ji keseki*) anîn.

понадóби||ться *сов. разг.*: **емý ~лась э́та кни́га** ew kitêb kêrî wî hat; **éсли ~тся** hergê lazim be.

понапрáсну *нареч. разг.* cîyê belesebeb, badîhewa.

по-настоя́щему *нареч.* rastî, çawa ku lazime.

по-на́шему *нареч.* 1. (*по нашему мнению*) bi fikira (bi aqilê) me; 2. (*по нашему совету*) bi şîreta me; 3. (*по нашему желанию*) bi xwestina (bi hewasa, bi arzûîyê) me.

поневóле *нареч.* bêdil, neçarî, bi êxtîyar.

понедéльник *м.* duşem *ж.*

понемнóгу *нареч.*, **понемнóжку** *нареч.* 1. hindik-hindik; 2. (*постепенно*) bere-bere, hêdî-hêdî.

понестú *сов. см.* нестú I 2, 3, 5, носúть 1.

понестúсь *сов. см.* нестúсь I, носúться.

понижáть, понúзить 1. nimz kirin, daxistin; 2. (*уменьшать*) kêm kirin; 3. (*ухудшать, ослаблять*) xirab kirin; 4. (*приглушать*) nimz kirin, vebirîn.

понижáться, понúзиться 1. (*делаться более низким*) deha nimz bûîn; 2. (*уменьшаться*) kêm (hindik) bûîn; 3. (*ухудшаться*) xirab bûîn; 4. (*о звучании*) ketîn; **гóлос понúзился** deng ket.

понижéние *с.* 1. (*цен и т. п.*) nimzbûîn *ж.*; 2. (*уменьшение*) kêmbûîn *ж.*, hindikbûîn *ж.* (*по гл.* понижáться); kêmkirin *ж.*, hindikkirin *ж.* (*по гл.* понижáть); 3. (*гóлоса, звука*) ketîn *ж.*

понúзить(ся) *сов. см.* понижáть(ся).

понима́ние *с.* 1. femkirin *ж.*; 2. (*толкование*) şirovekirin *ж.*

понима́||ть, поня́ть 1. fem kirin; **я ~ю ва́шу мысль** ez fikira we fem dikim; 2. zanî (*употреб. только во 2 л. наст. вр.*); **~ешь, он мо́жет нам помо́чь** zanî, ew dikare alî me bike; ✧ **дать поня́ть** daîn femkirinê.

по-но́вому *нареч.* bi cûrekê dinê, teze.

поно́с *м. мед.* navçûîn *ж.*, lingxebitîn *ж.*

поноси́ть I *сов. см.* носи́ть.

поноси́ть II *сов.* (*оскорблять*) çêrî (*keseki*) kirin, (*kesekîra*) daîn xebera.

поно́шенный *прил.* yê xwekirî, yê kevinbûî.

понра́виться *сов. см.* нра́виться.

понто́н *м.* 1. (*лодка*) ponton *ж.*; 2. (*мост*) pira ponton.

понто́нный *прил.*: **~ мост**, *см.* понто́н 2.

пону́дить *сов. см.* понужда́ть.

понужда́ть, пону́дить mecbûr kirin; daîn kirinê (*заставлять делать*).

понужде́ние *с.* mecbûrkirin *ж.*, zordaîn ser.

пону́рить *сов.*: **~ го́лову** bêvila xwe daliqandin.

поны́не *нареч.* ĥeta niha.

пону́хать *сов. см.* ню́хать.

поня́тие *с.* 1. (*представление*) fikir *ж.*, nêt *ж.*; 2. (*сведения*) elamet.

поня́тливость *ж.* femkarî *ж.*, zên *ж.*

поня́тливый *прил.* yê femkar, yê zên.

поня́тно 1. *нареч. в знач. сказ. безл.*: **э́то ~** ew yek eyane (femdarîye); 2. *вводн. сл.* (*конечно, бесспорно*) helbet, lê çawa; 3. *нареч.* femkarîye, eyane.

поня́тный *прил.* yê femkarîyê, yê eyan.

поня́ть *сов. см.* понима́ть.

пообе́дать *сов. см.* обе́дать.

поодино́чке *нареч. разг.* yek-yek.

поочерёдно *нареч.* peî hev, dû hev, nobe-nobe, dor-dor.

поощре́ние *с.* xelatkirin *ж.*, rewakirin *ж.*

поощри́тельный *прил.* yê xelatkirinê, yê rewakirinê.

поощря́ть *сов. см.* поощря́ть.

поощря́ть, поощри́ть xelat (rewa) kirin.

поп *м.* keşîş *м.*, keşîşê ûrisa.

попада́ние *с.* lêgirtin *ж.*, lêketin *ж.*

попада́ть, попа́сть 1. lêketin, lêgirtin; nişkêva lêketin (*нечаянно*); **~ в цель** li meremê xistin; 2. (*очутиться где-л.*) çûîn, derbaz bûîn; **~ в го́род** çûîn li şiher; 3. (*успеть*) gihîştin, xwe pêra gîhandin; **~ на по́езд** gihîştin li trênê (maşînê); **~ во́время** li wextêda gihîştin; 4. (*оказаться*) ketin ...; **~ в беду́** ketin li teşqelê (belaê); **~ в нело́вкое положе́ние** ketin li ĥalê xirab; ✧ **~ впроса́к** *разг.* xapyîan, şaş bûîn, hatin xapandinê; **ему́ попа́ло** bela wî hate daînê; **как попа́ло** tewekelî, çawa ku nebe.

попада́ться, попа́сться 1. hatin girtinê; 2. (*встречаться*) rast hatin, hev dîtin, rastî hev hatin.

попа́рно *нареч.* cot-cot.

попа́сть(ся) *сов. см.* попада́ть (-ся).

поперёк *нареч.* bi beraîyê; **~ доро́ги** bi beraîya rê; ✧ **вдоль и ~** *разг.* li her alîya.

попереме́нно *нареч.* wede-wede, bere-bere.

попере́чни||к *м.* beraî *ж.*; **6 ме́тров в ~ке** 6 mêtr bi beraîyê.

попере́чный *прил.* yê beraîyê; ✧ **ка́ждый встре́чный и ~** *разг.* her merîyê nenas.

поперхну́ться *сов.* berda (gewrîyêda) maîn, kuxîyan.

попече́ние *с.* xweîkirin *ж.*

попира́ть, попра́ть tepisandin, pêpes kirin.

поплаво́к *м.* sivikok *ж.*, pifdang *ж.*

попла́каться *сов. см.* пла́каться.

поплати́ться *сов. см.* плати́ться.

попл|ы́ть *сов. см.* плыть.

попо́йка *ж.* îçkevexwerin *ж.*

пополам *нареч.*: **дели́ть ~** nîvî kirin; **~ с чем-л.** nîvekarî tev tiştekî; **~ с ке́м-л.** nîvekarî tev kesekî.

пополznове́ние *с.* xwestin *ж.*, dilkirin *ж.*, hewaskirin *ж.*

поползти́ *сов. см.* ползти́ 2.

пополне́ние *с.* 1. tijîkirin *ж.*, serdazêdekirin *ж.* (*по гл.* пополня́ть); tijîbûîn *ж.*, serdazêdebûîn *ж.* (*по гл.* пополня́ться); 2. *воен.* eskerê zêde (teze).

пополне́ть *сов. см.* полне́ть.

попо́лнить(ся) *сов. см.* пополня́ть(ся).

пополня́ть, попо́лнить tijî (serda zêde) kirin.

пополня́ться, попо́лниться tijî (serda zêde) bûîn.

поподу́дни *нареч.* paşî nîvroê.

поподу́ночи *нареч.* paşî nîvê şevê.

попо́на *ж.* belgîyê (kulavê) ser pişta hespê.

попра́вить(ся) *сов. см.* поправля́ть(ся).

попра́вка *ж.* 1. (*здоровья*) qencbûn *ж.*, pakbûn *ж.*; 2. rastkirin *ж.* (*исправление*); pakkirin *ж.*, qenckirin *ж.* (*улучшение*); 3. (*починка*) rastkirin *ж.*, dûzkirin *ж.*, pînekirin *ж.*

поправля́ть, попра́вить 1. (*чинить*) rast (dûz, pîne) kirin; 2. (*оправлять*) rast kirin; 3. (*исправлять*) rast kirin; 4. (*улучшать*) pak (qenc) kirin.

поправля́ться, попра́виться 1. (*исправлять свою ошибку*) şaşîya xwe rast kirin; 2. (*здороветь*) qenc (pak) bûîn.

попра́ть *сов. см.* попира́ть.

по-пре́жнему *нареч.* dîsa usa, notila (mîna) berê.

попрека́ть, попрекну́ть tene lêdan (*упрекать*); minet kirin (*напоминать о сделанном добре*).

попрекну́ть *сов. см.* попрека́ть.

по́прище *с.* îş *м.* (*дело*); qulix *ж.* (*служба*); xebat *ж.* (*работа*)

попро́бовать *сов. см.* про́бовать.

попроси́ть(ся) *сов. см.* проси́ть(ся).

по́просту *нареч. разг.* bê teklîf, bi am û tam; **✧ ~ говоря́** rastî bêjin.

попроша́йка *м., ж. разг.* parsekçî *м., ж.*

попроша́йничать *несов. разг.* pars (recû) kirin.

попроща́ться *сов. см.* проста́ться, проща́ться.

попуга́й *м.* tûtî *м.*

популяриза́тор *м.* eyançî *м.*, şiroçî *м.*

популяриза́ция *ж.* 1. merûfkirin *ж.*, eyankirin *ж.*; 2. herkes pêhesandin *ж.*, sivikkirin *ж.*

популяризи́ровать *несов. и сов.* 1. (*распространять, делать известным*) merûf (eyan) kirin; 2. (*делать доступным, лёгким*) herkes pêhesandin, sivik kirin.

популя́рный *прил.* 1. (*известный*) yê navdar, yê merûf, yê eyan; 2. (*доступный, лёгкий*) yê sivik.

попусти́тельство *с.* serva berdan, rûdaîn *ж.*

попусти́тельствовать *несов.* serva berdan, rû daîn.

по́пусту *нареч. разг.* cîyê belesebeb, badîhewa.

попу́тно *нареч.* ser rîya xwe, yekser, rêva.

попу́тный *прил.*: **~ ве́тер** baê bi alîyê rê, baê piştê.

попу́тчик *м.* hemrêvî *м.*

попыта́ться *сов. см.* пыта́ться.

попы́тка *ж.* cêribandin *ж.*, temkirin *ж.*

попя́титься *сов. см.* пя́титься.

попя́тный: идти́ на ~ *разг.* paşda çûîn.

пор||á 1. *ж.* (*время*) wext *м.*, wede *м.*; **весе́нняя ~** wextê biharê; **~ обмоло́та** wedê ekin-

kutanê; **в ту ~у** li wî wextî, li wî çaxî; **до сих пор** 1) (*до этого времени*) heta niha; 2) (*до этого места*) heta vêderê; **до тех пор...** heta...; **до каки́х пор?** heta kengê?; **с да́вних пор** ji zemanê qedîm (zûda); **~о́ю** cara-cara; 2. *в знач. сказ.* wedeîye, wexte; **~ спать** wextê xewêîye; **~ идти́** wextê çûînêîye; ✧ **на пе́рвых ~а́х** ewil.

поработа́ть *сов.*: **немно́го ~** hinekê şuxul kirin.

поработи́тель *м.* zalim *м.*, altindar *м.*, zeftekçî *м.*

поработи́ть *сов. см.* порабо-щать.

порабоща́ть, поработи́ть hêsîr-dîî kirin.

порабоще́ние *с.* hêsîrkirin *ж.*

поравня́ться *сов.* weke hev (angorî hev) bûîn, gihîştin hev.

пора́довать(ся) *сов. см.* ра́довать(ся).

поража́ть, порази́ть 1. (*наносить удар*): **~ кинжа́лом** qeme lêdan; 2. *перен.* (*удивлять*) daîn heîrê; 3. *мед.* birîndar kirin, lêdan; ✧ **~ в права́х** ji heqdarîyê merûm kirin.

поража́ться, порази́ться heîr (metel, ecêb) maîn.

пораже́ние *с.* altbûîn *ж.*; **наноси́ть ~** alt kirin; **потерпе́ть ~** alt bûîn.

поражённый *прич.* yê heîrmaî, yê metelmaî, yê ecêbmaî.

порази́тельный *прил.* yê biheîr, yê ber bi çev; yê ecêb (*удивительный*).

порази́ть(ся) *сов. см.* поража́ть (-ся).

пора́нить *сов.* birîndar kirin.

порва́ть *сов. см.* рвать, порыва́ть.

порва́ться *сов.* qetîyan, qelişîn.

пореде́ть *сов. см.* реде́ть.

поре́з *м.* birîn *ж.*, bir *ж.*

поре́зать *сов.* birîn, jêkirin, kêr kirin.

поре́заться *сов.* xwe birîn.

пореши́ть *сов. см.* решить 1.

поржа́веть *сов. см.* ржа́веть.

порица́н||ие *с.* şîret *ж.*; **заслу́живать ~ия** hatin şîretkirinê.

порица́ть *несов.* şîret kirin.

по́рка *ж. разг.* (*наказание*) qamçûkirin *ж.*, lêxistin *ж.*

по́ровну *нареч.* angorî (beranberî) hev; nîvî-nîvî, nîvekarî (*пополам*).

поро́г *м.* 1. (*дверной*) şêmîk *ж.*; 2. (*речной*) şelale *ж.*, çemî *ж.*

поро́||да *ж.* cins *м.*; **той же ~ды** yê cinsekê.

поро́дистый *прил.* yê bicins.

породи́ть *сов. см.* порожда́ть.

породни́ться *сов. см.* родни́ться.

порожда́ть, породи́ть pêşda anîn, deranîn.

поро́жний *прил. разг.* yê vala, yê xalî.

порозове́ть *сов. см.* розове́ть.

по́розынь *нареч.* başqe-başqe, cuda-cuda.

поро́й *нареч.* cara-cara, cara wexta.

поро́к *м. в разн. знач.* qusûr *ж.*; eîb *ж.*, ar *ж.* (*моральный недостаток*); **~ се́рдца** *мед.* dilêş *ж.*; **~ ре́чи** lalbûîn *ж.*

поросёнок *м.* çêjikê xinzîr.

поро́ть I, вы́пороть (*сечь*) kutan, lêdan, lêxistîn.

поро́ть II, распоро́ть (*одежду и т. п.*) qelaştin, birîn.

по́рох *м.* barût *ж.*; **безды́мный ~** barûta bêdû (dû nake).

пороховни́ца *ж.* barûtdang *ж.*, qutîya barûtê.

порохово́й *прил.* yê barûtê; **~ дым** dûîyê barûtê; **~ по́греб** embara barûtê, barûtxane *ж.*

поро́чить, опоро́чить bênamûs (çirax, rezîl) kirin.

поро́чный *прил.* yê biqusûr, yê bênamûs.

порошо́к *м.* toz *ж.*, ar *м.*; **зубно́й ~** arê dirantemîzkirinê.

поро́ю *см.* поро́й.

порт *м.* bender *ж.*; **вое́нный ~** bendera eskerîyê; **торго́вый ~**

bendera bazirganîyê (arişvêrşîyê); **воздýшный ~** bendera teyara.

пóртить, испóртить xirab kirin; bêkêr kirin (*делать негодным*); **~ зрéние** çev (bînaîya çeva) xirab kirin; **~ себé нéрвы** nava xwe xistin, kerbûî bûîn.

пóртит‖ься, испóртиться xirab bûîn; bêkêr bûîn (*становиться негодным*); **погóда ~ся** hewa xirab dibe.

портмонé *с.* xelîtkê pera.

портни́ха *ж.* terzî *ж.*

портнóй *м.* terzî *м.*

портóвый *прил.* yê benderê; **~ гóрод** şiherê benderê.

портрéт *м.* sifet *м.*, şikil *м.*, sûret *м.*

портретúст *м.* şikilçî *м.*, sûretçî *м.*

портсигáр *м.* qutîya ciẍara.

португáлец *м.* merîyê Portûgalîyê.

португáльский *прил.* yê Portûgalîyê.

португéя *ж. воен.* qalşa şûr.

портфéль *м.* 1. portfêl *ж.*; 2. (*министерский*) wezîfê wezîr; 3. (*рукописи*) destnivîs *ж.*

портьéра *ж.* perde *ж.* (*ji perçê qalin*).

портя́нка *ж.* pînê lingalandinê.

порýбка *ж.* darbirîna binalî.

поруга́ть *сов. разг.* çêr kirin, daîn xebera.

порý‖ка *ж.* zaminî *ж.*; **взять на ~ки** zaminî hildan; **отпусти́ть на ~ки** zaminî berdan.

поручáть, поручи́ть sipartin.

поручéние *с.* sipartin *ж.*, temî *ж.*, anemet *ж.*; **ýстное ~** sipartina bizar; **дать ~** temî daîn; **испóлнить ~** temî qedandin.

поручи́тель *м.* kefîl *м.*, zamindar *м.*

поручи́тельство *с.* zaminî *ж.*

поручи́ть *сов. см.* поручáть.

поручи́ться *сов. см.* ручáться.

порхáть, порхнýть firîn.

порхнýть *сов. см.* порхáть.

пóрц‖ия *ж.* par *ж.*; **две ~ии мя́са** du par goşt.

пóрча *ж.* 1. (*по гл.* пóртить) xirabkirin *ж.*; 2. (*по гл.* пóртиться) xirabbûîn *ж.*; **~ зубóв** xirabbûîna dirana.

пóрчу *см.* пóртить.

пóршень *м. тех.* pîston *м.*

поршнéвой *прил.* yê pîston.

поры́‖в *м.* 1. (*ветра и т. п.*) bager *ж.*, pêl *ж.*; **~вы бýри** pêlê tofanê; 2. *перен.* (*чувств*) hewas *ж.*; **в ~ве гнéва** bi hêrsa xwe.

порывáть, порвáть 1. (*прекращать*) xilas (kuta) kirin, anîn serî; 2. (*отделяться*) tewqê xwe lêqetandin, cihê (başqe) bûn.

порывáться *несов.* zef xwestin (hewas kirin).

поры́вистый *прил.* yê qaîm; **~ вéтер** baê qaîm (gur).

порыться *сов. см.* рыться.

поря́дком *нареч. разг.* 1. (*значительно*) êpêce, zef; **он ~ устáл** ew êpêce westîyae; 2. (*как должно*) çawa ku (çiku) lazime; **он ничегó ~ не сдéлал** ewî çiku lazime nekirîye.

поря́д‖ок *м.* 1. cêrge *ж.*, tertîb *ж.*, qaîde *м.*; **быть не в ~ке** bêtertîb bûîn; **приводи́ть в ~** tertîb kirin; **соблюдáть ~** qaîde xwe kirin; 2. (*последовательность*) qaîde *м.*; **в ~ке óчереди** bi qaîdê nobê (rêzê); 3. (*способ*) cûre *м.*, celeb *ж.*; **какúм ~ком?** çi celebî?; **в спéшном ~ке** zef lez, zef zû; **зако́нным ~ком** bi qaîdê qanûnê; 4. (*строй*) cêrge *ж.*; 5. *мн.* **~ки** (*обычаи*) edet; ◇ **дéло идёт свойм ~ком** şuxul li sirîya (şuhul li rêça) xweda diçe; **в пóлном ~ке** çawa ku lazime.

поря́дочно *нареч.* 1. (*честно*) namûstî, helalî; 2. *разг.* (*изрядно, много*) êpêce, zef; 3. *разг.* (*хорошо*) pak, baş, rind.

поря́дочный *прил.* 1. (*честный*) yê helal, yê binamûs; 2. (*довольно большой*) yê êpêce mezin; 3. (*довольно хороший*) yê êpêce baş, yê êpêce pak.

посади́ть *сов. см.* сади́ть, сажа́ть.

поса́д||ка *ж.* 1. (*растений*) daçikandin *ж.*; 2. (*на поезд и т. п.*) rûniştin *ж.*, sîyarbûn *ж.*; 3. *ав.* danîn *ж.*, rûniştin *ж.*; **ме́сто ~ки самолётов** cîyê danîna teyara.

поса́дочн||ый *прил.* 1. *ав.* yê rûniştinê, yê danînê; **~ая площа́дка** meîdana danînê (rûniştinê); 2. *с.-х.* yê daçikandinê; **~ые материа́лы** heşîyaê daçikandinê.

посва́тать(ся) *сов. см.* сва́тать(ся).

посвежéть *сов. см.* свежéть.

посветле́ть *сов. см.* светле́ть 1, 3.

посви́стывать *несов.* kirin fîtîn, fîte-fît kirin.

по-сво́ему *нареч.* 1. (*по своему желанию*) bi hewasa (bi xwestina) xwe, bi rizadilîya xwe, xweserî xwe; 2. (*своим способом*) bi tehrê xwe, bi qaîdê xwe.

посвяти́ть *сов. см.* посвящáть.

посвящáть, посвяти́ть 1. (*отдавать*) sipartin; **~ жизнь нау́ке** jîîna xwe sipartin ulmê; 2. (*книгу и т. п.*) bexşandin; 3. (*сообщать—тайну и т. п.*) aga (elamet) kirin.

посвящá||ться *несов.* hatin bexşandinê; **~ется...** tê bexşandinê...

посе́в *м.* 1. (*действие*) çandin *ж.*, toximavêtin *ж.*; 2. (*то, что посеяно*) ekin *м.*, zevî *ж.*, kewşen *м.*

посевн||о́й *прил.*: **~áя пло́щадь** zevî *ж.*, deşta (meîdana) toximavêtinê.

посе́вы *мн. см.* посе́в 2.

поседе́ть *сов. см.* седе́ть.

поселе́нец *м.* binalî *м.*

поселе́ние *с.* 1. (*действие*) miskenbûîn *ж.*, cîwarbûîn *ж.*; 2. (*селение*) gund *м.*

поселя́ть(ся) *сов. см.* поселя́ть(ся).

посёлок *м.* şîherê biçûk, misken *м.*

поселя́ть, посели́ть ewir (misken) kirin.

поселя́ться, посели́ться ewir (misken) bûîn.

посеребри́ть *сов. см.* серебри́ть.

пос[е]дине́ *нареч.* li ortêda, orta.

посе́товать *сов. см.* се́товать.

посети́тель *м.* zîyaretçî *м.*; mêvan *м.* (*гость*).

посети́ть *сов. см.* посещáть.

посеща́емость *ж.* hatin *ж.*; **хоро́шая ~** hatina baş.

посещáть, посети́ть hatin, sertêdan, dîtîn; **~ заня́тия** hatin [ser] dersê.

посеще́ние *с.* hatin *ж.*, sertêdan *ж.*, dîtîn *ж.*

посе́ять *сов. см.* се́ять.

посиде́ть *сов. см.* сиде́ть.

поси́льн||ый *прил.* yê angorî qewetê; **~ая по́мощь** alîkarîya angorî qewetê.

посине́ть *сов. см.* сине́ть 1.

поскака́ть *сов. см.* скака́ть.

поскользну́ться *сов.* şimitîn.

поско́льку *союз* 1. (*насколько*) çiku, çimku; **~ ему́ изве́стно...** çimkî wîya eyane...; 2. (*так как*) çimku; **~ ещё ра́но, мо́жно погуля́ть** çimku hê zûîye, miherin bigerin; ◇ **~ посто́льку** çimku, çiku.

поскоре́е (*сравнит. ст. от* ско́ро) zûtirê; **~!** lezkeve!, zûtire!, zûke!

поскупи́ться *сов. см.* скупи́ться.

послабле́ние *с.* servaberdan *ж.*; rûdaîn *ж.*; dilnermî *ж.* (*мягкость*).

послáнец *м.* şandî *м.*, qasid *м.*

послáние *с.* (*письмо*) name *ж.*

послáнник *м.* 1. *дип.* wezîrê muxtar; 2. *см.* послáнец.

по́сланный *в знач. сущ. м.* qasid *м.*, şandî *м.*

послáть *сов. см.* посылáть.

по́сле 1. *нареч.* paşê, paşî; **что мы сде́лаем ~** ewê yekê emê paşê bikin; 2. *предлог* paşî; **~** ме-

ня́ он то́же прие́хал paşî min ewjî hat.

послевое́нный *прил.* yê paşî şer.

после́д *м. анат.* mala (cîyê) zarê.

после́дн||ий *прил.* 1. yê paşîn, yê axir; **в ~ раз** cara paşîn; **~ день неде́ли** roja paşîne ĥeftê; 2. (*предыдущий*) yê paşîn; **на ~ем собра́нии** li civata paşînda; 3. (*окончательный*) yê paşîn, yê xulase, yê kutasî; **э́то моё ~ее сло́во** ewa xebera mine kutasîye; 4. (*новейший*) yê teze; **~ие изве́стия** elametîyê teze (paşîn); 5. (*наихудший*) yê tewrexirab; **~ сорт** cûrê tewrexirab; ◇ **за ~ее вре́мя** vê paşwextîyê; **~ее жела́ние** (*предсмертное*) gotina bermirinê; **боро́ться до ~его** ĥeta serî şer kirin; **быть на ~ем пла́не** şûnda (paşda) maîn.

после́дователь *м.* dûketî *м.*; terefdar *м.* (*сторонник*).

после́довательность *ж.* 1. (*порядок*) peîhevî *ж.*, dûhevî *ж.*; 2. (*логичность*) femkarî *ж.*, îzbatkarî *ж.*

после́довательный *прил.* 1. (*упорядоченный*) yê peîhev, yê dûhev; 2. (*логичный*) yê femkarîyê, yê bîîzbat.

после́довать *сов. см.* сле́довать 1—5.

после́дств||ие *с.* aqûbet *ж.*, axirî *ж.*; netîce *ж.*, ĥasil *ж.* (*результат*); **без ~ий** bê ĥasil, bê netîce; **~ия боле́зни** netîcê êşê (nexweşiyê).

после́дующий *прил.* yê wê bê, yê peîhatî.

послеза́втра *нареч.* dusibê.

послеобе́денный *прил.* yê paşî firavînê.

послеоктя́брьский *прил.* yê paşî oktyabrê, yê paşî çirya ewil.

послереволюцио́нный *прил.* yê paşî înqlabê.

послесло́вие *с.* xulase *ж.*

послови́ца *ж.* mesel *ж.*

послужи́ть *сов. см.* служи́ть 3, 4.

послу́шать(ся) *сов. см.* слу́шать(ся).

послы́шаться *сов. см.* слы́шаться.

посма́тривать *несов.* nihêrîn, cara-cara teselî kirin.

посме́иваться *несов.* kenîn, pêkenî kirin; serê (*keseki*) kenîn (*над кем-л.*).

посме́ртный *прил.* yê paşî mirinê.

посме́ть *сов. см.* сметь.

посме́шищ||е *с.*: **стать ~ем** mesxere (ecêb, robet, pêkenî) bûîn.

посмея́ться *сов. см.* смея́ться.

посмотре́ть *сов. см.* смотре́ть 1—4.

посмотре́ться *сов. см.* смотре́ться.

посо́б||ие 1. (*денежное*) alîkarîya (komeka) peretî; 2. (*учебник*) kitêba dersê; **уче́бные ~ия** ĥeşîyatîyê hînbûnê.

посо́бник *м.* komekdar *м.*, heval *м.*, betil *м.*

посове́товать(ся) *сов. см.* сове́товать(ся).

посо́л *м.* îlçî *м.*, wekîle mezin.

посоли́ть *сов. см.* соли́ть.

посо́льство *с.* îlçîxane *ж.*, sifaretxane *ж.*

поспа́ть *сов.* razan, xewra çûîn; **~ полчаса́** nîvsehet razan.

поспева́ть I, поспе́ть (*созревать*) gihîştin; mezin bûîn (*вырастать*).

поспева́ть II, поспе́ть (*успевать*) gihîştin, xwe gîhandin.

поспе́ть I, II *сов. см.* поспева́ть I, II.

поспеши́ть *сов. см.* спеши́ть.

поспе́шно *нареч.* zef zû, zef lez.

поспе́шность *ж.* lezketin *ж.*, lezî *ж.*

поспе́шн||ый *прил.* yê lez; **~ое реше́ние** qirarê lez.

поспо́рить *сов. см.* спо́рить.

посреди́ *предлог* 1. orta, ser, nav; **~ доро́ги** orta rêda; 2. *в знач. нареч.* ortêda.

посре́дник *м.* 1. (*арбитр*) qazî *м.*; 2. (*комиссионер*) delal *м.*

посре́дничать *несов. разг.* delalî kirin, şede bûîn, ortê sekinîn.

посре́дничест‖во *с.* delalî *ж.*; **при ~ве...** bi komeka..., bi delalîya...

посре́дственно *нареч.* [bi] orte.

посре́дственный *прил.* yê ortê.

посре́дст‖во *с.*: **при ~ве...** bi alîkarya..., bi komeka...

посре́дством *предлог*: **~ перегово́ров** bi rîya hevraxeberdanê.

поссо́рить(ся) *сов. см.* ссо́рить (-ся).

пост I *м.* 1. (*должность*) qulix *ж.*; 2. *воен.* wezîfe *ж.*; 3. (*место охраны*) cîyê nobedarîyê.

пост II *м.* (*воздержание от пищи*) rojîgirtin *ж.*

поста́вить *сов. см.* ста́вить.

поста́вка *ж.* şandin *ж.*, anîn *ж.*

поставля́ть *несов.* şandin, anîn.

поставщи́к *м.* firoşçî *м.*, tucar *м.*

постанови́ть *сов. см.* постановля́ть.

постано́вка *ж.* 1. (*установка*) danîn *ж.*, daçikandin *ж.*; 2. *театр.* (*спектакль*) temaşe *ж.*; 3. (*организация*) teşkîlkirin *ж.*; 4. (*положение*) danîn *ж.*, qaîde *м.*

постановле́ние *с.* emirnivîs *ж.*, qirar *м.*; destûr *ж.* (*инструкция*).

постановля́ть, **постанови́ть** qirar (teşkîl) kirin.

постара́ться *сов. см.* стара́ться.

постаре́ть *сов. см.* старе́ть.

посте́ль *ж.* cî-nivîn; lihêf-doşek *ж.* (*постельные принадлежности*).

посте́льный *прил.* yê cî-nivîna.

постепе́нно *нареч.* bere-bere, hêdî-hêdî.

постепе́нный *прил.* yê bere-bere, yê hêdî-hêdî.

пост‖ига́ть, **пости́гнуть**, **пости́чь** 1. (*понимать*) gihîştin nêtê, fem kirin; 2. (*случаться с кем-л.*) qewimîn; **его́ ~и́гло го́ре** bedbextî serda ket.

пости́гнуть *сов. см.* постига́ть.

постила́ть, **постла́ть** 1. (*расстилать*) raxistin, vekirin; 2. (*постель и т. п.*) cî (cî-nivîn) danîn.

пости́чь *сов. см.* постига́ть.

постла́ть *сов. см.* постила́ть.

по́стн‖ый *прил.* yê bêgoşt; yê nekok (*нежирный*); **~ая пи́ща** xwerina nekok; **~ое мя́со** goştê nekok; **~ое ма́сло** bizir *м.*

постово́й *прил.* 1. yê nobedarîyê; 2. *в знач. сущ. м.* qerewil *м.*, nobedar *м.*

посто́й!, **посто́йте!** bisekine!, sebirke!

посто́льку *союз* çimkî; ✧ **~ поско́льку** çimku, çimkî.

посторони́ться *сов. см.* сторони́ться.

посторо́нн‖ий *прил.* 1. yê xerîb; **~ее лицо́** merîyê xerîb; **без ~ей по́мощи** bê komeka başqe; 2. *в знач. сущ. м.* merîyê xerîb (başqe); **~им вход воспрещён** derdahatin bona merîyê başqe qedexeîye.

постоя́лый *прил.*: **~ двор** kervansere *ж.*

постоя́нно *нареч.* hertim, hergav, herwext.

постоя́нный *прил.* yê hertim, yê herwext, yê dehim, yê her zemana.

постоя́нство *с.* dehimî *ж.*, hertimî *ж.*, hergavî *ж.*

постоя́ть *сов.* 1. (*некоторое время*) hinekî sekinîn, lezekî ser linga bûîn; 2. (*защитить кого-л.*) xweî kirin, pişt girtin.

пострада́вший *прич.* 1. yê cefadîtî, yê zerardîtî; 2. *в знач. сущ. м.* merîyê cefadîtî.

пострада́ть *сов.* 1. *см.* страда́ть; 2. (*потерпеть урон, испытать*) zerar (zîyan) dîtin.

постри́чь(ся) *сов. см.* стричь (-ся).

построе́ние *с.* 1. (*действие*) çêkirin *ж.*; anîn serî (*завершение*); 2. (*строй*) teşkîlet *ж.*, çêkirin *ж.*; 3. *воен.* cerge *ж.*, rêze *ж.*

постро́ить(ся) *сов. см.* стро́ить(ся).

постро́й‖ка *ж.* 1. (*действие*) çêkirin *ж.*, avakirin *ж.*; 2. (*строение*) avaî *м.*, xanî *м.*; **деревя́нные ~ки** avaîyê dar.

постро́мка *ж.* qaîşa (tasma, benda) hespê.

поступа́тельный *прил.* yê pêşdaçûînê, yê pêşdabirinê.

поступ‖а́ть, поступи́ть 1. (*совершать поступок*) kirin; **~ хорошо́** qencî kirin; 2. (*обходиться*) yole çûîn; **пло́хо ~и́ть с ке́м-л.** kesekîra xirab yole çûîn; 3. (*вступать, зачисляться*) ketin [ser]; **~ на рабо́ту** ketin ser xebatê; 4. (*прибывать*) hatin; **~ и́ли но́вые това́ры** heşîyaê teze hatîye.

поступа́ться, поступи́ться terk daîn, dest lêkişandin.

поступи́ть(ся) *сов. см.* поступа́ть(ся).

поступле́ние *с.* 1. (*вступление*) ketin li..., dexilbûîn *ж.*; **~ в шко́лу** ketin [li] mektebê; 2. (*товаров и т. п.*) hatin *ж.*

посту́пок *м.* kirin *ж.*, kirinaî *ж.*; **сме́лый ~** mêrxasî *ж.*; **че́стный ~** kirina helal.

по́ступь *ж.* gav *ж.*, rêvaçûîn *ж.*

постуча́ть *сов.* lêdan, lêxistin, kutan; **~ в дверь** derî xistin.

постуча́ться *сов.*: **~ в дверь** derî xistin.

посты́дный *прил.* yê şermê, yê eîbê.

посу́да *ж.* derdan *ж.*, firaq *ж.*

посу́дный *прил.* yê derdanê, yê firaqê; **~ магази́н** mîxaza firaqa.

посу́л *м. разг.* sozdaîn *ж.*

посули́ть *сов. см.* сули́ть.

посурьми́ть *см.* насурьми́ть.

посчастли́виться *сов. безл.* bext lêdan, (*ji kesekîra*) lihevhatin.

посчита́ть(ся) *сов. см.* счита́ть(ся).

посыла́ть, посла́ть *в разн. знач.* şandin, verêkirin; **~ письмо́** name şandin; **~ покло́н** selam şandin.

посы́лка *ж.* 1. (*действие*) verêkirin *ж.*, şandin *ж.*; 2. (*пакет*) emanet *м.*, pakêt *ж.*

посы́льный *м.* qasid *м.*

посы́пать *сов. см.* посыпа́ть.

